



**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

**TESÎRA HELWESTÊ LI SER TERCÎHA ZIMAN DI JIYANA
KURDÎZANAN DE
(NIMÛNEYA WANÊ)**

Amadekar

Zafer AÇAR

Teza Doktorayê

ŞÊWIRMENDÊ TEZÊ

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bîngol – 2019

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KÜRTÇE BİLENLERDE
TUTUMUN DİL TERCİHİNE ETKİSİ
(VAN ÖRNEĞİ)

Hazırlayan
Zafer AÇAR

DOKTORA TEZİ

TEZ DANIŞMANI
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

Bingöl – 2019

NAVEROK	
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	V
TEZ ONAY SAYFASI.....	VI
KURTE	VII
ÖZET	VIII
ABSTARCT	IX
PÊŞGOTIN	X
LÎSTEYA ŞEKLAN	XII
LÎSTEYA TABLOYAN.....	XIII
KURTKIRIN	XIV
DESTPÊK.....	1
BEŞA YEKEM.....	11
1. Çarçoveya Giştî	11
1.1. Zar.....	11
1.2. Ziman	12
1.2.1. Zimanê Serfî.....	13
1.2.2. Zimanê Dayikê.....	13
1.2.3. Zimanê Duyem	14
1.2.4. Zimanê Biyanî	15
1.2.5. Zimanê Fermî.....	15
1.2.6. Zimanê Kêmeper(an).....	17
1.2.7. Şêwezar	18
1.2.7.1. Îdyolekt.....	19
1.2.7.2. Sosyolekt	19
1.2.7.3. Diyalekt (Zarava).....	20
1.2.7.4. Devok.....	23
1.2.7.5. Aksan	26
1.2.7.6. Argo	26
1.3. Duzimanî.....	27
1.4. Pirzimanî.....	31
1.5. Kontakta Zimanan	32
1.5.1. Bandora Zimanan a li Hev	34

1.5.2. Guherîna ziman.....	39
1.5.2.1. Telafûz	40
1.5.2.2. Hin Guherînên Fonolojîk.....	40
1.5.2.3. Hin Guherînên Morfolojîk.....	41
1.5.2.4. Hin Guherînên Morfosentaktîk.....	42
1.5.3. Lihevketina Ziman (language mixing) an jî Kod-têkelî (code-mixing).....	43
1.5.4. Kod-guhertin (code switching).....	43
1.5.5. Dîglossia (duzarî).....	45
1.5.6. Paşketina Zimanan û Mirina Zimanan.....	46
1.6. Teoriyên Têkilî Duzimanî û Kontakta Zimanan.....	48
1.7. Helwest	48
1.7.1. Helwest Çi ye?	50
1.7.2. Hin Têgehên Têkilî Helwestê	53
1.7.2.1. Bawerî.....	53
1.7.2.2. Qenaet	54
1.7.2.3. Ajo	55
1.7.2.4. Nirx	55
1.7.2.5. Norm	55
1.7.2.6. Îdeolojî.....	56
1.7.2.7. Temsîlên Civakî.....	56
1.7.3. Hêmanên Helwestê	57
1.7.4. Teoriyên Serekî yên Têkilî Helwestê	58
1.8. Helwest û Kiryar.....	58
1.9. Guherîna Helwestan.....	60
1.10. Hin Kardayên ku Tesîrê li Çêbûn û Guherîna Helwestê Dikin	60
1.11. Pîvandina Helwestan	61
1.12. Pîvanekên Helwestê.....	63
1.12.1. Pîvaneka Mesafeya Civakî ya Bogardus	65
1.12.2. Pîvaneka Guttman.....	66
1.12.3. Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood (Pîvaneka Cudatiya Semantîk)	66
1.12.4. Pîvaneka Thurstone	67
1.12.5. Pîvaneka Likert.....	68
1.13. Helwesta Ziman	70

1.14. Siyaset û Plansaziya Ziman wekî Kartêkereke li ser Helwesta Ziman	72
1.15. Helwesta Kurdan a Têkilî Zimanê Wan	76
BEŞA II	80
2. Lêkolîna Kantîtatîv/Çendar	80
2.1. Metodolojî.....	80
2.1.1. Pîvaneka Helwestê.....	81
2.1.2. Xebata Pîlot	82
2.1.3. Xebata Serekî.....	83
2.1.3.1. Pêbawerî û Têbarî.....	84
2.2. Analîza Teswîrî ya Daneyan.....	84
2.2.1. Zayend	85
2.2.2. Kar	87
2.2.3. Perwerde	89
2.2.4. Sal	91
2.2.5. Şêweya Hînbûna Ziman.....	94
2.2.6. Tesîra Rewşa Siyasî.....	96
2.2.7. Tesîra Aboriyê	99
2.2.8. Prestîj	101
2.3. Raberî û Encam.....	103
BEŞA III	106
3. Lêkolîna Kalîtatîv/Çêbar	106
3.1. Metodolojî.....	106
3.1.1. Sêwra/Dîzayna Lêkolînê.....	107
3.1.2. Beşdar	108
3.2. Analîza Daneyan.....	109
3.2.1. Temayên Lêkolînê	110
3.2.1.1. Mecbûriyet û Pêdivî.....	110
3.2.1.2. Aîdiyet	114
3.2.1.3. Têrayiya Ziman.....	117
3.3. Raberî û Encam.....	120
ENCAM.....	124
JÊDER	128
PÊVEK -1	134

1. Forma Anketê ya Kurdî.....	134
2. Tirkiya Forma Anketê	139
PÊVEK -2	143
Forma Hevpeyvînê ya Tercîha Ziman	143
PÊVEK -3	144
Notên Hevpeyvînan	144
FERHENG	171
JÎNNAME.....	177

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Tesîra Helwestê li ser Tercîha Ziman di Jiyana Kurdîzanan de –(Nimûneya Wanê)* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

01/ 12/ 2019

İmza

Öğrencinin Adı Soyadı

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Zafer AÇAR tarafından hazırlanan *Tesîra Helwestê li şer Tercîha Ziman di Jiyana Kurdîzanan de (Nimûneya Bajarê Wanê)* başlıklı bu çalışma, 31.12.2019 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği/oy çokluğuyla*] başarılı / başarısız bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Doç. Dr. Tahirhan AYDIN

İmza: 

Danışman : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

İmza: 

Üye : Doç. Dr. Üyesi Mustafa ASLAN

İmza: 

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD

İmza: 

Üye : Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY

İmza: 

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 20..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

KURTE

Ji ber rewşa welat û civaka kurdan a îro, merî dikare bêje kurd piranî liqayî jiyaneke duziman bûne çî bi dilê wan be çî jî bê dilê wan be. Kurd di jiyana xwe ya rojane, zarava û devok li hêlekî, ew kêmî bi du zimanan (kurdî-erebî, kurdî-farsî, kurdî-tirkî, kurdî-ermenî) dijîn û merî dikare bêje jiyana kurdan a civakî ya îroroj jiyaneke duziman e (kurdên yekziman û asîmîle nebûyî û kurdên yekziman û asîmîle bûyî ne têde.)

Îja di rewşa kurdan a Bakurê welêt de ji bo ku kurd û zimanê wan kêmpar in helbet derbarê zimanê wan û zimanê zêdepar yanî tirkî de ew ê xwedî helwestekê bin. Xebata me armanc dike vê helwestê vekole ya kurdîzanên bajarê Wanê ku ew bi kurdî dikarin biaxivin û bixwînin.

Me di xebata xwe de wekî rêbaza têkel herdu lêkolînên kantîtatîv û kalîtatîv bijartin û wekî berhevkirina daneyan jî me teknîkên anket û hevpeyvînê bi kar anîn. Lêkolîna me ya kantîtatîv lédikole ka di helwesta kurdîzanan a ziman de li gorî guherbarên wekî zayend, kar, perwerde û temenê wan ferqeke çawa heye. Dîsa em bi vê xebatê dixwazin nîşan bidin bê şeweya hînbûna kurdî ya kurdîzanan di helwesta wan a zimanî de çiqas kartêker e. Herwiha xebata me lédipirse; desteka siyasî, pêşketina aboriyê û xwedî prestîj bûn di bikaranîn û xwedîderketina kurdî de çiqas girîng e? Di lêkolîna xwe ya kalîtatîv de jî me ji kurdîzanan pirsî; gelo ew di sehayên gel de bêtir kîjan zimanî tercîh dikin, ji ber kîjan sebebên kurdî yan jî tirkî tercîh dikin û dema ew bi van zimanan diaxivin di kîjanî de bêtir xwe rihet hîs dikin?

Wekî encam em dikarin bêjin di navbera helwesta kurdîzanan û tercîha zimanê wan ê pêwendiyê de têkiliyeke xurt heye û herdu lêkolîn jî diçespînin ku kurdîzanên helwestberz bêtir xwedî li zimanê xwe yê serî derdikevin.

Peyvên Sereke: Kurdî, Duzimanî, Kontakta zimanan, Helwest, Helwesta ziman

ÖZET

Kürtlerin içinde yaşadıkları toplumun ve ülkenin şartlarından dolayı denebilir ki günümüzde Kürtler ister kendi istekleri olsun ister istekleri dışında olsun iki dilli bir yaşama maruz kalmışlardır. Kürtler hayatlarında -lehçe ve ağızlar bir yana- en az iki dille (Kürtçe-Arapça, Kürtçe-Farsça, Kürtçe-Türkçe, Kürtçe-Ermenice) hayatlarını sürdürüyorlar ve asimile olmuş tekdilli Kürtler ile henüz asimile olmamış tekdilli Kürtler haricindeki Kürtlerin toplumsal yaşamı günümüzde ikidillidir diyebiliriz.

Böylece Türkiyede yaşayan ve dilleri azınlık durumunda olan Kürtlerin kendi dillerine ve çoğunluk dili olan Türkçeye karşı bir tutuma sahip olmalarını beklemek doğal bir durumdur. Çalışmamız Van'da yaşayan ve Kürtçe konuşabilen ve okuyabilen bu kişilerin tutumlarını araştırmayı amaçlamaktadır.

Çalışmamızda yöntem olarak nicel ve nitel yöntemleri seçtik, veri toplama teknikleri olarak da anket ve görüşme tekniklerini kullandık. Nicel araştırmamız Kürtçe bilenlerin dil tutumlarında cinsiyet, yaş, meslek ve eğitim durumlarına göre nasıl bir farklılaşma olduğunu göstermeye çalışmaktadır. Ayrıca bu bireylerin Kürtçeyi öğrenme biçimlerinin dil tutumlarına nasıl etki ettiğini sorgulamaktadır. Bununla birlikte araştırmamız siyasi desteğin, ekonomik iyileşmenin ve prestijlerinin artmasının bu bireylerin Kürtçeyi kulanma ve ona sahip çıkma üzerindeki önemini sınamaktadır. Nitel araştırmamız ise Kürtçe bilenlerin kamusal alanda her iki dilden daha çok hangisini tercih ettiğini, bu dilleri tercih etme sebeplerini ve hangi dili konuşurken kendilerini daha rahat hissettiklerini araştırmaktadır.

Sonuç olarak her iki araştırmamız da Kürtçe bilenlerin tutumları ile dil tercihleri arasında güçlü bir ilişki olduğunu ortaya çıkarmış, ayrıca dil tutumu yüksek olan Kürtçe bilenlerin kendi anadillerine daha çok sahip çıktığını göstermiştir.

Anahtar kavramlar: Kürtçe, İkidillilik, Dil etkileşimi, Tutum, Dil tutumu

ABSTARCT

It can be said that due to the conditions of the society and the country in which the Kurds live, the Kurds have been exposed to a bilingual life whether their will or not. Apart from dialects and subdialects, the Kurds live within at least two language (Kurdsh-Arabic, Kurdish-Persian, Kurdish-Turkish and Kurdish-Armenian) and we can say that the social life of the Kurds is bilingual other than that of assimilated monolingual and who have not been assimilated so far.

So it is a natural process for Kurdish people living Turkey whose language is the minority to have an attitude towards their language and the majority language, which is Turkish. Our study aims to investigate the attitudes of these people living in Van province who can speak and read kurdish.

In our study, we chose quantitative an qualitative methods, also used questionnarie and intewiev techniques as data collection techniques. Quantitative research attempts to show how the language attitudes of Kurdish speakers differ according to gender, age, occupation and education. It also questions how the individual's the way of learning Kurdish affects language attitudes. Moreover, our research is testing the importance of political support, economic recovery and increasing prestige on the use and protection of Kurdish. On the other hand, our qualitative research examines the language preference of Kurdish speakers in the public sphere, the reasons for choosing these languages and which language they feel more comfortable when speaking.

As a result, both of our studies revealed a strong relationship between the attitudes of Kurdish speakers and language preferences, and also showed that those who speak Kurdish with a high level of linguistic attitude are more likely to protect their own mother tongue.

Keywords: Kurdish, Bilingualism, Contact language, Attitude, Language attitude

PÊŞGOTIN

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

Zimanê kurdî li gorî zimanên din ên netew-dewletan hinekî dereng standarda xwe dîtibe/dibîne jî -ku standarda xwe jî li ser diyalektên xwe saz dike- ew ji hêla berhemên xwe yên zarî û nivîskî û derfetên xwe yên peyvdariştinê ve ne kêmi zimanên modern ên standardtbûyî ye. Lê pirsiyara mezin ne standartbûn an jî pirdiyalektiya kurdî ye, belkî pirsiyara mezin dên, bawerî û helwestên kurdên kurdînezan e yên derbarê zimanê wan û zimanên zêdepar ên fermî de.

Ji ber derbenda ser zimanê kurdî; xusûsen kurdên Bakûrî, derbarê nasname, dîrok, ziman û edebiyata xwe de ji pedagojiyê têr mehrûm man û vê jî nehîşt ew bibin xwedî şîûrekê bo parastin û pêşvebirina qîmetên xwe yên neteweyî. Digel pêşketina teknolojiyê û îmkanên hînbûnê, sistbûna zexta ser zimanê kurdî û têkoşînên şexsî û komeleyî jî, asîmîlasyona ser kurdan kêmi nebû û niha zimanê kurdî li navendê bajaran di bin metirsiyê de ye.

Ji bo ku serhatiyên kurdan tesîr li bîr û baweriyên wan kiriye û kurdên li navendên bajaran dijîn ji axaftineke xweş a kurdî ya berbelav û standard bêpar mane, vê rewşê hîştîye ku kurd bibin xwedî helwesteke ziman derbarê zimanê xwe û zimanê tirkî de. Ne hemû kurdên navendên bajaran lê kurdîzanên wê ketine ber meraqa me û ev pirsiyar bûye babeta xebata me: ‘Gelo di jiyana kurdîzanan de helwesta wan tesîreke çawa li tercîha wan a zimanî dike di dorwareke duziman de?’

Helwest wekî hêmaneke însanî, girîng e di jiyana wî de û tesîrê li jiyana wî ya takekesî û civakî dike. Li ser helwesta însanan ev sed salî zêdetir e ku lêkolîn çêbûne û xebatên têr hatine kirin di lîteratura psîkolojiya civakî de. Wekî wê, di derbarê helwesta ziman de jî gelek xebat çêbûne, xusûsen jî di herêmên kontakta zimanan û di herêmên zimanê kêmpar de. Ji bo ku kurdî wekî zimanekî kêmpar li Tirkiyeyê bi îmkanên teng dijî û kurdîzan piranî bi vîn û daxwaza xwe kurdî bi kar tînin helbet ev dike ku ew bibin xwedî helwesteke ziman û hêja ye ev helwesta wan bê vekolîn û naskirin.

Îja ji bo ku em helwesta kurdîzanan bipîvin û tîkiliya wê û xusûsiyetên kurdîzanan bîne der me ev xebat çêkir. Ji bo ku em xebata xwe saz bikin û lêkolîna xwe bisepînin me wekî nufûs bajarê Wanê û wekî nimûne jî kurdîzanên bajêr bijartin

û me lêkolîna xwe li ser têgerîna sehayî ligel teknîka anketê ya xebata kantîtatîv/çendar û rewşa bûyerê tevî teknîka hevpeyvîna niv-sazkirî ya xebata kalîtatîv/çêbar danî.

Dema me dest bi xebata xwe kir ji têgerîna lîteratûrê bigire heta berhevkirina berhemên têkilî xebatê, berhevkirina daneyan, belavkirina forman û wd. gelek alîkarî çêbûn; di serî da malbata min û hevalê min ên li Wanê ku ez minetdarê wan im û şanazê hebûn û naskirina wan im, ew hêjayî spasî û şukranên berz in. Digel wan spasiyên xwe ji rêvebir, xebatkar, mamoste û xwendekarên Komeleyên Nûbiharê û DÎSAyê -şaxên Wanê- re pêşkeş dikim û herwiha xusûsen ji Yakup AYKAÇ, Hacı YILMAZ, Mahmut AYAZ, Suvat PARİN, Süleyman KASAP, Fuat TANHAN û İlhan POLAT re spas dikim ku wan mesaiyeke dirêj bo min veqetandin.

Û xusûsen di vê rêya akademyê de ji serî heta niha û ji bo pêkhatina vê xebatê ji ber piştgirî, teşwîq û alîkariya wî şêwirmendê xwe birêz Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN re spas dikim, berdewamiya serkeftina wî dixwazim û diaya silametiya wî dikim.

Zafer AÇAR
Wan - 2019

LÎSTEYA ŞEKLAN

Şeklê 1.1: Helwestên Amerîkiyan li dijî Hin Grûpên Etnîk	65
Şeklê 1.2: Nimûneyeke Pîvaneka Guttman	66
Şeklê 1.3: Nimûneya Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood	67
Şeklê 1.4: Nimûneya Pîvaneka Thurstone	68
Şeklê 1.5: Nimûneyeke Pîvaneka Likert	69

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 2.1: Îstatîstîkên Teswîrî	85
Tablo 2.2: Zayend	86
Tablo 2.3: T-Test a bo Nimûneyên Netêkil	86
Tablo 2.4: Kar	88
Tablo 2.5: Testa ANOVAYê ya Karên Nimûneyan	88
Tablo 2.6: Perwerde	90
Tablo 2.7: T-Test a Rewşa Perwerdeya Nimûneyan	90
Tablo 2.8: Temen	91
Tablo 2.9: Testa ANOVAYê ya Temenê Nimûneyan	92
Tablo 2.10: Berawirdiya Geleyî ya Temenê Nimûneyan	92
Tablo 2.11: Şêweya Hînbûna Ziman	94
Tablo 2.12: Testa ANOVAYê ya Şêweya Hînbûna Ziman	94
Tablo 2.13: Berawirdiya Geleyî ya Şêweya Hînbûna Ziman	95
Tablo 2.14: Rewşa Siyasî	96
Tablo 2.15: Testa ANOVAYê ya Rewşa Siyasî	97
Tablo 2.16: Berawirdiya Geleyî	97
Tablo 2.17: Tesîra Aboriyê	99
Tablo 2.18: Testa ANOVAYê ya Têkilî Tesîra Aboriyê	99
Tablo 2.19: Berawirdiya Geleyî	100
Tablo 2.20: Prestîj	102
Tablo2.21: Testa ANOVAYê ya Têkilî Tesîra Prestîjê	102
Tablo 2.22: Berawirdiya Geleyî	103
Tablo 3.1.: Agahiyên Têkilî Beşdaran	109
Tablo 3.2.: Kodên Têkilî Mecbûriyet û Pêdiviyê	113
Tablo 3.3.: Kodên Têkilî Aîdiyetê	116
Tablo 3.4.: Kodên Têkilî Têrayiya Ziman	120

KURTKIRIN

AHZK	: Anketa Helwesta Ziman a Kesane
ANOVA	: Analysis of Variance
Bnr	: Binêre
BM	: Berî Mîladê
hb.	: heman berhem
KMO	: Kaiser-Meyer-Olkin
ND	: Navenda Danûstanê
Nm.	: Nimûne
SPSS	: Statistical Package for the Social Sciences
ss.	: sedsal
Gh.	: Guhastin
wd.	: wekî din
ww.	: wekî wan
yd.	: yên din

DESTPÊK

Ziman wekî navgihana ragihandin û pêwendiyên hem di jiyana takekesî û hem jî ya civakî ya însan de rola xwe ya serekî -di însanên pêşîn vir de- diparêze û di van çend sedsalên dawî de hem rola xwe hem jî peywir û vegira xwe firehtir kiriye. Dema behsa ziman dibe terîfa Sassureî ya ‘sîstemeke nîşanekan e ku têgahan diyar dike’ guncaw e ziman wekî amûra pêwendiyê nîşan bide ku hingê ne axaftin tenê, lê hemî teherên pêwendiyê vedigre nava xwe.

Digel pêşketina zanîn û teknîkê însan hem hîni zimanên xwe yên nû bûn, hem haya wan bi zimanên din ên candaran çêbûn, hem jî zimanên nû ji têkiliyên wan yên civakî û kelûmelên wan ên teknolojîk derketin. Bo nimûne; heywan di nav cinsên xwe de bi zimanekî xweser pêwendiyên çêdikin, însanên bê zar û nabihîz bi riya zimanê nîşanên dest û tiliyan hev fêhm dikin. Dîsa însan bi xêra hin tevger, jest û nîqandinan dikarin bê peyv, deng û herf hev serwext bikin, sînorê vê pevguhastinê teng be jî.

Li aliyekî din ziman bi xêra teknîka îro sînorê xwe firehtir kiriye û êdî dikare ji cografyaya xwe derkeve û li her derê dinyayê xwe nîşan bide. Ev firehbûna ziman ne ji derva tenê, ji hundir ve jî pêk tê; çunkî bi têkiliya zimanên din qalib û peyvên ziman ferhenga wî mezintir dikin, bi xêra amûrên teknolojîk jî bikaranîna wê bêtir pratîk dibe, ev jî dike ku şiyar û hizra qisevanên xwemalî/siruştî pêş keve yan jî li gorî yên berê biguhere û formeke nû li xwe bigire.

Di van demên ku navenda wê de zanîn, agahî teknîk û teknolojî heye û her ku diçe mezintir dibe ziman bêtir girîng dibe hem wekî kanala vê danûstan û pevguhastinê hem jî wekî çeka kargerî û siyaseta dewletan ku ev ji du sedsalan zêdetir e li gelek deverên dinyayê bi kar tê. Di gelek berhemên zimanzaniyê de jimara ziman an jî ziman û diyalektê wan tê dan -ku em ê beşên pêrava behsa wan jimaran bikin- û hema bêje di hemiyana de pêbenda mirina zimanan de jimara zimanên ber metirsiyê yan jî yên ber birandinê jî tê dan.

Îja, ji bo ku ziman evqas girîng e di jiyana însan de, sebebên tercîhkirina ziman jî girîng in û hêja ne merî wan sebebên bipirse û lêbikole. Wekî hêmaneke serekî ya biwara psîkolojiya civakî ‘helwest’ û têkilî dorwarên duziman û kontakta zimanan ‘helwesta ziman’, yek ji van sebebên e ku di tercîhkirina ziman de balê dikişîne ser

xwe. Ji ber vê, xebata me xebateke sosyolînguîstîk e û dixwaze helwesta kurdîzanan a derbarê tercîha wan a axaftinê de bipîve ku ji vî aliyê ve xebateke têkilî psîkolojiya civakî ye jî. Loma em ê nekevin nav agahiyên teknîk ên zarava û devokên kurmancî. Lê di qismên têkilî xebatê de dema me behsa şeweyên ziman kirin, di binbeşê ‘zarava’ û ‘devok’an de em ê digel terîfên wan amaje bi zarava û devokên kurdî bikin tevî terîf û tesnîfên li ser wan çêbûne. Herwiha ji bo ku devera em ser dixebitin bajarê Wanê ye, dema gotin hate ser, em ê rewşa kurdî ya têkilî herêmê binirxînin û nimûneyên xwe ji herêma xebata xwe bidin.

Mijara Tezê

Mijara teza me ast û pîleya helwesta zimanê kesên kurdîzan e ku em dixwazin bizanin ka tercîha kurdîzanan a zîmanê wan ê axaftinê kîjan e wekî zimanê yekem, di têkilî û pêwendiya bi însanên din re di jiyana wan a rojane de. Ji bo ku helwest; bi taybetî jî helwetsa ziman, mijara me ya serke ye, me cî da hin têgihên têkilî helwestê yê ji biwara psîkolojiya civakî. Herwiha mijara pîvandinê û hin pîvanekên sereke yê pîvandina helwestê di xebata me de digel nimûneyan wan tê pêşkeşkirin. Dîsa, xebata me ji bo ku dixwaze tesîra helwestê li ser tercîha ziman vekole li dorwareke duziman, hin mijarên têkilî helwesta ziman wekî; duzimanî, kontakta ziman û cureyên ziman ên kesî û komalî di tezê de cî digirin.

Armanca Tezê

Tirkiye bi giştî û Bakurê Kurdistanê xusûsî ji demên kirîtîk re derbas dibin. Ev dema ku serê sedsalê û hezarsalê ye, ji bo cîhanê û Rojhilata Navîn jî girîng e. Li dinyayê gelek guherîn çêdibin û digel guherînên fîzîkî û civakî di însanan de guherînên psîkolojîk jî çêdibin. Şer, qeyran, koç û koçberî, kanalên pêwendiyê, amûrên teknolojîk hin boneyên sereke û pêşîn in ku ev guherîn pê çêdibin. Û ev guherîn, di hin baweriyên însanan, zimanê wan, helwestên wan û xeyal û îdealên wan de jî xwe dide der.

Di jiyana kurdan a rojane de guherîn ne yekalî ye. Ne tenê jiyana wan a li mektebê, li kar û bazarê û ya derva, jiyana wan a navmal jî zûka diguhere. Nimûne; niha li malbatên kurdan kal û pîrên ku tirkî nizanin bi neviyên ku kurdî nizanin re dijîn. Îja ev rewşeke wisa ye, dikare tesîrê li helwesta kurdan bike ya raber ziman ku em armanc dikin vê helwestê û tesîra wê ya ser zimanê wan ê pêwendiyê bipîvin.

Helwest di jiyana însan de, xusûsen jî însanê modern de ciyekî girîng digire. Çendî însanên xwendî û gihîştî di parastina helwesta xwe de bihêztir bin jî helwesta hemî însanan dikare biguhere. Helwesta însanan a li ser bawerî, jiyana, dêna ser dinyayê, ziman û çanda wî/ê an jî yên din heye û li gorî guherînan ew jî dikare biguhere.

Îja xebata me ew ê ser helwesta ziman be ku di jiyana kurdan a duziman de ciyekî girîng digire. Armanca me di vê xebatê de ew e ku em bizanin ka kurdîzan di jiyana xwe ya rojane de ji herdu zimanên kurdî û tirkî kîjan zimanê tercîh dikin û ji ber çi tercîh dikin. Herwiha em armanc dikin ku sebebên serekî û yên talî yên guherîna helwesta ziman çi ne û li gorî guherbarên nimûneyan (perwerde, meslek, temen û zayend) û hin xusûsiyetên wekî; şêweya hînbûna zimanê wan ê serî, rewşa siyasî, aborî û hebûn an nebûna prestîjê ka çawa bandor li helwesta wan a ser zimanê pêwendiyê dike, hîn bibin.

Girîngiya Tezê

Sedsala borî ji gelek hêlan ve ji bo kurdan sedsaleke mehrumiyetê bû. Di çaryeka dawî ya sedsalê de ligel xebatên şexsî û komeleyî yên kurdan, zêdebûna perwerdeyê û pêdaçûna teknolojiyê jiyana kurdan de rê û îmkanên nû ji wan re vekirin. Zexta ser çand û zimanê wan bi nisbet kêmtir û îzolasyona li dor wan sisttir bû. Bi xêra van guherînan bi zimanên biyanî û yên fermî yên parçewelatên kurdan xebatên li dor kurdan û kurdî zêdetir bûn. Bi qasî wan nebe jî bi zimanê kurdî jî ev xebat êdî di her warê kurdolojiyê de tên kirin.

Îja welatekî mîna Tirkiyeyê yê ku kurd wekî kêmpareke girseyî lê dijîn digel îmkanên nû, bi pirsîyarên nû re jî hevrû ne. Kurdên ku li Rojhilatê Tirkiyeyê yanî li Herêma Kurdan dijîn tevî rê û îmkanên teknolojiyê û sistbûna ser astengên pêş zimanê kurdî ku pê dikarin zimanê xwe hîn bin an pêş bixin; ew karên xwe yê fermî bi tirkî dikin, perwerdeya xwe bi tirkî dibînin û têkiliyên xwe yên navendên bajaran pîranî bi tirkî dikin ku ev jî dihêle asîmilasyona wan a zimanî û çandî zûtir û zêdetir be.

Ji bo ku kurd bi vî awayî di nav du zimanan de û kêmtir bi du çandan mezin dibin, ew bivê nevē dibin xwedî helwestekê dema ew bi biyanîyên xwe re dikevîne têkiliyê û danûstandinê. Eva ew helwest e ku ya em lê digerin û meroq dikin ku çawa

ye, çawa çêdibe û heta çi astekê ye. Ji ber vê em ê bi vê xebata xwe sedema vê helwesta ziman bigerin, bipîvin encamên vê helwestê tê derxin. Tabî ev helwesta ku em ê bipîvin a kurdîzanan e ku ew bi kurdî dikarin biaxivin û ji xwendina kurdî fêhm bikin.

Li aliyekî din ev lêkolîn girîng e çunkî cara pêşîn ew li bajarekî kurdan ê Bakur, bi zimanê kurdî helwesta ziman a kesên kurdîzan dipêve hem bi rêbazeke çendar û hem jî çêbar, wekî xebateke sosyolînguîstîk û psîkolojiya civakî dê bibe yek ji xebatên pêşîn ê vê biwarê.

Rêbaza Tezê

Xebata me li ser hîmên hin teorî û paradîgmayên zanistên civakî daniye yên di biwara zimanzaniya civakî de ji babetên duzimanî û kontakta zimanan, û di biwara psîkolojiya civakî de jî yên ji babeta helwestê. Di xebata xwe de me digel teorî û hîpotezên têkilî duzimanî, kontakta zimanan û helwestê, hin xebatên ku me jê îstîfade kirine jî pêşkeş kirin û metodolojiya xebata xwe jî diyar kir.

Dema me dest bi lêkolîna xwe kir me biryar da ku em ê xebata xwe ser hîmê lêkolîneke kantîtatîv/çendar daynîn ku wekî teknîk em ê teknîka anketê bi kar bînin. Lê dûre me wekî lêkolîneke kalîtatîv/çêbar jî lê zêde kir ku ew ji hevpeyvînan pêk tî. Loma me di teza xwe de lêkolîna rêbaza têkel (mix method research) bi kar anî.

Lêkolîna metoda têkel nêzîkbûneke lêkolînê ye ku dihewîne; berhevkirina daneyên kantîtatîv û kalîtatîv, pevkirina formên herdu daneyan û bikaranîna dîzaynên ciyawaz ku faraziyên felsefî û çarçoveyên teorîk dihundurîne. Faraziya bingehîn a vê lêkolînê ew e ku pevkirina nêzîkbûnên kantîtatîv û kalîtatîv dabîn dike, ji ber ku fêmkirina ji pirseke lêkolînê bêtir temam e bi herdu nêzîkbûnan, li gorî nêzîkbûnekê tenê (Creswell, 2014: 32).

Creswell dîsa di ciyekî din ê berhema xwe de (r. 48), ji bo lêkolîna têkel wiha derdibirre; ‘Xebat bi lêkolîneke firawan dest pê dike ji bo gişkirina encamên ji nifûsekê, paşê di sefheyê duyem, li ser xebata kalîtatîv hûr dibe, hevpeyvînen vekirî dike ji bo nêrînen bi detay ên beşdaran bigire bona bibe destekê îzaha lêkolîna kantîtatîv a ku serîda hatibû kirin.’

Wekî ji terîfa wê diyar dibe ev metod herdu xebatên kantîtatîv û kalîtatîv pev dike. Îja hin lêkolînerên wekî Greene (2007) û Bryman (2006) armanca pevkirina van lêkolînan wiha nîşan kirine:

- 1) *Curedarî* - bi rêya metodên cuda armanca dîtina rastbûna encaman, wekheviya wan û têkiliya wan heye.
- 2) *Temamkarî* - encamên ku bi dîzaynekê bi dest ketine bi encamên dîzayneke din tîst destekkirin, geşkirin, nimûnepêdan û eşkerekirin.
- 3) *Geşkirin* - encamên ku ji dîzaynekê bi dest ketiye tîst armanckirin ku dîzayneke din geş bike yan jî tesîrekê lê bike.
- 4) *Pêşkarî* - armanca dike ku tezat û nakokî bîne keşfkirin, laye-nêrînên nû bîne vekolîn, pirs û encamên dîzaynekê bi pirs û encamên dîzayneke din ve cardin bîne şewandin.
- 5) *Firehbûn* - armanca dike ku ji bo hêmanên cuda yêst lêkolîne bi dîzaynen cuda vegir û sînorên lêkolîne bê firehkirin.
- 6) *Pêbawerî* - bi bikaranîna herdu dîzaynan armanca dike ku rastiya deskeftên lêkolîne zexm bike.
- 7) *Nimûnekirin* - ji bo nimûnekirina daneyên kantîtatîv, daneyên kalîtatîv bi kar tîne.
- 8) *Rastandin û Keşfkirin* - di bin lêkolînekê de dema hîpotezek tîst danîn daneyên kalîtatîv tîst bikaranîn ji bo bi dîzayneke kantîtatîv bîne testkirin.

(Alkan, Şimşek & Erbil, 2019: 563)

Li gorî cureyên jorê lêkolîna me çendîn ji van cureyan bihewîne jî em zêdetir armanca dikin ku herdu xebatên me hev temam bikin, pê xebata me dewlemend be, geş be û nimûneyan bide û diyarker be.

Li aliyekî din, di xebata xwe de me ji bo nimûnedan/nimûnekirinê jî hin teknîk bi kar anîn ku di xebatên zanistî de nimûnedan girîng e ji bo berhevkirina daneyan. Di zanistên sosyal û kiryarî de rêbazên nimûnedanê piranî wekî îhtîmalî û mebestdar dibin du grûpan lê Teddlie û Yu (2007) cureyên nimûneyan kirine çar kategoriyan û di xebata xwe de ew tesnîf kirine. Ev cureyên nimûnedanê wekî; *nimûnedana îhtîmalî* ku piranî di xebatên kantîtatîv de bi kar tîst, *nimûnedana mebestdar* ew jî zêdetir xebatên kalîtatîv de bi kar tîst û herduyên din jî *nimûneya guncawî* û *rêbaza nimûneya tîkel* e (Baki & Gökçek 2012: 4-5). Îja ji bo ku xebata me piştî xwe dide

metoda t kel, tekn ka nim nedan  ya ku me bi kar an  ji tekn k n r baza nim neya t kel ‘nim neya r z n e’ ku ev nim nedan ji bo xebateke r baza t kel bi r z  stratejiy n ihtimal    mebestdar (kant tat v-kal tat v) yan j  (kal tat v-kant tat v) bi kar t ne   wisa nim neyan dibj re (Baki & G k ek 2012: 7).

 ja me j  di xebata xwe ya kant tat v de tekn ka ihtimal  ya nim nedan    di ya kant tat v de j  tekn ka mebestdar a nim nedan  bi kar an    li gor  r baza t kel me nim nedana r z n bi kar an  ku p    me xebata kant tat v pa   j  ya kal tat v kir. Em   di be  n wan de bi detay behsa metodolojiya herdu xebatan bikin. L  li j r em   be  n tez    li gor  be  n hin agahiy n r baza tez  p     bikin.

Xebata me ji destp k, s  be  n serek    encam  p k t . Di destp k  de; me mijara tez , j der n serek  y n tez , armanc, giringiya xebat    metodolojiya xebat  diyar kir digel tekn k   h poteza l kol na xebata xwe.

Di be  a Iem de me  ar oveya teor k p     kir ku hers  binbe  n serek ; ‘duziman , kontakta zimanan   helwest’  digel mijar n t kil  wan dihew ne.

Di be  a Iiyem de j  me c  da xebata xwe ya kant tat v/ endar ku xwe disp re l kol na sehay    tekn ka anket . D  xebata xwe ya anket  de me wek  nif s/populasyon her ma Wan  (navenda baj r) bijart   wek  nim ne j  me kurd zan n ji  end kar   perwerdey n cuda   ji herdu zayendan neqandin. Anketa me ji du be  an p k t . Be  a yekem n ji agahiy n kesayet , malbat    civak     end pirs n t kil  helwesta nim neyan   be  a duduyan j  ji p vaneka t pa Likert p k t  ku ew 31 pirsan dihew ne. Ji bo ku di l teratura kurd  de anket   p vanek n helwest  bi dest me neketin me ji xebata Kasap (2015)  stifade kir. Pi t  ku me anket wergerande kurd  di be  a yekem ya anket  de me hin guher n   kirin; me hin pirs j  derxistin   hin pirs l  z de kirin l  be  a duyem me hin pirs n ku li xebata me nedihatn me derxistin l  me pirs l  z de nekirin.

Pi t  ku anketa me amade b , me ew p    li ser 20 kesan wek  xebata p lot sepand. Bi v  xebat  me k mas    pirsiyar n xwe d tin   me di xebata serek  de ew serrast kirin   wisa sepand.

Dema em derketine sehay  yek ji pirsiyar n me j  d tina nim neyan b n.  unk  ji bo ku di asta l se   l sans  li Wan  perwerde tuneb  nedib  em anket n xwe li saziy n ferm  bisep nin. Loma me wek  tekn ka belavkirina anketan tekn ka **giloka**

berfê bi kar anî. Bi vê teknîkê li Wanê me nimûneyên xwe wiha dîtin; kesên ku me ew nas dikirin, hin komeleyên ku berê wekî fermî dersa zimanê kurdî dabûn û xwendevanên xwe dinasîn, xwendevanên mastira beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya li Zanîngeha Yüzüncü Yıl û kesên bi zimanê kurdî re mijûl dibûn wekî xwendar an jî nivîskar nimûneyên me yên vê xebatê bûn. Nimûneyên ku me lêkolîna xwe ser sepanandin ev bûn; xwendevanên lîse û zanîgehê, esnaf û karmend. Li gorî temenê wan me binî 16, ser jî 65 bijartin û ew bi pênc kategoriyan cihê kirin; ‘16-25, 26-35, 36-45, 46-55 û 56-65’ ku nimûneyên me ji herdu zayendên jin û mêran pêk tên. Lê dema me anketên xwe sepanandin ji bo ku ji 55 salî jortir kes tunebû ew wekî çar kategorî derketin. Di herdu xebatên xwe de jî me anketa xwe xiste sîstema SPSSê (Statistical Package for the Social Sciences/Programa Îstatîstîkan bo Zanînen Civakî) û analîza daneyên wan anketan kir.

Beşa IIIyem jî ji lêkolîna kalîtatîv/çêbar pêk tê ku me bi 16 kurdîzanan re hevpeyvîn çêkirin ku xêncî çend hebên nivîskî hevpeyvînên me zarî bûn û me ew qeyd kirin. Her hevpeyvînek teqrîben heta nîv saetekê kişandin, me piştî ku dengê wan qeyd kirin me ew deşîfre kir û analîz û raveyên xwe pêşkeş kirin.

Di vê lêkolîna xwe de me ji çend paradîmayên xebatên kalîtatîv ‘lêkolîna rewşê’ bijart û wekî teknîk jî teknîka hevpeyvînê/milaqat, ji wê jî me ‘hevpeyvîna nîvsazkirî’ bi kar anî. Piştî ku me pirsên xwe amade kirin me fikrên du pisporên mijarê wergirtin. Pirsên lêkolîna me guncaw hatin dîtin û me ew pirs wekî xebateke pîlot li ser sê kesan sepanandin û dengên wan qeyd kirin. Dûre me ew qeyd deşîfre kirin û ji bo xebata xwe ya serekî ew nirxandin. Me kêmasiyên xwe dîtin û tevdîrên xwe ji bo xebata serekî girtin.

Di xebata xwe ya serekî de jî, wekî xebatên xwe yên din, nifûsa me bajarê Wanê bû û nimûneyên me jî kurdîzanên bajêr bûn. Di vê lêkolîna kalîtatîv de me wekî nimûne ji kurdîzanên bajêr 16 kes bijartin û piştî destûrgirtinê me hevpeyvînên xwe kirin. Me nimûneyên xwe jî veqetande du grûpan. Grûpek kesên helwesta wan a kurdî berz, grûpa din jî kesên helwesta wan a kurdî nizm bû. Me asta helwesta wan jî li gorî bersivandina pirsnameya xwe ya xebata kantîtatîv diyar kirin. Her hevpeyvîneke me di maweyeke nîv saet-saetekê dewam kir ku li gorî naveroka milaqatê hin ciyan me pirsên kurt li beşdarên xwe kirin.

Di encamê de jî wekî kurteya teza xwe me tesbît û pêşniyarên xwe pêşkeş kirin.

Jêderên Serekî yên Tezê

Di teza xwe de me ji gelek jêderên ciyawaz îstifade kirin ên ji biwara psîkolojiya civakî, têkilî helwestê û ji biwara zimananiya civakî, têkilî duzimanî û kontakta zimanan. Herwiha ji bo herdu rêbazên kantîtatîv û kalîtatîv, jêderên; ‘rêbazên lêkolînê yên zanistên sosyal’ û ji bo termînolojiya xebatê jî ferhengên kurdî û yên biwara zimananiyê, jêderên din bûn ku me ji wan îstifade kirin.

Lê di teza xwe de, me ji hin jêderan îstifade kirin ku ew ji bo xebata me girîng û xebatên serekî bûn. Ji van xebatan a yekemîn; xebata Kasap (2015) bû ku di mijara helwesta nuciwanên duziman a raber zimanê wan ê serî de bû, me ji pîvaneka vê xebatê û rêbaza wê ya lêkolîna kantîtatîv îstifade kir. Xebata duwem ya Kazazoğlu (2011) bû ku mijara vê xebatê jî helwesta raber zimanê serî û zimanê biyanî û tesîra wê ya li ser serkeftina akademîk e. Ev xebat jî ji ber naskirina têgehên têkilî helwestê û pîvanekên helwestê girîng bûn ji bo xebata me. Dîsa di biwara psîkolojiya civakî de xebata Hogg û Vaughan (2010), di mijara helwestê û pîvandîna wê de xebata Tavşancıl (2018), di mijara duzimanî û kontakta zimanan de xebatên Thomason (2001), Öpengin (2011) û Varol (2014) hin jêderên din ên girîng in ji bo xebata me.

Hîpoteza Tezê û Pirsên wê

Di jiyana kurdan a civakî de ji bo ku pirsiyarên têkilî ziman û nasnameya wan ciyekî girîng digire xebatên têkilî vê rewşê jî helbet ew ê girîng bin. Heta niha di vê derbarê de hin xebatên wekî tez an jî wekî lêkolîn an jî proje yên têkilî nasname û zimanê kurdî çêbûne lê piranî ew bi zimanê tirkî çêbûne. Xebatên kurdî yên vê derbarê de -xusûsen jî li Bakur- kêma in ku ew rewş dihêle berê lêkolîneran bikeve vê biwarê. Valahiya vê sehayê ya xebatên kurdî berê me da vî aliyî û hîşt ku em li pey hin pirsan ên derbarê bikaranîn û sedemên tercîha bikaranîna ziman bikevin di jiyana kurdan a rojane de, xusûsen di konteksa bajêr de.

Hemû xebat û lêkolînên zanistî bi meraq û pirsê/an dest pê dikin. Îja lêgerîna bersiva wê/an pirsê/an û rahêja tadmînkirina meraqê, ew xebat û lêkolîna zanistî bixwe ye. Ji bo ku em xebata xwe li ser qadê bisepînin û daneyên jimarî û yên nejimarî rave bikin me hîpoteza xwe danî û li dor hîpoteza xwe me hin pirs saz kirin

ku bersiva wan pirsan ew ê berê xebata me diyar bike û rêya li ber me veke. Di lêkolîna xwe de ji bo herdu xebatên me yê kantîtatîv û kalîtatîv hîpoteza me ev e:

‘Di tercîha ziman de hokarên psîkolojîk û sosyolojîk girîng in.’

Îja ji bo ku em bizanin ev sebeb heta çî radeyê girîng in, kîjan sebeb pêşvatir in û gelo yê psîkolojîk/navîn (motîvasyon, eleqe, tirs, xwebawerî, hesta aîdiyetê û wd.) an ên sosyolojîk/derîn (rewşa siyasî, zexta civakî, prestîj û wd.) zêdetir kartêker in me ev lêkolîn sepand.

Wekî berê jî me behs kiribû ev lêkolîna me li ser herdu modelên kantîtatîv û kalîtatîv ava bûye ku dema di lêkolînekê de herdu model jî bi kar bînin wekî ‘modelên têkel’ tê binavkirin. Di herdu modelên lêkolînê de jî me hin pirsên lêkolînê amade kirin ku em ê wan pirsan di beşên wan de pêşkeş bikin.

Astengî û Zehmetiyên Tezê

Di heyama vê xebatê de em rastî hin zor û zehmetiyên hatin ku ya yekem dîtina nimûneyan bû ku ew ne li ser hev bûn û jimareke vebirî ya nifûsa me bi dest neket loma me nekarî em sercemê kurdîzanan û nisbeta jin û mêran a nifûsa xwe parve bikin. Ji ber wî, em bi teknîka giloka berfê gihîştine nimûneyên xwe û 20 kes ên xebata pîlot û 316 kes jî yê xebata serekî bi tevayî em gihîştine 336 kesan. Pirsiyara duyem, asta zanebûna kurdî ya nimûneyan bû ku me nekarî em di ciyên wekî polê de asta zimanê wan bipîvin. Loma, ji bo ku anketa me kurdî bû kesên ji xwendina anketa me fêhm dikirin bûne nimûneyên xebata me. Vê jî kir ku jimara nimûneyên me kêmtir bin. Pirsiyara sêyem, di heyama hevpeyvînan de derkete pêşiya me. Hin beşdarên hevpeyvînê nexwastin dengên wan bînin qeydkirin, şûna wî; hinekan got me nivîsand, hinekan jî bixwe nivîsandin û ji me re şandin loma di wan hevpeyvînan de agahiyên ku hatin dayîn ji hevpeyvînanê bi deng kêmtir bûn û me ji yê bi deng zêdetir mifa dît. Pirsiyara çarem jî tunebûna xebatên kurdî bûn ên derbarê helwesta ziman û pîvandina wan, di lîteraturê de. Loma me zêdetir ji xebatên tirkî û îngilîzî yê derbarê helwestê û yê ser kurdî çêbûne îstifade kirin.

Sînorên Tezê û Sehaya ku lê Vedigre

Lêkolîna me li navenda bajarê Wanê hate sepandin ku ji navendê qesta me navenda hersê navçeyên navendî; Tuşba, Îpekyol û Edremît e. Ji bo ku Wan parêzgeh e û saziyên fermî û yê sivîl bêtir in li navçeyên navendî li gorî navçeyên dûrî

navendê û gihîştina nimûneyan jî bêtir rihet e, me hersê navend wekî nifûsa lêkolîna xwe bijart. Wekî nifûsê, sînorên xebata me ji aliyê nimûneyan ve jî teng e ku me tenê lêkolîna xwe li ser kurdîzanên bajêr sepand.

Em dikarin bêjin ku xebatên bi vî şiklî dikarin di gelek bajarên kurdîzar de bê sepandin ku ew bajar piranî duziman (nm: Wan, Batman, Diyarbekir, Riha û yd.), duzarava (nm. Bîngol, Diyarbekir, Riha) yan jî pîrziman (nm. Mêrdîn) in. Herwiha xebatên bi vî şiklî dikarin bi rêya formên elektronîk sînorê xwe firehtir, nifûsa xwe mezintir û nimûneyên xwe zêdetir bikin.

BEŞA YEKEM

1. Çarçoveya Giştî

Helwest; wekî bawerî, dên, motîvasyon û hin hêmanên din ên însanî, girîng e di jiyana wî ya kesî û komî de. Ji ber vê, zanyarên psîkolojiya civakî girîngî dane helwestê û tesîra wê ya li ser kar û kiryarên însanan û lêkolînên bêjimar li ser wê çêbûne.

Ji ber ku xebata me têkiliya helwestê û tercîha ziman vedikole em ê di vê beşê ya xebata xwe de; serî de, ziman û hin têgehên têkilî wî yên serekî, di pêbenda jiyana kesî û komî de rave bikin. Wekî wê, mijarên duzimanî û kontakta zimanan babetên din ên serekî ne di vê beşê de û ji bo ku em helwesta ziman û hin hokarên ku vê helwestê pêk tînin fêhm bikin, divê em van têgehên bi detay pênase bikin.

1.1. Zar

Zar wekî morfemê, xwedî çend wateyan e di zaravayê kurmancî de û hem bi şiklê peyvî hem jî girêyî berbelav tê bikaranîn. Ji bilî wateyên wê yên din, bi wateyên têkilî ziman, di ferhenga kurmancî de (Farqînî, 2004: 2087) wekî; ‘1. Ziman, 2. Xusûsiyeta gotinê, 3. Şêwe, 4. Awaz, qêrîn û zarîn’ bi kar hatiye. Di ferhenga soranî (Mukriyanî, 1988: 372), wekî; ‘1. Zarok, 2. Dev, ziman, 3. Dengê girînê, 4. Şêweyê ziman, zarava’ bi wate ye. Lê ev peyv çendî carna şûna ziman de bi kar bê jî, ew ne wekî ziman lê zêdetir şiklê bikaranîna ziman an jî şêwe yan jî teşeya îfadekirina bi ziman dikare bê fêmkirin.

Zar, hem wekî şiyana axaftinê ya xusûsê însanan yanî ziman: *zar û ziman*, hem wekî; îfadeya devkî: *azmûna zarî*, hem wekî; şiklê vegotinê: *bizarê yekî kirin*, hem jî wekî; qêrîn, bi dengê bilind nerihetîya xwe anîn ziman: *zarîn*, *zarezar kirin* bi kar tê. Herwiha mumkîn e ku pêwendîya peyvê bi peyva *zarokê* re jî hebe, jixwe li deverên kurmanciya Bakur/Serhedê ne wekî *zarok* lê wekî *zar* bi kar tê, çendî herfên wan ê dawî *r* bi heman şiddetê bi lêv nebe jî.

Di teza xwe de, em ê peyva *zar* di wateya îfade û şiklê bikaranîna ziman de bi kar bînin û dema me behsa cureyên ziman kir zêdetir em ê ji vê peyvê îstifade bikin. Bo nimûne: ji bo cureyên ziman (language variety) peyva **şêwezar**, ji bo sosyolektê **komezar**, ji bo îdyolektê **yekezar**, ji bo *diglossiyê* **duzarî** û dema me behsa

qisevanê zimanekî kir jî em ê ji vê peyvê îstifade bikin wekî; kurdîzar, tirkîzar, kurmancîzar, soranîzar, zazakîzar û ww.

1.2. Ziman

Ziman di ferhengê de wekî; ‘digel tesbît û guhastina tecrube û zanînê, amûra îfadekirin an jî pevguhartina fikir, têgeh, pêzanîn û agahiyan e’ (Bussmann, 2006) terîf bûye.

Ziman ne tenê wekî amûreke pêwendî danîn û têkiliyan e hem jî ew ne tenê wekî rêzika deng û nîşanên temsîla wan deng ango herfan e lê ziman wekî têgeheke ‘banî’ peywir û wateyên piralî vedigre. Nimûne; ziman wekî hêmana bingehîn a biwareke zanistî ya zimanzaniyê ye ku; dengsazî/ fonetîk û dengzanî/ fonolojî, peyvsazî/ morfolojî, hevoksazî/ sentaks, watenasî/ semantîk, peyvzanî/ leksîkolojî, ferhengnasî/ leksîkografî, navnasî/ onomastîk, zaravanasî/ diyalektolojî hin şaxên vê zanistê ne.

Li aliyekî din ziman wekî amrazê axaftinê dikare bikeve şiklên cuda. Nimûne; ‘dema em dibên ew zimanê dê û bavê xwe nizane’ mebesta me jê axaftin, dema em dibên ‘zimanê xirab’ qesta me jê şeweya axaftin û gotinê, dema em dibên ‘tu bi kîjan zimanî diaxivî, ez te fêhm nakim!’ qesta me jê wate ye. Herwiha kesek dikare li gorî rewşa perwerdeya xwe yan jî zanebûna zimanê xwe -digel devok an jî zaravayê wî- û yê biyanî, bi tevgerên bedena xwe, nîşanên dest û rûyê xwe û bî îfadeyên xasî axaftina xwe, zimanê xwe yê taybet bi kar bîne di têkiliya xwe û kesên din re ku zimanzan jê re **îdyolekt** dibêjin.

Dîsa ziman wekî **sosyolekt** ji aliyê fermitî û statuyê ve wekî; zimanê dayikê, zimanê serî, zimanê biyanî, zimanê duwem û yd., ji aliyê şewe û şiklê axaftina komên civakî ve wekî; zarava, devok, aksan, zimanê kar/meslekê, zimanê navmal, zimanê bajêrî, zimanê argoyê, zimanê cihên xusûsî û wd. cureyên wî hene.

Niha ji bo ev cureyên ziman ên navborî di têkiliya kes – kes, kes – civak û civak – civakê de girîng in em ê li jêr wan terîf bikin û carna balê bikişînin rewşa kurdî ya têkilî wan.

1.2.1. Zimanê Serî

Zimanê Serî, wekî zimanê yekem ew ziman e ku mirov di ewil de wî ji dê û bavê xwe hîn dibe. Têgeha zimanê yekem tê wateya zimanê ku di zarokatiyê de hatiye hînbûn (Kurt, 2017 -ji Finegan, 1989: 565). Û eger em zimanê serî wekî zimanê bingeh (main language/tongue-ing., anadil-tr.) pênase bikin ku di tezê de em ê bi vê maneyê bi kar bînin hingê ew wekî zimanê sereke yê kesekî/ê ye ku ji dê û bav, malbat û derdora xwe hîn bûye. Lê rewşa kurdan, bi taybet jî kurdên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê, ji ber ku cuda ye ji rewşa zimanfermiyan, navandin û fehma têgiha *zimanê serî* jî ew ê cuda be. Di rewşa kurdan de heta niha termînolojiya kurmançî ya têkilî mijarê de ev têgeh wekî; *zimanê zikmakî*, *zimanê dayikê*, *zimanê maderî*, *zimanê sereke* bi kar hatiye. Hem ji ber raberîya ser wate û vegirtina van têgihan, hem jî ji ber rewşa kurdîzaran ên duziman an jî pirziman em ê di seranserê xebata xwe de têgiha *zimanê serî* bi kar bînin, -û pêşniyar bikin- ku jê qesta me; kurdên ku -eger nizanibin jî- kurdî wek zimanê xwe dizanin, kurdên ku zimanê xwe yê bav û kalan ji diya xwe û malbata xwe hîn bûne, hînî xwendin û nivîsandina wî bûne û wî bi kar tînin di jiyana xwe ya rojane de.

1.2.2. Zimanê Dayikê

Ev têgeh hema bêje di hemû zimanan de bi kar tê û gelek zanyarên vê biwarê ew nêzik-dûr pênase kirine. Oruç (2016: 281) piştî ku çend pênaseyên vê têgehê ji jêderên cuda dide ew bi giştî wiha terîfa wê dike: “Zimanê dayikê ew ziman e ku meriv wî ji diya xwe, malbata xwe, derdora xwe ya nêzik hîn dibe, zimanê salên pêşîn ên piştî ji dayikbûnê û di dewra zaroktiyê, yê pêşîn ê axaftin û têkiliyê, yê herî baş ê xweîfadekirinê, yê pêşîn ê bêyî xwendin û perwerdeyê hînbûyî û bidestketî ye.”

Dîsa di heman xebatê de Oruç ji bilî terîfa navborî ew ji bo zimanê dayikê çar krîteran datîne û van di rewşa Tirkiye, Almanya, Amerîka û kurd, tirk, ereb, alman û yd. de mînak dide. Lê çawa ku me pêbestî rewşa kurdan di *zimanê serî* de ev têgeh ji hev kirin di zimanê dayikê de jî rewşa kurdan xweser e. Ji bo ku zimanê tirkekî Tirkiyeyî, îngilizekî Îngilistanê, almanekî Almanyayê piranî hem di malbatê de hem di fermiyetê de heman ziman e, ji bo wan zimanê serî û zimanê dayikê yek e, lê ji bo

ku şertên kurdan bi çend awayan cuda ye, dema me behsa zimanê wan kir divê di çarçoveya duzimanî yan jî pirzimanîyê de zimanê wan bê pênasekirin.

Di hin welatan de zimanê dayîkê, ji zimanê ku kesek pê diaxive bêtir referansî etnîsîteya wî dibe. Bo nimûne îro gelek kurd ji ber asîmîlasyonê êdî nikarin bi kurdî biaxivin lê dema behsa zimanê dayîkê tê kirin, dibêjin zimanê wan ê dayîkê kurdî ye (Filiz, 2017: 125). Îja, zimanê kurdan ê serî û yê dayîkê dikare ji hev cuda be xusûsen di konteksa bajêrî de îrroj. Loma li gorî me ji bo pênaseya zimanê kurdan, têkilî daxwaza mafê zimanê wan, têgeha *zimanê serî* rasttir e ji *zimanê dayîkê*.

Em dikarin rewşa kurdan a ziman (ên Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê) wiha kategorîze bikin:

1. Kurdên ku ji dayîka xwe û malbata xwe kurdî hîn dibin, tirkî nizanin an jî baş nizanin.

2. Kurdên ku ji dayîka xwe û malbata xwe kurdî hîn dibin, ji mektebê jî tirkî hîn dibin û hem kurdî û hem jî tirkî bi nisbeteke wekî hev an jî nêzîkî hev bi kar tînin.

3. Kurdên ku ji dayîka xwe û malbata xwe kurdî hîn dibin, ji mektebê jî tirkî hîn dibin, dikevîne derdoreke tirkîzar û tirkî zêdetir bi kar tînin.

4. Kurdên ku ji dayîka xwe û malbata xwe tirkî hîn dibin, kurdî kêr dibihîzin, ji mektebê jî tirkî hîn dibin, dikevîne derdoreke tirkîzar û tirkî bi kar tînin.

5. Kurdên ku ji dayîka xwe û malbata xwe tenê tirkî hîn dibin, ji mektebê jî tirkî hîn dibin, dikevîne derdoreke tirkîzar û tirkî bi kar tînin.

Îja di rewşa kurdan de -eger perwerdeya kurdî ya berbelav dest pê neke û bi vê lezê kurdî ji nav nifşên nû here- kurdî ji bo van nifşan nabe zimanê dayîkê jixwe hingê divê terîfeke din were der. Loma em ji bo hemî kurdan pêşniyara ‘zimanê serî’ beramberî kurdî dikin ku ew zimanê bav û kalê wan an jî zimanê wan ê etnîk an jî zimanê yekem û hem yê ku ew ji bo xwe wekî nasnav qebûl dikin û yê ku dê û bavê wan dizanin/dizanibûn e.

1.2.3. Zimanê Duyem

Encama xebata kesan an jî grûpan e ku zimanekî hîn dibin ku ew ne têkilî zimanê wan ê serî ye ku mirov di zaroktiya xwe de hîn dibin, herwiha hînûna

zimanekî çalak e (Geyik, 2017: 155 -ji Saville & Troike, 2006). Bi gotineke basît zimanê ku piştî zimanê yekem (yê dayikê yan jî yê serî) hatiye hînbûn e. Di civakên pirziman de rewşeke normal û berbelav e. Zimanê duyem li gorî bikaranîna zimanê kesekî dikare şûna xwe biguhere. Wate eger kes zimanê xwe ji aliyê etnîk ve pênase bike; zimanê xwe yê dayikê kêmtir bi kar bîne jî, dikare zimanê xwe yê dayikê wekî zimanê yekem, zimanê xwe yê ku paşê hîn bûye û baştir dizane/bi kar tîne jî wekî zimanê duwem îfade bike. Eger heman kes ji aliyê nisbeta bikaranîna ziman ve pênase bike, mumkîn e ku ew, dê zimanê ku baştir dizane yan jî bi kar tîne wekî zimanê yekem, ê mayî jî wekî zimanê duyem pênase bike.

1.2.4. Zimanê Biyanî

Zimanê biyanî ew ziman e ku kes wî bi rêya xwendin û hînbûnê ji kesên zane bi dest dixê ku zimanekî civakeke cuda ye ji yê civaka kesî. Li gelek welatan dewlet ji bilî zimanê fermî îmkana hînbûna zimanên din jî dide hewlatiyên xwe ku bo nimûne, îngilizî zimanê herî berbelav e li ser rûyê dinyayê ku wekî zimanê biyanî tê hînbûn. Di van welatan de hewlatiyên ku zimanê wan ê dayikê heman demê de zimanê fermî ye jî, zimanekî ne ji welatê xwe wekî zimanê biyanî hîn dibin ku mebest piranî pêdiviyên meslekî, aborî, hobî carna jî sebebên mîna prestîjê ne.

Di rewşa kurdan de zimanê wan ê biyanî ji bilî kurdî hemî zimanên din in. Lê ji bo ku kurdî ne fermî ye û li Bakur tirkî fermî ye, zimanê biyanî ji bo kurdan zimanên wekî îngilizî, erebî, farisî û yd. tê zanîn. Eger merî pênaseya zimanê biyanî ji bo kurdan bike, li Bakurê Kurdistanê; kurdî zimanê wan ê serî, yê dayikê an jî yê etnîk, tirkî zimanê wan ê fermî û zimanê din jî yê biyanî ne.

1.2.5. Zimanê Fermî

Zimanê fermî li gorî sepandina hikûmet û dewletan terîf û statuya wî biguhere jî ew wekî zimanê sîstem, sazûman û burokrasiya dewletan dikare bê fêmkirin. Li ser rûyê dinyayê li her derî wekî hev nebe jî zimanê ku bi qanûnan hatiye parastin, li saziyên îdarî bi kar tê û di rêvebirin û perwerdeyê de tê sepandin wekî zimanê fermî tê zanîn.

Trask (2007: 196-197) têgeha zimanê fermî digel nimûneyên sepandî li çend welatan wiha pêname dike:

“Zimanê ku ji bo karên fermî tê bikaranîn di dewleteke diyar de. Di dewleta modern de, her yek ji me bêgav e ku karên xwe yê fermî bi deshilataran re bike. Em mecbûr in ehliyet û pasaportê bistînin, wesîqeya beyannameya baca dahatê tijî bikin, wesîqeya jidêbûna zarokên xwe bistînin, formên xwe tijî bikin dema me ji xwe re karek dît an em bê kar man, dema me wesiyeta xwe da, zarok dane mektebê, xanî kirin û firotin û yê din. Hinekên me divê tevî hikumeta herêmî yan jî netewî bibe herwiha tevî dadgehan. Ji bo van armancan, her hikumet zimanekî yan du zimanan diyar dike ji bo rêbirina van karan bi qanûnî, bi vî awayî zimanê bijare dibe zimanê fermî yê hikumeta wî welatî. Lê, kîjan ziman ew ê bibe/in zimanê fermî li welatekî? Di hin rewşan de bijartina vê hêsan e. Çima ku swêdî hema bêje zimanê yekem ê hemî Swêdiyan e yê zikmakî de Swêdî, ji bo zimanê fermî, swêdî yekane bijarteya maqûl e. Di rewşên din de bijartin bêtir dijwar e. Belçîka hema bi qasî hev dabeş bûye di navbera hollandîzar û fransîzaran de, û Hikumeta Belçîkayê binbar e qanûnên komplîke derxe ka kîjan ziman dê kîjan perçê welat de wekî zimanê fermî bi kar bê. Îspanyayê demeke dirêj ji bilî îspanî zimanekî din, wekî zimanê zêdepar, nas nekir lê ji ber îtirazên berdewam ên bi milyonan hewlatiyên Îspanî yê ku zimanê wan ên serî katalanî, galîçî yan jî baskî bûn Madrîd qanî kir ku digel rêvebiriya wan, herêmên wan ên xweser nas bike ku hinek ji wan zimanan digel îspanî zimanê hevpar ê fermî ye. Nîjeriya bi qisevanên dehan zimanên ji hev cuda hêwiriye, û hikumet ji bo ku ev perçeyên nifûsa wî negijgijin, wekî zimanê fermî îngilizî bijart ku zimanê berê yê hêza kolonyal bû. Hin rahêjên ku dixwastin hindî bike yekane zimanê fermî yê Hindistanê rastî berxwedaneke zexm a bi sed milyonan Hindiyên zimancuda hat. Li dû serxwebûna ji Brîtanayê di 1948an, divê îngilizî bere bere rabûya, lê ji bo ku vê îmtiyazek neda tu grûpeke etnîk a xwecî, îngilizî çespanî ku ew zimanekî ‘bêalî’ ye; îja îngilizî li wir jî di pratîkê de wekî zimanekî fermî ye.”

Di rewşa kurdan de kurdî îrroj; li Iraqê fermî, li Sûrî -qismê Bakur û Rojhilat ku niha statuyekê digere- di fiiliyatê de fermî û tê payîn ku bi qanûnî jî bibe fermî, li Îranê ne fermî ye, çendî bi qanûnî perwerdeya bi wê hatibe naskirin jî ew di pratîkê

de nayê sepandin. Heçî Tirkiyeyê ye; kurdî ne fermî ye, hêj di dadgeh û meclîsê de wekî zimanekî ‘nenas’ bi lêv dibe, di saziyên perwerdeyê, vê gavê di xwendina navîn de, ji pola 5an heta pola 8an wekî dersa bijarte ya zimanê jîndar li ser zaravayan tê sepandin.

1.2.6. Zimanê Kêmepar(an)

Zimanê kêmepar piranî wekî zimanê wan civakan e ku ew li welatekî xwedî nifûseke kêmtir in. Lê di hin nimûneyan de rewş cuda ye. Marshall, (1999: 53) vê rewşê wiha derdibirre: “Têgaha grûpa kêmepar ji bo wan grûpên civakî hatiye bikaranîn ku ji 1930an pêrava ew ji ber taybetiyên xwe yên wekî nijadî, etnîk, bîyolojîk an jî ên din tadeyî dîtine yan jî hatine dexmekirin. Bo nimûne Luis Wirth grûpa kêmepar wiha terîf dike, ‘ew grûpa însanan e ku ji ber xusûsiyetên xwe yên fîzîkî yan jî çandî, di nav civaka tev de, miameleya cuda yan jî ne wekhev dîtine, ji yên din dûr hatine hîştin loma xwe wekî objeya cihêkariya kollektîf dîtine’. Lê eger vî aliyî ve em lê binêrin grûpeke kêmepar heye ku di nav civakê de grûpa pirjimar be jî (wekî reşên Afrîkaya Başûr). Loma, bikêr e grûpên jimarkêm û yên marjînal ên doza desthilatê dikin bên cudakirin...”

Eger em îfadeya Marshall bînin di çarçoveya rewşa kurdan a li Tirkiyeyê binirxînin; kurd hem ji aliyê jimarê ve kêmepar hem jî ji aliyê doza deshilatê ve kêmepar in. Bi kurdî heta niha di gelek berhemana de, di vê maneyê de, peyvên wekî *hindikatî*, *kêmar*, *kêmîne*, *kêmayetî* bi kar hatine. Em ê di xebata xwe de di wateya *minority* de peyva **kêmepar** û ya *majority* de jî peyva **zêdepar** bi kar bînin.¹

Zimanê kêmepar, ew ziman e ku li gorî nifûsa mayî ya welatekî ji aliyê grûpeke biçûktir ve tê axaftin. Qisevanên vî zimanî hewlatî bin jî ew dixwazin ciyawaziya xwe ya etnîk, dînî û çandî biparêzin (Crystal, 2008: 307).

¹ Ev peyv du maneyan li xwe digirin; 1. Ji aliyê nifûsê, carna jî li gorî erdnigariya welatê tevlê ye, aliyê mezinbûna axê ve, 2. Ji aliyê fêdedîtina dahat û îmkanên dewletê ve. Wate; li Tirkiyeyê gelê tirk zêdepar û gelê kurd jî kêmepar e hem ji aliyê nifûs û erdnigariyê hem jî ji aliyê wergirtina dahat û xizmetên têkilî nasnameya wan a etnîkî ve. Li aliyekî din sebebê tercîha me ya van herdu peyvên ew e ku ew karîgerî û rewşa statûya ziman/civakan pênase dike ne ku pênaseyeke binyadî yan ontolojîk nîşan dike. Loma peyvên mîna *kêmar*, *kêmayetî*, *kêmîne*, *hindikatî* ne exlaqî ne bibin nasnavê civak an zimanekî.

Li gelek deverên dinyayê û di gelek welatan de, erdnigariyên ku ji aliyê dîrokî, sosyolojîk û nasnameyî ve ji welatê fermî cudatir hene. Ev der û gelên van herêman di van welatan de wekî herêm an gelê kêmpar tên zanîn. Li hin deran xwedî naskirineke qanûnî ne jî wekî herêmên otonom ên li Rûsya, Kanada (Quebec), Îspanya û wd. li hin deran jî ne xwedî tu statuyeye fermî ne wekî herêma kurdan li Tirkiyeyê û Îranê, Tirkîstana Rojhilat li Çînê û wd.

Wekî van herêmên ciyawaz, zimanê kêmparên van herêman jî ji zimanê fermî cudatir e û li hin welatan dîsa naskirin û statuya van zimanên kêmparan heye lê li welatên mayî ew bê mafên ziman in. Axir çî bê naskirin û çî neyê naskirin zimanê civaka kêmpar a welatekî wekî zimanê kêmpar dikare bê pênasekirin.

1.2.7. Şêwezar

Di zimanzaniyê de wekî cure-îfadeya cografî an jî sosyal e. Ev têgeha ku di îngilizî de wekî; **variation, dialect variation** an jî **language variety** bi nav bûye, di hin xebatên kurdî de wekî **guherto** hatiye navandin². Ji bo ku ev têgeh şikl û şeweya axaftinê ya kes û komên civakî diyar dibe em ê jî wê wekî *şêwezar*³ bi nav bikin.

Crystal (2008: 535) vê têgehê wiha pênase dibe: “Têgehek e di zimanzaniya civakî û stîlîstîkê de ku her cure sîstema îfadeyên lîngûîstîk ên ku bikaranîna wan bi guherbarên rewşî diyar dibe, nîşan dide. Di hin rewşan de, ciyawaziya ziman a rewşî bi hêsanî îfade dibe wekî varyantên herêmî û meslekî (nm; îngiliziya Londonê, îngiliziya dînî); di hin rewşên din de, wekî xebatên çînên civakî; pênasekirina wan zehmettir e wekî hin varyantên ku guherbarên wan nav hev de ne (nm; zayend, sal, meslek). Gelek tesnîfên cureyên ziman pêşniyar bûne ku têgehên wekî; devok, qayde (register), dorhêl, seha dihewînin. Ji bo hin zimanzanên civakî, ‘guherto’ terîfeke bêtir sînordar e ku wekî cureyeye rewşa ciyawaziya zimanekî, tîpeke xas ya daxilî diyalektekî, mesela bo armancên meslekî.”

² Bnr: Aykaç & Yıldırımçakar (2017), ‘Guhertoya Devok û Zaravayan’, *Gotarên Zimannasiyê* (ed. Subaşı & Geyik), Weşanên Nûbihar, Stenbol.

³ Di ferhengên de wekî; devok, zarava, diyalekt derbas dibe. Di xebata Öpengin (2011:215-216) de ew wekî têgeha vegir a gelek şeweyên zimanî yê cografîk û civakî bi kar hatiye, loma em ê jî herwisa di wateya varyantên ziman ên pêbendî cî û koman de bi kar bînin.

Ji bo ku me cure-îfadeyên ziman ên cografî û civakî bi kurdî wekî *şewezar* bijart, em ê ji van cureyan; **îdyolekt** (yekezar), **sosyolekt** (komezar) , **zarava**, **devok**, **aksan** û **argo**’yê pênase bikin û behsa rewşa kurdî ya daxilî van têgehan jî bikin.

1.2.7.1. Îdyolekt

Karakterîstîkê bikaranîna zimanê kesê qisevan e. Ev terza şexsî di dereceyên cuda de xwe di telafuz, ferheng û hevoksaziya kesî de dide der (Busmann, 2006: 533 -ji Bloch 1948).

Bi qasî ku Aksan (2009: 80-81) ji Glinz, Hockett û Heike diguhêze, ew îdyolektê wiha terîf dikin: Glinz wekî; “tevahiya heyîn û bikaranîna ziman a kesî”, Hockett wekî; “tevahiya hînkariyên kesekî yê di demeke diyar de” û Heike jî wekî; “bikaranîna xweser a ziman di şexsê kesekî de ye ku sistema ziman ser wî/ê re ye”.

Di rewşa kurdan a kesî de, merî dikare bêje îdyolekta kurdan dewlemend e. Çunkî niha hema bêje îdyolektiya her kurdekî ji ziman an zarava an jî devokekî zêdetir e. Bo nimûne li herêma Wanê kurdên xweciyê bajêr kurdiya kurmançî diaxivin bi devoka xwe hem jî herdu devokên kurmançî yê din bihîstine, tirkî dizanin/diaxivin, turkmenî yan jî devoka turkmenî ya bajêr fêhm dikin.

1.2.7.2. Sosyolekt

Ji bilî cureyên herêmî û deverî yê ziman, cureya ziman a ciyawaz a li gorî grûpên civakî (tebeqeyên civakî/çîn, malbat, zayend, temen, perwerde, grûpên siyasî, meslek û wd.), bi kar tê, bi taybetî jî ji aliyê ferhengî ve. Nm; zimanê deryavanan, zimanê tibê, zimanê mêran, zimanê jinan, zimanê rewşenbîran, zimanê xwendevanan û ww. (Dilbilim Sözlüğü, 2011: 186)

Eger em ser zimanê zanistan an jî yê kar û meslekan nimûneyekê bidin; her zanistek dema xwe dide ser zimanekî, ew bêgav e ku bibe xwedî termînolojiyeke xweser. Ji bo vê ew hem ji zimanên biyanî -eger bingeha xwe ya zanistî jê girtibe- hem jî bi îmkanên zimanê xwe peyvên nû hildibere û ferhenga xwe ya xuxûsî tîne pê. Bo nimûne, niha di her zimanî de ji bilî ferhengên ziman ên giştî ferhengên şaxên zanistan jî hene wekî; ferhenga termên hiqûqî, ferhenga termên tibê, ferhenga civaknasiyê û wd.

Îja dema kesek li ser zanistekî dixebite ew fêrî vî zimanî dibe ku xwendin, nivîsandin û axaftina wî ya têkilî zanista wî ji axaftina rojane ya gel cudatir dibe. Nimûne; dema doktorek dersê vedibêje, parêzerek parastina muwekilê xwe dike, kîmyagerek ceribandinekê dike ew termînolojiya zanist û karê xwe bi kar tîne.

Ji bo vê, di zimanên rojavayî de têgiha **jargonê** bi kar tê ku ew zimanê xas ê meslekekî yê û endamên wî meslekî bi şeweyekî xusûsî bi hev re diaxivin. Bo nimûne, jargona tibê.⁴

Xêncî van zimanên grûpên civakî, ji aliyê şeweyên axaftina van grûpan ve jî merî dîsa dikare wekî; ‘zimanê suhbetê, zimanê lîstik û yariyan, zimanê bajêr, zimanê çiyayî û ww.’ nimûneyan bide.

1.2.7.3. Diyalekt (Zarava)

Yek ji şaxên zimanzanîyê zaravazanî/dialectology ye û ev şax hemî tesnîf û pênaseyên zarava, devok û varyantên din ê parçeyê ziman dihewîne. Wekî pênaseyeke zanî zarava şiklê zarî, ferhengî û gramatik ê zimanekî ye ku şaxê pêşîn e ku ji zimanî derketiye. Devok jî varyantekî zaravayê ye ku ji aliyê civatekê ve li gor dem, rewş û mekanên diyar ve tê axaftin.

Chambers û Trudgill (2004: 5) ‘Diyalekt’ê, wekî; ‘cudabûna gramatik (û belkî ferhengî), herwiha fonolojîk a varyanteke ziman e ji varyantên din ên zimanî’ pênase dikin. Li gorî Schilling-Estes (2013: 312) têgiha ‘diyalekt’ê; ‘di hemî astên qalibên ziman de ciyawaziya ziman îfade dike bi xusûsiyetên xwe yên wekî; fonolojîk, rêzimanî û ferhengî’. Li aliyekî din Trask (2007: 72) jî diyalektê ne di wateya cografîk tenê de herwiha ew di wateya civakî de jî wiha pênase dike: ‘Cihêrengiya zimanekî ya herêmî û civakî ye ku kêma zêde dikare bê naskirin. Her ziman di herêmên diyar de bi formên cuda yê xwe bi kar tê wekî devokên herêmî û di komên sosyal de bi awayên cuda bi kar tê wekî devokên komalî (sosyal dîalekt an jî sosyolekt).’

Zimanzan ji bo ku ziman û zaravayan veqetînin hin krîter pêşniyar kirine lê li ser wan krîteran lihevkirineke giştî tuneye. Bo nimûne; têkgihaştin (mutual

⁴ <http://www.tdk.gov.tr>, (pêwendî, 03.01.2019)

integibility) yek ji van krîteran e ku ji bo cihêkirina ziman û zaravayan ser raberî çêbûne.

Bi terîfeke basît têkgihaştin; dema qisevanên zaravayekê bi qisevanên zaravayeke din re axivî eger ew hev fêm bikin hingê ew zarava ji zimanekî ne, eger hev fêm nekin ew heryek wekî zimanekî tên pejirandin. Lê wekî ku Chambers & Trudgill (2004) û Schilling-Estes (2013) bi nimûneyên ji zimanên Skandînav, Balkan û Çînê nimûneyan didin; heye ku qisevanên du zimanan ji hev fêm bikin lê zimanê xwe cuda bibînin (zimanên **norwecî** û **swêdî**), yan jî qisevanên du zimanan ji hev fêm nekin lê zimanê wan wekî yek zimanek bê nasîn (herdu zimanên **kantinîz** û **mandarîn** ên li Çînê).

Ev herdu nimûne jî nîşan dikin ku li ser têkgihaştinê raberî heye û nabe krîtereke bêqusûr ji bo cihêkirina ziman û zaravayan ku wekî ‘ziman’ û ‘diyalekt’ etîketlêdana wan guhertoyan mijareke tevlihev e û bêtir mijareke çandî û siyasî ye (Aykaç & Yıldırımçakar 2017: 169).

Dîsa, ji bo ku du qisevanên bi du zarên cudanav diaxivin hev fêm bikin an jî nekin divê rewşa wan a kontaktê bê zanîn. Li gorî Chambers û Trudgill (2004: 4) têkgihaştin pêbendî van çend fakteran e:

1. Guhdar bi çi dereceyî tuşî zimanê din bûne?
2. Xwediyê perwerdeyeke çawa ne?
3. Bi têra xwe eleqeyê nîşan didin?
4. Gelo dixwazin fêm bikin?

Di lîteratura akademîk, pênaseya binbeşên ziman ên cografîk de li gorî ziman û xusûsiyetên wan cudahî hene. Di îngilizî de **diyalekt** hem di wateya zaravayê de hem jî di wateya devokê de bi kar tê. Carna jî di hin xebatan de ji bo şaxeke diyalektê di wateya devokê de **subdialect** (bin-diyalekt an jî bin-devok) bi kar hatiye. Loma, dema em behsa diyalektên îngilizî dikin ew hema bêje digel hin guhertinên biçûk tên pênasekirin ku ew di kurdî de yan jî di tirkî de beramberî têgeha *devokê* tê. Lê di kurdî de ji bo ku sînorên zarava û devokên kurdî stûrtir in zanyarên ku ser kurdî xebitîne, kurdî dabeşî zarava û devokan kirine.

Di tirkî de jî derbarê dabeşkirina zarava û devokên tirkî de pênase û tesnîfên cuda hene. Yek ji van pênaseyan Ergin (2009: 10) wiha dike: "...zarava, şêwe û devokên muxtelîf ên zimanekî hene. Ji van *zarava* ew şaxa zimên e ku, berî dîroka wî zimanî ya ku tê zanîn û şopandin, di dewreke wê ya tarî de, ji wî zimanî qetyaye û cudatîyên mezin çêbûne. *Şêwe* ew şax in ku di seyra dîrokî ya zimanekî de ya ku tê zanîn, cudatîyên deng û şiklî nîşan didin, an jî axaftinên cuda yên qebîleyên qewmekî ne. *Devok* jî di nav şeweyekî de şaxên biçûk in ku cudatîyên telafûzî dihewînin an jî axaftina hin bajar û herêmên memleketekê ne ku di axaftina wan de cudatîyên peyvan tê dîtin. Di devokan de cudatîyên dangan (bilêvkirin), şeweyan de deng û şekil, di zaravayan de jî xêncî deng û şekilan cudatîyên peyvî jî hene. Bo nimûne: Çûvaşî û yaqûtî zaravayên tirkî ne ku di demên nediyar de ji tirkî qetiyane; kirgizî, kazakî, ozbekî, azerî û tirkiya osmanî û wd. şeweyên tirkî; Tirkiya Karadenîz, Konya û Stenbolê û wd. jî devokên tirkiya Tirkiyeyê ne. ”

Haugen (1966: 927) di pêbenda têkiliya ‘ziman-netewê’ de li ser ziman û diyalektê wiha dibêje:

...Hemî zimanên gewre yên îroroj wextekî ne pêşketî bûn. Li şûna ku merî zimanên nepêşketî wekî “diyalekt” bi kar bîne ku êdî bûye mode merî wan wekî “deverî” bi kar bîne çêtir e yan jî bi têgeheke wekî wê û baştir e merî “diyalekt”ê sînordar bike herwekî ku zimanzanan ew mîna “guhertoyên hevreh” terîf kirine. Edî em amade ne pirs kin ka zimanekî deverî yan jî “nepêşketî” çawa dibe zimanekî standart an jî “pêşketî”. Ji bo ku em vê fêhm bikin divê em têkiliya ziman ligel netewê bifikirin.

Yewnana antîk û Romiyana bi qasî ku dorana wan firawan dibû zimanê xwe belav dikirin, û di dinyaya modern de emperyalîstan jî bi heman şiklî kirin. Lê di dinyaya modern, şoreşên teknolojîk û siyasî firsend da kesê jirêzê ku tevî biryarên siyasî bibin digel avantajên xwe. Keşfa çapemeniyê, geşbûna endustriyê, û belavbûna perwerdeya modern pêşiya netew-dewletê ya modern vekir ku pevgerêdana malbatî, cîranî yan jî eşîrî berfiretir dikir di tevayîya dewletê de. Netew û ziman ketine nava hev ku nabe ji hev biqetin. Her netewa xwe-hebîn divê xwedî zimanekî be ku ew ne amûreke pêwendiyê, zimanekî deverî yan diyalektek lê bi temamî zimanekî pêşketî be; her çî wê wekî kêmpêşketî nîşan bike jî.

Di heman nivîsara xwe de Haugen (r. 933), ji bo rehendên ku diyalektekê wekî zimanê standart û neteweyî diyar dikin wisa nîşan dide:

“Dema me gava xwe ji ‘diyalektê’ berew ‘ziman’, ji deveriyê berew standartê avêt wekî taybetiyên girîng ên ku me niha ew îzole kirine, çar rehendên pêşketina ziman mîna li jêr in:

(1) bijartina normê, (2) kodkirina şêwazê/teşeyê, (3) detaykirina fonksiyonê, û (4) qebûlkirina wê ji alî cemaetê. Herduyên pêşîn berî didine formê-şêwazê, herduyê dawîn jî berî didine fonksiyona zimên. Yên pêşîn û dawîn têkilî civakê, yên duwem û sêyem jî têkilî ziman in...”

Îja di rewşa kurdî de, pênase zêdetir li ser du têgehên belav bûne: ‘zarava’ û ‘devok’. Li ser tesnîfa binbeşên zimanê kurdî jî, Şerefxanê Bidlîsî di *Şerefnameyê* de, kurdî wekî; lorî, kurmancî, û zazakî dabeş dike. Piştî Şerefxan, Mela Mehmûdê Bazidî di berhema xwe ya *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* de zaravayên kurdî dike çar şaxan; ‘*Kurmancî (wekî du cureyan: rawendî û badînanî-hekkarî), Silêmanî û Zazakî*’.

Piştî Bazidî gelek zimanzan û kurdologan li ser zaravayên kurdî tesnîf û terîf kirine ku çend nimûne ji tesnîfa zaravayên kurdî wisa ne: M. Mîhrî Hîlav (1918) wekî; ‘*Kurdî (Feylî, Bilbasî û Kurdî) û Goranî (Hewramî û Zazakî)*’, Tewfîq Wehbî (1951) wekî; ‘*Kurmancî, Lorî, Goranî, Zazakî*’, Cemal Nebez (1967) wekî; ‘*Kurmanciya Bakur, Kurmanciya Navîn, Goranî/Zazakî, Kurmanciya Başûr*’, Zabilhî (1977) wekî; ‘*Bakur, Navendî, Hewramî/Zaza, Başûr*’, McKenzie (1981) wekî; *Koma Bakur, Koma Navendî, Koma Başûr*’, Hassanpour (1997) wekî; ‘*Kurmancî, Soranî, Hewramî, Kirmaşanî*’.

Xebata me ji bo ku bajar û navçeyên herêma Wanê vedigre divê em zarava û devokên ku li herêmê tînin axaftin nîşan bidin. Bajarê Wanê dikeve ser qismê Bakur, kurdên bajêr û navçe û gundê wan, devokên zaravaya kurmancî diaxivin ku di binbeşa devokê de em ê bi awayekî giştî nav û cografyaya wan devokan bidin.

1.2.7.4. Devok

Devok wekî şaxeke ji zaravayê, di zimanên wekî îngilizî de zêdetir cudabûna telafûzî nîşan dide ku dikare bajar an jî welat be, nm; Devoka/diyalekta Londonê, Devoka Awustralyayê, Devoka Amerîkayê û yd. Di zimanê tirkî de li Tirkîyeyê

wekî cureyeke bajêrî û li derdorê wê, wekî; devoka Stenbolê, devoka Îzmirê, devoka Mersînê û yd. Lê di rewşa kurdî de jî curexaftina deverî ku carna dikare wekî dorwareke cografîk be carna jî dikare axaftina eşîr an jî konfederasyona eşîran be ku dawîya vê beşê de em ê devokên nav sînorên Wanê nîşan bidin û wan bi giştî kategorîze bikin.

Wekî çawa kurdî li ser zaravayan dabeş bûne, zaravayên kurdî jî li ser devokan dabeş bûne û gelek zanyaran li ser devokên kurdî terîf û tesnîfên xwe pêşkeş kirine. Bi qasî ku em pê dizanin pêşîn kesê ku behsa hin devokên kurmancî kiriye Ehmedê Xanî ye. Lê Xanî ne di maneyeke lînguîstîk belkî di çarçoveya vegêrana Mem û Zînê de behsa van devokan dike. Xanî dema behsa devokên kurmancî dike, wan wekî; *mihemdî, silivî û botî*, bi nav dike. Xanî (2009: 210) wisa dibêje:

Bohtî û Mihemdî û Silivî

Hin le'l û hinek ji zêr û zivî

Ji van hersê devokan jixwe Devoka Botanê tê zanîn ku ew li ser xeta Çemê Botanê û hin deverên devdor; Cizîr, Şirnex, Silopiya, Sêrt, Dih(Erûh), hin deverên hevşinor ên Bilîs, Wan û Batmanê pêk tê. Devoka duyem Mihemdî ku di hin berheman de wekî; Mihemedî jî derbas dibe tam ne diyar be jî li ser nav û devera wê hin îddîa hene ku hêja ye merî bala xwe bide ser. Nimûne; Cîhanî (2013: 778) ji bo vê devokê dibêje ku; devoka Mehemandan devoka Xanî bixwe ye û ev dever dikeve Başûrrojhilatê Bajarê Wanê...'. Li gorî vê, mumkîn e navê Devera Mehemandan ji navê Binemala Mahmudiyên guherîbe û wekî pênaseya hin kom û eşîrên deverê ketibe ser zimanê gel. Wekî din, di berhema 'The Kurdistan and Kurds'ê (1919: 57) de tê guhestin ku Mark Sykes wekî Mamed û Mamedan behsa du eşîran dike, di bin navê Konfederasyona Hertoşî de. Herçiqaq navê Mehemdî û Mamedî ne yek bin jî dibe ku ev nav bi demê re guherî be û Mehemdî wekî Mamedî ketibe ser zimanê gel. Yek jî li Serhedê ji bo devokên Bilîs-Sêrt-Başûrê Wanê Mamokî tê gotin ku ev jî balê dikare bikişîne ser vê babetê.

Devoka sêyem Silivî jî, ji berhema Bazidî (2010: 50) têdertê ku ev navê devoka hin eşîrên Silivayê ye ku hatine û li derdora Bazidê bi cî bûne.

Piştî Xanî, Mela Mehmûdê Bazidî li ser kurdî tesnîfek kiriye ku ew kurdî dabeşî çar zaravayan dike û ji tesnîfa wî tédertê ku ew zarava; kurmancî wekî du qisman (Rawendî⁵, Hekkarî-Behdînanî) û soranî (Silêmanî) û zazakî ne.⁶

Ji bilî Xanî û Bazidî çend kesên ku devokên kurmancî tesnîf kirine ev in: Tewfîq Wehbî û Cemal Nebez devokên kurmancî (jorîn) wekî hev navandine; *Bayezidî, Botanî, Aşêteyî, Hekarî, Botanî*. David N. McKenzi, devokên kurmancî wekî; *Bayezidî, Diyarbekirî, Hekarî, Botanî, Behdînanî* û Fuad Heme Xurşîd jî wekî; *Bayazidî, Hekarî, Botanî, Şemdînanî, Behdînanî, Devoka Rojava* bi nav kirine. Ji bilî van zanyarên jorîn tesnîf û nexşeyeke giştî li ser herêmên kurmancî Haig û Öpengin (2014: 143-176) çêkirine ku zêdetir devokên kurmancî dide hev. Ew kurmancî dabeşî pênc herêman dikin ku herêma têkilî xebata me li gorî tesnîf û nexşeya wan herêma bakur a zaravayê kurmancî ye.

Ji bo ku ev xebata me li bajarê Wanê tê sepanandin û tercîha kurdîzanên bajêr lêdikole pê divê ku em devokên kurmancî ên li nav sînorên fermî yê Wanê nîşan bidin.

Bi qasî ku me tesbît kiriye di navend û hundirê sînorên fermî yê Parêzgeha Wanê de îro sê devokên kurmancî tînin axaftin, ew devok bi giranî wiha belav bûne:

⁵ **Rawendî:** Heye ku ji peyva farisî 'revend'ê be. Wateya wê koçer e. Bazidî ji kurdên vê devokê daxivin re çima rawendî gotiye em nizanin. Lê ihtimal e; eşîrên ku bi vê devokê diaxivîn, hêj berê de ji deverên wekî Musil, Mêrdîn, Diyarbekir, Riha û yd. dihatine zozanên Erzirom, Agirî, Qers û derdora wan û havînên xwe li wir derbas dikirin û ji ber vê wekî koçer/rawend bi nav bûn.

⁶ Mela Mehmûdê Bazidî di tesnîfa xwe de navê zarava, devok, herêm û deverên li jêr û eşîrên têkilî wan daye lê em ê lêre tenê devoka rawendî -ku Bazidî dibêje zarava- bidin. Bazidî nexşeya vê devokê wiha dide: "Yekem zaravayê Rawendî ye ku li Çeldiran, Qers, Bayezîd, Mûş, Bedlîs û Wanê û herwiha zimanê re'ayiyên (bajêrî) kurdan yê Xarpût, Diyarbekir, Mêrdîn û hawirdora wê heta Erziromê dijîn ser vê zaravayê tê hesabkirin. Êlên koçeran yê giran li van herêmên me gotî, mîna: Zilan, Heyderan, Cimadînan, Keskan, Savîdanan, Meman, Celaliyan, Cûnakanan, Hesenan, Cibran, Sîpkan, Eltoran, Birokan, Şikakan, Şawiyar, Şeftalû, Erbanan, Baraviyan, Şilan û êlên kurdan yê mayî, mezin û biçûk, koçer û bajarî (medenî), li dora Qersê, Çeldiranê, Yerîvanê, Wanê, Mûşê, Diyarbekirê, Xarpûtê, ew jî hemû bi zaravayê rawendî dipeyivin." Bnr: Bazidî, Mela Mehmûdê, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, amd: Ziya Avci, weşanên Lîs, Amed, 2010, r. 29.

1. Devoka *Behdînan-Hekkaryan*: Li başûr û rojhilatê Wanê, navçeyên wek; *Elbak* (Başkale), *Şax* (Çatak) û qismekî navçeya *Payîzavayê* (Gürpınar).

2. Devoka *Miks-Xizan*: Li navçeyên *Miks* (Bahçesaray) û *Westanê* (Gevaş).

3. Devoka *Bakur/Serhed*: Li navçeyên *Erdîş* (Erciş), *Bazîdaxa* (Çaldıran), *Bêgrî* (Muradiye), *Qelqelî* (Özalp), *Seray* (Saray) û qismekî navçeya *Payîzavayê* (Gürpınar)

Ji bilî van navçeyan di hersê navçeyên navenda bajarê Wanê de (Îpekyol, Tûşba û Edremît) ev hersê devokên kurmancî jî tên axaftin.

1.2.7.5. Aksan

Ji peyva esil-latînî ‘accent’ê ye. Cure-telafulzeke xweser a qisevanên zimanekî ye ku ew bi komî pê diaxivin. Ji bo her zimanekî ku di hinek qisevanên wî de cudatîyên kifşe yên şexsî, herêmî û civakî hene û ew vê cudatîyê bi zimanê xwe telafulzê dikin ku piranî telafulza gelek peyvan bi demê re diguhere. Carna ev cudatî dewasa ye. Her telafulzên ku merî dikare ji hev veqetîne wekî aksan tê binavkirin. Di rewşa îngilizî de aksanê Amerîkayê, aksanê Îskoçyayê, aksanê çîna kar a Londonê, aksanê Fransî (ne yê qisevanekî xwecî) dibin nimûneyê wê (Trask, 2007: 3).

Di îngilizî de carna **dialect** an jî **subdialect** di wateya devokê de bi kar tê lê **aksan** jî devokê cudatir e. Aksan asta ziman a fonolojîk nîşan dide lê heçî devok e ew di hemî astên ziman de karakterîze bûye. (Schilling-Estes, 2013: 313)

Devok di nimûneya kurdî de zêdetir xwe bi herêm an jî deverekê digire û hem cureaxaftina gundî hem jî ya bajarî îma dike lê heçî aksan e, ew zêdetir di nav sînorên devokekê de telafulzeke bajêrî ya wê devokê ye.

1.2.7.6. Argo

Ji peyva firansî ‘argot’ê ye. Şêweya axaftinê ya komekê ye ku zêdetir bi peyv û qalibên xweser ên doraneke civakî ye. Argo li ber çavê civakê wekî axaftina hors, bêedeb û ji nezaketê dûr tê zanîn ku ne axaftineke xwendin û zanyariyê ye.

Di zimanan de termînolojiya argoyê hem ji peyvên wî zimanî û hem jî- belkî zêdetir- ji peyvên zimanên cuda pêk tê. Wekî ku Trask, (2007), derdibirre formên argoyê piranî dembuhêr in, yanî peyvên wê, demekî bi kar tên paşê li şûna wan peyvên nû digirin.

Argo ne girêdayî cihekî xweser be jî ew zêdetir devok an jî jargoneke bajêrî ye di civakên modern de. Di rewşa kurdî de li Bakur, zimanekî argo yê dorwareke xusûsî neyê nîşandan jî ew nayê wê wateyê ku di kurdî de argo tune ye.

1.3. Duzimanî

Di ferhengan de wekî pênaseyeke basît; ‘şiyana axaftina bi du zimanan’, (Trask, 2007: 31), ‘şiyana bikaranîna du yan zêdetir zimanan a qisevanekî di pêwendiyên wî yên rojane de’ (Bussmann, 2006:130) bê terîfkirin jî dema em li pênase û xebatên zanyarên vê biwarê dinêrin em dibînin ku ev têgeh wateyeke firawantir li xwe digire.

Duzimanî rewşa xwedîbûna zimanekî duwem e ku yan bi zimanê yekem re hevdem an jî muteqîbê wî zimanî hatiye hînbûn (Derince, 2010: 22 -ji Romaine, 2005 û yd.).

Yek ji kesên pêşîn ê ku pênaseya duzimaniyê dike Bloomfield e (1933: 56). Li gorî wî duzimanî;

Di rewşa hînbûna zimanekî biyanî de eger zimanê zikmakî winda nebe encam duzimanî ye. Piştî zaroktiyê gelek kes ji aliyê fizîkî û zihnî ve êdî digihijin û ew dibin xwedî firsend û îmkanên têr ku bikarin zimanekî biyanî hîn bibin. Heta ev cure duzimanî berbelavtir e ji nimûneyên wekî ya koçberan, gerên ji bo lêkolînê yên derê-welat û rewşên wekî wan. Tabî kes nikare asteke mikemmel diyar bike ya qisevanekî baş ê zimanekî biyanî ku ew pê bûye duziman, çunkî cudahî îzafî ye.

Li gorî hin zimanzanên civakî duzimanî rewşa hevseng ê du zimanan e lê li gorî hinekan jî her kes duziman e ku; kes tune ye ji zimanekî din çend peyv wernegirtibe nav zimanê xwe yê serî (Edwards, 2003: 55).

Duzimanî çendî wekî zanebûna bi du zimanan bê fêmkirin jî asta zanebûna herdu zimanan, bikaranîn û xweîfadekirina bi wan zimanan û ciyê wan di jiyana rojane de dihêle ku ev mijar bibe mijara gengeşiyê.

Wekî ku Kasap (2015: 9) derdibirre derbarê pênasekirina duzimaniyê de zimanzanan li hev nekirine. Ev ji ber têkiliya duzimaniyê ya bi biwarên wekî sosyolojî, psîkolojî û pedagojîyê ye ku psîkolojî têkilî prosesên hizrî yên duzimaniyê,

sosyolojî ji aliyê çand û civakê ve bi duzimaniyê re eleqedar e û pedogojî jî bi perwerde û plansaziya dersan ve pêwendiya wî bi duzimaniyê re heye.

Wekî ku gelek zanyarên vê biwarê nîşan dane; duzimanî, di rewşên wekî hînbûna zimanekî din çî bi zorê yan jî bêgavî çî jî bi rêya xwendin, çûna li derva bo karkirinê û têkilîdanîna bi însanên zimancuda re pêk tê. Wate; kurdekî li Tirkiyeyê yê ku kurdî li mal û derdora xwe hîn bûye û tirkî li mektebê, hewlatiyekî Tirkiyeyê yê ku ji bo xwendinê çûye welatekî biyanî û yekî ku ji bo karkeriyê çûye Almanyayê û liwê zimanekî din hîn bûye, dîsa kesekî ku zimanekî biyanî hîn bûye û bi vê rêyê wî di jiyana xwe de -dersdan, rêberiya tûrîstan, seyhat û wd.- bi kar tîne wekî duziman tê binavkirin.

Ji bo em ji kesekî an jî civakekê re duziman bêjin kîjan krîteran em ê daynin? Gelo kesekî ku bi zimanekî fêr dike û bi zimanekî din hemî karên xwe pêk tîne duziman e? Yan jî civakeke ku zimanê xwe yê xwemalî di jiyana xwe ya rojane de bi kar tîne lê di kar û saziyên fermî de zimanekî din bi kar tîne duziman e? Ji bo bibe nimûne Hoffmann (1991: 22) hin rewşên duzimaniyê wiha derdibirre:

- Zarakê du salî yê ku ji dêwbavê xwe yekî re bi îngilizî, yê din re gallî diaxive.
- Zarokekî çar salî yê ziman-bengalî ku carna di komên listikan de îngilizî diaxive.
- Xwendevanekî malbateke koçber a îtalî yê ku digel malbata xwe li Amerîkayê dijîn, îngilizî zêdetir bi kar tîne hem li mal hem li derva, lêbelê eqrebayên wî tenê bi îtalî xîtabî wî dikin.
- Zarokekî Kanadayî yê ji Montrealê ku rabirdûya wî îngilizî ye lê bi programeke îmmersionê⁷ dorhêla wî ya mektebê dibe fransewî.
- Mezûnekî nû yê ku ev yazde sal in fransewî dixebite.
- Zanyarekî şêst salî yê ku piraniya jiyana xwe daye xwendina destxet û ewraqên latinî.
- Wergêrekî teknîkî.
- Wergêrekî şexsî yê kargêrekî girîng.
- Kîmyagerekî portûgalî yê ku lîteratûra têkilî biwarê xwe bi îngilizî dixwîne.
- Pîlotê Japon ê ku di pêwendiyên xwe yên meslekî de îngilizî bi kar tîne.

⁷ **Immersion:** noqkirin, têdekirin. **Programa îmmersionê (ing; immersion program):** di perwerdeya duzimanî de ew teknîk e ku dersên wekî fen, matematîk û civakî bi herdu zimanan tê dan.

- Koçberê tirk ê ku wekî karker çûye Almanyayê; li mal, bi hevalê xwe re û di karê xwe de tirkî diaxive û dikare bi almanî têkilî dayne bi serkarê xwe û bi meqamên fermî re hem bi zarî hem bi nivîskî.
- Jina koçberê tirk; ew bikare di danûstanê de almanî bi kar bîne jî xwendin û nivîsandina wê ya bi wî zimanî tune.
- Koçberê danmarkî yê li Zelandayê dijî; ev kes çil sal in ku têkiliya wî bi danmarkî re qut bûye.
- Karmendên hikumeta Belçîkayê yên li Brukselê dijîn; ev kes heval û eqrebayên wan flemenkî biaxivin jî li ser karê xwe fransewî diaxivin çendî hevalkarên wan bi flemenkî bizanibin jî.
- Katalanekî netewparêz; ev kes li malê û li ser kar tenê katalanî bi kar tîne lê ew zehmetiyê nakşîne dema tûşî îspanyolî dibe ji çapemeniyê yan li kolanan.

Li aliyekî din Liddicoat (1991: 3-9) çend tîpên duzimaniyê û zanyarên ku ser xeberîne wiha nîşan dide:

Compound and co-ordinate bilingualism (Weinreich, 1953) -duzimaniya hevbend û ya hevaheng, *Simultaneous and successive bilingualism* (McLaughlin, 1984) -duzimaniya hevdem û ya rêzîn, *Additive and subtractive bilingualism* (Lambert, 1975) -duzimaniya zêdeker/pêveker û ya jêder, *Elite and folk bilingualism* (Skutnabb-Kangas, 1981) -duzimaniya elît û ya gel. Ji bilî van ew behsa duzimaniya hevseng -*Balanced bilingualism* jî dike û ji hemî cureyan nimûneyan dide.

Di derbarê duzimaniyê de yan jî duzimanbûnê de krîterên ji yên jorê sînordartir hene ku duzimanan tenê wekî xwendar, qisevan û nivîsevanên baş ê herdu zimanan terîf dike. Bo nimûne; wekî ku Oruç (2016: 284) vediguhezîne, Lewandowski duzimaniyê wiha terîf dike: ‘kesek dema hakimî herdu zimanan be, di zimanê duwem de wekî zimanê yekem an jî yê dayikê xwe îfade bike û bibe xwedî wê şiyanê ku kesên din serwest bike û wan fêhm bike ew kes hingê duziman e.’

Îja di rewşa kurdî de li Tirkiyeyê dema em li krîterên jor dinihêrin em dikarin wiha rave bikin:

Li Tirkiyeyê kurd çî li mektebê hîn bin çî li ciyekî din duzimanbûna wan bi awayekî mecbûrî ye. Ew dema ji mal û derdora xwe kurdî hîn dibin, demek şûnde li

TV'yan, li mektebê, li bajarên û li leşkeriyê mecbûr in ku hîn zimanê tirkî bibin ku bikarin ji destek û dahatên dewletê îstifade bikin. Li aliyekî din em dikarin bêjin ji aliyê duzimanbûnê ve ji bilî zimanê sêyem, ku ew jî li Tirkîyeyê piranî îngilizî ye, kurd dikevin sê kategoriyan;

1. Kurdî dizanin, tirkî kêman dizanin (serwext dikan, serwext dibin).
2. Kurdî û tirkî wekî hev an jî nêzî hev dizanin.
3. Tirkî dizanin kurdî kêman dizanin (serwext dikan, serwext dibin).

Di van hersê rewşan de rewşa duyem ku ew jî piranî rewşa xwendevanan e; ji mektebê tirkî hîn bûne, bi keda xwe yan jî bi çûyîna qurs an fêrgehên kurdî hîn bûne û bi herdu zimanan jî dikarin fêman bikin, biaxivin, bixwînin û binivîsin. Ev belkî wekî duzimanîya îdeal e ku nabe zimanekî kesê duziman zimanê wî yê din paş bixe yan bibirîne.

Îja ji bo ku dorwarê xebata me herêmeke kurdîzar û duziman, bajarê Wanê ye, ev hersê kategoriyan du paragraf berê li rewşa ziman a vî bajarî tînin. Varol (2014: 122-123) çar tîpên asta duzimanîyê ji Wei diguhezîne û tîkilî wan rewşa kurdî ya li Bajarê Wanê wiha derdibirre:

- a. Duzimanîya Raser (Dominant Bilingualism): Di vê tîpê de qîsevan ji herdu zimanan yekî de bêtir şîyanwer e û wî zêdetir bi kar tîne. Li çoltera bajarê Wanê kurdî zêdetir bi kar tê, lê li navenda bajêr⁸ tirkî zêdetir domînant dixuyê.
- b. Duzimanîya Hevseng (Balanced/Equal Bilingualism): Ew cure ye ku qîsevan di herdu zimanan de jî bi qasî hev gihiştî ye. Di duzimanîya vê astê de zarokên çolterê dema tirkî hîn dibin û zarokên kurdîzar ên navenda bajêr dema bi derdora xwe re kurdî diaxivin, asta herdu zimanê wan wekî hev an jî nêzî hev in.
- c. Duzimanîya Wergir/Pasîf (Receptive Bilingualism): Di vê tîpê de qîsevan ji herdu formên ziman ên zarî yan jî yê nivîskî yekî fêman dikan lê ji bo ku ne mecbûrî ye, wî bi kar nayne. Di navenda bajêr de; zarokên dema dêwbav an jî kal û pîrên wan bi kurdî diaxivin, ew wan fêman dikan lê bersiva wan bi tirkî didin nimûneya vê tîpê ye. Xusûsen ciwan û zarokên navenda bajêr bersiva pirsên kurdî bi tirkî didin.

⁸ Li gorî çavdêriya me; ev rewş zêdetir di caddeyan bajarê Wanê yê navendî, di saziyan fermî û kar û barên îdarî de berbelav e. Asta raseriya tirkî li caddeyan qeraxê bajêr û hin saziyan sivil de bi nisbet kêmtir e.

- d. Duzimaniya Paşekêş (Reccevice Bilingualism): Di vê tîpê de; ji ber ku qisevan ji herdu zimanan yekî de têra xwe derhatê nabîne yan jî ji sehaya bikaranîna ziman mehrûm e, ev rewş dibe sedema paşketina zimanekî wî. Xusûsen piştî salên 1950yî ji ber koça ji rojhilat berew rojava û ya ji çolterê berew bajaran kurdan zimanê xwe kêmtir bi kar anîn û tûşî vê rewşa duzimaniyê bûn. Çunkî zimanê têbar tirkî bû.

Li Wanê îroroj rewşa zimanî ya nişteciyên bajêr, di pêbenda bajêrî û ya gundewar de ne wekî hev be jî, kurdî li gorî tirkî di sehayên fermî û kargerî de pir kêm e, ji sehayên gel ên wekî mizgeft, nexweşxane, park, navendên danûstanê û yd. jî kurdî her ku diçe vedikşe bi taybetî jî li navenda Wanê û navenda hin navçeyên wê.

1.4. Pirzimanî

Dema em li xebatên ser sosyolînguîstîkê yên têkilî pirzimaniyê dinêrin hin xebat an jî lêkolîner ji yekzimaniyê /**monolingualism** şûnde rewşa zanebûna ji zimanekî zêdetir wekî duzimanî /**bilingualism**, hinekên din jî wekî pirzimanî /**multilingualism** bi nav dikin. Heta hinek jî behsa rewşa sêzimaniyê /**trilingualism**ê di pêbenda pirzimaniyê de dikin.

Niha ser rûyê dinyayê li gelek welatan çî bi sirûştî be çî bêgavî be rewşa pirzimanî -duzimanî an jî sêzimanî- li kar e. Di hin welatan de, qismê civaka kêmpar hem zimanê xwe, hem zimanê dewletê yê fermî hem jî eger hebe zimanekî biyanî hîn dibe û bi kar tîne. Li hinekan de jî dewletan ji zimanekî zêdetir ziman wekî zimanê fermî nas kirine û îmkana perwerdeya pirzimanî heye.

Gelek xebatên sosyolingustîkê derbarê jimara zimanên jîndar de agahî dane ku ew zêdetir jimarên texmînî ne û di navbera 6000-7000 zimanî de ne. Lê bi qasî ku Deumert (2011: 262) ji xebata Lewis; *Ethnologue* (2009) diguhêze niha li ser rûyê dinyayê 6909 ziman tên axiftin.

Li deverên dinyayê yên pirziman de gelek xebatên têkilî biwarê çêbûne. Ji van xebatan diyar dibe ku hînbûna zimanekî sêyem prosesê siruştî ye li welatên piretnîk ên wekî Hindîstan, Welatê Bask li Îspanyayê, Luksemburg, Belçîka, Kanada û yd. (Derince, 2010: 24)

Deumert (2011), pirzimaniyê wekî ‘pirzimaniya şexsî’ û ‘pirzimaniya civakî’ bi nav dike û şeş tîpên pirzimaniyê -duziman û sêziman- diyar dike.

Di reşwa Tirkiyeyê de niha ne wekî berê berbelav be jî hin hewlatiyên Tirkiyeyê yên kurd, ereb û siryan pirziman an jî sêziman dikarin bên pejirandin ku rewşa wan a pirzimaniyê rewşeke siruştî ye ku wan ziman an jî zaravayê pê diaxivin -ji bilî tirkî (îstisnayên wekî tirkmeniya derdora xwe hîn bûne ne têde)- li derdora xwe hîn bûne. Bo nimûne; erebekî Mêrdînî ji malbata xwe erebî hîn bûye û bi kar tîne, li derdora xwe ya kurdîzar kurdî hîn bûye û li mektebê jî wekî zimanê fermî tirkî hîn bûye û bi kar tîne. Ev wekî rewşeke temam a pirzimaniyê dikare bê nîşandan.

1.5. Kontakta Zimanan

Li seranserê dinyayê çî di demên dîrokî de çî jî di demên modern de be, ji ber têkiliya însan û civakan (xusûsen jî bazirganî, koç, şer û ww.) zimanên wan rastî hev hatine û tesîr li hev kirine. Ev rasthatina zimanan û kartêkirina wan a li hev, wekî kontakta zimanan/karlêkkirina zimanan tê zanîn.

Li gorî Thomason (2001: 1) kontakta zimanan; ‘bi terîfeke basît, di heman demê û heman cihî de axaftina bi zimanan e, ne bi zimanekî tenê.’

Ji ber têkiliyên însanan û kontakta zimanên wan li hin deverên cîhanê hin zimanên hevpar bi kar hatine ku ew wekî; **lingua franka** bi nav bûne. Trask (2007: 152) ‘lingua franka’yê wiha pênase dike: “Li hin herêman, zimanê ku wekî zimanê hevpar ê însanên xwedî zimanên ciyawaz tê axaftin mîna *lingua franka* bi nav bûye. Resenê têgehê (navê wê, tê wateya *zimanê frenkan* herwiha ew wekî *zimanê Ewropî* yan jî *zimanê Krîstiyân* jî bi nav e) cureyekî îtalî bû ku zexm girêdayî peyvên ji fransî, îspanî, yewnanî, erebî û tirkî bû û bi dirêjîya serdema navîn ew wekî zimanê bazirganiyê li rojhilatê Deryaspî bi kar dihat. Ji wê demê vir de, me ev etîket li her zimanî daye yên ku di hin herêman de, di navbera însanên cudaziman de firawan bi kar tê.”

Wextekî, **koînê**⁹ ya yewnan û demeke din **vulgar**¹⁰ a latîn li cîhana Deryaspî û piraniya Ewropayê wekî lîngûa franka berbelav dihat axaftin. **Sabîr**¹¹ *lîngua*

⁹ Zimanê bazirganiyê yê hevpar ê yewnaniya klasîk.

frankaya Deryaspî bû (û piştî hingê); hêj ji serdema navîn û seferên Xaçiyên mabû, heta sedsala bîstemîn dewam kir. Li derên dinyayê yê din; erebî, mandarîn, hindî û swahîlî¹² wekî *lingua franka* bi kar tên. Ji van erebî ji ber belavbûna Îslamiyetê *lingua franka* ye. Li ser rûyê dinê îroroj îngilizî ji ber mebestên wekî; ger, kar, teknoloji û têkiliyên navdewletî *lingua franka* ye. (Wardhaugh & Fuller, 2015: 115)

Wekî Thomason di heman berhema xwe de (r.99) nîşan dide, li ser rûyê dinê hin **sehayên lînguîstîk (linguistic areas)** ên nimûnêyên kontakta zimanan hene ku ew vê têgehê wiha pênase dike: “sehayeke lînguîstîk, ew herêma cografîk e ku sê yan jî çar grûpên zimanan dihewîne ku ew di hin xusûsiyetên binyatî de hevpar in ji encama kontaktê, ne ji encama rewşeke bixwe berê yan jî ji ber mîrata bavûkalên hevpar.”

Ew sehayên ku lêkolîner behs kirine, ziman tevî diyalekt û malbatên pêbestî ev in: “Balkan (zimanên Romanî, Slavîk, Albanî, Grekî), Baltîk (li dorwarê Deryaya Baltîk, sê komên zimanên Hîndo-Ewropî, Uralî û diyalektên Slavîk ên Bakurrojawayê Rûsyayê), Çiyayên Etiyopyayê (zimanên Kushîtk, Omîtk û Etiyopîk-Semîtk), Asyaya Başûr (zimanên Dravîdyan, hin şaxên zimanên Hindî yê malbata Hîndo-Ewropî, şaxeke ji zimanên Austro-Asyatîk yanî Munda), Gîneya Nû-Dorwarê Rûbara Sepîk (li herêma Pasîfik, zimanên Austronesîan, hin zimanên Papuan û Australyayê), Bakurrojawayê Pasîfik ê Amerîkaya Bakur (zimanên Salîşan, Wakaşan, Çîmaukan).” (r. 105-121).

Di rewşa kurdan û zimanê kurdî de em dikarin bêjin ku welatê kurdan berê de bûye kontakta civak û zimanan û niha jî ev rewş berdewam e. Lê tesîr û şeweyên kontakta zimanan berê û niha em dikarin bêjin ku ne wekî hev e. Berê ji bo ku ziman wekî mecbûrî tenê di saziyên fermî û kar û barên îdarî de hebû, di navbera gelan de kartêkirina zimanan li ser hev, zêdetir, bi awayekî daxwazî yan jî carna bi sedemên wekî bazirganî û danûstana çandî û edebî bi awayekî siruştî çêdibû. Îro ev rewş ji ber

¹⁰ Diyalekteke latînî ye di serdema Împaratoriya Romayê de.

¹¹ Zimanekî bîngeh provençal-oksîtan ê bazirganiyê ye li peravên rojavayê Deryaspî ku hêmanên ji spanî, portûgalî û yewnanî têkel e.

¹² Zimanekî *lingua faranka* (hevpar) ê peravên rojhilatê Afrîkayê ye. Serî da li Kenya û Tanzanyayê, paşê li bakur heta Somalî û li başûr jî heta Mozanbîkê.

ku bi zora dewletê dibe û plansaziya perwerdeya neteweyî li kar e ne wekî kontakteke siruştî ye.

1.5.1. Bandora Zimanan a li Hev

Wekî agahiyeke gelemper û berbelav e; Rojhilata Navîn ji berê de bûye jêder û dergûşa gelek dîn, netew, ziman û çandan ku ev rewş hê jî berdewam e. Ji ber hersê dînen semawî Îslamiyet, Nasranîti û Cihûtî, xebat û têkoşîna li dor wan, ji ber çûn û hatina li ser herdu rêyên mezin ên bazirganiyê ku herêma bihura wan bû û şer û siyaseta netewên herêma û yên nêzîkî wan, herêma; her kontakta ziman û çandan bû ku hê jî wisa ye.

Îja ji ber vê yekê çawa ku gelê kurd û zimanê wan ji ber pejiwandina Îslamiyetê di bin tesîra erebî de man, ew ji ber Îranbûna xwe û **'lingua franca'** bûna farsî - bi xusûsî jî di sedsalên 10. - 19. de- ya di edebiyat û kar û barên rêvebirinê de, di bin tesîra farsî û çanda Îranê de û ji sedsala 16. şûn de jî di bin tesîra tirkî û Dewleta Osmanî de man. Bêguman divê em bêjin ku ev tesîr ne yekalî bû. Çawa ku tesîra erebî; ji ber ku zimanê Quranê û îbadetê bû, li ser zimanê din ên mislimanan çêbû, tesîra zimanên cîranên ereban jî bi heman nisbetê nebe jî li ser erebî yan jî zimanên din ên cîranên xwe di encama kontaktê de çêbû. Bo nimûne; farsî di edebiyat û tesewîfê de, tirkî jî di siyaseta û rêvebirina dewletê de tesîr li zimanên dora xwe kirin.

Ji ber kontakta zimanan û tesîra wan a li ser hev, farsiya îro, -bi taybetî jî ji aliyê ferhengî ve- û zimanê osmanî du nimûneyên berçav in. Îro di zimanê farsî de gelek peyvên erebî hene çî di axaftina gel çî di zimanê burokrasiya dewletê de. Heçî zimanê osmanî ye ew jî nimûneyeke zimanê pêkhatî ye ji zimanên erebî, farsî û tirkî ku carna wekî *tirkiya osmanî*, carna jî wekî zimanekî serbixwe bi nav bûye. Herwiha zimanê osmanî di dewra xwe de, di nav milletên ser erdê Împaratoriya Osmanî de wekî zimanê hevpar yanî *lingua franca* bi kar hatiye, taybetî; di bazirganî, kar û barên dewletê û têkiliyên birokratik ên navbera navend û mîrektiyên de.

Eger em bêne ser zimanê kurdî, ew li gorî hersê zimanên din ê herêma bi nisbeteke biçûk kartêker bû yan jî ev tesîr li gor dem û cografyayê guherî. Wate, kurdan li Kurdistanê ji gelek aliyan ve bandor li gelên hevwehatiyê xwe kirin. Bo nimûne, heta sedsal berê jî ereb, ermen, siryan û tirkmenên Kurdistanê kurdî

dizanibûn di qadên civakî de. Ji bo ku em nimûneyekê têkilî zimanzaniya civakî û encama kontakta ziman a kartêkirina kurdî li ser tirkî (xusûsen jî azerî û tirkmenî) bidin em dikarin bêjin ku gelek qalibên rêzimanî, biwêj, gotinên pêşyan û peyvên ferhenga kurdî derbasî tirkmenî bûne û wan ew di jiyana xwe ya rojane de bi kar anîne. Lê ji bo ku em di vê îddiaya xwe de piştrast bin divê em xebatên sehayî bikin digel têgerîna ji jêderên edebî û zanistî. Herwiha divê em berê dûrbîna xwe bidine mêjûya rastîhevhatina kurdan û tirkan di salên hezarî û şûnde, û hebe di destê me de materyal ku em zimanê wan ê wê demê bidine ber hev. Di vê serdema mêjûyî ya ku me behs kir de, jixwe kifş e ku tesîra farsî li ser tirkî, azerî û tirkmenî çêbûye û mumkîne bereksê wê jî bûbe. Ji bilî vê kontaktê; ji bo ku mêjûyeke dirêj a cîrantî û kontakta kurdan û azerî û tirkmenan çêbûye heye ku kurdî di hin rewşan de tesîr li zimanê azerî û tirkmenî kiribe. Ji bo ku rê veke, em ê çend nimûneyên kontakta kurdî-tirkî (azerî û tirkmenî) ya ku tesîra kurdî ser tirkî çêbûye, di dawiya vê beşê de bidin.

Eger em li ser herêma Wanê biaxivin; bajarê Wanê, wekî warê Şaristaniya Ûrartuyan, warê gelên kurd, ermen û tirkmen û li ser sînorê Dewletên Osmanî, Rûs û Îranê di demên berê de bûye sehayeke kontakta zimanan.

Ev herêm di navbera dewletên cografyaya Îranê û Anatolyayê de gelekî cî guhertiye, dewlet û împaratoriye wekî; Ûrartû, Med, Pers, Sasanî, Axamenişi¹³, Satrapiyên Ermenan, Mîrektiyên Kurdan, Merwanî, Selçûqî, Eyyûbî, Osmanî û yd. di demên xwe de, li navenda bajêr û dorwarê wê hikim kirine ku ev herêm bûye sehayeke kontakta bawerî, ziman û çandên van şaristaniyan. Ji bo ku em herêma Wanê wekî sehayeke kontaktê ya ziman û çandan bizanin, digel perspektîfa wê ya mêjûyî divê em lêbinêrin. Vê perspektîfê Yıldız (2016: 110-111) bi kurtasî wiha pêşkeş dika:

Ji lêkolînên dorwarê Wanê tê kifşê ku serdema kalkolîtîk vir de li herêmê şênîbûn berdewam e. Jêderên nivîskî, komalên Hurrî-Mîtanî ku êdî niha wekî qebûleke berbelav Hind-Ewropî ne, dane nîşan ku ew ji salên BM 2000î pêrava wekî konfederasyonan xwe bi

¹³ Di pêbenda kontakta zimanan de berhemeke nivîskî ya li ser Kela Wanê -Nivîsteka Sêzimanî- delîleke baş e ku pêwendiya ziman û şaristaniyan hêj beriya mîladê nîşan dide.

rê xistine. Ji van komalan yek jî Ûrartû ne ku ew di jêderên Asûriyan de wekî ‘Naîrî’ bi nav bûne. Piştî ku BM sedsala 6an Ûrartû hildiweşe, li herême Med peyra jî Pers dibin serwer ku Persî, di serdema Darîûsê Iem de împaratoriya xwe dikin 13 satrapiyan ên otonom û wisa bi rê ve dibin. Li derdora Wanê hingê Satrapiya Ermenan li ser hikm e. Ev îdareya wekî satrapiyan di serdema Sasanî û ya Romê de jî berdewam e heta ku Împaratoriya Rom dibe du perçe û herêma Wanê wekî herêmeke tampon di navbera dewletên Sasanî û Bîzansê de dîmîne.

Piştî belavbûna Îslamiyê; di sala 646an şûnde herêma Wanê wekî ‘Ermeniyê’ pêşiyê serdema Emewiyan û paşê jî ya Ebbasiyan de ji alî kralên ermenî yê serbixwe ve tê îdarekirin. Ev herêma wekî ‘Vaspûrakan’ binav, xusûsen jî ji alî kralên nesla Bagraîd ve hatiye rêvebirin. Di salên 980yan de Baz ê emîrê dewleta kurdan a Merwanî dorwarê Wanê bi dest dixê. Bi qasî sed salî şûnda herêm, di sala 1070yan de dikeve bin hikmê Selçûqîyan. Piştî ku Selçûqî li herême lawaz dibin Wan û derdora wê, dikeve bin îdareya dewletên wekî Sokmenî, Eyyûbî, Îlhanî, Karakoyûnî û heta sedsala XVI. serîda Safewî, di nav çend hêzên ciyawaz de cî diguhere. Piştî ku di sala 1548an de herêm dikeve bin serweriya Osmaniyan, di Wan û derdora wê de Mîremîrantî/Beylerbegiya Wanê tê damezrandin, herêm piranî ji alî mîrên kurdan ve wekî otonom tê rêvebirin.

Di sala 1847an de Wan û derdora wê tevî Hekkariyê dibin sancaqeke wilayeta Erziromê. Di 3yê Kanûna 1847an de sancaqên wekî Wan, Mûş, Hekkarî û qezayên wekî Cizîr, Botan û Mêrdîn tene ser hev û dibin ‘Eyaleta Kurdistanê’ ku ev eyalet ji aliyê waliyan ve tê birêvebirin ên ji navendê tayînkirî. Di 1848an de Bilîs û Diyarbekir daxilî Eyaleta Kurdistanê dibe û di 1849an de sînorê Eyaletê heta ku Dêrsimê vegire fire dibe. Di sala 1867an de dawî li Eyaleta Kurdistanê tê û pêşî Wan daxilî wilayeta Erziromê dibe û paşê jî di 1888an de dibe wilayet ku Hekkariyê jî wekî sancaq vedigre.

Herêma Wanê wekî herêmeke kontakta ziman, bawerî û çandan (mislîman; kurd, tirk, çerkez û nemislîman; ermenî, nastûrî, cihû û êzidî) bûye heta I. Şerê Cîhanê. Piştî şer û guherîna demografyaya bajêr û derdora wê û damezrandina Tirkiyeyê herêm zêdetir di navbera tirkî û kurdî de maye. Loma ji bo ku em tesîra zimanên kurdî û ermenî ya li hev bibînin divê em zêdetir berhemên dîrokî û xebatên ferhengî û folklorîk binêrin ku ev cure xebat ji sînora lêkolîna me ew ê derkeve çunkî xebata me neynika îro ya kontakta zimanên bajêr pêşkeş dike.

Eger em bêne ser kontakta kurdî û tirkî li Bakur, em dikarin bêjin ev herêm demeke dirêj bûye kontakta zimanên wekî; kurdî, tirkî(tirkmenî, azerî), ermenî, erebî,

farsî û siryanî û van zimanan bi nisbetên cuda tesîr li hev kirine. Bi qasî ku Eker (2008: 95) ji Xemgin diguhêze ku; varyantên xwecî yên li herdu herêmên Rojhilatê Anadoluyê û Başûrrojhilatê Anadoluyê di bajarên wekî Qers, Agirî û Wanê de tesîra farsî, di bajarên wekî Riha û Mêrdîn de tesîra erebî û di bajarên wekî Çewlik û Elezîzê de jî tesîra tirkî zêdetir çêbûye. Di heman xebata xwe de Eker (r. 102) hin nimûneyên hevpar dide ku ew di azerî û devoka tirkî ya Diyarbekirê de hene lê li gorî me ji wan nimûneyan a pêncemîn (nebûna girêya pirsê, tr: -mı, -mi?) û ya dawî cînava vegerok (xwe, tr: öz) ji tesîra kurdî derbasî zimanê azerî bûne -tevî ku xebatên sehayî û yên berawirdî dixwazin jî- ku jêrê em ê bi nimûneyan nîşan bidin.

Hin nimûneyên tesîra kurdî li ser tirkî (azerî an jî tirkmenî) ku bajarê Wanê jî yek ji sehayî vê kontaktê ye:

- Cînava *xwe* di zimanê kurdî û hin zimanên Ewropî de –nm: îngilizî weki; *myself*–bikaranîneke ciyawaz heye ku digel cînava kesî ya I. *min* bi kar tê. Nimûne:

‘Min ji xwe ra/bo xwe dîtiye.’

Ev awa di tirkîya îro de tune lê di azerî û tirkmenî de ji peyva *kendi* zêdetir di peyva *öz*¹⁴ de heye ku ew wiha bi kar tînin: ‘Men özüme bulmuşam.’

- Nebûna girêya pirsê di kurdî de. Wekî ku tê zanîn di kurdî de ji bilî peyvên pirsê, pirs bi derba gotinê di axaftinê de û bi pirsnîşanê di nivîsê de diyar dibe. Di îngilizî de jî di hin hevokên kurt de û di hin rewşên axaftinê de pirs bi heman awayî saz dibin. Heçî tirkî ye, pirs bi girêyên wekî; ‘mı, mi, mu, mü, mısın, misin...’ û wd. saz dibin. Îja di azerî û tirkmenî de wekî awayê kurdî pirs saz dibin ku di devoka tirkmenî ya Wanê de ev rewş berbelav e. Nimûne:

‘Te xwarin xwar?’ wekî; ‘Sen yemek yedin?’ an jî ‘Li cem we ... heye?’ wekî; ‘Sizde ... var?’, an jî ‘Ew meriv birayê te ye?’ wekî; ‘O adam senin kardeşin(dir)?’

¹⁴ Di nivîsa xwe ya; ‘Fuzulî’nin Kürtçe Şiirleri/Helbestên Kurdî yên Fuzûlî’ de Selim Temo, îddia dike ku eslê peyva ‘öz’ a azerî ji ‘ez’ a kurdî ye. Bnr: <https://www.gazeteduvar.com.tr / kitap / 2016/12/01/ fuzulinin-kurtce-siirleri />, (pêwendî: 08.02.2019)

- Tewardina navan di şiklê banglêkirinê de. Wekî tê zanîn di kurdî de bi taybetî jî di kurmançî de, di rewşa banglêkirinê de navên mêza paşgira *ê*; ‘**lê**, **metê**, **pîrê**, **xûşkê**, **Zînê**, **Fatê**, **Xecê!**, û **ww.**’, û yên nêrza paşgira *o*; ‘**lo**, **lawo**, **kuro**, **keko**, **apo**, **kalo**, **Îbo**, **Bîlo**, **Edo!**, û **ww.**’ digirin. Lê ev di hemû deverên kurmançîzar de yekgirtî nîne û merî dikare bêje li hin deveran ev awa tevî hev bûye. Bo nimûne, li hin deveran peyvên nêrza paşgira *ê*; ‘**Kekê**, **xalê**, **mamê**, **Îbê**, **Îsê**, **Mihê**, **Edê**, û **ww.**’, peyvên mêza jî paşgira *o*; ‘**Fato**, **Aso**, **Leylo** û **ww.**’ digirin. Îja ev cure banglêkirina navan ketiye tirkî jî ku di tirkîya Tirkiyeyê de navên tirkî wisa kurt dikin di rewşên ne fermî de: ‘İbrahim wekî İbo, Fatma wekî Fato, Abdullah wekî Apo, Bîlal wekî Bîlo’ û **ww.**
- Hin lêker û biwêjên ku di kurdî de berbelav in û ne di tirkîya standart a zimanê fermî yê Tirkiyeyê lê di devokên azerî û tirkmenî de hene:

‘dan pey wî/ê’ wekî; ‘*peşine vermek*’, ‘ketina avê/behrê’ wekî; ‘*suya/denize düşmek*’, ‘piştta wî/ê girtin’ wekî; ‘*belini tutmak*’, ‘marê wî hatin’ wekî; ‘*yılan gelmek*’, ‘dil ketin’ wekî; ‘*gönlü düşmek*’, ‘xwelî li ser’ wekî; ‘*toprak başan*’ û **wd.**¹⁵

Ji bilî van nimûneyan heye ku tesîrên ferhengî, fonolojîk, morfolojîk û sentaktîk ên kurdî li ser tirkî yan jî zarava û devokên tirkî hebe çawa ku yê tirkî li ser kurdî çêbûye. Lê wekî ku me berê jî derbirrî, divê li ser vê biwarê xebat û lêkolînên bêalî bê kirin da em bizanin ka ev kartêkirin heta ku derê û ku astê çêbûye.

Divê ev jî bê zanîn; ji ber ku tirkîya osmanî demeke dirêj wekî zimanê kargeriyê û têkiliyên siyasî û burokratîk bi kar hatiye û peyre di serdema Komara Tirkiyeyê de tirkî wekî zimanê fermî û mecbûrî bi rê ketiye, helbet tesîra wê li ser kurdî çêbûye ku li jêr di binbeşa ‘guherîna ziman’ de em ê çend nimûneyên vê kartêkirinê nîşan bidin.

¹⁵ Lêre me çend nimûneyên berbelav ên li Wanê di sehayên kontakta kurmançî-tirkmenî de dan. Derbarê lêker hevedanî, biwêj û gotinên pêşyan de xebateke berawirdî divê hem ji bo fêmkirina tesîra zimanan a li hev hem ji bo fêmkirina asta kontaktê ya têkilî mijarê.

1.5.2. Guherîna ziman

Zimanê însan bi demê re ji ber hin kardayên civakî diguhere/dikare biguhere. Carna ev guherîn tebiî û bi hemdê xwe carna jî mecbûrî, bi zorê yan jî bi awayekî kontrolkirî diguhere. Jixwe dema meriv zimanên modern dide ber eslê wan ê berê ev guherîn eşkere ye.

Shaligram Shukla û Jeff Connor-Linton (2013: 278) hin sedemên guherîna zimanan wiha derdibirrin:

“Ziman wekî hêzeke civakî ji ber encama kontakta bi însanên zimanekî din re diguherin. Carna qîsevanên zimanekî, qîsevanên zimanekî din dagir dikin (an jî fetih dikin) û ji bo demekê zimanê xwe empoze dikin wekî di rewşa dagirkirina Îngilistanê ya Normanan.¹⁶ Endamên koma qîsevan a civaka dagirkirî ji bo bigihije jêderên civakî (hêz, dewlemendî, perwerde û ww.) motîve dibe ji bo bikaranîna zimanê dagirkeran û bi demê re peyvên zimanê dagirker di zimanê dagirkirî de cî digire. **Jêgirtin (borrowing)**¹⁷ jî yek ji nimûneya guherînê ye ji encama kontakta çandî û aborî ya nav zimanan wekî jêgirtina navê têgeh an jî keşfeke nû ji zimanekî din. **Peyvên deynî (loan words)** adapteyî sînardariyên fonolojîk ên zimanê jêgirtî dibin. Bo nimûne; televîzyon, kompîtur, dot kom).”

Li aliyekî din guherîna zimanan ne tenê di deng û ferhenga wan de dibe, li gorî kontakt û tesîrê guherîn dikare piralî be. Dîsa di jêdera berê de asta guherînê wiha hatiye nîşandan (r. 280); “Hemû şeweyên ziman bi demê re diguherin, bi bikaranîna ziman re hevaheng, tevî normên koma qîsevanan. Lê zimanzanên dîrokî li ser çar tîpên guherîna ziman disekin: guherîna fonolojîk /dengzanî, guherîna morfolojîk /peyvzanî, guherîna sîntaktîk /hevoksazî û guherîna semantîk /watenasî. Çunkî ji ber

¹⁶ **Fetha/Dagirkirina Normanan a ser Îngilistanê:** Di 14yê Çiriya sala 1066ê Mîladî de Dukê Normandiyyê William leşkerekî mezin ji Fransa, welatê Breton û axên Flandersê kom dike û davêje ser Îngilistanê, bi şerê *Hastingê* Îngilistanê fetih dike û arîstokrasiya Anglosakson têk dibe. Di encama vê fethê de zimanekî wekî anglo-norman saz dibe û gelek peyvên fransewî dikeve nav îngilizî, hin peyvên îngilizî yê kevin ji nav diçin û navên fransî bêtir tîncê kirin.

¹⁷ **Borrowing;** wekî *deynkirin* dikare bê wergerandin û di hin berhemên kurdî de bi şiklên cuda bikar hatiye. Bo nimûne, Subaşî (2017: 192) wekî; ‘(peyvên) jêgir’ bi kar aniyê, lê em ê wê wekî ‘jêgirtin’ pêname bikin.

ku bin-sîstemên zimanan bi hev ve girêdayî ne, guherîna bin-sîstemekê dibe ku reaksiyonên zincîrî di bin-sîstemên din de bide destpêkirin.”

Îja, ji ber ku kontakta kurdî bi çend zimanan re ye, em guherîna di kurdî de eşkere dikarin bibînin. Li gorî herçar tîpên guherînê di zimanê kurdî de ji ber tesîra zimanên biyanî (xusûsen jî erebî, farisî û tirkî) guherîn hem di deng û tîpên kurdî hem di peyv û ferhenga kurdî, hem di sazkirina hevokan hem jî di wateyê de pêk hatiye. Heta îro em dikarin bêjin di telafûz û şêweya axaftinê de jî guherîn çêbûye dîsa ji ber tesîra van zimanan. Lê ji bo ku kurd di nav çend dewletên herêmê de dabeş bûne em dikarin bêjin her parçe tesîra xwe ji kontakta zimanê xwe û zimanê fermî yê dewletê girtiye. Bo nimûne, dema kurdekî kurmancî ê farisîzan kurmancî biaxive diyar dibe ku ew kurmancekî Îranê ye. Herwiha kurmancekî Tirkiyeyê ji tirkî û yekî Iraq-Sûrî jî ji erebî tesîr girtiye ku ew tesîr jî telafûz, peyv û hevokên wî tê der. Heta li Tirkiyeyê ji ber vê rewşê têgiha **tirkmancî** tê bikaranîn ku ne tenê zêdebikaranîna peyvên tirkî di axaftina kurdî de lê ji ber sazkirina hevokên kurdî bi mantiqa tirkî ev peyv navdar bûye.

Hin nimûneyên guherîna kurdî ji ber tesîra tirkî li Bakur; di telafûz, fonolojî, morfolojî, sentaks û watenasiyê de:

1.5.2.1. Telafûz

Ji ber xwendina tirkî ya li mektebên dewletê û tesîra bernameyên televîzyonên tirkî îro di hin axaftin û telafûza hin kurdan de guherîn tê dîtin ku jê diyar dibe kesê qisevan li Tirkiyeyê dijî.

1.5.2.2. Hin Guherînên Fonolojîk

Dengên ku xasî kurmancî ne; “p, ç, t, k” yên nehilmî ji ber tesîra tirkî di peyvan de diguherin û dibin wekî yên hilmî. Bo nimûne; ‘pez’, ‘karîn’, ‘te’, ‘çav’ ku herfên wan ên serî nehilmî ne îro di devê gelek kesan de wekî şiklên hilmî dertên.

Dengê ‘u’; ev deng jî di hin zimanê kesan de wekî şiklê dirêj ‘û’ carna jî xusûsen di peyvên esilerebî de wekî ‘i’ dertê. Nimûne: kul wekî kûl, gul wekî gûl, dunya wekî dinya û wd.

1.5.2.3. Hin Guherînên Morfolojîk

Lêre, em ê çend nimûne ji girê û peyvên tirkî yên ku ketine kurmancî bidin ku ji van hinek peyv û girê li deverê jî têne bikaranîn:

1. Li herêma Wanê ji tesîra tirkî, di hin nav û hevalnavên kurdî de guherîn çêbûne ku eslê peyvê yê kurdî nehatibe ji bîrkirin jî, tirkiya peyvê ketiye zimanê gel, xusûsen jî di devoka bakur û rojavayê parçeyê Wanê¹⁸.

Nimûne;

- Di rewşa banglêkirinê de li şûna peyvên wekî; kalik (kalko!) → **dede**, pîrik (pîrkê!) → **nene**, xatî (xatî/xatîyê!) → **teyze**, kekê (kekê/keko) → **abê** û ww.
- Di hin peyvên de eger kurdiya wê nizanibe yan jî ne xwedî şîûreke ziman be wekî; mamoste¹⁹ → **xoce**, **oretmen/êretmen**, xwendevan → **telebe**, **êrencî**, parêzer → **abûqat** şaredar → **belediye başqanî** û ww. de.
- Peyvên wek; rêwî → **yolcî**, boş → **qelebalix**, berdewam → **dewamlî**, pak/paqij → **temîz**, nav/navber → **are**, navik/navhend/navîn → **orte** û ww.

2. Wekî nimûneyeke xirabûna ziman (**language attrition**)²⁰ bikaranîna hin paşgirên tirkî di dawiya hin peyvên tirkî û kurdî de;

¹⁸ Ev mijar ji ber ku lêkolîneke sehayî û qeyda axaftinê dixwaze û ji bo xebata me wekî babeteke talî dimîne, em ê tenê çend nimûneyên berbelav ku di jiyana me ya rojane de rast tên û eşkere ye pêşkeş bikin.

¹⁹ Berê zêdetir peyva **mielîm** ku ji peyva erebî **'mûellîm'**ê ye, bi kar dihat. Niha kurdên xwedî helwesta ziman **mamoste** bi kar tînin lê yê mayî li şûna mamoste tirkiya wê, wekî; **oretmen/êretmen** bi kar tînin. Li aliyekî din peyva **xoce**, bi wateya mamoste wekî berê niha jî berbelav bi kar tê.

²⁰ Li Wanê du xebatên têkilî xirabûna ziman çêbûne ku nimûneyên vê babetê dihewînin. Binêre: 1. Süleyman Kasap, *The Role of Attitude in the First Language Attrition Among Kurdish Bilingual Adolescents in Turkey*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Aydın Enstituya Zanistên Civakî, Aydın, 2015 û 2. Orhan Varol, *Türkçe-Kürtçe Dil Etkileşimi: İkidilli Konuşuculara Ait Verilerdeki Dilbilimsel Görünümler*, Teza Doktorayê, Zanîngeha Ankara, Enstituya Zanistên Civakî, Ankara, 2015.

- –mîş: Di lêkerên hevedudanî de digel hin lêkerên kurdî mîna bûn û kirinê; **beklemîş** kirin, **çarpmiş** bûn, **qêmiş** kirin/nekirin, **duşunmiş** bûn û ww.
- -lî: zêdetir digel nav û hevalnavên kurdî û tirkî; birîndar → **yaralî**, bizirar/zirardar → **zirarlî**, bajêrî → **şehirlî**, bi mane/wate → **menelî** û ww.

1.5.2.4. Hin Guherînên Morfosentaktîk

Ev mînakên li jêr, piranî guherîna ser kurmanciya standart nimûne dikin:

1. Ev hevoka ku em ê mîna nimûne bidin, daçekên hevedanî ‘di...de’ dihevine, li Başûr wekî; ‘Mesnewî **di** Edebiyata Klasîk a Kurdî **de**’ lê li Bakur wekî; ‘**Di** Edebiyata Klasîk a Kurdî **de** Mesnewî’ bi kar tê.

2. Biwêja ‘derketiye holê’: Ev biwêja ku tirkî wekî ‘ortaya çıkmak’ e di maneya tirkî de tê bikaranîn û tesîrê li hevoksaziya kurdî dike. Eger em bala xwe bidine peyvan, lêkera kurdî ‘derketin’ jixwe hevmaneya ‘ortaya çıkmak’ a tirkî ye. Li aliyekî din, di kurdî de, di vê maneyê de lêker an qalib hene ku ew dikarin şûnê bigirin: “derkete der, hate der, tê derket, deranîn, derhatin). Li jêr çend hevokên nimûne yên tirkî û beramberî wan hevokên kurdî yên bi awayê rast a lêkera navborî.

- Yanlış yaptığımız **ortaya çıktı**. = **Tê derket** ku me şaşitî kiriye.
- Çok zahmetli de olsa sonunda iyi bir ürün **ortaya çıkardık**. = Ew pir bi zehmet bûbe jî dawî me berhemeke baş **deranî**.
- Dağılan sislerin arasından büyük gövdesi **ortaya çıktı**. = Dema ku mij belav bû laşê wî yê gir **derhat/hate der**²¹.

3. Lêkerên tebatî/pasîf: Îro di kurmanciya Bakur de ji ber tesîra tirkî di nivîsbariya kurdî de rewşa pasîf a lêker û hevokê zêde li kar e. Bo nimûne:

Güzel havasından ve temiz suyundan dolayı buraları cennet diye adlandırılmıştır.= Ji ber hewayê wê ya xweş û ava wê ya paqij ev der wekî cinnet **hatine binavkirin**.

²¹ Di şiklê ‘hate der’ de heye ku lêkera *hatin* wekî rewşa pasîf bê fêmkirin loma şûna wê derhatin dikare bi kar bê.

Lê hevok wekî; ‘bi nav bûne’ dawî bibe zêdetir li kurdî tê.

1.5.3. Lihevketina Ziman (language mixing) an jî Kod-têkelî (code-mixing)

Kod-têkelî rewşa daxilbûna peyv an jî hin qalibên zimanekî din e di hingama axaftinê de ku qisevan di zimanê xwe de bi kar tîne. Ev rewş di civakên duziman de tê dîtin û ji ber sedemên ciyawaz pêk tê.

Crystal (2008: 83) ‘kod-têkelî’yê wiha terîf dike: “Kod-têkelî, guhestina hin hêmanên ji zimanekî bo zimanekî din îfade dike. Hevokê zimanekî bi wî zimanî dest pê dike paşê peyv an jî taybetiyên rêzimanî yên zimanekî din bi kar tîne. Şêweyên zimên ên wiha tevlihev piranî bi navên melez tên etîketkirin, wekî (di rewşa îngilîzî de) spanglish, franglais û singlish (îngilîziya Sîngaporê), û ji desteka bicoş a civakê (wekî îfadeya nasnameya xwecî) heta sucdarkirina rasterast (ji qisevanên têkilî zimanê standart) helwestan kaşî xwe dike.”

Ji kod guherînê cudatir, di kod-têkelîyê de tenê peyvek an jî komeke peyvan tê guhertin. Lê di kod-guherandinê de, bi kêrî risteyek tê guherandin (Öpengin, 2011: 213).

Di dema axaftinê de qisevanên kurdî ji ber kontakta bi zimanê zêdepar re, pirî caran peyvên wî zimanî -carna jî peyvên biyanî- (dibe ku peyveke/îbareyeke teknîk a aîdî zimanekî din be yan jî wî zimanî girtibe yan jî hema di zimanê zêdepar de jî bi wê şêweyê be) bi kar tînin. Li Bakur ev zimanê kontaktê ji bo ku tirkî yê zêdetir kod-têkelî bi tirkî re çêdibe.

1.5.4. Kod-guhertin (code switching)

Trask (2007: 39-40) vê têgehê wiha terîf dike: “Di wextê suhbetekê de pevguherîna du celebên ziman e. Her çî cureyeke axaftinê dibe bila bibe ya ku pênasê dibe, ji zimanekî diyar an jî cureyeke diyar a zimanekî, ji bo vê zimanzanên civakî têgeha *kod* bi kar tînin. Gelek qisevan herî kêr li ser du cureyên zimanê xwe xwedî kontrol in, (bo nimûne, qisevanekî Alman hem dikare cureya deverî ya almanî biaxibe hem jî ya almaniya standart), û gelek kes jî li ser du zimanan xwedî kontrol in, (bo nimûne li Gallerê duzimanên gallî/îngilîzî). Qisevanên wiha, pêbendî fakterên wekî; ‘bi kê re ne’, ‘li ku ne’ û ‘di derbarê çî de diaxivin’ ew ê pêşde û paşde xwe biguherin. Ev kod-guhertin e. Qisevan di hingama suhbetekê de ku piranî çarçoveya

wê ew diguherin an jî cureyeke din ew bixwe dixwazin; di navbera ziman, zarava, şêwe yan jî aksanê de digerin: ev **kod-guherîna rewşî** ye. Wekî alternatîv, qisevan ji bo ku derbarê rewşa nû de li ser beşdarên din fehmeke nû pêk bînin ew dikarin qestîka derbasî kodeke din bibin: ev wekî **kod-guherîna metaforî** tê binavkirin. Ev veguherîn dikare di sînorên tematîk ên sohbetekê de bibe, di hevokan de, di îbareyan de an jî heta dikare di gotinên navdar ên dawîya îfadeyan de jî pêk were.”

Di civakên duziman an jî pirziman de, kod-guherîn di axaftinê de rewşeke berbelav e xusûsen jî di civakên kêmpar de wekî encama kontakta zimanê wan û zimanê civaka zêdepar. Li gorî Franceschini kod-guherîn di axaftina nûciwanên civakên kêmpar de berbelav e. Ew wiha derdibirre:

“Kod-guherîn di grûpên hevsal ên nûciwanan de hatiye analîzkirin ku ev nûciwan piranî endamên grûpên kêmpar in. Li gorî lîteratura têkil, prototîpên qisevanên kod-guherînê ji aliyê karakterîstîkên civakî û takekesî yê li jêr ve dikarin bîn pênasekirin:

1. Temenê ciwan
2. Endamtiya kêmpariyekê
3. Çîna bîndest
4. Nasnameya grûpê ya ‘etnîk’ û bihêz
5. Paşxaneyekê civakî ya pirzimanîyê

Lê belê, gelek grûpên qisevanan hene ku kod-guherînê dikin lê bi awayekî bihêz herî kêr ji van xusûsiyetên tîpîk yekî dadiherizin.” (Franceschini, 2002: 53)

Eger em rewşa zimanê axaftinê ya kurdan binirxînin di çarçoveya kod-guherînê de em dibînin ku ev rewş berbelav e. Kurdên duziman (kurdî-tirkî) dema bi hev re di suhbetekê de diaxivin ji ber hin sedeman dikarin ji zimanekî derbasî zimanekî din bibin. Bi qasî ku me raçav kiriye kod-guherîn di van rewşên li jêr de berbelav e:

1. Nûciwanên ku diçine mektebê û êdî tirkî ji kurdî zêdetir bi kar tînin (bi taybetî jî di salên 1980yan û 90an de).²²

²² Wekî ku Franceschini balê dikişîne ser nûciwanan, demekê di mektebên şevîn de zarokên kurdan dest bi pola 6an dikirin û tirkî hîn dibûn, dema dihatine mala xwe axaftina xwe pirî caran vediguherîn (kurdî-tirkî yan jî tirkî-kurdî) heta ku çend rojan diman û vedigerîn ser zimanê xwe.

2. Di suhbetê de ji ber bikaranîna hin têgehên teknîk an zanistî ku qîsevan an kurdiya wan nîzane yan jî tirkî jêre rihettir e (li gorî hizra wî).

3. Ji ber bikaranîna hin jimare an jî cî û saziyên fermî di hingama suhbetê de ku piranî navên wan tirkî ne.

4. Peyv û îfadeyên mode yê demê.

5. Eger suhbeta wan kesekî sêyemîn guhdar bike û ew jî tenê bi tirkî bizane.

Li bajarê Wanê di suhbetên hevalan de carna di navbera devokan de jî guherîn çêdibe. Lê ev cure belkî qasî kod-guherîna zimanên kurdî û tirkî nebe.

1.5.5. Dîglossia (duzarî)

Wekî terîfeke basît du cureyê axaftinekê ye di zimanekî de. Crystal (2008: 145), bi firehî têgeha *dîglossiyê* wiha pênase dike:

“Di zimanzaniya civakî de rewşa du cure axaftina zimanekî ye ya ku di komeke qîsevanan de tê dîtin ku her yek bi fonksiyona xwe ya sosyal belav bûye. Herdu cure jî heta dereceyekê standardîze bûne, ji aliyê qîsevanên xwecî wekî alternatîv tînin hîskirin û piranî xwedî navên taybet in. Zimanzanên civakî zêdetir behsa ciyawaziya şeweyên berz û yê nizm dikin: cureya berz; li mektebê tê hînbûn, li dêrê jî meyleke wisa heye, di bernameyên radyoyê de û di nivîskariya ciddî de û wd. bi kar tê ku axir ew xwedî prestîjê mezintir e. Cureya nizm jî zêdetir di suhbetên navmal û doranên bi nisbet nefermî de bi kar tê. Rewşên **dîaglosîk** bo nimûne di van zimanên han de wiha tê dîtin; li Yewnan (berz: Katharevousa; nizm: Dhimotikî), Erebi (berz: Klasîk; nizm: Colloquial/axaftina rojane), û hin cureyên Germanî (berz: Hochdeutsch; nizm: Schweizerdeutsch, *li Swîsreyê*)...”

Li ciyê ku Crystal hiştiye em berdewam kin; îro hema bêje hemû zimanên cihanê ên modern li dorwarê axaftina xwe de -kesên ku ji devokên xwe qut bûne û li bajêr tenê forma standart bi kar tînin ne tede- qîsevanên wan dîaglosîk in û carna dikarin trîglosîk bin jî.²³

Eger em bêne ser kurdî; di zaravayê kurmançî de, li ser devoka Botanê û niha zêdetir -ji ber dorhêla edebî û çandî ya Amed û Mêrdînê- xuyaye standardeke

²³ **Triglossia:** Sêzarî. Sê cure axaftina zimanekî. Nm; li Fransayê, erebiya klasîk, erebiya rojane û erebiya Tûnisî. Bnr: Crystal, hb; 145

xwendin, nivîs û axaftinê çêbûye/çêdibe û em vê, wekî cure-axaftineke berz bipejirînin hingê axaftinên navmal û nefermî yên kurmancîzaran dibe cure-axaftina nizm di çarçoveya dîaglosiyayê de.

1.5.6. Paşketina Zimanan û Mirina Zimanan

David Crystal di xebata xwe *Language Death/Mirina Ziman* de (2000: 1) dibêje; bilandina mirina zimanekî herwekî bilandina mirina însanekî ye ku însan nebe rêyeke din tune ji bo hebûna zimanan.

Dema hin zimanzan ziman wekî candarekî bi nav dikin, kifş e ku ew dixwazin vî aliyê ziman ê ku ji însan ne-der nîşan bidin. Crystal dîsa di heman berhema xwe de (r. 11) vê rewşê wiha derdibirre:

“Zimanek; dema kesekî ku pê bi axive nemîne wekî mirî bi nav dibe. Ew dikare hebûna xwe bi qeydan, -nivîsa edetî, di van demên nêzîk de wekî arşîvên deng an vîdyoyan (û bi vî şiklî dibe zimanekî jîndar)- berdewam ke lê eger qisevanên wî yên xweşbêj tunebe nabe ew wekî zimanekî jîndar bê pejirandin.”

Nivîskar di berhema xwe de ji çend qisevanên dawî yên hin zimanan nimûneyan dide ku kesek /zimanek jî ji Tirkiyeyê ye. Ji bo ku têkilî xebata me ye em ê vê nimûneya dilsoj biguhêzin:

“Lêre, Ole Stig Andersen çîrokeke din pêşkeş dike di duyemîn Konferansa Weqfa Zimanên Bermirîna de, li *Edinburghê*, sala 1998an.

Ûbixî, zimanekî Rojavayê Kafkasyayê... berbanga sibê mir, di 8ê Çiriya 1992an de, dema qisevanê wî yê dawî Tevfîk Esenç çû rehmetê. Di heman rojê de ji bo ku vî qisevanê navdar ê dawî re hevpeyvîna bikim, bê randevû, min xwe gihande mala wî ya li gund lê ew tenê çend saet berê miribû. Eynî rojê wan ew spart axê...

Eger hûn qisevanê dawî yê zimanekî bin, zimanê we -çendî wekî zimanê pêwendiyê bê dîtî jî- jixwe ew miriye.”

Ziman ji bo ku wekî amûreke pêwendiyê ye ew her berî dide komeke însanan, bi vî şiklî jî ew bi wê komê re dijî heta ku ew li jiyana bin. Îja li gorî nifûs, cografya, statuya fermî, îmkan û ww. ê qisevanên zimanekî rewşa wî zimanî ya jiyana diyar dibe. Eger zimanek wekî zimanê dewletekî be yan jî ew bi qanûnan hatibe parastin û di pratîkê de jî bê bikaranîn, an ew bi perwerdeya komî bê fêrkirin, an jî qene ew neyê qedexekirin, qelskirin û di nav sînorên xwe yên cografîk û civakî de jiyana xwe

berdewam ke li ser wî zimanî metirsiya tunebûnê yan jî birandinê nabe. Lê di rewşa zimanê kêmparan de metirsiya qelsbûna ziman, an jî mirina ziman li kar e. Li jêr em ê tesnîf û terîfa rewşa jiyanî ya ziman a ku Crystal (2000: 20-21) ji Kincade diguhêze paşê jî ya zimanên qels ku ji Stephen Wurm diguhêze nîşan bidin:

“Hin tesnîf wekî vê sîstema pênc-ast a rewşa ‘biewle’ û ‘neewle’ ya ziman, wiha pêda dibin:

Zimanên berjiyan (viable languages): bingehêke wî ya nifûsê heye ku têra xwe mezin û geş e û metirsiyek ser tune ye di maweyeke dirêj de;

Zimanên berjiyan lê biçûk (viable but small languages): xwediyê wî ji 1000 qisevanî zêdetir e, û di civakên îzole de an jî digel organîzasyoneke bihêz a navxweyî tê axaftin, û qisevanên wî xwedî wê hizrê ne ku zimanê wan nîşaneyê nasnameya wan e;

Zimanên ber metirsiyê (endangered languages): ew bi têra jimareke însanan a ku li jiyanê bimîne tê axaftin, lê tenê di rewşên guncaw û digel mezinbûneke bi desteka civakê ve;

Zimanên nêzî birandinê (nearly extinct languages): wekî ji îmkanên jiyanî wê de tê fikirîn, ji ber ku piranî ew tenê çend kesên kal û pîr pê diaxivin;

Zimanên birandî (extinct languages): ev ziman li wê dorwarê ye ku liwê; kesê dawî yê xweş pê diaxive miriyê û nîşaneyêke vejîna wê tune ye.

Û lêre Stephen Wurm berê xwe dide tesnîfa pênc-ast a zimanên qels (û bi awayekî cuda balê dikişîne ser zimanên ber mirinê):

Zimanên bi potansiyela metirsiyê (potentially endangered languages): ji aliyê aborî û civakî ve bêavantaj in, di bin zexta giran a zimanê mezintir de ne û qisevanên xwe yê zarok winda dikin;

Zimanên ber metirsiyê (endangered languages): zarokên ku wî zimanî hîn dibin tune yan jî pir kêr in, û qisevanên baş ên herî ciwan ciwanên navsere ne;

Zimanên ber metirsiyê ciddî de (seriously endangered languages): qisevanên baş ên herî ciwan 50 salî û li ser in;

Zimanên ber mirinê (moribund languages): piranî çend qisevanên baş mane, ew jî piranî kal û pîr in;

Zimanên birandî (extinct languages): qisevanên wî nemanê.”

Îja eger em ji van tesnîfan biherin; rewşa kurdî li Bakur xusûsen ji salên 2000î vir de di bin metirsiyeke eşkere de ye. Çendî kurmancî li gorî zazakî berbelavtir be û îmkânên wî bi nisbet baştir bin jî herdu zarava jî ne di bin garantiyekê de ne û li gorî tesnîfên jorê kurdî zimanekî bin metirsiyê de ye ku zaravayê wê zazakî li ber metirsiya birandinê ye.

1.6. Teoriyên Têkilî Duzimanî û Kontakta Zimanan

Gelek teorî û paradîgma hatine danîn û pêşxistin di biwara duzimanî û kontakta zimanan de. Hinek ji van ên têkilî bidesxistina zimanê duwem, hinek ên derbarê hişmendiyê û hinek jî derbarê perwerdeya duzimanî de ne. Çend ji van teoriyan ên tesîr li xebatên van biwaran kirine ev in: “Teoriya Şêmîkê (Threshold Theory) ya Cummins (1979), Teoriya Têkbendîya Geşedanî (Developmental Interdependence Theory) a Vygotsky (1934, 1986) û Cummins (1978), Têrayîya Bingeh a Hevpar (Common Underlying Proficiency) a Cummins (1980, 1981), Teoriya Kod Guherînê ya Parl û Lambert (1962), Tîpolojîya Zimanên Kêmeparan (Typology of minority languages) a Edwards (1992), Tehlîla Dorwaran (Domain Analysis) a Fishman (1967, 1968).

1.7. Helwest

Helwest yek ji hêmaneke sereke ya psîkolojiya însan û babeteke sereke ya zanista psîkolojiya civakî ye. Ji bo ku em têgeha *helwestê* ku kakilê xebata me ye, fêm bikin divê em pêşî fêr bibin ka **psîkolojiya civakî (social psychology)** çi ye û çîma girîng e.

Psîkolojiya civakî ew lêkolîna zanistî ye ku lêdikole bê hizr, hest û kiryarên kesan çawa tesîra xwe ji heyîna kesên din a rast, xeyalî an jî qestkirî digire (Hogg & Vaughan, 2010:2 -ji Allport, 1952).

Wekî şaxe-zanistekê, psîkolojiya civakî; hem aliyê kes û civakê yê sosyal hem jî yê psîkolojîk vedikole, û îro têkilî van herdu zanistan lêkolînên bêjimar di vê biwarê de çêdibin. Çend pênaseyên din ên vê zanistê wekî li jêr in:

- Psîkolojiya civakî ew disîplîn e ku gelek karakterîstîkên pêwendiyên civakî bi kûrayî lêdikole.

- Psîkolojiya civakî şaxeke psîkolojiyê ye ku bala xwe dide hêlên civakî yê jiyanê; dema însan bi kesên din re dikevine pêwendiyên ka ew çawa dikin û çawa difikirin. Ev şaxa zanîna kiryarên însanan di hemû perspektîfên wî de dixebite, hê serda; ew ji bo têkiliyên wekhev saz bike û pirsiyarên civakî çareser bike, alîkariyê dide.
- Baron û Byrne psîkolojiya civakî wiha terîf dikin: ‘sehayeke zanistê ye ku dixwaze fêma bike ka sedem û tebîeta kiryarên însanên di rewşên sosyal de çi ne. Bi gotineke din, psîkologên civakî dixwazin fêma bikin bê em çawa difikirin dema em bi însanan din re dikevine têkiliyê.’
- Psîkolojiya civakî tesîra însanan a li ser însanan din dixebite.

(Berhema dersê ya Rai Teknoloji University, r. 4)

Rehên xebatên psîkolojiya civakî heta sedsala 19an dirêj dibe ku digihije du bizavên psîkolojiyê yê wekî; ‘psîkolojiya gel’ û ‘psîkolojiya girseyê’ li Almanyayê. Lê bi şiklê xwe yê modern di dawiya sedsala 19an hin azmûnên ser kiryarên grûpan wekî destpêka xebatên vê disîplîna ne û li Amerîkayê di sala 1908an de jî ji psîkolojiyê McDougall û ji sosyolojiyê Ross du kitêbên dersan bi navê psîkolojiya civakî, bêyî ku haya wan ji hev hebe, hevdem diweşînin ku ev jî dibin xebatên pêşîn di dîroka vê zanistê de (Kayaoğlu, 2011: 5-6).

Di salên 1930an, gelek psîkologên Gelstat, bi taybetî jî Kurt Lewin, ji Almanyaya Nazî kişyane Amerîkayê. Ew kartêker bûn ji bo ev biwar ji mektebên kiryarî û psîkanalîtîk ên raserê wê demê veqete û pêşkeve ku psîkolojiya civakî herdem mîrata bala wan a li ser hiş û îdraqê parastîye. Helwest û bûyerên grûpên biçûk babetên serekî yê xebatên vê serdemê bûn. Di dirêjiya Cenga Cîhanî ya IIyem de, psîkologên civakî li ser îqna û propagandayê xebitîn bo artêşa Amerîkayê. Piştî şêrr, lêkolîneran zêdetir eleqe nîşanî xebatên pirsiyarên civakî yê wekî mijarên zayendî û pêşhikmên nijadî kirin. Di salên şêstan de mijarên nû yê wekî neliheviya hişî/zanîna, midaxeleya dijber û êrişkarî derketin pêş. Lê di salên 1970yan de li Amerîkayê psîkolojiya civakî rastî krîzekê hat. Raberî çêbûn li ser etîka azmûnên labratuwarî, li ser helwestan ka gelo ew pêş-kiryarî ne yan na û di pêbenda çandî de ka zanist çêdibe yan na. Di salên 1980 û 1990an de psîkolojiya civakî hem di teoriyê

hem di warê sepanê de kemilî. Niha lêkolînerên modern eleqe nîşanî gelek biwaran dikin. Lê çêbarî, îdraqa civakî û têgeha xwebûnê qadên herî mezin ên pêşketinê ne di van salên dawîn de. Tevî van, psîkologên civakî eleqeya xwe ya sepanî digel têkariya xwe ya ser psîkolojiya tendurustî û hawirê, ew psîkolojiya sîstema hiqûqê re jî didomînin (Social-psychology, r.1).

Ev zanista ku piranî piştî xwe dide azmûnên sosyal xebatên xwe di gelek sehayên jiyânê û biwarên zanistên civakî de disepîne. Sosyolojî, psîkolojiya takekesî, psîkolojiya hişî, antropolojiya civakî û zimanzaniya civakî hin disîplînên têkilî zanista psîkolojiya civakî ne. Li aliyekî din psîkolojiya civakî di xebatên xwe yê zanistî de hin metodên xebatê bi kar tîne ku ew jî piranî ev in: ‘metoda raçavkarî, metoda geşbûnê, metoda hevpeyvînê, metoda klînîkal, metoda anketê/pirsnameyê, metoda pîvanekê, metoda azmûnî.’ (Kuppuswamy, 1961: 14).

Helwest yek ji beşeke xebatên psîkolojiya sosyal e ku li ser helwesta kes û civakê û pîvandina wan, xebatên bêjimar hatine kirin. Ji bo ku xebata me li ser helwesta ziman a kurdîzanan e em ê ji niha şûnda pênaseya helwestê, têgehên têkilî wê, cureyên wê, helwesta ziman û pîvandina helwestan bisekinin.

1.7.1. Helwest Çi ye?

Wekî gelek têgehên bihîzîyarî, hizrî û kiryarî yê mîna; ‘pejn, seh, niyet, qest, genaet, dên, têgihîştin, raman, bîr û ray, kiryar, pêşk’ helwest jî têgeheke sereke ye di jiyana însan a psîko-sosyal de. Ji 1920an vir de zanyar û lêkolînên biwara psîkolojiya civakî helwest terîf kirine û bi detay ev têgeh îzah kirine. Em ê li jêr çend pênaseyan bidin û dûre berê xwe bidine binbeşên vê mijarê.

Helwest -bi îngilizî **attitude**- ji eslê xwe yê latinî *aptûsê* tê ku wateya wê; ‘ji tevgerê re guncaw û amade’ ye. Ev wateya kevnar qesta raçavkirina rasterast a tiştan bike jî lêkolînerên helwestê êdî wê wekî çêbûneke wisa dibînin; ‘helwest rasterast neyê raçavkirin jî ew berî kirina tiştêkî rêberiya tercîh û biryarên me dike ji bo em bikevine tevgerê’ (Hogg & Vaughan, 2010: 94).

Helwest nirxandinên me yê erênî an jî nerênî ne digel objeyeke helwestê. Helwestên me xwe dispêrin qaîdeyên hest, kiryar û têgihîştinê (Stangor, 2011: 291).

Helwest; meyla psikolojîk a derbarê heyîneke diyar de ye ya ku meriv wê heta dereceyekê bi başî yan jî nebaşî dinirxîne (Bohner & Dickel, 2011: 393 -ji Eagly & Chaiken 2007).

Herçend di lîteraturê de derbarê pênasekirina helwestê de terîfên cuda hebin jî, gelek teorîsyen li ser heman fikrê ne ku; helwest ew bertek e ku kes wê nîşanî obje yan jî koma objeyan dide.’ (Kazazoglu, 2011: 17 - ji Lett, 1977).

Bi qasî ku em ji xebata Mostyn (1978: 4-5) hîn dibin, kurteya mêjûya helwestê wiha ye; “cara pêşîn Lange di sala 1888an de digel ‘xebatên maweya reaksiyonê’ di halê labaratuwarê de, li ser helwestê xebitiye. Dema tê serê sedsalê, derbarê ‘cihê helwestan di zêhnê de’ raberiyeke geş çêdibe. Li ser têgeha *helwestê* William James, Harlow Gale û Freûd gotin û xebatên girîng pêşkeş kirine lê cara pêşî wekî têgeh; *helwest*, di 1918yan de, bi xebata şaheser a Thomas & Zaniniecki ya li ser gundiyên Polonî xwe nîşan dide. Ê di xebata xwe de wan helwest wisa terîf kirin: ‘rewşa aqilê kesekî li hemberî nirxekî (nirxên civakî)’. Ji salên 1918 heta 1950yan heyamek bû ku li ser bûn û guherîna helwestê lêkolînên têr çêbin. Thurstone ji wan kesan yek bû, dikir ku helwestan bi awayekî zanistî bipîve, di 1928an de dema wî teknîka pîvaneka xwe ya ‘neqebên wekî yekser’ çêkir wî xwest ku digel reseniyeke rasyonel pîvanekekê ji pîvanên sêbjektîf saz bike. Piştî wî bi sedan pîvanekê helwestan hatine pêşxistin. Li aliyekî din Cenga Cîhanî ya IIyem lez da psîkologan ku eleqeyê nîşan bidin têkiliya helwest û kiryarê wekî metoda fêmkirin û daxuyakirina pêşhikm û îqneyê (di pêbendî propagandayê, bi taybetî jî propagandayên bîrdoziya faşîzmê). Di halê hazir de, teoriya helwestê bandor li her aliyê jiyana takekesî û sehayên xebatê dike. Wekî çawa doktor bi çêbûn û guherîna helwestê re eleqedar in, mamoste, karsaz, hêzên emnî, karkerên civakî, rojnamevan û ajansên reklaman jî bi heman awayî...”

Însan di jiyana xwe ya rojane de, ji hin tiştan hez dike, kêfa wî ji hin tiştan re nayê, hin tişt jêre balkêş in lê bala xwe nade hin tiştan. Dîsa ji ber bîr û baweriyên însan ew tevî perwerdeya xwe ya li malbat, hawir û xwendîgehê dibe xwedî hin hest, qenaet, fikr û ramanan ku di derbarê kes an tiştan de an jî heyînên têkilî wan de biryaran dide. Îja ev biryarên berî ku bibin kiryar dikare wekî helwest pênase bibe.

Carna helwesta însan berçav lê carna jî nepen e ku di hin rewşan de tê ferqkirin lê carna jî heye ku neyê ferqkirin.

Îro di gelek biwarên zanistî û sehayên civakî de helwest wekî babeteke sereke derketiye pêş. Niha hem di akademiya de hem di saziyên fermî û yên taybet de ji bo helwesta kes û civakan bê hînbûn xebatên bêjimar tên kirin. Bo nimûne; beşên perwerdeyê helwestên ciwanan ên têkilî hin guherbaran dipîvin, karsaz û şirketên bazirganî ji bo berhemên xwe bidin nasîn an jî balê bikşînin ser, xebatan dimeşînin. Herwiha siyasetmedar ji bo tercih û helwestên hilbijêran hîn bibin bi heman awayî xebatên sehayî; enket, hevpeyvîn û yd. didin çêkirin.

Ji ber ku meyla qaîdeyên psîkolojiya civakî ser lihevgirtinê ye, îtîrazên qanîker ên ku fikr û hestên me pê diguherin dê tesîrê bikin ku kiryarên me jî biguherin. Ev lihevgirtina helwestê tê wê maneyê ku; eger şirketek, fikr û hestên we derbarê berên xwe de bi awayekî erênî bike, hingê hûn dê bêtir bixwazin wê berê bikirin. Lê hevgirtina helwestê bi aliyê din de jî dixebite, bi vî awayî dema kiryarên me guherîn, fikr û baweriyên me yên derbarê objeya helwestê de jî dikare biguhere. Dema me berek kirî û di wê de tiştên baştir dîtin, kêfa me dê bêtir pêre were û helwesta me dê zêdetir erênî be ji şirketa xwedî wê bera me kirî re (Stangor, 2011: 213).

Ji bo ku di derbarê pênase û xusûsiyetên helwestê de gelek xebat çêbûne ku hinek pênase me li jorê dan, em ê li jêr hin xusûsiyetên helwestê yên ku zanyaran derberrîne biguhêzin.

Bi qasî ku Kuppuswamy (1961: 194-195) ji Sherif diguhezîne hin xusûsiyetên helwestê wekî li jêr in:

1. Helwest ne zikmakî ne.
2. Helwest pir yan jî hindik, mayînde ne.
3. Helwest têkiliya biker-berkarê îma dîkin.
4. Helwest bi qasî ku grûpan vedigrin şexsan jî vedigirin.
5. Helwest xwedî xusûsiyetên motîvasyonî-hestyariyê ne.
6. Helwest para hemû endamên grûpekê ne.

Dîsa hin xusûsiyetên din ên helwestê Kazazoğlu (2011: 23) ji Baker (1992) wiha diguhezîne:

1. Helwest îdraqî û hestyarî ne.

2. Helwest ne wekî du-serî lê piralî ne. Li gorî tercîhkirin an jî nekirina xwe cur bi cur in.
3. Helwest hêj pêşda kesan amade dikin ku ew ê çawa tevbigerin.
4. Helwest têne fêrbûn. Ew nayên guheztin û ne zikmakî ne.
5. Helwest berew mayîndebûnê ne lê bi tecrubeyan ew dikarin biguherin.

1.7.2. Hin Têgehên Têkilî Helwestê

Wekî gelek hest û ramanên însan ên wekî; hizir, qenaet, lêwerîn (werdîtin), bîr û ray û yd. helwest kardayeke girîng e ji bo bawerkirin, biryardan, tevgera însan a li dijî tiştekî. Ji bo ku em helwestê ji bawerî, qenaet, ajo, nirx, norm, îdeolojî û temsîlên civakî veqetînin em ê li jêr wan yek bi yek pênase bikin.

1.7.2.1. Bawerî

Her însan merî dikare bêje xwedî baweriyên e. Ji hîmên bingehîn ên helwestê yek jî bawerî ye. Însan an jî hinek însan pirî caran ji ber baweriyên xwe dibin xwedî hin helwestan an jî helwesta xwe nîşan didin. Herwiha ji ber baweriyên xwe însan dikare helwesta xwe ya heyî/hînbûyî biguhere jî.

Bawerî, îdraqên têkilî dibetiyê bûyer an jî heyberekê ne yên ku eleqeya wan bi xusûsiyeteke qebûlkerî heye. Hin teorisyen, baweriyekê wekî pêkhatyeke helwestê dibînin çendî cudahî hebin jî yên ku bi helwest û baweriyên hatine dorgirtin. Helwest wekî encama (yekûna) baweriyên dikare bê nirxandin. Kesek dikare xwediyê hin baweriyên ciyawaz be yên têkilî diyardayan (çi erênî çi nerênî). Ev kes dê xwe bispêre nirxandina giştî ya baweriyên xwe û li dijî vê diyardeyê ew ê helwesta xwe nîşan bide. (Rai Teknoloji University, r. 22)

Bawerî û helwest herçiqas tiştên cuda bin jî ew herdem bi hev re ne. Bawerî hevaltiya aliyên helwestê yên bihîzwarî dikin û ew îfadeyên zarî yên vî aliyî ne. Lê, ew ji bo hemî baweriyên ne tê ye ku digel helwestan bin. Bo nimûne; hin baweriyên ku wekî “dinya gilover e” hene ku eleqeya wan bi helwestan nîne. Ji bo ku van herdu baweriyên ji hev biqetîne, baweriyê digel helwestê re qenaet tê gotin (Tavşancıl, 2018: 75 -ji Morgan, 1995: 363).

1.7.2.2. Qenaet

Ev peyva erebî du peyvên watecuda li xwe digire: 1. Razîbûna ji rewşa xwe, têr bûn û gilî nekirin. 2. Bîr û baweriya li ser tiştêkî an jî rûdanekê. Wateya ku zêdetir helwestê re eleqedar e helbet wateya duwemîn e lê qenaet rewşeke helwestê ya fikrî û hestî îma dike loma nabe ku sedîsed wekî helwest bê nirxandin çunkî aliyê helwestê yê kiryarî jî heye.

Ev peyva ku di kurdî de bi şiklê; ‘qanî bûn, îqna bûn, îqna kirin’ jî bi kar tê, ji bo pejirandin tiştêkî pêlikeke girîng e û têkiliya zexm bi helwest û kiryarê re nîşan dide. Îrroj xusûsen di sektora kar û xizmetê de, di çarçoveya têkiliyên firoşkar-bikir a dan-standin û kirîn-firotinê de tesîrkirina li ser wan; balkişandin, beralîkirin, guherandina helwesta wan û îqnakirina wan belkî karê herî girîng û jêneger e.

Îqna rêbazeke aktîv a kartêkirina ser însanan e ku bi rêyên mantiqî û hestiyarî dike ew bibin xwedî helwest, hizr an jî kiryarekê. Îqna ji zext û zorê zêdetir pala xwe dide ricayan. Gelek guherbarên ku tesîrê li prosesa îqnayê dikin hatine dîtin, û ev wekî; ‘kî got, çi, ji kê re û çawa got’ di pênc kategoriyên sereke de hatine pêşkeşkirin: 1. Ragihîner; ê ku pêbawerî, pisporî û cazîbedariyê li xwe digire. 2. Peyam; a ku dereceyên ciyawaz ên mantiq, hest (wekî tirsê), argumanên yekalî yan jî dualî, û tîpên din ên naverokên malumatî dihewîne. 3. Temaşevan; ê ku cure demografîkan, xusûsiyetên şexsî û tercihan li xwe digire. 4. Kanal; a ku çap, radyo, televîzyon, înternet û pêwendiya rûbirû dihewîne. 5. Konteks; a ku derdor, dînamîkên grûpê, destpêka ji bo peyamê dihewîne (Social-psychology, r. 2-3).

Li gorî Kolasa û Rokeach; “qenaet îfadeyên zarî yên helwestê ne. Qenaet helwestan durist nakin, ew zêdetir eksa helwestan in. Li gorî helwestan qenaet, bêtir cureyîn in; di nava demeke kifşe de, raveya kesan a di derbarê bûyer, kiryar û mijarên diyarkirî de nîşan didin. Kes, di derbarê rastiyên bûyerê de ji xwe tiştan tevlê dike û wisa qenaeta xwe diyar dike.” (Tavşancıl, 2018: 75).

1.7.2.3. Ajo

Wateya ajoyê di ferhengê de: 1. Rewşa hişyarbûneke fîzyolojîk an jî psîkolojîk e ku berê takekes dide hedefekê, 2. Ew sebeb e ku wekî wate an jî boneya kiryara kesekî hatiye nîşandan.²⁴

Helwest ji gelek aliyan ve wekî ajoyê ye lê ferqên wan ên girîng hene. Ferqa pêşîn belkî jî maweya demî ye. Hêza ajoyekê pêbendî rewşa ajotinê (berdewamiyê) ye. Loma ajo dertên, winda dibin, dîsa dertên. Helwest bi rewşeke wisa re karaktîze nîne lê ew tenê îhtîmala hişyarbûna ajoyeke kifşe îfade dike (digel hêza ajotinê ya pêre). Loma, merivek dema televîzyonê temaşe dike, dibe ku nekare malbata xwe biparêze lê dibe ku ew bibe xwedî helwesteke parêzvan digel malbata xwe, bo nimûne; dema bulteneke keşûhewayê behsa bahozekê dike di herêma wî, di cî de ajoyê wî merivî hişyar dibin (Newcomb, Turner & Converse, 2015: 42).

1.7.2.4. Nirx

Nirx ew peyv e ku hemî qîmet û hêjayên kes an civakan diyar dikin, çi maddî û çi manewî bin. Ji nirxên maddî wê de, dema kes û civak bi nirxên xwe, xwe îfade dikin piranî mebest jê nirxên manewî ne ku ew jî bîr û bawerî, hezkirin, hezkirî û nêzîkên wî ne yên wekî; bawerî, dîn, milliyet, welat, malbat û wd. in.

Nirxên civakê ji bo ku helwest çêbin an jî bikemilin kartêker in. Bo nimûne; Millon û Lerner (2003: 308) ji Rokeach diguhêzin; bi qasî ku ew derdibirre, di bin helwestan de rêzenirxên civakê yên bi nisbet biçûk hene. Dîsa li gorî teoriya Rozenberg însan wisa dikin ku helwest û nirxên wan ji hev bigirin.

1.7.2.5. Norm

Norm qaîde û pîvanên civakî îfade dikin ku kes ji bo jiyaneke aram û asûde bi wan qaîdeyan ve girêdayî ye/divê girêdayî be û li gorî wan tevbigere.

Di derbarê norman de teoriya Parson⁷ wiha dibêje: ‘Norm, eksa baweriyên kesan ên têkilî kar û peywirên wan e û bi rêya civakîbûnê bûye parçeyeke motîvekîrîna însanan û loma ji ber ku însan dixwazin li civakê werin, ew bi wan norman ve hevaheng dibin.’ Lê li gorî teoriya nasnameya civakî jî terîfa norman wisa

²⁴ <https://dictionary.apa.org/motive>, (pêwendî, 20.01.2019).

ye: ‘norm (ji baweriyên şexsî wêdetir), îfadeya wan têgihîştinan e ku, ka kîjan çalakî ew ê nasnameyên din bi însanên mayî bide pejirandin. Loma wisa tê hizirkirin ku însan bi norman re hevaheng dibin ji bo ku nasnameyên xwe yê diyar hem bi xwe hem jî bi însanên din bidin pejirandin (Marshall, 2005: 534).

1.7.2.6. Îdeoloji

Wekî wateyeke berbelav jêre ‘dêna dinyayî’ tê gotin ku ew dên e; derbarê heyîn, terîfkirina sekna xwe û yê din, qanûnên jiyana civakî, rêvebirina kar û kiryarên civakî nîşan dide. Ji bo ku sê aliyên helwestê (zihnî, hestî û kiryarî) hene, îdeoloji ji helwestê cudatir ew zêdetir zihnî û fikrî ye. Yanî ew belkî helwesteke fikrî ye.

Hogg û Vaughan (2014: 189-190) vê derbarê de wiha dibêjin: “Îdeoloji, îşaretî sistemeke baweriyê ya tevahî dike ku berbelav tê parvekirin; bi giştî, xaleke referansê ya siyasî yan jî sosyal e ku xwedî karjeniyê xuyaker e. (Thompson, 1990). Ji bo me îdeolojiyên herî nas îdeolojiyên dînî û yê sosyo-polîtîk in ku ew dibin jêderê gelek pevçûnan ên navbera grûpan... Bilig (1991), îddia kiriye ku di nav jiyana rojane de, para bêtir a çalakiyên me yê fikrî ji nakokiyên/herênayên me yê îdeolojîk dertên. Bo nimûne; mamoste, ji aliyekî ve dixwazin otorîteya xwe saz kin ji aliyekî ve jî dixwazin wekheviya xwe û ya xwendevanê xwe saz bikin...”

Her însanê ku xwedî îdeolojiyekê ye, ew xwedî hin helwestan e ku dema ew xwe îfade dike yan jî şûna xwe diyar dike (nm; di siyasetê de partiya xwe, di akademyê de ekola xwe, di bazarê de bazirganiya xwe û ww.) û bi vî awayî ew helwesta xwe nîşan dide.

Lêkolîneran di nav helwestên siyasî de herî kêr du rehendên îdeolojîk ên cuda dîtine: helwestên li dijî sazûmanên exlaqî yê eleyhê azadiya takekesî de û helwestên dijî dilovaniyê yê eleyhê reqabetê de (Millon & Lerner 2003: 308 -ji Ashton û yd.).

1.7.2.7. Tensîlên Civakî

Psîkologên civakî ji ber aliyê însanê civakî ew wekî perçeyekî ji civaka wî dîtine û di kiryar û helwestên însanê de rola civakê ya li ser wî derbirîne.

Li gorî Moscovici, baweriyên însanan bi awayekî civakî însa bûne; yanî tiştê ku dibe hevîrê fikr û ramanên însan ew tişt in ku însanên din baweriya xwe pê anîne

û ew gotine. Dema em vî aliyê ve lê binêrin, em dibînin ku helwestên kesan ji aliyê endamên civatê yên din ve jî tîr parvekirin. Ji aliyê perspektîfê helwestî xala girîng ev e: çarçoveya helwestên spesîfîk ji aliyê binyadên temsîlî ve tîr xêzkirin, binyadên temsîlî jî hîmê xwe di nav grûpên civakî de danîne. Bi vê nêrînê helwest, bi awayekî civakî ava bûne û bûne eksa civaka însanan an jî grûpên wan ku ew jiyana xwe tê de dijîn (Hogg û Vaughan, 2014: 190).

1.7.3. Hêmanên Helwestê

Bi qasî ku zanyarên biwara psîkolojiya civakî ser xebitîne û ronî dane ser, sê aliyên helwestê hene ku însan dikare bi hestên xwe, bi fikr û ramanên xwe û bi kir û tevgerên xwe ve bibe xwedî vê hêmanê. Modela ku ev hersê pêkhatyên helwestê rave dike wekî; ‘modela sê-hêmanî ya helwestê’ hatiye binavkirin.

Li gorî ‘modela sê-hêmanî ya helwestê’ ya Rosenberg û Hovland (1960) hêmanên helwestê wiha kategorîze dibin:

1. Hêmana îdraqî/hîşî (fikr û raman): Baweriya di derbarê objeyê helwestê de ye.
2. Hêmana hestyarî (his): Hestên erênî yan jî nerênî yên tîkilî objeya helwestê.
3. Hêmana kiryarî (kar û tevger): Rewşa ber amadebûna tevgerê.

Li aliyekî din digel van hersê hêmanên sereke, ev model hin xusûsiyetên din ên helwestê wiha derdibirre:

- Helwest bi nisbet mayînde ne: Yanî, ew bi dirêjîya rewş û deman re berdewam in, hisên lehzekî nabine helwest.
- Helwest bi bûyer û objeyên girîng ên sosyal ve sînordar in.
- Helwest gelemper in: Eger tu kitêbekê ser tiliya xwe bigirî û te biêşîne, ev tîrê nake wê bike helwestekê, çunkî ev bûyereke yek cî û yek car e. Lê eger ev tecrube bike ku tu ji kitêb û pirtûxaneyan aciz bî yan jî xwe şehetî hîs bikî hingê ev acizî dibe helwestekê.

(Hogg & Vaughan, 2010: 94).

1.7.4. Teoriyên Serekî yê Têkilî Helwestê

Wekî sehayeke xebatê û pêkhatyê girîng a psîkolojiya civakî, di têkilî helwestê gelek model û teorî hatine pêşxistin. Çawa ku Mostyn (1978: 21) diyar dike; “Grenwald û yê din wê texmînê dikin ku di dawiya 1960an de ji teoriyên fêrbûnê an jî S-Rê²⁵ heta teoriyên motîvasyon û neliheviyê bi qasî 34 xebatan têkarî pêşketina teoriya helwestê kirine. Her teoriyên têkilî mijarê bi qasî şeş hebên li jêr tesîr li ser çalakiyên lêkolîn û fikirandinê yê psîkologên civakî nekirine ku ew jî ev in: ‘Teoriya Fêrbûnê, Teoriya Fonksiyonel, Teoriya Neliheviya Hişî, Teoriya Xwetêgihandinê, Teoriya Daraza Civakî, Teoriya Lêbarkirinê (attribution)’.”

1.8. Helwest û Kiryar

Li ser helwestê, di sehayê psîkolojiya civakî de gelek xebat hene ku xwestine pêwendiya helwest-kiryarê diyar bikin û bersiva hin pirsên wiha geriyane; ‘ev têkilî heta ku derê dirêj dibe yan jî heta çî astê dertê, gelo raste rast pêwendiya wan dikare bê pîvan?’ Îja di hin xebatan de pêwendiya helwest û kiryarê hatiye çespanandin lê di hinekan de pêwendiyê qels derketiye û di hinekan de jî pêwendiyek tesbît nebûye.

Gelek terîfên helwestê hene ku pêwendiya helwest û kiryarê dihewînin lê ew dikare sist be û berê wê her ku de dibe bila bibe. Wekî wê, terîf hene ku dibê; helwest rewşa amadêbûna hilberîna tevgerê û pêkanîna berîdanê ya takekesî ye ku wî ji kiryarê re amade dike. Li aliyekî din hin terîf jî hene ku helwestê wekî şekilandin, dîkte kirin û sedema kiryarê dibînin (Mostyn, 1978: 67).

Hatiye çespanandin ku belgekirina pêwendiya bihêz a navbera helwest û kiryarê de ya farazî, carna dijwar e. Bo nimûne, Wicker (1969) 30 xebat vekolan ên ku lihevgerîna helwest-kiryarê ezmûnandine, û ew encam jê girt; “pir hindik delîl hebûn ku destekê bidin hebûna farazî ya helwestên binyatî û biryardar ên di hundirê takekes de yê ku tesîrê hem gotinê wan hem jî tevgerê wan bikin.” Qe nebe ji wê vir de, lêkolîneran gelek faktor diyar kirine yê ku bandorê lihevgerîna helwest-kiryarê dikin, û encama gunca wisa xuya dike ku; hinek pîvanên pêwendiya helwest û

²⁵ **Stimulus-response theory/teoriya ‘hişyarker-bertek’ê:** di psîkolojiyê de têgehek e ku li gorî wê, wisa tê bawerkirin ku kiryar di encama hevtesîrkirina hişyarker û bertekê tê der.

kiryarê di hin rewşan de têkiliya nêzîk nîşan didin lê di henekan de ne wisa (Millon & Lerner 2003: 314-315).

Li aliyekî din Hogg & Vaughan (2010: 103) du teoriyên derbarê têkiliya kiryar û helwestê de wiha derdibirrin:

“Teoriya Çalakiya Mantiqî (theory of reasoned action) a ku Martin Fishbein û Icek Ajzen (1974) pêş xistine, pêda dikeve ka bi xusûsî niyet û baweriyên kesekî bi awayekî krîtîk çawa daxilî kiryarê wî dibin, û teorî van pêkhatayan dihewîne:

- *Norma subjektîv* – encama dêna takekes a têkilî baweriyên kesên din e. Kesên girîng derbarê ‘kirina tiştê rast’ de rêberiyê dikan.
- *Helwestên têkilî kiryarê* – xwe dispêre baweriyên takekes ên derbarê kiryarên kifşe û nirxandina wan kiryaran. Ev ne helwesteke beralî heyberekê ye (nm. dermanê kontrola ducaniyê), lê ew beralî kiryarê ye (nm. xwarina derman).
- *Niyeta kiryarî* – beyana ji nav (hundir) a berew tevgerê ye.
- *Kiryar* – çalakî li dar e.

Ajzen (1989) berdewam kir li ser rola viyanê di modeleke guherandî de ya teoriya kiryara plankirî (theory of planned behaviour). Kontrola kiryarî ya têgihiştî bi qasî jêbaweriya takekes e ka jêre pêkanîna çalakiyê dijwar e yan hêsan e. Dema biryarê, em tecrubeyên bihurî û astengên mewcud difikirin. Bo nimûne, Ajzen û Madden (1986) tesbît kirin ku xwendevan, ne surpîz e, dixwazin di dersên xwe de nota Ayê werbigirin: Xwendevan notên Ayê berz dinirxînin (helwest), û ew notên wisa ne ku malbat û hevalên xwendevanan dixwazin ew bi ser kevin (norma subjektîv). Digel vî, pêşdîtina nota Ayê, eger em nepîvin ka xwendevan dê şiyarên xwe çawa binirxîne ew ê bawerî pê nebe. Herdu teorî; teoriya çalakiya mantiqî û teoriya kiryara plankirî ne di pevçûnê de ne.”

Wekî ji teoriyên li jor diyar dibe di sepandina kiryara kesên de hin pêlik hene û kes, pêbendî hin rewşên ji xwe û hinên ji derî xwe ye. Dîsa hin xebatên vê biwarê di navbera helwest û kiryarê de têkiliyeke xurt dîtine xusûsen di hin rewşan de.

Ev lîsteya li jêr kurtiya faktorên ku pêwendiyêke bihêz a helwest û kiryarê pêk tînin nîşan dide:

- Dema helwest ne qels, lê bihêz bin
- Dema niyeteke me ya bihêz hebe ji bo ku em tişteki bikin.
- Dema helwest û kiryar herdu jî ji heman rewşa civakî der hatin.
- Dema em gihîştine heman pêkhatayên helwestê (tesîr an jî îdraq) wextê helwest hat nirxandin an jî dema kiryar pêk hat.
- Dema helwest ji asteke gelemper zêdetir di asteke xusûsî de hate pîvandin.
- Ji bo xwe-temaşekirina qels (ne ji bo xwe-temaşekirina berz)

(Stangor, 2011: 244).

1.9. Guherîna Helwestan

Wekî ku tê zanîn însan razî dibe fikrên wî biguhere. Rastiya ku dibêje; heye ku helwest û kiryar ji hev negirin, encameke firawan derdixe û yek ji wan sedemên bihêz e ku dihêle însan helwesta xwe biguherin. Teoriya neliheviya hişî/zanînî yek ji teoriyên malbata teoriyên lihevgirtina hişî ye. Ev teorî ferz dikin ku însan dixwaze bawer bike; dema ew hîs dikin, difikirin û tevdigerin, ew di van rewşên xwe de lihevgirtî ne. Li ser vê faraziyê herî zêde teoriya nelihaviya hişî xebitiye ku psîkologê civakî Leon Festinger (1957) ew pêş xistiye, û di psîkojiya civakî de bûye ew babet ku herî zêde xebat ser çêbûne di dirêjiya salên 1960an de (Hogg & Vaughan, 2010:105).

Çawa ku Kuppuswamy (1961: 206) derbirriye di çêbûn û guherîna helwestan de hem fakterên navîn hem jî yên derîn cihê xwe digirin. Fakterên hundirîn amaje bi armanc, îdeal û ên wekî wan ê takekes dikin. Fakterên derîn jî amaje bi tecrube, têkiliyên takekes bi kesên mayî re û yên wekî wan dikin.

Wekî ku me berê amaje pê kir; nabe ku herdem helwest kiryarê derîne. Mumkîn e ku carna helwesta kesekî bibe kiryar, carna nebe û carna jî helwest dikare biguhere. Ev rewş jî bi dehsalên sedsala borî hatine vekolan û di encama van lêkolînan de jî hin teorî hatine pêşxistin ku me berê behsa wan kiribûn.

1.10. Hin Kardayên ku Tesîrê li Çêbûn û Guherîna Helwestê Dikin

Di însan de hin xusûsiyet û rewşên navîn û derîn hene ku tesîrê li helwestên wan dikin. Psîkologên civakî balê dikişînin ser kardayên wekî; sal, kesayet, dorwarê

perwerdeyê, karlêkkirina çandî, dêwbav û serkeftina akademîk ku bi van, helwesta kesan tesîra xwe digire.

Bi qasî ku psîkologên civakî dane pêş, helwest di zaroktiyê de ne diyar in. Li gorî Brown (2000) ew zarokên ku hişê wan negihiştî ne; li hemberî nijad, çand, grûpa etnîk, çîn û zimanan ne xwedî helwesteke kifş in (Kazazoğlu, 2011: 29 -ji McNamara, 1975: 79).

Ji bo ku temenê însan girîng e di çêbûn û guherîna helwestan de, lêkolîneran dema li ser helwestan pîvanekên xwe saz kirine û sepandine wan zêdetir li salên balixbûna zarokan û pêrava dane ber xwe. Çunkî ji lêkolînan têderketiye ku zarok zêdetir ji dêwbavê xwe tesîrê digirin û her ku diçe mezin dibe helwestên wan dikare ji yê dêwbavê wan cudatir be. Vê derbarê de Hogg û Vaughan (2014: 187) hin encamên lêkolînan wiha diguhêzin:

“Connell (1972) xuya dike ku di hin mijarên *spesîfîk* de, di navbera helwesta zarokan û ya dêwbavê wan de korelasyon (têkilî/girêdan) piranî pozîtîf be jî, ew heman demê de qels e. Dema mijarên *gelemper* tên pîvandin korelasyon xurttir e. Jennings û Niemi (1968), derbarê tercîhkirina partiyeke siyasî de, tercîhên xwendevanên lîseyê û yê dêwbavê wan daye ber hev û korelasyon wekî; 0.60, lê di derbarê dînê de, tercîhên wan daye ber hev û korelasyon wekî; 0.88 dîtine. Tabî kiryarên bereks dikare bikeve ber van korelasyonan, ev jî xusûsiyeta balixbûnê ye ku zarokên vê serdemê piranî eksê dêwbavê xwe helwestan dihebînin an jî wisa dixuyên.”

Li aliyekî din derdor, medya û xusûsen televîzyon û -îroroj zêdetir medyaya civakî- kartêker in li ser çêbûn û guherîna helwestan. Bi qasî ku Hogg û Vaughan (2014) diguhêzin medya û xusûsen televîzyon hin ji faktorên sereke ne yê ku tesîrê li helwestan dikin. Di gelek lêkolînan de hatiye sepandin ku berîdanên medyayê û televîzyonan û teşwîqên reklaman di çêbûna helwesta însanan de roleke girîng lîstine.

1.11. Pîvandina Helwestan

Psîkolojiya civakî, ev bi qasî sed salî ye ku li ser helwestê xebatan dike, têkiliya helwest û kiryarê dipêve û dixwaze tercîh û sebebên terciha însan ên pêbendî

helwestê rave bike. Prosesa pîvandina helwestê ya ku ji sala 1925an vir de berdewam e, heta niha bi gelek pîvanekan bûye sehayeke lêkolînê.

Pîvandina helwestan ne ewqas hêsan e, çunkî raçavkirina helwestan bi awayekî rasterast ne mumkîn e. Tişta di zêhna kesekî de em ê çawa bipîvin? Bi giştî çare ew e ku meriv pirsan li kesan bike. Lêkolîner bi giranî pişta xwe didine vê stratejiyê û dupayî, ew anket û pîvanekên helwestê bi kar tînin (Hogg & Vaughan, 2014: 191).

Raçavkirina helwestên kesan rasterast ne mumkîn e. Thurstone (1929) îfade dike ku helwest dikare bi rêya qenaetan bê pîvandin ku qenaet îfadeyên zarî yên helwestan in. Hinekan jî gotine qenaet hergav helwestan îfade nakin, gotin û kirinên însanan dibe ku ji hev cuda bin. Lê qenaetê berbelav heye, kiryarên kesan ji helwestên wan ên xasî wan dertên. Pîvandina helwestan xwe dispêre vê bingehe (Köklü, 1995: 86 -ji Özgüven, 1994).

Ji bo ku rehendên fizîkî yên helwestan tunene, bi gotineke din ji bo ku ew têgehên razber in, pîvanekkirina wan heta heye dijwar e. Wekî berê jî hate diyarkirin, helwest guherbarên veşarî yan jî farazî ne. Ji ber wê helwest rasterast nayêne pîvandin. Dema ku ji kesan helwesta wan a têkilî obje an jî mijara helwestê hate pirsîn, piranî ew nikarin bibersivînin, ew îfadeyên çewt an jî yên serva didin. Loma ji bo ku merî helwestên kesan hîn be divê merî agahiyên derbarê fikrên wan, hestên wan û meyla bertekên wan hîn be (Tavşancıl, 2018:101 -ji Thurstone, 1967: 78-79).

Ji aliyê pîvandinê ve hin rehendên helwestê girîng in. Ji van rehendan; alî, derece û sift ji bo pîvandina helwestê pir girîng in. Aliyê helwestê; aliyê hestyarî ye yê wekî jê xweşbûn, jê xweşnebûn, pozîtîf an jî negatîf bûn. Dereceya helwestê; asta hestyarî ya pejirandin an jî redkirina helwestê nîşan dide. Siftbûna helwestê jî; îhtimala veguherîna bo kiryarê, rewşa bihêz an jî qelsbûnê ye, ya di nav qadên din ên helwestê de îfade dike (Kazazoğlu, 2011: 42).

Di pîvandina helwestan de hin teknîk, rê û rêbaz hatine pêşxistin ku zanyaran pîvanekên helwestê li gorî xusûsiyetên wan tesnîf kirine û navandine. Ji van, rêbazên wekî; raçav, listeyên pirsan, risteyên netemam û vegotina çîrokan û teknîkên wekî; bijartina çewtiyê, analîza naverokê bi kar tên.

Wekî encam xebatên têkilî helwestê dikarin sê kategoriyan de werine ser hev. Ew, wekî li jêr in:

1. Rêbazên ku dihêlin merî ji kiryarên kesan wateyan derxe. Di vê de, divê merî daneyan berhev bike yê ku xwe dispêrine raçavkirinê ji bo têkiliya helwest-kiryarê saz bike.
2. Rêbazên ku dihêlin merî wateyan derxe yê ku xwe dispêrine bertekên kesan ên fîzyolojîk.
3. Rêbazên ku dihêlin merî wateyan derxe ji yê ku xwe dispêrine bertekên kesan ên ku dane rêzeke îfade/madde an jî sifetan.

(Tavşancıl, 2018: 101 -ji Arul, 2002; Anderson, 1988)

1.12. Pîvanekên Helwestê

Pîvanekên helwestê di serê salên 1930yê de hatin pêşxistin û ji bo fikrên serekî yê însanan bipîvin ên wekî; siyasî, dînî û nijadî hatine bikaranîn. Ev pîvanek anket/pirsname bûn ku ji însanan dipirsîn ka ew di derbarê van mijaran de çi difikirin, çi hîs dikin û di van rewşan de çawa tevdigerin. Xebata pêşîn a helwestên nijadî Richard LaPiere (1934) çêkir ku bi wê xebatê têderket; gotin û tevgerên însanan bi awayekî berçav ji hev nagirin (Hogg & Vaughan, 2010: 100).

Pîvanek ew lîsteya bertekên însanan ên ji hestên wan ên rasteqîn e dema rêzepirsên wekî riste an sifet ji wan tê pirsîn nîşan didin. Pîvanekên herî zêde tînan bikaranîn yê; Likert, Thurstone, Guttman û ‘pîvanekên wateya hestiyar’ in. Pîvanekên Likert, Thurstone û Guttmanî risteyan dihewînin, ‘pîvaneka wateya hestiyar’ jî ji rêzesifetên nirxandinê yê du niçî pêk tê (Kazazoğlu, 2011: 44 -ji Köklü, 1995: 87).

Dema lêkolînerê bixwaze di mijarekê de helwesta kesan hîn bibe, ew pirsên têkilî mijarê amade dike û wan li ser nimûneyên bijartî dispêne. Ev pirs dikarin bi şiklê risteyan bin ku zêdetir wekî anket tînan zanîn. Ji bo têbarî û pêbaweriya pîvanekê xurt be divê maddeyên pirsan xwedî hin xusûsiyetan bin ku zanyaran ew diyarkirine.

Edwards (1957) ji bo nivîsandina maddeyên pîvanekên helwestê hin qayde pêşniyar kirine (Gh: Tavşancıl, 2018: 114-115). Ev qayde dikare wisa bêne rêzkirin:

1. Risteyên ne ji dema borî, lê divê zêdetir risteyên dema niha bi kar bên.

2. Divê merî xwe ji îfadeyên ravekirina bûyerên rasteqîn, an jî raveyên xwe dispêrine wan bûyeran bigire.

3. Divê merî xwe ji îfadeyên ku raveyekê zêdetir dixwazin bigire.

4. Divê merî xwe ji wan maddeyên helwestê bigire, ew ên eleqe bi mijara berdest a psîkolojîk re tuneye.

5. Divê îfadeyên ku herkes dikare bipejirîne yan jî tu kes wan napejirîne bi kar neyên.

6. Divê risteyên wisa bîn bijartin ku ew riste ranja sehekî ya pîvaneka mijarê bi tevayî vegirin.

7. Divê îfade eşkere, hêsan, vebirî û rasterast fehmbar bin.

8. Divê madde kurt bin (herî zêde 20 peyv).

9. Divê di maddeyan de îfadeyên gelemper ên wekî; ‘hemî, herdem, tu-yek, qet’ ên ku bersivdaran berew nediyariyê dibin, nebin.

10. Divê her maddeyêke pirsê tenê fikrekê bihewîne.

11. Dema peyvên wekî; ‘tenê, her, yek’ bi kar hatin ew bi qaydeyekî bi kar bîn.

12. Mumkîn be divê madde ne wekî risteyên kompleks an jî hevedanî lê wekî risteyên basît bi kar bîn.

13. Peyvên ku bersivdar dê fêm nekin divê bi kar neyên.

14. Divê du îfadeyên nerênî di heman maddeyê de bi kar neyên.

Li aliyekî din wekî ku Hogg û Vaughan (2014: 191-192) diyar dikin; teknîkên pîvandina helwestan pêşbîniyên cuda dikin di derbarê maddeyên testê an jî kalîteya daneyên berhevkirî de û di derbarê helwesta kesekî de ka ew agahiyên çî terî ne. Ev teknîk heman demî, di van faraziyan de hevpar in:

- Helwest bi teknîkeke kantîtatîv dikarin bîn pîvandin; bi vî awayî fikra kesekî bi nirxeke jimarî tê temsîlkirin.
- Maddeyêke testê ya kifş an jî kiryareke ku helwestekê dinîşe, ji bo hemî bersivdaran xwedî heman wateyî ye, wisa ku bersivek ji bo her kesekî bi heman şiklî tê pûankirin.

Ev farazî ne mumkîne hercar xwe rast biderin. Divê merî bi ihtiyat be jî faraziyeyên girtî re.

Ji bo ku em muhtewaya pîvanekên helwestê fêhm bikin, em ê çend hebên sereke li jêr pêşkeş bikin.

1.12.1. Pîvaneka Mesafeya Civakî ya Bogardus

Ev pîvanek wekî pîvaneka pêşîn a helwestê tê zanîn û di sala 1925an de hatiye sepandin. Ev pîvanek bi wê mebestê saz bûye ku têkiliyên însanan bide ber hev ka ew kesên ji dîm, nijad û çînên cuda çiqas qebûl dikin an red dikin. Li gorî mantiqa pîvanekê ya bingehîn wate ev e; “eger ez bi we re jiyana di heman taxê de qebûl bikim, ew tê wê maneyê ku ez jiyana di heman bajêrê û welatî de jî qebûl dikim.” Bogardus di sala 1926an de pîvaneka xwe li ser 1725 xwendevanên Amerîkî yê esil-Ewropayî sepandiye yê ji 24 zanîngehên wî welatî. Û wî di 1936an ne tê de ku hingê dervayî welêt bûye, her deh salan carekê (1946, 1956 û 1966) tekrar kiriye (Tavşancıl, 2018: 114-115 -ji Arul, 2002; Nix, 1993). Di rapirsîna Bogardus a 1926an de, belavbûna pîleya têkiliyên Amerîkiyan digel grûpên etnîk li gorî sedeyên wan wekî tabloya li jêr ê:

Şeklê 1.1: Helwestên Amerîkiyan li dijî Hin Grûpên Etnîk – wekî ‘Qebûl Dikim’

	Bi zewacê wekî egreba (%)	Wekî dostekî tevî kulûba xwe (%)	Wekî cîran li taxa xwe (%)	Wekî heval-kar li welatê xwe (%)	Wekî hewlafî li welatê xwe (%)	Wekî mêvan li welatê xwe (%)	Divê ji welat bê derxistin (%)
Amerîkî	90	92	93	92	91	1	0
Kanadayî	87	93	96	96	96	2	0
Îskoç	78	89	91	93	93	2	0
Îrlandî	70	83	86	90	91	4	1
Gallî	61	72	80	81	86	5	0
Fransewî	68	85	88	90	93	4	1
Îngiliz	94	97	97	95	96	2	0
Îskoçên Îrlandayî	73	82	88	89	92	17	0

(Tavşancıl, 2018: 118)

1.12.2. Pîvaneka Guttman

Ev pîvanek, Guttman û hevalên wî di heyama II. Şerê Cîhanê de ji bo helwestan biçespînîna pêşxistine. Taybetiya berçav a vê pîvanekê ew e ku dema kesek ji rêza risteyan risteyekê dibersivîne, bersiva kesî dihêle ku merî derbarê pirsên din de jî bibe xwedî fikrekê. Bi vê wateyê ew û pîvaneka Bogardus xwe dispêrin heman faraziye (Kazazoğlu, 2011: 47 -ji Tavşancıl, 2018 û yd.).

Şeklê. 1.2: Nimûneyeke Pîvaneka Guttman

Madde	Bersiv
1. Ez ji 80 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na
2. Ez ji 60 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na
3. Ez ji 40 kîloyî zêdetir im.	Erê / Na

Di vê pîvanekê de dema kesek ji madeya yekem re bersiva “erê” bide, eger ne ji bêdîqetiyê be divê ji herdu madeyên duyem û sêyem re jî bersiva “erê” bide. Kesê ku ji her maddeyê re “erê” bêje û hingê 1 puanî bistîne, dema ku 2 puan standibe teqez diyar dibe bê kîjan herdu maddeyê re “erê” gotiye. Ne mumkîn e kesek ji maddeya yekem re “erê” bêje, ji maddeya duyem re “na” bêje, ji maddeya sêyem re “erê” bêje (Tavşancıl, 2018: 157).

1.12.3. Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood (Pîvaneka Cudatiya Semantîk)

Pîvaneka wateya sehekî ya ku Osgood, Suci û Tannenbaum (1957) pêş xistine dihêle ku di pîvanekê de helwestên cuda bêne pîvandîna û xusûsen jî pîvanekê gunçaw e ji bo pîvandîna helwestên sosyal. Di bingeha wê de, lêkolîna nirxên watedar ên derbarê helwestên kesên heye. Ango, armanca esil pîvandîna mijara têkil a helwestê ye ku dixwaze tê derxe ka ew ji bo kesî tê çî wateyê. Ji bo vê pîvanekê cure sifetên kifş ji gelek sifetan hatine dariştin. Bi rêya vê pîvanekê, merî dikare nirxdana çandên ciyawaz ên ku didine bûyer, obje û têgehên berawird bike. Pîvaneka wateya sehekî, ji ber ku ewledar e, sepandîna wê hêsan e, ji bo pîvandîna berawirdî ya navbera çandan gunçaw e û ji bo azmûnberan balkêş e ew gelekî berbelav bi kar tê. Lê pêşxistîna pîvanekê ne hêsan e. Ji bo ku rehendên watedar di vê pîvanekê de

bêne pîvandîna divê sîfetên têkilî gelek têgehan bêne berhevkerin, ji pêş-testekê re bêne derbsakirin û analîza faktorê bê kirin (Kazazoglu, 2011: 48 -ji Tavşancıl, 2005: 169).

Nimûneyeke pîvanekê ya têkilî pîvandîna ‘jihevkerina watedar a têkilî mêran’ wekî li jêr e:

Şekî 1.3: Nimûneya Pîvaneka Wateya Sehekî ya Osgood

Mêr:

1. rind: __: __: __:__:__:__:__: nerind
2. bihêz: __: __: __:__:__:__:__: qels
3. aktîv: __: __: __:__:__:__:__: pasîv
4. baş: __: __: __:__:__:__:__: nebaş
5. çalak: __: __: __:__:__:__:__: req
6. bilez: __: __: __:__:__:__:__: hêdî
7. bêkêr: __: __: __:__:__:__:__: bikêr
8. serkeftî: __: __: __:__:__:__:__: neserkeftî
9. bikelecan: __: __: __:__:__:__:__: xwînsar

Di pîvanekê de ji cotên sîfetan maddeyên 1, 4 û 7 ji rehendên nîrxandinê ne; maddeyên 2, 5 û 8 ji rehendên hêzê ne; maddeyên 3, 6 û 9 jî ji rehendên çalakiyan in (Tavşancıl, 2018: 170).

1.12.4. Pîvaneka Thurstone

Yekemîn kesê îddia kiriye ku helwestên civakî dikarin bêne pîvandîna Thurstone e. Wî, ji bo helwestên yek rehend pêş bixe hin teknîkên cuda dîtine. Di nav van de yê herî berbelay, teknîka ‘berawirdkirina cotane’ û teknîka ‘pîvaneka neqebên wekî yekser’ in. Ev teknîk, li gorî çêkirina maddeyan ji hev cuda dibin. Xebata dorvegir a Thurstone ya têkilî raveyên pîvanekan ên ji bo fêmkirin û pîvandîna guherbarên sosyolojîk, psîkolojîk û perwerdeyî, bûye bingehê pîvandîna (Tavşancıl, 2018: 122 ji- Andrich, 1988: 303).

Pîvanekeke Thurstone a ‘neqebên wekî yekser’ bi halê xwe yê resen ji bîst û du risteyên helwestê yê bi serê xwe pêk tê. Her risteyek xwedî nîrxekî pîvanekê yê jimarî ye, ev nîrx piştî nêrîna pozîsyona nîvtev a wê risteyê ya li ser rehendeke kit û

berdewam tê diyarkirin. Helwesta kesan a têkilî meseleya mijara behsê jî, ji wan, tê xwestin ku risteyên ku ew tevlê dibin binîşin, û bi vî awayî helwesta wan tê pîvandin. Pûanê her yekî, nirxê pîvanekê yê nîvtev ê maddeyên nîşankirî ne (Hogg & Vaughan, 2014: 192-193).

Şeklê 1.4: Nimûneya Pîvaneka Thurstone

Herî erênî			Nêtar					Herî nerênî		
1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11

1.12.5. Pîvaneka Likert

Pîvaneka helwestê ya Likert yek ji formên pirsê yê herî bikarbar e. Ev pîvanek di sala 1932an de ji aliyê Rensis Likert ve hatiye pêşxistin. Ev pîvanek rêze-risteyên ku helwesta kesekî ya têkilî objeyekê nîşan didin dihewîne. Di van pîvanekan de du cure riste tê dîtin. Tîpa yekem, risteyên tesdîqê ne yên ku helwesteke erênî raber objeya têkil nîşan didin. “Ez ji dersa lêkolînê hez dikim.” Risteyeke erênî ye. Tîpa duwem, risteyên tesdîqê ne yên ku helwesteke nerênî raber objeya têkil nîşan didin. “Kêfa min nayê ez lêkolînê bikim.” Nimûneya risteya nerênî ye. Di pîvaneka Likert de risteyên erênî û nerênî hema bi qasî hev têne saz kirin. Risteyeke sê, pênc an jî heft vebjêrkî ji kesekî re tê pêşkeşkirin û tê pirsîn ka ew tev dibe yan nabe (Köklü, 1995: 89).

Di pîvaneka Likert de (bo nimûne, ya pênc vebjêrk de) ji beşdaran rêzek pirs tîn pirs kirin û ew jî pîvanekê pênc pûanî bi kar tînin (ev pûan pîranî wekî; ‘teqez wisa ye’, ‘wisa ye’, ‘bêqirar im’, ‘ne wisa ye’, ‘qet ne wisa ye’ tîn etîket kirin) û bi vî awayî nîşan dikin ka ew çî dereceyî tevî her yek hevokî dibin. Dema ev hevokên helwestê gelekî bi kar hatin, pûanê kesî ji hevokeke serî heta hevoka seriyê din tê berhev kirin û yekûna bi dest ketiye wekî diyarkerê helwesta kesî tê bi kar anîn. Likert di nav nirxên pîvanekê de neqebên yekser/wekhev pêş nedîtibû. Bo nimûne; ferqa navbera ‘wisa ye’ û ‘teqez wisa ye’ mumkîn e ku ji ferqa navbera ‘wisa ye’ û ‘bêqirar im’ mezintir be. Ev tê vê maneyê: pîvanekê Likert, li ser rehendeke take û berdewam, dikare li ser serastkirina helwesta însanan agahiyan bide, lê dûr e ew

nîşan bide ka helwestên cuda çiqas nêzîk an dûrî hev in (Hogg û Vaughan, 2014: 194).

Li jêr nimûneyeke pênc-vebjêrkî ya pîvaneka Likertî Hogg û Vaughan (2014: 195) wisa nîşan kirine:

Şeklê 1.5: Nimûneyeke Pîvaneka Likert

Derbarê îfadeyên li jêr de fikra we çi ye? Bersiva we eger fikra we ya rasteqîn îfade bike ew rast e. Ev ne azmûnek e.					
Ser tu maddeyekê re baz nedin. Ji van her pênc vebjêrkan a ku li we tê binîşin.					
<u>Madde</u>	<u>Tegez wisa ye</u> ²⁶	<u>Wisa ye</u>	<u>Bêqirar im</u>	<u>Ne wisa ye</u>	<u>Qet ne wisa ye</u>
Cotkarî karekî xweş e.	—	—	—	—	—
Bêna merî bi cotkariyê teng dibe.	—	—	—	—	—
Ne karê aqilan e însan jiyana xwe bi cotkariyê xerc ke.	—	—	—	—	—
Jiyana cotkariyê bala min dikişîne.	—	—	—	—	—
Xebata li çewlikekê xebateke zexm dixwaze.	—	—	—	—	—

Di pîvanekên Likert de vebjêrkên duwane, sêwane, çarane, şeşane û heftane bi kar tên lê pîvaneka pêncane ya herî pratîk û berbelav e. Ji bo kesên temenbiçûk

²⁶ Di şiklê îngilizî de wekî; ‘strongly agree, agree, neither agree nor disagree, disagree, strongly disagree’ û di şiklê tirkî de wekî; ‘kesinlikle katılıyorum, katılıyorum, kararsız ım, katılmıyorum, kesinlikle katılmıyorum’ e. Me di tabloyê de wekî şiklê jorê nivîsîn lê di pîvanekê de me hin guherîn çêkirin.

pîvanekên sêyî heta duyî guncawtir e. Ji bo ku pîvanekeke klasîk a Likert bê çêkirin Anderson (1991) heşt pêlikan pêşniyar dike:

1) Risteyên erênî yan jî nerênî yên raberî objeya helwestê têne nivîsandin.

2) Ji bo ku kontrol bikin, ji nifûsa pîvanekê hin nimûne/kes têne bijartin. Ev kes risteyan têdinêrin û wan wekî erênî û nerênî tesnîf ikin.

3) Ew risteyên ku kontrolkeran piranî wekî erênî yan nerênî tesnîf nekirine têne derxistin.

4) Riste, li ser kaxizekê bêyî bêne bijartin têne rêzkirin. Telîmat û vebjêrkên bertekan ên guncaw têne lêzêdekirin. Di telîmatê de ji bersivdaran tê xwestin ku ew di derbarê risteyekê de xwe çawa hîs dikin diyar bikin û vebjêrka li wan tê binîşin. Bi vî awayî forma pêşîn tê amadekirin.

5) Forma pêşîn a Likert, li ser nimûneyeke nifûsê tê sepandin. Ji bo ku daneyên watedar û pêbawer bi dest kevin, divê jimara nimûneyan çend caran zêde be ji jimara risteyên pîvanekê.

6) Li encamên sepanê tê nêrîn, korelasyona navbera bertekên her risteyê û pûanên sercem ên pîvanekê tê hesabandin.

7) Bi awayê îstatîstîkî bi pûanê sercem risteyên ku wateyên wan derneketine nayêne bikaranîn. Rastiya ku dibê têkiliya her risteyê divê bi pûanê sercem ê pîvanekê re hebe, wekî pîvana nav-hevgir a Likert tê dîtin.

8) Bi risteyên bijartî şiklê dawî yê formê tê amadekirin.

(Gh. Kazazoğlu, 2011: 51)

Teza me, wekî ku me di destpêka xebata xwe de jî behs kiribû ji bo ku herdu xebatên kantîtatîv û kalîtatîv jî dihewîne em ê di lêkolîna xwe ya kantîtatîv/çendarî de wekî teknîk anketê bi kar bînin ku anketa me pîvanekeke pênc-vebjêrkî ya Likert e.

1.13. Helwesta Ziman

Di gelek civakan de ber û bala însanan piranî li ser zimanên fermî, bi prestîj û berbelav e. Li gorî grûpên civakî û asta wan a perwerdeyê ev beralî mumkîn e ku ciyawaz be. Bo nimûne di nav grûpên nexwendî yên civakên kêmpar de, zimanê zêdeparan bi prestîj dixwiyê ne tenê ji ber îhtiyacên wan ên ku wan bêgav dihêlin ew

hîn bin, lê ew wisa hizir dikin ku zimanê zêdeparan kubartir, nerm û naziktir e herwiha ew zimanê zanîn û pêşketinê ye. Li aliyekî din, di nav xwendaran de jî zimanê zanîn û pêşketinê yan jî yê mode kîjan be ew zêdetir berê xwe didine wî zimanî. Heta ew bixwe jî zimanan wekî; nerm/nazik-hişk/hors an jî hêsan-dijwar kategorîze dikin. Wekî mînak demekê li Tirkiyeyê fransewî wekî zimanekî elît û pêşketî dihat dîtin ku hê di hizra hin kesan de ew wisa ye. Dîsa niha di hizra gelek kesan de îngilizî zimanê herî dewlemend û pêşketî ye û ji bo zanîna zimanê guncaw zêdetir ew e.

Berî niha me di binbeşa ‘1.5.5. dîglossia/duzarî’yê de behsa varyantên berz û nizm ên ziman kiribûn ku ev kategorîkirin ji ber bikaranîn û karjeniya ziman a komeke civakî ye ku hiştiye etîket li van varyantan bikevin, wekî varyantê bajêrî, perwerdedîtî, elît an jî varyantê siruştî, gundî û nekitêbî. Di vê derbarê de Wardaugh & Fuller (2015: 92) têkilî dîglossiyê û hissiyata digel herdu varyantên wê wiha îfade dikin:

“Varyanta berz bihêz û bi prestîj e lê varyanta nizm ji vê hêz û prestîjê bêpar e. A rastî prestîja varyanta nizm dikare ewqas kêr be ku însanên wê cureyê ji ya berz zêdetir bikartînin heye ku bêjin ew wê varyantê nizanin. Ev nirxandina têkilî bi prestîjbûna varyanta berz, mumkîn e hebûna wê hîsa bihêz be ku wisa dinirxîne; varyanta berz ji varyanta nizm ‘bihêztir’, ‘beraqil’ û ‘kartêker’ e, loma ew vê prestîjê heq dike...”

Wekî vê; ev helwest û qeneeta nerênî li dij zimanên kêmeperan ji aliyê endamên civaka kêmeper ve bi perspektîveke Fanonî dikare di çarçoveya kolonyalîzm û mêtîngehbûnê de bê nirxandin. Fanon (2016: 34-35) wiha derdibirre:

Her gelê mêtîngehê, bi gotineke din her gelê ku jêderên wî yên çandî yê xwecî û orjînal hatiye temirandin û binaxkirin û bi vî awayî di rihê wî de komplekseke jêrdestiyê pêk hatiye ku nayê dermankirin, hema bêje wekî şertê heyînê, bi zimanê neteweyekê ku şaristaniyeke din û nû belav dike re, yanî bi çanda metropolê re xwe di nav pevçûneke sing ber sing de dibîne. Însanê mêtîngehê êdî bi nisbeta qebûlkirina standardên çandî yên metropolê, yên welatê-serî ew ê rabe ser statuya xwe ya hov û biyanî ya xasî del û deviyê ye...

Ji bo ku li gorî zanebûn û nisbeta xwe hema bêje di her însanî de helwestek heye pêşberî zimanê xwe yan jî di rewşa welatên pirziman de, li pêşberî zimanên kêmpar û yê zêdepar. Mumkîn e ku merî bêje kesê bi zimanê xwe perwerde dîtibe, bi zimanê xwe gihiştibe, bi zimanê xwe pijiya be ew ê bi wê pencereyê re li dinyayê binihêre û nabe ku ew xwedî helwesteke nerênî be heta di konteksa ziman-netewê de ew kes dê xwedî helwesteke netewyar be ku zimanê xwe ser zimanên din re bibîne. Heçî kesê ji koma kêmpar e eger perwerde bi zimanê xwe dîtibe bi qasî nisbeta kesê ji civaka zêdepar nebe jî, mumkîn e ew ê jî xwedî helwesteke erênî be li pêş zimanê xwe û pirî caran ew ê bibe parêzvanê zimanê xwe. Li aliyekî din kesê ji civaka kêmpar eger bi zimanê xwe perwerde nedîtibe, ji zimanê xwe hez bike jî heye ku ew ê piranî ne xwedî helwesteke erênî be raber zimanê xwe ku zêdetir mesaiya xwe dê ji bo zimanê zêdepar xerc bike.

1.14. Siyaset û Plansaziya Ziman wekî Kartêkerekê li ser Helwesta Ziman

Hin têgehên ku derbarê midaxeleya ser ziman a takekesî û komî bi wateyên carna nêzî hev carna jî têkilî hev bi kar hatine hene, wekî; ‘plansaziya ziman (language planning), siyaseta ziman (language policy), kargerîya ziman (language management), endazyarî (engineering), çêkarî (treatment)’. Ji van têgehên ‘kargêriya ziman’ Spolsky (2004: 11) wisa pênase dike: “Kargerîya ziman sazîkirin û beyankirina siyaseteke eşkere nîşan dike derbarê bikaranîna zimên de ku navê/hewce nake ew dokumanekê fermî de bê nivîsandin.”

Lê em ê ji van têgehên, zêdetir têgehên ‘plansaziya ziman’ û ‘siyaseta ziman’ bi kar bînin ku lîteratura vê biwarê de jî bêtir em rastî van têgehên hatin. Plansazî û siyaseta ziman ku bi awayekî modern piştî damezrandina netew dewletan hatiye sepandin tesîr li ser bikaranîna ziman, nêrîn û helwesta ziman kiriye. Dewletên ku xwe bi kodên yek netew an jî netewa homojen bi cî kirine, zimanê netewa xwe wekî fermî mecbûrî kirine û şeklekî nû dane zimanê netewa xwe.

Garcia (2012: 81) têkiliya nasnameya etnîk û ziman û rola wan a li ser plansazî û siyaseta ziman wiha derdibirre:

“Rola ziman a ku nasnameya etnîk dişekilîne û pênase dike girîng e -ya ku Fishmanî (1977, 1996) jê re **nasnameya etnolinguîstîk** gotibû- digel rola girîng a

nasnameya etnîk a di cimaeteke zimanî de, di bawerî û pratîkên zimanê wan de û di kargerîya ziman de ya ku dihêle rahêjên siyaseta û plansaziya ziman çêbin, xwe nîşan dide.”

Ji bo ku ziman yek ji pêkhatiya herî girîng a netewî ye, netew-dewletan ji bijartin û sazkirina alfabeyê, heta mufredata perwerdeya neteweyî midaxeleyî ziman kirinê ku siyaseta parzûna ziman -zêdetir rizgarkirina ziman ji peyv û telafuza zimanên biyanî- yek ji karên pêşîn ê van dewletan bûye.

Garcia (2012: 83), di heman berhema xwe de perspektîfa mêjûyî ya pêwendîya nasnameya etnîk û siyaseta ziman wiha diguhêze:

“Di hizra Ewropa û pan-Behraspî ya pêşmodern de ziman û nasnameya etnîk bi awayekî sirûştî têkildar bûn. Ev dêna kevneparêz di hizra romantîkên alman de belîqî. Ji bo Johann Gottfried Herder (1744–1803), ev rewş; ‘bêyî ziman, *gelek* ne tu tiştê e, ji aliyê têgihan ve nakok e.’ Ev herwiha pozîsyona Gottlieb Fichte (1762–1814) bû ya ku dîgo: ‘kesên ku heman zimanî diaxivin, bi gelek benên nepen ve bi hev ve girêdayî ne...’ Edward Sapir (1884–1939) û şagirtê wî, Benjamin Lee Whorf (1897–1941), hin hîpotez pêşniyar kirin ku pêwendîya ziman û nasnameya etnîk bihêz dikin, ji wan, di versiyona bihêz a hîpoteza Sapir-Whorf de, takekes mane ber însafa zimanê xwe, û di versiyona qels de terza fikirîn û tevgerîna takekes li jêr kartêkirina zimanê wî de ye ku ew pê diaxive. Lê cihoka kevneparêz a ku ziman û nasnameya etnîk pevgerîdidan, berew dawîya sedsala nozdemîn pirs lê bû. Franz Boas (1858–1942) nîşan da ku tecrubeyên mêjûyî, civakî û cografî cihêrengiyên der tînin. Û Max Weber (1864–1920) îfade kir ku bawerîya eslê/koka hevpar pêbendî ‘îdraqa cins’ e. Pevgerîdana ziman û nasnameya etnîk li Ewropayê, di dirêjîya sedsala nozdemîn de, di tevgerên netewyar de bêtir bihêz bû piştî ku ji bo ji yê din veqete zimanekî netewî hat bijartin û homojenîtiyeke lînguîstîk di nav grûpê de hate dabîn kirin (Wright 2004). Dewletên nû yê ku piştî rûxandina Împaratoriyeke Osmanî û Awûstro-Macarî, dawîya Şerê Cîhanî yê yekem hatine damezirandin, sînorên nasnameyên netewî yê cuda çêkirin ku beramberî ‘zimanekî netewî’ dihatin. Di maweya vê demê de, siyaseta ziman wekî ‘tesîra pêra’ a stratejiyên netewsaziyên mayî hem hatin plankirin hem jî neşîya bê plankirin.”

Dema em li pratîkên netew-dewletan û dewletên modern dinêrin di derbarê plansazî, kargerî û siyaseta ziman de rewşeke cihêreng dertê pêşiya me. Wardhaugh û Fuller (2015: 368-369) behsa du tîpên plansaziya ziman dikin ku yek jê **plansaziya statuyê** ye; ‘plansaziya statuyê karjeniya zimanek an jî varyantekî wî û mafên bikarhênerên wî diguherîne’. Û wan ji bo statuya zimanan çend nimûne dane: ‘zimanek wekî zimanê fermî hatibe naskirin; li Fransayê fransî û li Îngilistan û Amerîkayê îngilizî. Du yan zêdetir ziman dikarin heman statuyê de bin li hin welatan wekî îngilizî û fransî li Kanada û Kamerûnê; fransî û flemenî li Belçîkayê; fransî, almanî, îtalyanî û romanî li Swîsreyê û îngilizî, malayî, tamilî û çînî li Sîngapûrê. Zimanek dikare xwedî statuyekê be lê tenê li herêmekê; îgbo, yorûb û haûsa li Nijeryayê, almanî li Belçîkayê û maratî li Maharashtra-Hindistanê. Zimanek dikare ne xwedî statuyekê be lê wekî zimanê terfîyê, di saziyên ciyawaz de ji bo hin armancên xusûsî bi kar bê wekî; îngilizî bi nisbeteke roj bi roj zêdetir di konteksa perwerdeyê de bi kar tê li Almaniya û Swêdê. Zimanek dikare bê tolerekirin lê ne zimanê terfîyê be ne jî bê astengkirin wekî; baskî li Fransayê, gelek zimanên koçberan li Rojavayê Ewropayê û zimanên xweciyên Amerîkayê li Bakurê Amerîkayê. Plansaziya duwem jî **plansaziya korpûsê** ye ku ew digere şeweyeke ziman piranî standardîze bike, yanî xizmeta her fonksiyona ziman bike ya di civakê de. Wekî encam plansaziya korpûsê dikare geşkirina ortografîyê, jêderên nû yên peyvan, ferhengên, û edebiyatekê bihewîne, digel sehayên nû yên bikaranîna zimanên ku bi qestî hatine pêvekirin ji bo ku di sehayên hikumî, perwerde û bazirganiyê de belav bibin. Plansaziya korpûsê bi taybetî welatên wekî Endonezya, Fînlandiya, Îsraîl, Pakîstan, Hindistan, Papûa Gîneya Nû girîng e.’

Îja dema em berê xwe didine plansaziya ziman di dara Tirkiyeyê de, ji îlankirina komarê (29ê Çiriya 1923yan) heta niha tirkî wekî zimanê zêdepar; fermî, xayî-statû, teşwîqkirî, zimanê kargerî, perwerde û bazarê ye. Zimanên din ên ku li Tirkiyeyê tene axaftin jî, ji destpêka komarê heta salên dawî yên ss. 20an merûzî înkâr, îmha û asîmîlasyonê bûn.

Bi qasî ku Çîçek (2013: 4-14) diguhêze piştî ku zimanê tirkî di sala 1876an bi Qanûna Esasî bû zimanê dewletê û yê perwerdeya serekî û mecbûrî, zimanê kurdî di perwerdehiyê de hate derbendkirin, di deshîlata Îttihad û Terakkiyê de ev derbendî û

asîmîlasyona kurdan wekî siyaseteke esasî hate qebûlkin. Herwiha di serdema Komarê de jî bi plana Islahata Şerqê (1925), Rapora Seyahat a li Rojhilat a Înonu (1935), Rapora Rojhilat a piştî Derbeya 1960î û Qanûna Bingeh a 1982an ev siyaseta fermî ya dewletê ya asîmîlasyona kurdan û derbendkirina kurdî berdewam kir.

Li aliyekî din Hassanpour (2005: 229) û hin zanyarên din, siyaseta Tirkîyeyê ya fermî ya têkilî zimanê kurdî wekî *linguicide/linguistic jenocide* (birandina ziman) îfade dikin ku hin pratîkên vê siyasetê jî pêşkeş dikin. Lê li gorî Arslan (2015: 7) polîtîkayên pêşgirtinê teşebusa jinavbirina kurdî kiribin jî ew(linguicide) bi temamî pêk nehatiye. Terma teknîkî ya *linguistic genocide/linguicide* tê wê maneyê ku; zimanek bi temamî tê derbendkirin wisa ku qisevanên wê êdî nikarin bi zimanê xwe bixwînin an jî binivîsin. Herwiha Arslan (2015: 15-17), ji Irvine û Gal (2000) têgeha ‘erasure/jêbirin’ û ji Skutnab-Kangas (2000) û Haig (2004) têgeha ‘invisibilisation /xwe nedîtîne danîn’ dide ber rewşa kurdî ya li Tirkîyeyê û li gorî wê hersê têgeh jî tesîreke negatîf li ser berdewama jiyana ziman dikin ku di rewşa kurdî de dikare raberî ser çêbe ka ew hemî çawa derketine û hev temam kirine.

Lê, navê wê her çî dibe bila be, siyaseta dij-kurdî, derbendiya ser zimanê kurdî; xwendin, nivîsandin, weşangerî û heta axaftin, guherandina navê gund û bajaran û ciyên cografîk vedigre. Heta ev derbendî û siyaseta dij-kurdî tê radeyeke wisa ku çîrok û serhatiyên dilsoj ên derbarê kurdî li Tirkîyeyê vê siyasetê eşkere dikin.

Li aliyekî din digel vê siyaseta înkâr û îmhayê jî kurdî ji nav neçûye, gihîştîye îro ku di vê derbarê de Çîçek (2013: 15) behsa şeş kardayên girîng dike ku kurdî li jiyane hîştine û ew ji siyaseta zimankuj parastine, ew jî ev in: ‘Ekola Bedirxaniyan a li Sûrî, medreseyên kurdan, dengbêj û muzîk, Radyoya Yêrewan û Bexdayê, weşangeriya kurdî ya navbera 1960-1980yan û dîyasporaya kurd li Ewropayê piştî salên 1980yan.’

Ev siyaset û plansaziya ser zimanên kêmeparan bi giştî, ser kurdî bi taybetî, tesîr li hizr û helwestên hewlatiyên Tirkîyeyê kiriye hem li yên tirk hem jî yên ne-tirk.

Piştî van agahiyên derbarê siyaset û plansaziya ziman bi giştî, ya li Tirkîyeyê bi taybetî, em dikarin bêjin li ser dên, qenaet û helwestên însanan ên derbarê ziman/zimanan de tesîr çêbûye ku li Tirkîyeyê derbarê zimanên kêmepar de piranî

helwesteke nerênî heye; ‘fermîkirina wan an jî perwerdeya wan a bi şertên zimanê tirkî, wekî perçebûna welat û millet tê dîtin’. Di van demên dawîn bi xêra ‘pêşvekirina demokratîk’ û ‘prosesa çareseriyê’ siyaseta ziman a dewletê nîsbeten guherîbe jî ku niha weşanên Tvyan, Enstîtuyên Zimanên Jîndar, beşên ziman û edebiyatê li çend zanîgehan û dersên bijartî li mekteban ji polên 5 heta 8an²⁷ bi zimanên kêmpar tê sepandin lê ji sala 2015an pêda ev gavên erênî wekî xwe man û dewama wan nehatin ku dihat payîn bi awayekî qanûnî ew ziman xusûsen jî kurdî bihata naskirin.

1.15. Helwesta Kurdan a Têkilî Zimanê Wan

Di hin beşên berê de me di derbarê helwesta ziman, ast û sedemên wê û têkilî rewşa kurdan, helwesta wan a pêşberî ziman bi kurtasî hin tesbît û nêrîn pêşkeş kirin. Li Tirkiyeyê dema em li dên, qenaet û helwesta kurdan a li pêşberî zimanê wan dinêrin em dikarin bêjin rewş ne zêde cuda ye ji civakên kêmpar ên derên din ên cîhanê. Serhatiya kurdan û ya zimanê wan di sedsala dawî ya dîroka Tirkiyeyê de hîştîye ku kurd pîranî bibin pêgirtiyê sîstema burokratîk û ya perwerdeya fermî û ji bilî xebat û têkoşînên takekesî û ya tevgera kurd, pîraniya kurdan derbarê kurdî de merî dikare bêje ne xwedî helwest û şîûra ziman a têr in.

Di derbarê zimanê xwe de kurdan eger bi rahêjeke şexsî yan komî, bi jidilî yan bi telkîn û teşwîqê agahî nestandibin mumkîn dibe ku ew bibin xwedî helwesteke nerênî ku dikarin kurdî wekî zimanekî kêmpar, netê, nepêşketî, nezanistî û nebajêrî bibînin.

Piştî ku li tevayîya Tirkiyeyê perwerdeya fermî berbelav dibe û li Kurdistanê jî ev saziyên perwerdeyê belav dibin, bi taybetî jî; serî de wekî mektebên şevê (YİBO)²⁸ paşê jî yên din, kurdî hêdî hêdî ji jiyana akademîk a xwendevanan vedikşe û di pisîkolojiya xwendevanan û di hizir û helwesta wan de guherîn çêdibin di derbarê

²⁷ Serê pêşî dersên bijartî yên zimanên kêmpar ji pola 5em heta pola 12em hate plankirin lê di rewşa niha de ev ders hêj neketine nav dersên lîseyê.

²⁸ Yatılı İlköğretim Bölge Okulu/Mekteba Seretayî ya Şevîn a Herêmî

zimanê wan de. Di xebata DÎSA²⁹ yê ya Kula Ziman de (Coşkun, Derince & Uçarlar, 2010: 78-87) di derbarê psîkolojiya zarokan de ên tûşî zimanê tirkî bûne û ji zimanê xwe yê serî mehrûm mane tesbîten girîng hatine kirin. Di vê xebatê de pirsiyarên ku zarokên kurdan pêre rû bi rû mane wiha rêz bûne:

- Pirsiyara danûstandinê ya navbera zarok û mamosteyên wan; ku zarok ji ber di zimanê biyanî de ne têr in ew nikarin şiyar û kesayetiya xwe ya rastîn nîşanî mamosteyan bidin û mamoste jî pirî caran wan qels, ne şareza û ne jîr dibînin.
- Xwe derengmayî dîtin. Li gorî zarokên bi zimanê xwe yê serî perwerdeyê dibînin ev zarok xwe mexlûb û bi dezavantaj hîs dikin.
- Hin zarokên ku bi tirkî nizanin an jî pir hindik dizanin, dereng dest bi xwendin û nivîsandinê dikin û dema ku salek derbas dibe hê nû herfan nas dikin; bi vî awayî, nikarin xwendin û nivîsandina xwe pêş ve bibin û ji ber van sedeman jî polê naqedînin. Ev zarokên ku polê naqedînin û tirkî jî hîn nabin dev ji mektebê berdidin.
- Etîketlêdan. Dema zarokên bi israr kurdî diaxivin li derdora xwe bi navên siyasî tînen mohrkirin.
- Şiddet. Zarokên kurd ên ku qet bi tirkî nizanin an jî hindikî bi tirkî dizanin, dema dest bi dibistanê dikin, ji ber ku ji mamosteyên xwe fêhmakin tûşî şiddetê dibin çî ya devkî û çî ya fîzîkî be.
- Huşbûn û li benda zengilê man. Zarokên ku tirkî nizanin mecbûrî huş dibin û di dersê de aciz dibin. Ji bo ku bi hev re biaxivin li benda zengilê dimînin. Ev huşbûna wan a li mektebê tesîrê karakterê wan jî dîke û wan pasîfîze dîke.
- Muxbîrî. Di salên destpêkê yê dibistanê de, zarok, ji bo ku bi kurdî nepeyivin ji aliyê mamosteyên xwe ve tînen îkazkirin; bi alîkariya xwendekarên din, xwendekarên ku bi kurdî dipeyivin bi riya *muxbîrî*,

²⁹ Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştırmalar Enstitüsü/Enstituya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî.

îspîyonkarî û sîxuriyê tên tesbîtîkirin û cezayên cihê li xwendekarên ku bi kurdî dipeyivin tên birrîn.

- Zarokên ji gund û bajarên. Ji ber ku zarokên ji gundan li gorî yê bajêrî tirkî kêrmanî dizanin hevalê wan ên baş tirkî dizanin henekên xwe bi wan dikan.
- Mamosteyên kurdîzan û yê kurdînezan. Zarok li ba mamosteyên kurdîzan bêtir rihetin û ew baştir ji hev fêmdikan.
- Rola dê û bavên. Ji ber ku zarok hînî tirkî dibin û tirkîya dê û bavê wan jî ne baş e tirkîya wan a derbarê perwerdeyê de qels dibe. Bi taybetî jî dê û bav dema nikarin alîkariya spartekên zarokan bikin, eleqeya wan a bi xwendina zarokan û mekteba wan re jî kêrmanî dibe.
- Cihguhertina zimanan. Ji ber perwerdeya bi zimanê tirkî û nebûna kurdî êdî tirkî dibe zimanê pêwendiyê yê xwendevanan ku ew ji rabirdûya xwe qut dibin.

Ev maddeyên ku li jorê rêz bûn rewşa psîkolojiya zarokên kurd û guherîna nêrîna û helwesta wan a derbarê ziman de bi awayekî eşkere nîşan dide. Tabî ji bo merî helwesta kurdan a tirkî zimanê wan bipêve divê zêdetir lêkolîn bînin kirin û sînorên nifûs û nîmûneyên lêkolînê ji bajêr û herêmekê der be. Herwiha ne tenê kurdî, çunkî vê gavê xwendarên kurdî li gorî nifûsê hindik e, bi tirkî jî divê xebatên sehayî ên li ser anket û hevpeyvînan bînin sepandin da ku em derbarê helwesta wan de encamên rasttir bi dest bixin.

Îja di rewşa kurdan de, bi taybetî jî yê ne xwedî helwesteke zimanê xwe ne, li hemberî kurdî qelsdîtin, kêrmanî dikare çêbe ji ber zexta fermî ya zimanê tirkî. Bi qasî ku em ji îfadeyên mamosteyan û hin bûyerên devdorê hîn dibin; hin dêwbavan ji ber tirsê, zarokên xwe hînî kurdî nekiribin jî, hinekan wisa hizir kirine ku kurdî tîra zanîna û teknîkê nake, loma divê zarokên wan tirkî hîn bin, serbarî ser; eger zarokên wan kurdî hîn bin ew ê tirkîya wan qels be, di dersên xwe de ew ê ne ser kevin û dê bîmînine paş. Li aliyekî din, di hin kurdan de beramberî tirkî helwesteke wisa çêbûye ku ew tirkî wekî bajêrî, nerm û nazik, gihîştî û pêşketî dibînin ku li bajarên mezin

xusûsî jî di sehayên gel û yên fermî de bikaranîna tirkî bi nisbeteke zêdetir heye, dibe ku ev ji ber vê qenaet û helwestê be.

Divê em vê jî bêjin ku li gorî rewş û hewayaya siyasî ya welêt û helwesta însanan a derbarê tiştan de dikare biguhere. Bo nimûne, helwesta têkilî ziman û zimanê dayîkê berî prosesa aştiyê û di hingama wê prosesê de em dikarin bêjin ne wekî hev e ku em vê ji çapemeniyê, ji devê siyasetmedar û akademîsyenan, ji bazarê, ji milaqtên kolanan û ji axaftinên kolanan hîn dibin. Hêj em dikarin bêjin piştî ku beşên kurdî li çend zanîngehan vebûn û dersên bijartî yên li mekteban hatine dan li Tirkiyeyê digel weşana TRT Kurdî ya televîzyon û radyoyê bi nisbet guherî ber-alî erênîyê. Herwiha naskirina kurdên dinyayê û îmkanên ber wan û ji ber pêşketina teknolojiyê û bikaranîna kurdî di hacetên teknîk de mumkîn e ku helwesta hin kurdan a nerênî ya raber zimanê wan erênî kiribe.

Di vê xebata xwe ya ku rastî dawîya prosesa aştiyê hatiye de, me armanc kir ku em helwesta kurdan a raber zimanê wan hîn bibin di rewşa pêwendiya bi însanên din re di navenda bajêr, di sehayên gelwarî de. Ji bo vê jî me navenda bajarê Wanê wekî nifûsa lêkolîna xwe û kurdîzanên bajêr jî -yên xwendar- wekî nimûne bijartin. Di herdu lêkolînên xwe yên kantîtatîv û kalîtatîv de jî me armanc kir ku em bizanin ka di rewşa pêwendiya kurdîzanan a digel kesên din, tercîha wan a ziman de helwesta wan bi çi şêweyî kartêker e? Li gorî hin xusûsiyetên wan ên wekî temen, zayend, meslek û rewşa perwerdeyê ferqeke watedar heye? Herwiha gelo ew xwendina kurdî çawa hîn bûne û têkiliyek bi helwesta wan a tercîhkirina kurdî re heye? Dîsa gelo tercîh û xwedîderketina wan a kurdî de desteka rewşa siyasî, pêşketina aboriyê û xwedî prestîj bûn çiqas kartêker e? Li aliyekî din xebata me, vedikole ka kurdîzan di sehayên gel de ji herdu zimanên kurdî û tirkî bêtir kîjanî tercîh dikin, sebebên tercîha wan çi ne û bi kîjan zimanî bêtir xwe rihet hîs dikin.

Ji bo ku em helwesta nimûneyên xwe fêhm bikin em ê di bêşên pêrava encamên lêkolînên xwe pêşkeş bikin û encamên wan parevekin.

BEŞA II

2. Lêkolîna Kantîtatîv/Çendar

Lêkolîna kantîtatîv di xebatên zanistî de yek ji girîngtirîn lêkolînan e ku di gelek biwarên zanistî de tê sepandin. Punch (2005: 6), ev cure lêkolîn wekî; ‘lêkolîna ku daneyên wê jimarî ne’ pênase kiriye. Bi terîfeke din; ‘ji bo ku teoriyekê test bike, bi pîvandînen jimarî û teknîkên îstatîstîkî, lêkolîna rewşeke problem a ku analîza wê dibe îfade dike (Yeşil, 2013: 52 -ji Dobbin û Gatowski, 1999).

Lêkolîna kantîtatîv ew nêzîkbûn e ku têkiliyên nav guherbaran vedikole bo testkirina teoriyên objektîv. Ev guherbar, bi rêzê, bi awayekî tîpîk li ser enstrumanan dikarin bêne pîvandin, bi vî awayî daneyên ku têne jimarekirin bi bikaranîna prosedurên îstatîstîkî têne analîzkirin (Creswell, 2014: 32).

Xebatên kantîtatîv di lêkolînen sehayî de girîng in û bi wan, daneyên îstatîstîkî bi dest dikevin ku dihêlin meriv derbarê hin xusûsiyetên nimûneyan yên ku dikarin bêne pîvandin de bigihije encaman. Teza me ji bo ku dixwaze helwesta kurdîzanan hîn bibe li gorî hin guherbaran ku di binbeşên pêrava me ew parve kirine, di vê beşa teza xwe de em ê lêkolîna xwe ya kantîtatîv pêşkeş bikin.

2.1. Metodolojî

Xebata me li ser tegerîna sehayî, bi teknîka nimûnedanê ya îhtimalî û teknîka berhevkirina daneyan pirsname/anketê saz bûye, loma em ê di vê beşê de piştî nîşandana pirsên hîpoteza xwe, xebata xwe ya pîlot digel agahiyên wê û xebata serekî digel encamên pîvaneka xwe pêşkeş bikin. Serî de em ê pîvaneka xwe bidine nasîn, paşê encamên bi dest ketî yên têbarî û pêbaweriya pîvaneka xwe nîşan bidin. Dûre, guherbarên pîvanekê yên wekî zayend, temen, perwerde, kar û şeweya hînbûna zimanê kurdî ya kurdîzanan, tesîra rewşa siyasî, tesîra aborî û ya prestîjê li ser tercihkirina ziman a kurdîzanan têkilî helwesta wan parve bikin.

Berî ku em lêkolîna xwe bisepînin wekî ku serê xebata xwe de jî me nîşan kiribû di lêkolîna xwe de hîpoteza me ev bû: “Di terciha ziman de hokarên psîkolojîk û sosyal girîng in.” Îja ji bo ku em hîpoteza xwe test bikin me hin pirsên lêkolînê amade kirin û em li bersivên wan geriyan. Ew wekî li jêr in:

1. Di helwesta kurdîzanan a li hemberî zimanê wan ê pêwendiyê de li gorî zayenda wan, ferqeke watedar heye?

2. Di helwesta kurdîzanan a li hemberî zimanê wan ê pêwendiyê de
 - a. Li gorî rewşa perwerdeya wan ferqeke watedar heye?
 - b. Li gorî kar/meslekên wan ferqeke watedar heye?
 - c. Li gorî temenê wan ferqeke watedar heye?
 3. Ferqeke watedar a helwesta kurdîzanan heye li gorî şêweya hînbûna xwendin û nivîsandina wan a kurdî?
 4. Gelo rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî ev ê tesîreke çawa li ser helwesta kurdîzanan bike?
 5. Eger aboriya kurdîzanan bi kurdî ew ê baş be, ew ê tesîreke çawa li helwesta wan bike?
 6. Eger prestîja kurdîzanan bi bikaranîna kurdî zêde bibe ew ê tesîreke çawa helwesta wan a têkilî zimanê wan bike?
- Îja li gorî van pirsan em ê li jêr herdu xebatên xwe analîz bikin û encamên wan parevekin.

Di lêkolîna xwe de me wekî teknîka berhevkirina daneyan teknîka pirsname/anketê bi kar anî ku xebatên têgerîna sehayî de yên ku qeneet, helwest, dên û bîrûraya kesan dipirsin yek ji teknîkên herî zêde bi kar tê jî anket e.

Li gorî Thomas (1998) anket materyalên lêkolînê ne yên ji pirsan pêk tînin ku bi wan pirsan teswîra şertê jiyana însanan, kiryarê wan, bawerî yan jî helwestên wan dertê (Büyüköztürk, 2005: 1).

Anket metodeke sistematîk a berhevkirina daneyan e. Di vê metodê de rêzeke pirsan ji însanan berê de diyarkirî tê pirsîn û dane wisa tînin wergirtin. Bi metoda anketê mumkîn dibe ku ji gelek mijarên cîyawaz dane bînin berhevkirin. Kiryarên însanan, performansa ji kar, asta zanîna wan, tercîh, helwest, bawerî, hest û ww. ji van tenê çendek in (Gh. ji Şahin 2013: 125).

2.1.1. Pîvaneka Helwestê

Ji bo ku em di xebata xwe ya kantîtatîv de bi kar bînin me wekî teknîka berhevkirina daneyan teknîka anketê bijart. Lê ji bo ku di lîteraturê de anketekê kurdî ya ku li lêkolîna me were bi dest neket, me berê xwe da lîteratura zimanên din û xebateke bi îngilîzî ya ku li sehayê Wanê hatiye sepandin me dît û me anketê û pîvaneka xwe li wê xebatê guncand.

Ev anket û pîvaneka wê ya ku Kasap (2015) bi kar aniye ji bo ku em jê îstifade bikin û kêrî me were, em ser xebitîn. Xebata ser anketa me wekî; ‘Anketa Helwesta Ziman a Kesane (AHZK)’ bi çend pêlikan hate pê. Ya yekem; wergerandina anketê ji îngilizî, duyem; diyarkirin û bijartina pirsan/maddeyan, sêyem; girtina fikra pisporên mijarê, çarem; sepandina xebata pîlot û ya pêncem jî tesbîtkirina têbarî û pêbaweriya anketê.

Di pêlika diyarkirina pirsên pîvanekê de pêşî me berê xwe da lîteraturê ya têkilî helwesta ziman, motîvasyonê ziman, şayîşa ziman, û hînbûna ziman, me hinek maddeyên anketê nivîsîn an jî hinekên wan guherand bi îlhama çendîn cure pîvanekên ziman ên lîteratura vê babetê. Piştî ku me pirsên anketê û maddeyên pîvanekê diyar kirin me berê xwe da dêna akademîsyenên kurdîzan ên vê babetê û li gorî pêşniyar û midaxeleyên wan me anketa xwe temam kir.

Ev anketa xebata me ya bi navê ‘Anketa Helwesta Ziman a Kesane’ ji du beşan pêk tê. Beşa yekem ji 15 pirsan digel binbeş an jî vebjêrkê wan pêk tê. Di vê beşê de pirsên agahiyên giştî; sal, zayend, aîdiyet, kar/meslek, rewşa perwerdeyê, hin agahiyên malbatî yê têkilî bikaranîna ziman û hin pirsên têkilî asta ziman û pirsên têkilî kurdî cî digirin. Di beşa duwem de jî pirsên pîvanekê yê têkilî helwesta ziman a nimûneyan cî digirin. Beşa duwem, yanî pîvaneka me ya ku ji 35 pirsan pêk dihat piştî ku me xiste SPSSê û analîz-faktora wê girt maddeyên ku nirxê wan kêm derketin me ew jê derxistin, bi vî awayî wekî şiklê dawî 31 maddeyên pîvanekê man û me ew wisa sepandin.

Li aliyekî din pîvaneka ku me di anketê bi kar anî pîvanekê Likert-tîp a pênc-vebjêrk bû ku vebjêrkên wê; BW (Bi temamî wisa ye), W (Wisa ye), NENA (Ne erê ne na), NW (Ne wisa ye) û QN (Qet ne wisa ye) bûn.

Me anketa xwe di xebata pîlot li ser 20 kesan, di xebata sereke jî li ser 316 kesan sepand.

2.1.2. Xebata Pîlot

Berî xebatên serekî xebatên pîlot, di heyama sepandina anketê de dihêle lêkolîner li pêş pirsiyaran baldar bin û ji ber vê, pêş-sepandin proseseke pir girîng e ji bo çespandina pêbawerî û têbariya encamên bidestketî yê ji testê (Kasap, 2015: 49 - ji Mertens, 1998). Me jî di vê xebata xwe de ji bo ku em kêmasiyên xwe bibînin,

bizanin ka pirsên anketê tèn fêmkirin an na û em bizanin ka kê-m-zêdeyên pirsên anketê çi ne me ev xebata pîlot sepand.

Di xebata xwe de rêbaza me wiha bû:

Pêşî me anketên xwe li komeke xwendevanên nas ên kurdîzan belav kirin. Nimûneyên me yên ku pirsên anketê bersivandin ji temen, kar û perwerdeyên cuda bûn û serhev 20 kes bûn. Ji van tenê kesek keç, nozde kesên mayî jî xort bûn. Piştî ku nimûneyên me anket tijî kirin û me anketên xwe girtin, me ferq kir ku hin pirsên anketê baş nayên fêmkirin û di hin pirsan de jî ji bo ku rewşa nimûne li pirsê nayê, ew pirsê nabersivîne. Herwiha me ferq kir ku ji bo em bikarin daneyên xwe li gorî zayendên bersivdaran analîz û rave bikin divê em di xebata xwe ya serekî de bigihijin jimareke têt a zayenda jin li gorî nisbeta mêran.

2.1.3. Xebata Serekî

Piştî ku me xebata pîlot saz kir û li gorî encamên wê hin guherîn di anketa xwe de kirin me lêkolîna xwe ya serekî li bajêr sepand. Wekî ku destpêkê de jî me behs kiribû ji bo ku xwendina kurdî di asta lîse û lîsansê li Wanê tune ne mumkîn bû em anketên xwe li saziyên perwerdeyê belav bikin. Loma ji bo girtina daneyan ji nimûneyan wekî metod me lêkolîna sehayî û teknîka **giloka berfê** bi kar anî. Giloka berfê (snowball sampling method) yek ji teknîkên berhevkirina daneyan ji nimûneyan e ku di hin rewşan de dema lêkolîner nikare bigihije nimûneyan an jî hemî nimûneyan, bi kar tîne. Baltacı (2018: 253) li ser vê tenîkê wiha diguhêze:

“Teknîka ‘Giloka Berfê’ yan jî ya ‘Zincîreyî’ ya nimûnegirtinê, dema xwegihandina yekeyên ji nifûsê zehmet e yan jî dema agahiyên derbarê nifûsê (mazinahî û kûrahiya agahiyê û ww.) kê dimîne ev teknîk bi kar tê. (Patton, 2005). Ev teknîk, berê xwe dide kesên ku ew ê jê daneyên pîrr werbigire û rewşên krîtîk ku dide dû van kes û rewşan û wisa xwe digihîne nifûsê. (Creswell, 2013). Lêkolînerê ku dixwaze nimûnegirtina giloka berfê bike, derbarê diyardeya ku ew lêdikole û pêre eleqedar e, ew hin pirsan dike ji kes û rewşên ku xwedî agahî ne yên ji nifûsê: ‘Derbarê vê mijarê de herî zêde agahiya kê heye? Divê pêşî ez bi kê re dest bi hevdtinê bikim?’ (Flick, 2014). Lêkolîner bi vî awayî ji însanan dipirse ka ew dikare bi kîjanên din re hevdtinê bike û wisa ew wan nimûneyan dibîne. Lêre xala girîng ew e ku beşdar, baweriya xwe bi lêkolîner bînin. (Grix, 2010).”

Îja me jî ji bo lêkolîna xwe ev teknîk guncaw dît û dema me xebata xwe seband me teknîka xwe wiha rê xist: Li Wanê kesên ku me ew nas dikirin, hin komeleyên ku berê wekî fermî dersa zimanê kurdî dabûn û xwendevanên xwe dinasîn, xwendevanên mastira beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya li Zanîngeha Yüzüncü Yıl û kesên bi zimanê kurdî re mijûl dibûn wekî xwendar an jî nivîskar nimûneyên me yê vê xebatê bûn. Çi bi rêya telefonê û çi jî rûbirû me destûra bersivandina anketan ji nimûneyan standin û derbarê anket û lêkolîna xwe de ew agahdar kirin. Paşê me anketên xwe belav kirin û hema maweya 6 mehan de me anketên xwe sebandin.

Anketên ku me ji bo xebata serekî li bajêr sebandin ji nimûneyên temen, kar û zayendên cuda tevayî 316 kes bûn û me agahiyên ku ji wan girtin me xiste SPSSê û analîza wan kir. Piştî analîza wan agahî û encamên jê derketin, em ê li jêr parve kin.

2.1.3.1. Pêbawerî û Têbarî

Pîvaneka helwesta ziman a ku me li ser 316 kesan seband, me xiste programa SPSSê û ji bilî şeş kesan -ku progamê daneyên wan şaş qebûl kir û me ew jê derxistin- nimûneyên me tevayî bûne 310 kesan û me analîzên xwe li ser wan kir. Ji bo ku em pêbaweriya pîvaneka xwe test bikin me testa KMO (Kaiser-Meyer-Olkin) çêkir ku ew testeke pîvandina pêbaweriya pîvanekê ye. Kaiser dibêje nirxê ji pîvanekê destketî nêzîk 1ê be mikemmel, di bin 0.60de jî ne meqbûl e (Büyüköztürk, 2006: 126). Îja ji testa me jî wekî encam .923 derket ku ew jî di lîteraturê de wekî nirxekî mikemmel tê qebûlkirin û wisa diçespîne ku pîvaneka me xwedî pêbaweriyê berz e.

Herwiha qatjimara pêbaweriyê ya Cronbach-alfa ku divê nirxekî navbera 0-1ê bide wekî .928 hate dîtin ku ev jî rêjeyeke berz a qatjimara pêbaweriyê tê qebûlkirin di lîteratûra vê biwarê de. Îja piştî testên pêbaweriyê me pîvanek û encamê daneyên xwe pêşkeşî pîsporekî mijarê kir û di encamê de pîvaneka me û daneyên bi dest ketî têbar hate dîtin.

Wekî encam ev pîvaneka helwestê ya ku me pêş xistiye ji aliyê têbarî û pêbaweriyê ve pîvanekêke durust e.

2.2. Analîza Teswîrî ya Daneyan

Di vê beşa xebata xwe em ê teswîra daneyên xwe pêşkeş bikin ku yê wekî bersivên pîsporekî lêkolîna me ya kantîtatîv in. Em ê pêşî tabloyên xwe pêşkeş bikin

paşê nîrxên bi dest me ketine û encama helwestên nimûneyên me yên têkilî guherbarên wekî zayend, kar, rewşa perwerdeyê, sal, şêweya hînbûna ziman, rewşa siyasî, aborî û hebûna prestîjê li ser helwesta nimûneyan pêşkeş bikin. Herwiha em ê ciyên têkil, bi testên ANOVAyê û T-Testê jî biçespînin ka cudahiyên di nav guherbar an jî vebjêrkan watedar in an nînin.

Tablo 2.1: Îstatistikên Teswîrî

	J	Herî kêr	Herî berz	Nîvtev	Daherizîna Std.
Tevayî	310	65,00	155,00	126,2903	19,67551
Jimara Têbar	310				

Tabloya yekem puanê sercem ê helwesta nimûneyên me diyar dike. Wekî ku ji tabloyê jî diyar dibe ji 310 kesê ku anket bersivandinê pûanê wan ên helwestê herî zêde 155.00 û herî hindik 65.00 derketiye û daherizîna standart 19,67551 e. Herwiha nîrxê nîvteva helwestê jî wekî 126.2903 derketiye. Ji bo ku pîvaneka me 31 pîrs in, eger nimûneyek her maddeyekê re pûanekî bide '31', du pûanan bide '62', sê pûanan bide '93', çar pûanan bide '124' û pênc pûanan bide '155' pûanî bi dest dixê. Îja em têkilî helwesta nimûneyên xwe dikarin; navbera pûanên '31-93' wekî helwesta nîzm û navbera pûanên '94-155' jî wekî helwesta berz bipejirînin. Îja wekî ji Tablo 2.1ê diyar dibe, nîrxê kêmtirîn ê helwesta nimûneyan 65,00 û yê berztirîn jî 155,00 derketiye. Li ser vê, eger em navbera 65-93 wekî helwesta nîzm û navbera 94-155 wekî helwesta berz bipejirînin, hingê nîvteva nimûneyên me wekî '126,2903' astekî berz ê helwesta wan a raber kurdî nîşan dide.

2.2.1. Zayend

Bersivdarê anketa me ji 310 kesan 220ê wan mêr 90ê wan jî jin in. Çendî nimûneyên jin kêr bin jî ji ber ku nifûsa me kurdîzanên Bajarê Wanê bûn û ji kurdîzanan rêjeya jinan ji ya mêran gelekî kêmtir bû ev rêje li gorî nifûsa me rêjeke berz e ji bo jimara jinan.

Tablo 2.2: Zayend

teveyî

Zayend	J	Nîvtev	Daherizîna Stdandart
Mêr	220	129,5636	18,36814
Jin	90	118,2889	20,55808

Dema em li pûanê helwesta wan dinêrin, wekî ji tabloyê tê kifşê, nîvteva puanê helwestê yê mêran 129,5636 û yê jinan jî 118,2889 derketiyê. Heman demê de daherizîna standart di mêran de 18,36814 di jinan de jî 20,55808 bi dest ketiye. Bi vê maneyê ji tabloyê diyar dibe ku di nav puanên zayendan de cudahiyeke heye û ji bo ku em bizanin ka ev cudahî watedar e yan na me T-test bi kar anî. T-test (T-test a bo Nimûneyên Netêkil/Independent Sample T-test) ji bo ku ferqa nîvtevên du nimûneyên netêkil bê zanîn ka ew watedar in an ne watedar in bi kar tê (Büyüköztürk, 2017: 39).

Tablo 2.3: T-Test a bo Nimûneyên Netêkil

	Testa Levene bo Wekheviya Varyansan		T-test bo Wekheviya Nîvtevan			
	F	Sig.	t	df	Sig. (2-tailed)	Ferqa Nîvtev
Varyans homojen bin	,393	,531	4,736	308	,000	11,27475
Varyans ne homojen bin			4,517	150,116	,000	11,27475

Di encama daneyên T-Testê; di navbera helwesta jin û mêran a derheq zimanê wan de ferqeke watedar derketiye. Wekî ji tabloyê jî diyar dibe, nîrxê watedariyê ,000 derketiye ku ev nîrx; Sig. (2-tailed)/watedarî (2-alî) dema varyans ne homojen bin tê hesabandin. Li gorî encama vê testê, asteke watedar a cudahiya helwestan derketiye.

Dema em derbarê helwesta ziman de li xebatên lîteraturê dinêrin li gorî zayendan em dibînin ku faktera zayendê di serkeftina ziman de xwedî tesîreke diyarker e. Xusûsen di serkeftina zimanê biyanî de xwendevanên keçik li pêş in. Ev ji bo helwestê jî wisa ne. Di xebatên Graham (1990), Keskin (2003), Selçuk (1997), Karahan (2007) û Özdemir (2008) tê dertê ku keçik ji kuran zêdetir xwedî helwesteke erênî ne ligel ziman (Kazazoğlu, 2011: 77). Li aliyekî din encamên dijber jî hene ku dane nîşan; mêr ji jinan zêdetir xwediyê helwesteke erênî ne lipêş zimanê xwe wekî xebata Kasap (2015) û ya Ladegaard (2000).

Dema em li encamên testa xwe dinêrin em dibînin ku helwesta mêran a raber zimanê wan ji ya jinan berztir e. Ji bo ku civaka kurdan ji civakên modern ên din bêtir girtî ye û hêj teze ev çend dehsal in ku perwerdeya berbelav ketiye nav jiyana kurdan nisbeta xwendin û nivîsandina jinan li gorî ya mêran kêmtir e hem di tirkî hem jî di zimanekî din ê biyanî de. Heçî kurdî ye merî dikare bêje di xwendin û nivîsandina kurdî de jî li sehaya Bakur rêjeya jinan ji ya mêran kêmtir e. Loma dema em encamê xebata xwe dinêrin em dikarin bêjin helwesta ziman a mêran a raber kurdî, dibe ku ji ber avantajê wan a xwegihandina kurdî be û li gorî jinan ew di demeke pêştir de rûbirûyî pirsiyarên zimanî mane. Herwiha sebebeke din jî mumkîn e ku mêrên kurdîzan vê gavê ji jinên kurdîzan bêtir xwedî têrariya ziman in û hakimî standartê ziman in.

Herçend di derbarê bikaranîna zimanê standart de li gorî lêkolînan jin ji mêran bêtir xwedî zimanê standart derdikevin û wî zimanî li gorî qaydeyên wî bi kar tînin Hickey (2007: 26) jî di rewşa kurdî de lêkolîna me çespandiye ku ev rewş di nav kurdîzan de bereks e. Ji bo ku lêkolîna me helwesta kurdîzan digere ku kurdîzan divê ji kurdî fêhm bikin û bikarin bixwînin, wisa têdertê ku nimûneyên me yê mêr li gorî jinan bêtir şiyawer in li ser zimanê xwe yê serî.

2.2.2. Kar

Wekî me berê jî behs kiribû nimûneyên anketa me kurdîzanên bajarê Wanê bûn û ji ber ku ew ne li ser hev bûn, yanî wekî xwendevanên qurs an polekê yan jî mamoste û karkerên saziyekê, loma me bi teknîka giloka berfê anketên xwe sepandin û ji ber wê jî ji kar û meslekên cuda û jimarên ji hev dûr derketin nimûneyên me. Li gorî encama îstatîstîkên meslekan ji tevayî 310 kesan; 136 kes mamoste, 100

xwendevan, 18 karmend, 18 karker, 6 xebatkarê tendurustiyê, 5 esnaf, 4 mela, 2 jî karsaz in. Ji bilî van kategoriyan ji nimûneyên me 15 kesan xwe wekî bêkar îfade kirine û 6 kesan jî wekî meslekekî din xwe îfade kirine.

Tablo 2.4: Kar

teyayî	J	Nîvtev	Daherizîna Standaard
Kar			
Mamoste	136	124,5074	20,49535
Karmend	18	130,6111	22,04578
Esnaf	5	135,0000	14,74788
Mela	4	128,2500	15,37043
Karsaz	2	126,0000	7,07107
Xwendevan	100	126,4100	18,24363
Karker	18	133,6667	18,55992
Xebatkarê tendurustiyê	6	121,3333	14,50057
Bêkar	15	124,6000	19,51849
Yê din	6	130,3333	32,86132
Sercem	310	126,2903	19,67551

Wekî ji tabloyê jî diyar dibe pûanên meslekan nêzî hev in. Dema em nîvteva pûanan dinêrin ê herî berz bi nirxê 135,0000 yê esnafan, yê herî nizm jî bi nirxê 121,3333 ê xebatkarên tendurustiyê derketiye. Îja ji bo ku em ferqa navbera wan binêrin em ê encama testa yek-faktor ANOVAYê (Analysis of Variance) binêrin ku ev test; ferqa nav nîvteva du yan jî zêdetir nimûneyên netêkil dinêre bê ka ferqa wê ji sifrê watedar e yan na (Büyüköztürk, 2017: 48). Li gorî vê testê eger nirxê (Sig.) li binê 0,05 be watedar e lê serra be hingê cudahiyeke watedar nîşan nade.

Tablo 2.5: ANOVA

	Sercemê		Nîvteva		
	Kareyan	df	Kareyan	F	Sig.
Navbera Grûpan	2432,394	9	270,266	,692	,716
Nava Grûpan	117189,477	300	390,632		
Sercem	119621,871	309			

Wekî ji tabloyê em dibînin nirxê Sig. li ser 0,05ê yanî ,716 derketiye ku ev jî nîşan dide di navbera helwestên kesan de li gorî meslekên wan tu ferqeke watedar nîne.

Li vê derê divê em bêjin ku xwendin û nivîsandina kurdî di nav hemî grûpên civakî herî zêde xwendevan (zêdetir zanîngeh) û mamostetiyê de dertê pêşiya me. Xwendevanên zanîngehê mumkîn e; ji bo ku rewşa zimanê xwe yê xirab ferq dikin û li gorî xwendevanên din bêtir xwedî şîûr in zimanê xwe hîn bin, ew zêdetir berê xwe didine hînbûna zimanê xwe. Ji bo mamostetiyê jî em dikarin bêjin meslekê herî zêde xwedî zimanê xwe dertê ew meslek e. Ji bo ku mamostetî wekî tebiî karê xwendin û nivîsandinê dihewîne herwiha meslekê hînkirin û perwerdeya ziman e. Mamosteyên kurd heye ku ji ber du sebebên xwedî li kurdî derikevin: Yek, ew zêdetir merûzî asîmîlasyonê dibin û di hingama xwendinê de, yan jî xwendevanên merûzî asîmîlasyonê dibin perwerde dikin ku ew bixwe jî tevê vî karê asîmîlasyonê dibin û ev jî dike ku ew wekî bertekekê nîşanî rewşa kurdî bidin û bêtir li kurdî xwedî derkevin. Dudu, ji ber ku mamostetî karê hînbûn û hînkirina ziman e mamoste bêtir rihet in û xwedî îmkan in ku zimanê xwe hîn bin an hîne kesên din bikin.

2.2.3. Perwerde

Ji 310 kesên nimûneyên xebata me li gorî perwerdeya wan 203 kesên wan lîsans qedandine, yê mayî jî; 60 jê mastir xwendine, 33 kes lîse, 12 kes xwendera navîn û 2 kesan jî xwendera seretayî qedandine. Lê me ew wekî du grûpan; 'xwendina bingehîn' (seretayî, navîn, lîse) û 'xwendina bala' (lîsans û mastir) kirine du kategoriyan. Li gorî vê, 46 kesan xwendina bingehîn dîtine û 264 kesan jî xwendina bala dîtine. Dema em li tabloya teswîrî ya daneyan dinêrin puanê helwesta beşdaran li gorî perwerdeya wan; xwendina bingehîn wekî 126,2391 û xwendina bala jî wekî 126,2992 derketiye ku hema bêje pûanê nivîstevî helwesta wan wekî hev derketiye.

Tablo 2.6: Perwerde

Perwerde	J	Nîvtev	Daherizîna Stdandard
Xwendina bingehîn	46	126,2391	21,31268
Xwendina bala	264	126,2992	19,41946

Ji bo watedariyê dema em li T-Testê dinêrin di navbera helwesta nimûneyan de wekî Sig. (2-tailed) ji nirxê ,05ê berztir derketiye ku ev jî ferqeke watedar nîşan nade.

Tablo 2.7: T-Test

Testa Levene bo Wekheviya Varyansan			T-test bo Wekheviya Nîvtevan			
	F	Sig.	t	df	Sig. (2-tailed)	Ferqa Nîvtevan
Varyans homojen bin	,275	,600	-,019	308	,985	-,06011
Varyans ne homojen bin			-,018	58,751	,986	-,06011

Dema em li tabloya 2.7. dinêrin em dibînin ku di navbera kategoriyan de belaviyeke yekser/wekhev nîne. Yanî ji xwendina bingehîn 46 nimûne, ji xwendina bala jî 264 nimûne hene. Îja dema di belavbûna nimûneyan de wekheviyek tunebe, em li T-testê de li qismê ‘dema varyans ne homojen bin’ dinêrin û li gorî testa ‘watedarî ya du alî’ yanî ‘Sig. (2-tailed)’ dinirxînin. Wekî li jorê jî me diyar kir, nirxê Sig. (2-tailed) ji nirxê ,05ê berztir derketiye ku ferqeke watedar nîşan nade. Divê em vê jî bêjin, eger em nifûsa xwe û şertên nimûneyên xwe binêrin ew ê têderkeve ku kurdîzanên mezûnên xwendina bala çima bêtir in ji mezûnên xwendina bingehîn. Ji bo ku mezûniyeta nimûneyên me ne ji mektebên kurdî/zimanê kurdî ye em ê di beşa sêyemîn a xebata xwe -xebata kalîtatîv- de li gorî rewşa perwerdeyê ya (ya fermî-kurdî) nimûneyan helwesta wan rave bikin.

Dîsa divê em bêjin, dema em li rewşa kurdîzanan dinêrin em dibînin ji bo ku hemiyana jî perwerdeya bingeh/serekî (ya ji mekteba seretayî heta lîseyê) bi kurdî

nedîtine, wan xwendin û nivîsandina kurdî her bi çî şêweyê be -ku binbeşa pêrava derbarê vê de ye- hîn bûne ku bi hezkirina xwe hîn bûne. Ji bo ku ji encama T-Testê ferqeke watedar derneketiye, em dikarin bêjin çî nimûneyên xwendina seretayî dîtîbin çî jî yê xwendina bala dîtîbin, ew di helwesta xwe ya raber zimanê xwe yê serî de xwedî heman helwestê ne.

2.2.4. Sal

Di anketa xwe de, me temenê nimûneyên xwe, wekî pênc kategorî diyar kirin. Ev kategorî wiha bûn: '16-25, 26-35, 36-45, 46-55 û 56-65'. Bi vê, me armanc kir ku em nimûneyên xwe li gorî deh salî (her grûpek wekî nîfşekê) wan raberî hev bikin û encamên wan binirxînin. Îja dema me pîvaneka xwe li ser nimûneyan sepand, ji bo ku ji 55 salî jortir tu kes tunebûn, sîstemê ew wekî çar kategorî nîşan kirin û wisa dane ber hev. Li gorî vê, dema em li tabloya xwe ya jêrîn dinêrin, ji nimûneyên me di kategoriya '16-25'an de 110 kes, di kategoriya '26-35'an de 116 kes, di kategoriya '36-45'an de 67 kes û di ya '46-55'an de jî 17 kes hene. Wextê em li pûanê wan ê helwesta wan a ziman dinêrin; li gorî tabloyê, grûpa nimûneyên '46-55' salî bi nirxê 129,8824 xwedî nîvteva herî berz e. Li aliyekî din grûpa '26-35' salî jî bi nirxê 124,7845 nîvteva herî kêr bi dest xistiye. Herwiha nirxê nîvtevê pûanê helwesta wan jî wekî ji tabloyê jî diyar dibe hema bêje wekî hev e.

Tablo 2.8: Temen

teyayî	J	Nîvtev	Daherizîna Standart
16-25	110	126,4727	18,90231
26-35	116	124,7845	21,28433
36-45	67	127,6866	19,20875
46-55	17	129,8824	15,02033
Sercem	310	126,2903	19,67551

Piştî ku me kategoriyên xwe li gorî nîvteva pûanê wan dane ber hev, ji bo ku em bizanin ka navbera grûpan de, di helwesta wan de, ferqeke watedar heye yan na me li testa ANOVAYê nihêrî û wekî encam tabloyeke wiha derkete pêşiya me:

Tablo 2.9: ANOVA

	Sercemê				
	Kareyan	df	Kareya Nîvtev	F	Sig.
Navbera Grûpan	616,658	3	205,553	,529	,663
Nava Grûpan	119005,213	306	388,906		
Sercem	119621,871	309			

Wekî ji tabloya jorê diyar dibe, di navbera grûpan de, nîrxê watedariyê ya helwesta wan wekî ,663 derketiye ku ew jî ferqeke watedar nîşan nade. Wate; hemû grûp jî di helwesta xwe ya raber ziman de nêzikî hev in. Li aliyekî din ji bo ku em ferqa navbera hersê kategoriyan binêrin em ê li tabloya ‘multiple comparison’ (berawirdiya geleyî) binêrin ku ev teknîk dihêle meriv berawirdên duwane bike di navbera nîvtevan de (Köklü, 2002: 30).

Tablo 2. 10. Berawirdiya Geleyî

teyayî				
(I) sal	(J) sal	Ferqa Nîvtevan (I-J)	Xetaya Standart	Sig.
16-25	26-35	1,68824	2,62453	,521
	36-45	-1,21384	3,05615	,692
	46-55	-3,40963	5,13929	,508
26-35	16-25	-1,68824	2,62453	,521
	36-45	-2,90208	3,02609	,338
	46-55	-5,09787	5,12147	,320
36-45	16-25	1,21384	3,05615	,692
	26-35	2,90208	3,02609	,338
	46-55	-2,19579	5,35550	,682
46-55	16-25	3,40963	5,13929	,508
	26-35	5,09787	5,12147	,320
	36-45	2,19579	5,35550	,682

Tablo 2.10 nîşan dide ku, dema em her grûpekê didine ber yên din, di navbera wan de ferqeke watedar a helwestê raber zimanê wan dernakeve, çunkî nirxên watedariyê hemû jî ji nirxê ,05 berztir derketine. Loma em dikarin bêjin helwestên van grûpan wekî hev in.

Temenê însan li ser helwestê wî kartêker e, lê li gorî zanyarên psîkolojiya civakî helwest di serdema zaroktiyê de ne diyar in. Li gorî Brown (2000) zarokên ku ne xwedî zêhneke gihiştî ne, ew ne xwedî helwesteke diyar in raber nijad, çand, grûpa etnîk, çîn û zimanan (Kazazoğlu 2011: 29).

Dema em li pênaseyên helwestê dinêrin em dibînin ku helwest rewşeke amadebûnê û ya bertekê ya kesan e raber heyberan ku ew jî em dikarin bêjin hem ji aliyê fîzîkî û hem jî ji aliyê hestiyarî û hişî ve binyadeke gihiştî dixwaze. Loma bi qasî ku zanyarên vê biwarê derbirrîne di temenên biçûk de însan zêdetir ji mezin û devdorê xwe tesîrê dibîne û helwesta wî wisa dişekile. Vê rewşê Kazazoğlu (2011: 29) ji Morgan (1995) wiha diguhêze: “Zarok dema tê serdema xwendinê, ew berpê kesan dibe xwedî hin helwestan. Van helwestan piranî dê-bav, hevsal û mezinên din hîn dikin çî bi zanebûn çî bi bêhemdî be. Zarok her ku mezin dibin rola dê û bavan a li ser helwesta wan kêmtir dibe û bi balixbûnê re rola hokarên civakî yên din zêdetir dibin. Helwesta kesan piranî di navbera salên 12-30an de şiklê dawî dibîne û paşê pir kêmtir diguhere. Ev serdema salên 12-30an a ku helwest têde kirîstalîze dibin wekî *serdema krîtîk* bi nav bûye. Di dirêjîya vê serdemê sê hokar xwedî rol in li ser çêbûna helwestan; tesîra hevsalan, amûrên ragihandina girseyî û agahî û perwerdeya ji jêderên din.”

Îja eger em werin ser xebata xwe; ji bo ku temenê nimûneyên me binî 16 ye, ew temen tê serdema lîseyê û merî dikare bêje ji bo xwendin û zanebûna kurdî serdemeke guncaw e. Dîsa têkilî vê grûpê, temenên ji 18-19 salî heta 25an wekî serdema lîsansê tê zanîn. Piştî vê serdemê, her sê grûpên din jî ligel vê grûpê helwestên nêzîk raber zimanê xwe nîşan kirine ku ji daneyan diyar dibe kurdîzanên 16 salî û 55 salî xwedî heman helwestê ne raber zimanê xwe yê serî.

2.2.5. Şêweya Hînbûna Ziman

Di pîvaneka me de pirseke me jî şêweya hînbûna ziman a kurdîzanan dipirsî ku bi wê me armanc kir em bizanin ka gelo li gorî hînbûna xwendin û nivîsandina kurdî ya kurdîzanan raber helwesta wan têkiliyeke çawa heye.

Îja dema em li hersê vebjêrkên pirsê xwe dinêrin em dibînin pirsê; ‘Tu xwendin û nivîsandina kurdî çawa hîn bûyî’ jî 310 kesan 158an wekî ‘ji malê/malbatê’, 54 kesan wekî ‘ji qursê/mektebê’ û 98 kesan jî wekî ‘bi keda xwe’ bersivandine. Dema em pûanên li tabloyê dinêrin em dibînin ku helwesta hersê vebjêrkan jî berz derketiye lê pûanê helwesta kurdîzanên kurdî ‘bi keda xwe hîn bûne’ wekî; ‘131,1633’, yên kurdî bi rêya ‘qursê/mektebê’ hîn bûne wekî; ‘127,2963’ û yên kurdî ji ‘mal/malbatê’ hîn bûne jî wekî; ‘122,9241’ derketiye. Li gorî vê agahiyê, kurdîzanên ku kurdî bi keda xwe hîn bûne, pûanê wan ê nîvtev berztir e.

Tablo 2.11: Şêweya Hînbûna Ziman

tevayî	J	Nîvtev	Daherizîna Stdandart
Mal/malbat	158	122,9241	20,01736
Qurs/mekteb	54	127,2963	19,51935
Bi keda xwe	98	131,1633	18,26139
Sercem	310	126,2903	19,67551

Îja wekî yê berê dema em berê xwe didine testa ANOVAYê ji bo ferqa navbera helwesta hersê bersivan, tabloyeke wiha dertê pêşiya me:

Tablo 2.12: ANOVA

	Sercemê				
	Kareyan	df	Kareya Nîvtev	F	Sig.
Navbera Grûpan	4172,135	2	2086,068	5,547	,004
Nava Grûpan	115449,736	307	376,058		
Sercem	119621,871	309			

Ji tabloyê jî diyar dibe ku nirxê watedariyê wekî ,004 e û ev jî dide nîşan ku ferqeke watedar heye. Eger em hersê grûpan bidine ber hev bi rêya berawirdiya geleyî encameke wiha dertê:

Tablo 2.13: Berawirdiya Geleyî

teveyî		Ferqa Nîvtev	Xetaya	
(I) şêweya hînbûna ziman	(J) şêweya hînbûna ziman	(I-J)	Standart	Sig.
Mal/malbat	qurs/mekteb	-4,37225	3,05682	,461
	bi keda xwe	-8,23921 [*]	2,49348	,003
Qurs/mekteb	mal/malbat	4,37225	3,05682	,461
	bi keda xwe	-3,86697	3,28654	,721
Bi keda xwe	mal/malbat	8,23921 [*]	2,49348	,003
	qurs/mekteb	3,86697	3,28654	,721

Li gorî tabloya jorê di navbera kesên kurdî ji mal/malbatê hîn bûne û yên bi keda xwe hînbûne de ferqeke watedar heye, bi nirxê 'sig. ,003'. Lê di navbera vebjêrkên din de ferqeke watedar xuya nake. Wekî ku ji tabloyê diyar dike nimûneyên me kurdî herî zêde ji malbatê hîn bûne û paşê jî bi keda xwe. Lêre merî dikare wiha rave bike ku kesên ji mal û malbatê xwendin û nivîsandina kurdî hîn bûne xwedî şîura zimanî ne û ji malbata xwe destêk girtine ji bo parastin û pêşxistina zimanê xwe. Wekî wê; kesên bi keda xwe zimanê xwe hîn bûne jî merî dikare bêje qîmeteke mezin dane parastin û geşkirina zimanê xwe ku van hokaran kiriye ku helwesta zimanê wan berztir be.

Hînbûna zimanekî ya bi ked û rahêja xwe, merî dikare di çarçoveya hin teorî û modelên bingeh ên matîvasyonê hînbûna ziman (language learning motivation) ên wekî; *modela perwerdeya civakî*, *teoriya xwe-diyarkirinê*, *teoriyên armancê* û *teoriya lêbarkirinê* rave bike.

Gardner (1985) motîvasyonê ziman wekî kombînasyonê rahêjan a daxwaza serketina armanca hînbûna ziman û helwestên erênî yên lipêş ziman bi nav dike. Ew behsa du cure motîvasyonan dike; ya *tewawker* û ya *amrazî*. Di motîvasyonê tewawker de hînxwaz dixwaze bi xwendevanê zimanê armanc re qene bikare pêwendiyê dayne yan jî tevê (asîmîle jî bibe) kesê endamê zimanê armanc be. Lê

motivasyona amrazî îşaretî sebebên bêtir fonksiyonel ên hînbûna ziman dike yê wekî ji bo dîtina karekî baştir, girtina mehaneyeke zêdetir, borîna ji azmûnê (Gh. Keblawî, PDF-r.5).

Ev tesbîtên Gardner bêtir derbarê zimanê biyanî de ye. Dema em sebebên hînbûna zimanê kurdî ya kurdan a ‘bi keda xwe’ dinêrin ew bêtir têkilî motîvasyona hundirîn (intrinsic motivation) e. Kesek eger bêyî sebebekî menfî, zimanekî, xusûsen jî zimanê xwe yê serî yan jî netewî hîn be merî dikare bêje ew xwedî motîvasyonê hundirîn e.

Li gorî Deci û Ryan (2000) ji dorwareke çavser/kontrolker zêdetir, dorwareke ku destekê dide xweseriyê rê ji encamên erênî û fêrbûneke bitesîr re vedike û bi vî awayî, motîvasyona hundirîn, xwe diyarkirinê û xwe-hebandinê zêde dike. Derbarê motîvasyona hînbûna ziman (learning language motivation), di lêkolînên liser xwe-diyarkirinê de, hatiye çespendin ku têkiliyê erênî ya motîvasyona hundirîn raber motîvasyona giştî, xwe têrayî, têrayîya xwendin û axaftinê ya piştî perwerdeyê heye (Ehrman, 1996 -ji Abubakari, 2016: 25).

2.2.6. Tesîra Rewşa Siyasî

Pirseke me ya anketê jî: ‘Rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî, ez ê di jiyana xwe de bêtir kurdî bi kar bînim.’ bû û wekî bersiv hersê vebjêrkên ‘erê’, ‘hinekî’ û ‘tişteke naguhere’ bûn. Dema em li bersivan dinêrin 243 kesên wekî ‘erê’, 43 kesên wekî ‘hinekî’ û 24 kesên jî wekî ‘tişteke naguhere’ ev pirs bersivandine.

Tablo 2.14: Rewşa Siyasî

tevayî	J	Nîvtev	Daherizîna Stdandard
Erê	243	128,4733	18,47676
Hinekî	43	114,9535	18,95729
Tişteke naguhere	24	124,5000	25,66507
Sercem	310	126,2903	19,67551

Wekî ji tabloyê diyar dibe ku helwesta bersivdaran ên ‘erê’ gotine wekî 128,4733 ên ‘hinekî’ bersivandine 114,9535 û yê ‘tişteke naguhere’ gotine jî wekî 124,5000 derketiye lê li gorî rêjeya wan a helwesta herî berz a vebjêrka ‘erê’ ye. Li

aliyekî din dema em li testa ANOVAYê û nirxê watedariyê dinêrin em dibînin ku ferqeke watedar bi dest dikeve.

Tablo 2.15. ANOVA

	Sercemê				
	Kareyan	Df	Kareya Nivtev	F	Sig.
Navbera Grûpan	6761,388	2	3380,694	9,196	,000
Nava Grûpan	112860,483	307	367,624		
Sercem	119621,871	309			

Îja wextê em li têkiliya bersivan dinêrin li gorî tabloya jêrê, di nav hersê bersivan de kesê ev pirs wekî ‘erê’ û ‘hinekî’ bersivandine bi pileyeke watedar helwesteke wan a erênî raber zimanê wan ê serî heye. Lê di bersiva tiştê naguhere de ligel vebjêrkên din ferqeke watedar nayê dîtin.

Tablo 2.16: Berawirdiya Geleyî

tevayî

(I) tesîra rewşa siyasî	(J) tesîra rewşa siyasî	Ferqa Nivtev (I-J)	Xetaya Standart	Sig.
Erê	hinekî	-10,21370 [*]	2,40143	,000
	tiştê naguhere	-2,85905	3,10579	1,000
Hinekî	erê	10,21370 [*]	2,40143	,000
	tiştê naguhere	7,35465	3,69847	,143
Tiştê naguhere	erê	2,85905	3,10579	1,000
	hinekî	-7,35465	3,69847	,143

Dema me dest bi vê xebata xwe kir û heta qedandina wê yanî sala 2019 rastî piştî rawestîna û dawîbûna prosesa aşitiyê hat. Di dema prosesa aşitiyê de li seranserê Tirkîyê û xusûsen li Kurdîstanê raber bikaranîna zimanê kurdî helwestek erênî hebû û berê kurdan berew hînbûn û bikaranîna kurdî de bû. Em vê agahiyê hem ji çapemeniyê, hem ji serlêdana dersên bijartî yên li xwenderan û hem ji tewecuha bo çûna qursên zimanê kurdî dizanin. Herwiha di sehayên gel û saziyên fermî de jî bikaranîna kurdî bi nisbet ji berî prosesa aşitiyê baştir û berztir bû.

Lê dema ev proses rawestiya û paşê bi dawî hat helwesta kurdan jî ne bi temamî be jî wekî dema prosesê nema ku em vê dîsa ji daneyên navborî dizanin. Ji bo xebata me jî ev pirs girîng bû ka gelo kurdîzan xwedî helwesteke çawa ne li gorî rewşa siyasî ya welat. Ya rastî ev xebata me du daneyên herdu deman (hingama prosesê û piştî wê) nade ber hev û qesta me jî jixwe ne guherîn an jî neguherîna helwesta kurdîzanan e. Jixwe em wê nagerin lê ya ku me xwest em bipîvin; ‘gelo kurdîzan desteka siyasî ji bo bi karanîna kurdî tiştê girîng dibînin yan na? bû. Îja ji bersivan jî diyar dibe kurdîzan pîranî desteka siyasî erênî dibînin ji bo bikaranîna zimanê wan.

Di lîteratura têkilî helwestê de siyaseta an jî tesîra siyaseta a li ser helwest û dêna însanan pîranî têkilî ‘kardayên ku tesîrê helwestê dikin’ derbas dibe, xusûsen di bin navê *propaganda* û *îqnayê* de. Çawa ku sektora kar bi rêya teşwîq û reklaman dixwazin derbarê berên xwe de tesîrê li mişteriyên bikin û helwesteke erênî çêkin, wisa jî siyaseta deshilatdarên bi rêya propagandayê dixwaze derbarê partiya xwe yan jî bîr û raya xwe de li ser gel tesîreke erênî çêke, gel îqna bike li ser rastbûna politikayên xwe û şaşiya dijberên xwe. Îja li Tirkiyeyê derbarê, kurdan û kurdî de ji bilî prosesa aşitiyê rewşeke ku kurdan hêjandibe yan jî pêşiya kurdî vekiribe hema bêje tune yan jî ewqas gelemper nebûye. Heta kurd jî di vê prosesê de wekî hewlatî - ne wekî gel û ne jî wekî netew- û kurdî jî wekî zimanekî zindî yan jî wekî dewlemendiyeke Tirkiyê qebûl bûye. Loma, dên û helwesta siyaseta serwer a Tirkiyeyê ku neynika gelê Tirkiyeyê ye, xusûsen jî yê tirk e -ji bo ku me nepîvaye em nikarin hikmekî vebirr derxin- em nebêjin nerênî ye jî em nikarin bêjin erênî ye. Her tişt li aliyekî, ya balkêş; kurdî, bikaranîna kurdî û taleba kurdî her wekî daxwazeke siyasî û îdeolojîk hatiye qebûlkirin ku pîrî caran raberî ser çêbûye.

Îja eger em werin ser xebata xwe, di vê xebata xwe de me xusûsen helwesta kurdîzanan mereq dikir ka gelo ew ji rewşa siyasî derbarê kurdî de destekê bibînin ew ê xwedî helwesteke çawa bin. Ji bersivdarê me para bêtir desteka rewşa siyasî girîng dîtine, mumkîn e ku merî dikare bêje eger siyaseta pêşiya kurdî veke, kurdî ew ê ji mohr û etîketa siyasî û îdeolojîk rizgar be û hingê kurd dê bêtir kurdî bi kar bînin. Li aliyekî din merî dikare herdu bersivên din jî wiha bixwîne; bersiva ‘hinekî’ zêde

giringiyê nade desteka siyasî û ‘tişteke naguhere’ jî, kurdîzan eger desteka siyasî hebe jî tunebe jî ew ê xwedî li kurdî derkevin, nîşan dîde.

2.2.7. Tesîra Aboriyê

Aborî yek ji girîngtirîn hokar e ku rêberiya jiyana însanan dike. Însan ji bo ku jiyaneke asûde û rihet bijîn ew daîm dixebitin û mesaiya xwe herî zêde ji bo aboriya xwe baştir bikin xerc dikin. Û dema dê karekî bikin eger aboriya kesên ew ê pê baş be, normale ku ew kes xwedî wî karî derkevin. Îja di xebata me de jî pirsêke me ya lêkolînê; ‘Eger rewşa min a aborî bi bikaranîna kurdî baştir be, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim’ bû û bersivên wan jî hersê bersivên; ‘erê’, ‘hinekî’ û ‘tişteke naguhere’ bûn. Li gorî bersivan; vê pirsê 220 kesên wekî ‘erê’, 31 kesên wekî ‘hinekî’ û 59 kesên jî wekî ‘tişteke naguhere’ bersivandine. Li aliyekî din dema em berê xwe didine pûanê helwesta vebjêrkan wekî; 128,8475 helwesta herî berz ya kurdîzanên ku pêşketina aboriyê girîng nabînin ji bo bikaranîna û xwedîderketina zimanê xwe dertê. Herwiha kurdîzanên ku bersiva ‘erê’ dane 127,3455 û yê bersiva ‘hinekî’ dane jî 113,9355 standine.

Tablo 2.17: Tesîra Aboriyê

tevayî	J	Nîvtev	Daherizîna Standaard
Erê	220	127,3455	18,21883
Hinekî	31	113,9355	23,50594
Tişteke naguhere	59	128,8475	20,75789
Sercem	310	126,2903	19,67551

Dema em li tabloya jêrê dinêrin di navbera bersivan de nirxekî wekî ,001 derketiye ku ev jî nîşan dide ku navbera wan de ferqeke watedar heye.

Tablo 2.18: ANOVA

	Sercemê Kareyan	df	Kareya Nîvtevan	F	Sig.
Navbera Grûpan	5362,627	2	2681,314	7,204	,001
Nava Grûpan	114259,244	307	372,180		
Sercem	119621,871	309			

Herwiha dema em wan kategoriyan/bersivan li gorî teknîka berawirdiya geleyî rûberî hev dikin, em dibînin ku di nav bersivên ‘erê’ û ‘hinekî’ de ferqeke watedar heye bi nirxê ,001 û navbera vebjêrkên ‘hinekî’ û ‘tişteke naguhere’ de ferqeke watedar heye bi nirxê ,002 lê di navbera ‘erê’ û ‘tişteke naguhere’ de ferqeke watedar tune ye.

Tablo 2.19: Berawirdiya Geleyî

teyayî		Ferqa Nîvtev		
(I) tesîra rewşa aborî	(J) tesîra rewşa aborî	(I-J)	Xetaya Standart	Sig.
Erê	hinekî	13,40997*	3,70102	,001
	tişteke naguhere	-1,50200	2,82840	1,000
Hinekî	erê	-13,40997*	3,70102	,001
	tişteke naguhere	-14,91197*	4,27948	,002
Tişteke naguhere	erê	1,50200	2,82840	1,000
	hinekî	14,91197*	4,27948	,002

Dema însan karekî bike û ji wî karî destkeftiyên maddî û manewî werbigre, ew ê bêtir xwedî li wî karî derkeve. Eger ji aliyê manewî ve fêdeya wî karî bigihêje hinek însan xwedî lê derdikevin lê hinek na, herwiha ji aliyê maddî ve fêdeya wî hebe lê fêdeya wê ya manewî tunebe dîsa hin kesî xwedî li wî karî dertên lê hin kes jî xwedî dernakevin. Îja îroroj berê sektora kar û deskeftiyên aborî zêdetir li gorî destkeftiyên maddî kar dijene. Dema em li tercîha ziman a xwendevanan dinêrin li seranserê dinyayê îngilizî lipêş e ku ev zêdetir ji ber hokarên aborî ne. Di Kanûna 2004an raporteke Konseya Brîtanî weşiya ku texmîna 2 milyar kesan dikir ku di nava deh salan de ew ê îngilizî hîn bin û heta 2050yan ew ê bibe 3 milyar qisevanên îngilizî li seranserê dinyayê. Ji bo hînbûna îngilizî jî motîvasyonê serekî ew ê berdewam aborî be (Wardaugh & Fuller, 2015: 389).

Îja di rewşa kurdî de dema em li bersivên nimûneyan dinêrin ku piraniya wan desteka aborî erênî dîtine, eger hebe ew ê bêtir xwedî li kurdî derkevin. Gelek rûdanên dinyaya îro çespendine ku însan dema di navbera aborî û nasnameyê de dimînin ew pîranî pêşî aboriya xwe difikirin ku ev jî ne diyardeyeke deraqil e. Ya îdeal ew e ku însan hem nirxên xwe biparêzin hem jî aborî û rewşa wan a sosyal baştir be. Loma divê merî encama ji testa navborî di vê çarçoveyê de qebûl bike.

Kurdîzan piranî dixwazin kurdî bi kar bînin û aboriya wan jî pê baştir be. Heçî bersiva ‘hinekî’ ye wekî; ‘aborî ji bo xwedîderketina min a li kurdî zêde ne girîng e’ û ‘tiştê naguhere’ jî wekî; ‘aboriya min pê baş jî be nebaş jî be ez ê xwedî li kurdî derkevim’, dikare bê xwendin.

2.2.8. Prestîj

Yek ji sebebên girîng jî yên berî merivan dide hînbûna zimanekî prestîj e. Zimanekî xwedî prestîj û statuyeke berz an jî li gorî rewş û şertên demê xwedî prestîjbûna zimanekî dike ku însan zêdetir wî zimanî tercîh bikin. Ji xebata Kasap (2015: 90-91) diyar dibe ku prestîja zimanekî kêmtir be şansê redkirina wî zimanî bêtir e di civakê de. Dema kesek hizir bike ku zimanê wî/ê ne hêjayî hînbûn an parastinê ye ew dibe kû wî red bike. Wekî wê, dema prestîja zimanekî berz be ew hurmetê dibîne, ne tenê ji aliyê qisevanên xwe ve, ew ji aliyê kesên bi zimanên xwecî diaxivin ve jî hurmetê dibîne... Bo nimûne Îngilîzî ji ber statû û prestîja xwe wekî zimanekî cihanî tê dîtin. Li Tirkiyeyê zimanê herî bi prestîj tirkî ye û belkî loma qisevanên zimanên xwecî yên din radihêjin wî zimanî hîn bin.

Di civakên kêmpar de wekî rastiyeke zanî ye ku zimanê zêdepar li gorî zimanê kêmpar xwedî prestîjeke berz e. Ev hem ji ber statuya wê hem jî ji ber pêkanîna îhtiyacan, pêwendî, reklam û teşwîqan e. Îja di rewşa kurdan de prestîja kurdî li gorî ya tirkî kêmtir e bi gelemperî. Û ev jî dike ku nisbeta kurdî bere bere kêmtir be. Dîsa di xebata xwe ya navborî de Kasap derdibirre ku eger însan zimanê xwe wekî kêmtir bizane mumkîn e ku ew bibe xwedî helwesteke nerênî û ev jî bike ku di zimanê wî de xirabûn/qelsbûn pêk were.

Lê di nav kurdîzan de, gelo li dor prestîjê helwesta wan bi çî şiklî ye ligel zimanê wan. Ji bo em bersiva vê bigirin me pirseke wiha da pêşiya nimûneyên xwe; ‘Eger bikaranîna kurdî prestîja min zêde bike, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.’ li nimûneyên xwe pirsî.

Dîsa, hersê vebjêrkên ‘erê’, ‘hinekî’ û ‘tişteke naguhere’ bersivên nimûneyên me bûn û ji encama bersivan ev tablo derket:

Tablo 2.20: Prestij

tevayî	J	Nîvtev	Daherizîna Stdandart
Erê	194	125,8247	18,47166
Hinekî	34	119,3824	22,98223
Tişteke naguhere	82	130,2561	20,30193
Sercem	310	126,2903	19,67551

Ji bersivdaran 194 kesan ev pirs wekî ‘erê’, 34an wekî ‘hinekî’ û 82 kesan jî wekî ‘tişteke naguhere’ bersivandine û ji wan nimûneyên ku pirs wekî ‘tişteke naguhere’ bersivandine bi pûanê 130,2561 helwesteke berztir nîşan dane raber kurdî. Ligel vê, kurdîzanên ku bersiva ‘erê’ dane vê pirsê 125,8247 û yê bersiva ‘hinekî’ dane jî 119,3824 bi dest xistine. Dema em li testa ANOVAYê dinêrin bê ka em bizanin di navbera grûpan de ferqeke watedar heye yan na, em dibînin test nirxê ,022 yanî ferqeke watedar nîşan dide.

Tablo2.21: ANOVA

	Sercemê				
	Kareyan	df	Kareya Nîvtev	F	Sig.
Navbera Grûpan	2954,178	2	1477,089	3,887	,022
Nava Grûpan	116667,693	307	380,025		
Sercem	119621,871	309			

Dîsa, dema em berê xwe didine ferqa navbera kategoriyan, ferqa di nav bersivên ‘hinekî’ û ‘tişteke naguhere’ de wekî ,020 ferqeke watedar derketiye, lê ligel vê; di nav bersivên din de ferqeke watedar bi dest neketiye.

Tablo 2.22: Berawirdiya Geleyî

tevayî		Ferqa Nîvtev	Xetaya	
(I) tesîra prestîjê	(J) tesîra prestîjê	(I-J)	Stdandard	Sig.
Erê	hinekî	6,44239	3,62438	,229
	tişteke naguhere	-4,43136	2,56775	,256
Hinekî	erê	-6,44239	3,62438	,229
	tişteke naguhere	-10,87374*	3,97639	,020
Tişteke naguhere	erê	4,43136	2,56775	,256
	hinekî	10,87374*	3,97639	,020

Hickey (2007: 26) têkiliya ziman û prestîjê wiha derdibirre; “ prestîja herî mezin a zimanekî ya standarda wî ye. Ew ji bo bikaranîna fermî, hînkirina li mektebê, bikaranîna li zanîngehê tê bijartin û dibe amrazê gerdûnî ya nivîsandinê. Hemî civakên rojavayî xwedî standardeke zimanê xwe yê fermî ne, wekî fransiya standard, îtalî, spanî, îngilîzî û yd.”

Îja di rewşa kurdî de çendî kurdî wekî zimanekî fermî hêj nebûbe xwedî statuyekê li Bakurê Kurdistanê, wî piranî standardeke xwendin û nivîsandinê girtiye. Lê li gorî Hickey ji bo prestîjê ne standard bûn lê fermî û statû girîng e ku kurdî ji vê bêpar e. Dema em vê rastiyê li rewşa kurdî digirin û digel encamên testa xwe rûberî hev dikin em dikarin bêjin; di hokarên ku berê kurdan didine kurdî de tesîra prestîjê kêmtir dixuyê. Lê li gorî rêjeya bersivan ew jimareke zêdetir prestîjê jî dixwazin di bikaranîna zimanê xwe de.

2.3. Raberî û Encam

Ev xebata me ya kantîtatîv a ku me li navenda bajarê Wanê li ser 310 kesan bi teknîka anketê sepand radihêje helwesta kurdîzanan bipêve bê ka têkiliyeke watedar bi zayend, meslek, rewşa perwerdeyê û temenê wan re heye yan na. Dîsa ew li gorî hînbûna zimanê wan ê serî yê kurdîzanan çawaniya helwesta wan digere, û hin

xusûsiyetên wekî desteka siyasî, başbûna aboriyê û zêdebûna prestîjê tesîreke çawa li ser helwesta kurdîzanan dike, lêdipirse.

Piştî ku me xebata xwe sepanê û daneyên xwe xiste sîstemê, pîvaneka ku me bi kar anî; ji testa KMO (Kaiser-Meyer-Olkin) encama ,923 deranî ku di lîteraturê de wekî nirxekî mikemmel e û diçespîne ku pîvaneka me xwedî pêbaweriyeke berz e. Herwiha qatjimara pêbaweriyê ya Cronbach-alfa jî wekî ,928 hate dîtin ku ev jî rêjeyeke berz a qatjimara pêbaweriyê tê qebûlîkirin di lîteratûra vê biwarê de. Herwiha me analîzên daneyên xwe li nîşanî pisporên mijarê dan û pîvaneka me û encamên wê têbar hate dîtin.

Piştî ku me têbarî û pêbaweriya pîvaneka xwe bi dest xist me daneyên xwe analîz kirin û digel testên pêdivî me ew rave kirin. Dema em li bersiva nimûneyên xwe yan jî encama daneyên xwe dinêrin em dibînin ji 310 kesên ku pîvaneka me bersivandine, puanê wan ên helwestê maksîmûm 155,00 û mînimûm 65,00 derketiye û nirxê nîvteva helwesta wan jî wekî 126,2903 derketiye ku ev jî wekî rêjeyeke berz a helwesta wan a ziman nîşan dide. Li aliyekî din li gorî zayendê di helwesta nimûneyan de ferqeke watedar heye ku zayenda mêr bêtir xwedî helwesteke berz in li gorî jinan. Ev jî li dijî pejra ‘xwedîderketina jinan a li ziman nîşan dide’ ku xebatên Spolsky (1998), Hickey (2007) û Holmes (2008) nîşan didin ku jin ji mêran bêtir xwedî standarda ziman derdikevin û ziman bêtir li gorî qaydeyê wî bi kar tînin. Li gorî encamên xebata me, merî dikare bêje mêrên kurdîzan ji ber têrariya ser kurdî û mijûliya pêre bûne xwedî helwesteke berz li gorî jinan.

Heçî li gorî meslek, rewşa perwerdeyê temenê kurdîzanan e ferqeke watedar di nav helwesta kurdîzanan de derneketiye ku em dikarin bêjin helwesta kurdîzanan li gorî karê wan, perwerdeya ku dîtine (ya tirkî) û temenê wan nêzî hev e. Divê em vê jî bêjin di vê xebata xwe ya kantîtatîv de me perwerdeya fermî pirs kir. Lê di beşa sêyemîn a tezê de me nimûneyên ku perwerdeya kurdî dîtine diyar kirin ku wê de têderket ew xwedî helwesteke berz in li gorî yên bê perwerdeya kurdî.

Li aliyekî din ev lêkolîn bersiva pirsê wekî; ‘Tu xwendin û nivîsandina kurdî çawa hîn bûyî?’ digere ku li gorî hersê bersivên wan ên ‘ji mal/malbatê’, ‘ji mekteb/qursê’ û ‘bi keda xwe’ têderket di navbera şeweya hînbûna zimanê wan û helwesta wan de tîkiliyeke watedar heye. Li gorî bersivan herî zêde kurdîzan

xwendina xwe ya kurdî ji malbata xwe hîn bûne. Dîsa me di anketa xwe de sê pirsên têkilî ‘rewşa siyasî’, ‘rewşa aborî’ û ‘prestîjê’ kirin ku ev hersê xusûsiyet girîng in li ser terciha ziman bi taybet di civakên kêmpar de. Pirsên me ev bûn: ‘Rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî, ez ê di jiyana xwe de bêtir kurdî bi kar bînim.’, ‘Eger rewşa min a aborî bi bikaranîna kurdî baştir be, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.’ û ‘Eger bikaranîna kurdî prestîja min zêde bike, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.’ Îja dema em encamên daneyan dinêrin di bersivên hersê pirsan de nimûneyan bersivên erê bêtir dane ku ev jî nîşan dide kurdîzan dixwazin rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî ku ew rewş xwestina statûyekê ye, û li gorî Fishman (1991) parastina zimanekî li dorwareke ku zimanê duwem raser e, pabendî hin xusûsiyetan e yên wekî; mektebên ziman, pirtûkxane, çapemeniya nivîsbar û dîtbar, cimaetên dînî, klûbên civakî, mixaze û xwaringehên etnîk. Dîsa ew dixwazin aboriya wan bi bikaranîna kurdî baştir be ku ew ê bêtir xwedî li kurdî derkevin, ev jî li fenomena ‘linguistic capital’ a Bordieu tê ku ew derdibirre; kesek dikare qîmetê bide zimanê xwe yan bêqîmet bizane li gorî kara ku jê dibîne. Eger ew hizra wê yekê dîkin ku ew ê bi awayekî fînanşal hin tiştan bi dest bixin an jî statûya wan dê geş be ew ê bi daxwaz û hewes hînî zimanê xwe bibin an ew ê zimanê xwe biparêzin Kasap (2015: 34-35). Herwiha ew zêdetir prestîjê re jî erê dibêjin ku eger bi bikaranîna zimanê wan ew ê bi dest bixin ku Hickey (2007) prestîja ziman zêdetir bi fermîbûn û statûya ziman ve girêdide. Yanî eger statûya kurdî hebe ew ê prestîja wê jî hebe.

BEŞA III

3. Lêkolîna Kalîtatîv/Çêbar

Yek ji rêbazên serekî yên lêkolînê, lêkolîna kalîtatîv e û di sehayê zanistên sosyal de, ew berbelav tê bikaranîn. Lêkolîna kalîtatîv ew lêkolîn e ku daneyên wê ne jimarî ne (Punch, 2005: 6). Bereksê analîza kantîtatîv ku ew piranî li ser îstatîstîkan e û ji lêkolîner xweser e, analîza kalîtatîv piranî girêdayî şiyana analîtîk û temamker a lêkolîner û zanîna şexsî ya lêkolîner a ser daneyan e ku ji kontekseke civakî berhev kiriye (Bhattacharjee, 2012: 113).

Di vê cureyê de lêkolîner bi teknîkên wekî raçavkirin, hevpeyvîn, analîza dokumentan lêkolînê dike û encamên lêkolînê rave dike. Wekî ku Punch (2005: 165), jî derdibirre, lêkolînên kalîtatîv; bi gelek rêbaz û jêderan, qeyd an jî vegêranên zarî û nivîskî yên têkilî tecrubeyên însanan vedikolin.

Lêkolîna kalîtatîv nêzîkbûnek e ji bo pirsiyareke însanî yan jî civakî ya ku kes an jî grûpan wateyek lêkirine keşf bike yan jî fêhm bike. Prosesa lêkolînê dihewîne; deranîna pirs û prosedûran, berhevkirina daneyan ji dorana beşdaran, ji temayên gelemper heta yên xweser bi awayekî enduktîv lêkirina analîza daneyan, û ravekirina daneyan ji hêla lêkolîner ve (Creswell, 2014: 32).

3.1. Metodolojî

Piştî ku me xebata xwe ya kantîtatîv sepanê û encamên wê rave kirin ji bo ku em xebata xwe dewlemend bikin û qismê kêmtir yê ji xebata kantîtatîv mayî temam bikin me xebata xwe ya kalîtatîv bi rê xist. Di vê lêkolîna xwe de me ji çend paradigmayên xebatên kalîtatîv ‘lêkolîna rewşê’ bijart û wekî teknîk jî teknîka hevpeyvînê/milaqat, ji wê jî me ‘hevpeyvîna nîvsazkirî’ bi kar anî.

Di vê xebata xwe ya kalîtatîv de wekî me di xebata xwe ya kantîtatîv de jî dîyar kir, hîpoteza me ev bû:

“Di tercîha ziman de hokarên psîkolojîk û sosyal girîng in.”

Berî ku em bi beşdarên xwe re hevpeyvînê bikin, me sê pirsên lêkolînê amade kirin ku ew wekî li jêr in:

1. Tercîha te ya axaftin an jî pêwendîdanîna piranî bi kîjan zimanî ye di sehayên gelwarî de (saziyên fermî, park, mekteb, nexweşxane, ND û ww.), çima?

2. Hokarên ku te bi kurdî yan jî tirkî didine axaftinê çi ne?

3. Tu bi kîjan zimanî rehet î dema tu daxivî, çima?

Piştî ku me pirsên xwe amade kirin ji bo ku em têbarî û pêbaweriya xebata xwe dabîn bikin me fikra sê pisporên mijarê wergirt. Pirsên lêkolîna me guncaw hat dîtin û me ew pirs wekî xebateke pîlot li ser sê kesan sepand û dengên wan qeyd kirin. Paşê me qeydên xwe deşîfre kirin û ji bo xebata xwe ya serekî me ew nirxandin. Me kêmasiyên xwe dîtin û tevdîrên xwe ji bo xebata serekî girtin.

Di xebata me ya serekî de jî wekî xebatên xwe yên din nifûsa me bajarê Wanê bû û nimûneyên me jî kurdîzanên bajêr bûn. Di vê lêkolîna kalîtatîv de me wekî nimûne ji kurdîzanên bajêr şazde kes bijartin û piştî destûrgirtinê me hevpeyvînên xwe kirin. Hevpeyvînên me teqrîben heta nîv saetî kişandin ji bo her kesekê û li gorî naveroka milaqatê hin ciyan me pirsên kurt li beşdarên xwe kirin. Di hevpeyvîna xwe de me qeydên dengên beşdaran girtin lê ji ber ku hin beşdaran nexwestin dengê wan bê qeydkirin, me ji wan re jî forma hevpeyvînê pêşkeş kir ku hinekan bixwe tijî kirin û hinekan jî gotin û me tijî kir. Herwiha ji beşdarên me yên helwest-berz qeydên xwe wekî kurdî lê yên helwest-nizm jî qeydên xwe wekî tirkî dan. Dûre me qeydên xwe deşîfre kirin û digel yên mayî ew nirxandin.

3.1.1. Sêwra/Dîzayna Lêkolînê

Lêkolîna kalîtatîv bi wateya mecazî wekî qumaşekî girîft e ku ji tayên ziraf gelek reng, tevnekên ciyawaz û malzemeyên cuda têkel e. Ev qumaş ne hêsan e bê jevderxistin. Wekî tevna qumaşî, faraziyên giştî û banên raveker dihêle lêkolîna kalîtatîv bi hev bisekine. Ji bo ku van çarçoveyan terîf bike, lêkolînerên çêbar termên wekî *binyadger*, *raveker*, *femînîst*, *postmodernîst* û yên wekî wan bi kar tînin. Di nav van faraziyan de û bi rêya van çarçoveyan paradîgmayên wekî; lêgerînên vebêjî, fenomenolojî, sazkirina teoriyê, etnografî û lêkolînên rewşê hene (Creswell, 2013: 42).

Di lêkolîna xwe ya kalîtatîv de wekî dîzayna lêkolînê me lêkolîna rewşê bijart. Lêkolîna rewşê rêbazeke lêkolînê ye ku ew, wekî bingeş xwe dispêre pirsên ‘çawa’ û ‘çima’ û dihêle bûyer an diyardeyeke ku lêkolîner nikare kontrol bike, bi hûrgilî bê analîzkirin (Yıldırım û Şimşek, 2016: 289).

Lêkolîna rewşê paradîgmayeke kalîtatîv e ku lêkolîner derbarê jiyana rasteqîn, sistemeke (rewşek) sînardar an jî sîstemên (rewşên) sînardarkirî yên pirhejmar ên di

demeke diyar de bi rêya jêderên agahiyan ên pirhejmar (bo nimûne çavdêrî, hevpeyvîn, materyalên dîtbar-bihîzbar, dokument û rapor) agahiyan berhev dike û pê teswîreke rewşê yan jî temayên rewşê tîne der (Creswell, 2013: 97).

Ji bo xebata xwe, me teknîka nimûnedanê ya mebestdar û di çarçoveya paradîgmaya kalîtatîv, ji bo amûra berhevkirina daneyan me formên hevpeyvîna nivsazkirî bi kar anî. Me sê pirs amade kirin û ji bo bibersivînê me ew pêşkeşî 16 kesan kirin ku heryekî re hevpeyvîna me di demeke cuda de pêk hat. Hevpeyvîna ku me qeyd kiribûn bi rêya analîza teswîrî me ew kod kirin û çend tema bi dest xistin. Bi analîza naverokê, di çarçoveya têgeh û temayên diyarkirî de me daneyên lêkolîne dane hev û ew rave kirin.

3.1.2. Beşdar

Me hevpeyvîna xwe ji bilî sê kesên ku me wekî ceribandîne hevpeyvîn pêra çêkirin, me bi 16 kesan re çêkir ku xêncî çend kesan ên ku xwestin hevpeyvîn bê nivsandin an jî formê bixwe tijî bikin, pîranî me qeydên dengên wan girtin û dûre ew deşîfre kirin. Me xebata xwe li ser 16 kesan sepand û me ew wekî du grûp ji hev cuda kir. Grûpa pêşî 8 kesên helwesta wan a kurdî berz, grûpa din jî 8 kesê helwesta wan nizm in. Me asta helwesta wan jî ji encama pirsname/anketa xebata xwe ya kantîtatîv girt. Her grûpek ji herdu zayendên jin û mêran pêk tê ku jimara wan wekî hev çar jin û çar mêr in. Li gorî asta zimanê wan ê kurdî jî; ji 8 beşdarên me yê helwest-berz 2 heb xwendevanê doktoraya kurdî, 4 heb mastira kurdî kirine/dikin û 2 kesên wan jî bi çûna qursê hînî xwendin û nivsandinê kurdî bûne. Ji 8ên helwest-nizm jî tenê kesek xwendarê kurdî ye lê yê din çendî bikarin kurdî biaxivin û metnên kurdî fêm bikin jî wan tu perwerdeyeke kurdî nedîtine. Beşdarên me li gorî temenên xwe navbera 22-53yan de ne û li gorî meslekên xwe jî; 2 hebên wan karmend, 2 xwendevan, kargerek, neccarek û yê mayî jî hemî mamoste ne.

Li aliyekî din, me beşdarê lêkolîna xwe wekî; Beşdar 1, Beşdar 2, ..., Beşdar16 bi nav kirin û ew wekî; B1, B2, ..., B16 kod kirin û li ser tabloyan li gorî îfadeyên wan ên hevpeyvînan ew bi wan kodan nîşan kirin.

Li gorî tabloya li jêr agahiyên beşdarên wekî; sal, kar/meslek, perwerdeya fermî û kurdî wisa ne:

Tablo 3.1: Agahiyên Têkilî Beşdarên

Beşdar	Zayend	Sal	Kar	Perwerdeya Fermî - Kurdî
B1	Mêr	38	Karmend	lîsans - qurs
B2	Mêr	53	Neccar	lîsans - mastir
B3	Mêr	32	Karmend	lîsans - doktora
B4	Mêr	40	Mamoste	lîsans - qurs
B5	Jin	38	Mamoste	lîsans - doktora
B6	Jin	22	Xwendevan	lîsans - mastir
B7	Jin	35	Mamoste	lîsans - mastir
B8	Jin	34	Mamoste	lîsans - mastir
B9	Mêr	39	Mamoste	lîsans - perwerde nîne
B10	Mêr	40	Karger	lîsans - perwerde nîne
B11	Mêr	38	Mamoste	lîsans - perwerde nîne
B12	Mêr	53	Mamoste	lîsans - perwerde nîne
B13	Jin	28	Mamoste	lîsans - perwerde nîne
B14	Jin	24	Xwendevan	lîsans - qurs
B15	Jin	26	Mamoste	lîsans - perwerde nîne
B16	Jin	27	Mamoste	lîsans - perwerde nîne

3.2. Analîza Daneyan

Ji bo ku temayên xebatê yê bingeha analîza xebatê bi xêra formên hevpeyvînê yê nîvsazkirî pêşda hatin diyarkirin, ji bo analîza daneyan rêbaza analîza teswîrî hate tercîhkirin. Di vê nêzîkbûnê de, ji bo ku eksa bîr û rayên beşdarên bê dîtin, rasterast jêgirtinên ji wan tê dan. Di analîzên bi vî awayî de mebest daneyên ku hatine girtin, wekî serastkirî û ravekirî bêne pêşkeşkirin. Bi vê mebestê dane, pêşiyê bi awayekî sîstematîk û aşkere tene teswîrkirin. Paşê ev teswîr tene ravekirin, digel tene rîna tēkiliyên ‘bone-encam’î hin encam bi dest dikevin. Paşê lêkolîner dikare van encaman bi temayên xwe re bitēkilîne, maneyan bidê û texmînen pērava bike ku ev jî di nav rehendên raveyên lêkolîner de ne (Yıldırım û Şimşek, 2016: 239-240).

3.2.1. Temayên Lêkolînê

Me fikrên/kodên ku ji beşdarên xwe girtin di bin sê temayan de civandin. Me ev tema wekî; *“Mecbûriyet û Pêdivî”*, *“Aidiyet”* û *“Têrayiya Ziman”* rêz kirin û kodên ji beşdaran di bin sernavên van temayan de me rave kirin. Temaya *“Mecbûriyet û Pêdivî”* yê ji wan hevokên beşdaran hatiye pê ku ji ber tercîha kurdîzanan a ziman ew tirkî di rewşên bêgav de bi kar tînin an jî ji ber îhtiyac û zanîn/nezanîna mixatab ew tercîh dikin. Loma dema kurdîzanek dixwaze kurdî bi kar bîne di sehayên gel, lê ji ber nezanîna mixatab an jî karên fermî, saziya fermî ew tirkî tercîh dike, yan jî kurdîzanek dema tirkî bi kar tîne lê ji ber tirkî nezanîna mixatab, li nav eqrebayên xwe, tirkî nezanîna endamê malbatê (dê, bav, kalik, pîrik...) ew wekî îhtiyac kurdî bi kar tîne.

Temaya *“Aidiyet”* ê jî ji ber hevokên kurdîzanan ên pênasekirina ziman hate pê ku hinekên wan ziman wekî nasnameya xwe qebûl dikin û bêtir hestiyar in. Lê hinek jî ziman bêtir wekî amûra pêwendiyê dizanin.

Temaya *“Têrayiya Ziman”* nîşan dide ku kurdîzan çiqas hakimî zimanê xwe ne û îfadeyên wan çawa dişekile li gorî zanebûna zimanê wan.

3.2.1.1. Mecbûriyet û Pêdivî

Dema me ji beşdarên xwe pirsra *“Tercîha te ya axaftin an jî pêwendîdanîne piranî bi kîjan zimanî ye di sehayên gelwarî de (saziyên fermî, park, mekteb, nexweşxane, ND û ww.), çima?”* kir, beşdarên helwest-berz ‘B1, B2, B3 û B5’ wekî; ‘kurdî’ an jî ‘zêdetir kurdî’ bersivandin, ‘B4, B6, B7 û B8’ jî wekî zêdetir tirkî lê hemî beşdarên helwest-nizm wekî bersiv ‘tirkî’ nîşan dan. Lê beşdarên me yên helwest berz hemiyar jî îfade kirin ku ew dixwazin bi kurdî dest pê bikin an jî gelek caran ew wisa radihêjin lê eger kesê/a hember kurdî nizanibe hingê ew tirkî dewam dikin. Ji bo sedemên axaftina kurdî -heçiyê ku kurdî tercîh dikin- dibêjin ew dixwazin kurdî li her derî normalîze be, bijî/nemire, yan jî meşruiyeta kurdî li her derê bê çespandin. Li aliyekî din ji bo tercîha tirkî jî li saziyan, beşdarên me piranî wekî ‘zimanê fermî’ û ‘mecbûriyetê/bêgav man’ê nîşan kirin. Çend nimûne ji bîr û rayên beşdaran:

“Xusûsî ez kurdî tercîh dikim... seba ku zimanek bimîne, dewam bike, nemire, ji holê ranebe divê mirov xeber bide, bike zimanê bazarê, bike zimanê fermî. Ber

hindê çî danûstandinê da çî karê fermî da, nexweşxaneyan da saziyên dewletê da hindî ku ji min hat ez kurdî diaxivim. Însanan jî teşwîq dikim ku kurdî biaxivin.” (B1).

Beşdarên me yê duwem (B2) dibêje heta kesê pêşberê wî kurdî bizanibe yan jî bersivê bi tirkî nede ew her kurdî tercîh dike:

“Ez bixwe wek prensîb dixwazim kurdî nav sehaya gel da hebîtin, îllahî bi kurdî diaxivim. Loqente bîtin, xestexane bîtin, emnîyet bîtin, polîs bîtin. Ez dixwazim li wê derê kurdî meşru bibîtin ji ber ku meşruiyeta kurdî di nava her erdekî da çêbîtin, însanê miqabilî te jî bizane ku tu kurd î, ez kurdî diaxivim. Ez dibêjimê mesela. Çime xestexanê: doxtor mesela, ‘dahîliye doktorî kêderê ye?’ heke go; ‘ne?’ Ez wê gavê bo tirkî dizivirînim. Yan çûme loqentê, bêjimê ‘kebab hene?’ Heke go; ‘e nizanîm’ ez wê gavê dixwazim bizivirînim.”(B2).

Herwiha beşdarê sêyem jî dibêje ew bi zanebûnî zêdetir kurdî tercîh dike ji ber ku hem yên saziyan de dixebitin çî kurd bin çî tirk bin, bila hewcetiyeke wisa di wan de çêbe ku ew kurdî bi kar bînin û dîsa ew bi zanebûnî kurdî tercîh dike ji bo kesê derdora wî re jî bibe nimûne.

Wekî beşdarê sêyem, beşdarê yekem (B1) behsa serboriyeke xwe dike ku ew wekî bûyereke nimûne ya daxwaza normalîzekirina kurdî û bergiriya nêrîna şaş a li hemberî li her sehayî bikaranîna kurdî dike:

“Ew firina ez diçim nan distînim daîmî, serê ewil ez çend cara çûm, min kurdî xeber dida rojekê mêrkê misade kir go heval, tu kîderê dergevan î/kapici yî? Mi go ez çu dera dergevan nînim, min zanî ku seva kurdî xeberdana min hizir dike ku ez dergevan im. Ji piştî wê rojê ez çend cara bi kravata çûme dikana wî da bila bizane ne ku xwendevan bûyîn mamoste bûyîn, memûrbûyîn ne tiştêkî xwe mezinkirinê ye belê mi go bila bizanî ku kesê xwenda jî xusûsiyetê didin ezmanê xwe...”

Îja ji vê pirsê me diyar dibe ku kesên helwest-berz bi kurdî dest bi axaftinê dikin an jî ew dixwazin piranî bi kurdî dest bi axaftinê bikin lê wekî mecbûriyet an jî kurdî-nezaniya mixatab ew tirkî tercîh dikin. Ji beşdarên helwest-nizm yek dibêje sedema tercîha wê ya tirkî ne ku hezkirina wê ye lê dibêje ew mecbûrê vê rewşê hatiye kirin. Lê heçî beşdarên me yên helwest-nizm ên din in, ew piranî tirkî tercîh dikin ji bo ku tirkî berbelav e û ew nizanin ka kesê li hemberî wan kurdî dizane yan na. Herwiha ew dema pêdivî pê çêbe, wekî îhtiyac kurdî bi kar tînin.

“Türkçe tercih ediyorum. Bu gibi yerlerde yazı dili Türkçe olduğu için, diğer insanlar tercih ettiği için. Bir diğeri Türkçe daha iyi ifade ettiğim için. Eğer karşımdaki Türkçe bilmiyorsa Kürtçe konuşurum. Karşı taraf Kürtçe konuşursa Kürtçe cevap veriyorum.”(B12).

“Ez tirkî tercih dikim. Li ciyên wekî van deran ji bo ku zimanê nivîsê tirkî ye, însanên din tercih dikin. Yeke din, ji bo ku ez xwe bi tirkî baştir îfade dikim. Eger mixatabê min tirkî nezane hingê ez kurdî tercih dikim. Kesên pêşberî min kurdî biaxivin ez bersiva wan kurdî didim.”

Beşdara 15em a helwest nizm dibêje; wê dixwest ew kurdî bi kar bîne lê ji ber ku ew li her derî bi tirkî re rû bir û maye û bêgav hatiye hîştin bo bikaranîna tirkî -ne bi terciha wê- ew loma tirkî zêdetir bi kar tîne:

“Ana dili Kürtçe olan biri olarak yıllarca büyük şehirde yaşamış ve kamusal alanlarda Türkçe konuşup, kendimi Türkçe ifade edip bu dili kullandım. Bunu bir tercih olarak değil de bir zorunluluk olarak değerlendiriyorum. Bize sunulan bir tercihin söz konusu olduğunu düşünmüyorum. Girdiğimiz her ortamda; gerek resmi ortam olsun gerek mağaza, işyeri, hastane olsun Türkçe ile karşılaşınca küçük yaşlardan itibaren bu dili tercih edip kullanmak kaçınılmaz oluyor. Ana dilim olan Kürtçeyi dışarda, parkta, işyerinde, hastanede birçok kamusal alanda kullanmak bu dili konuşup kendimi ana dilimle de ifade etmeyi isterdim ancak konuşma alanı daraldıkça Türkçenin konuşma alanı genişledikçe bu dili tercih etmek kaçınılmaz oluyor.”(B15)

Ez wek keseke zimankurdî bi salan li bajarên mezin jiyame, di sehayên gel de tirkî axivîme û bi vî zimanî min xwe îfade kiriye. Ez vê, ne wekî tercihekê lê wekî mecbûriyetekê dinirxînim. Ez ne ser wê fikrê me ku ev wekî tercihekê dane pêşiya me. Di her dorhêla em ketinê; çi fermî be çi wekî mixaze, kargeh, nexweşxane bin ji bo ku em rastî tirkî hatine di piçûktayiya xwe vir de ev ziman bû tercih û me bi karanî ku me nekarî em jêgerin. Min dixwast ku ez zimanê xwe yê serî/dayîkê li derva, parkê, kargehê, nexweşxanê, li gelek saziyên gelwarî bi kar bînim lê her ku sehaya zimanê min teng bû, yê tirkî fire bû terciha vî zimanî jêneger bû.”

Beşdara 16an jî zêdetir tirkî tercih dike û ji bo sebebê vê jî xwe îfadekirin û asta zimanê xwe nîşan dide:

“Kamusal alanlarda genel olarak Türkçeyi tercih ediyorum. Çünkü Türkçeyle kendimi daha rahat ifade ediyorum ve daha iyi anlaşıldığımı düşünüyorum. Kürtçeyi tercih etmememin sebebi ise karşıdaki kişilerin dil seviyesini bilmediğim içindir. Ayrıca Kürtçe dil eğitimi almadım. Aileden çevreden

öğrendiğim kadarıyla biliyorum. Bu yüzden bazen yanlış telafuzlarım olabiliyor. Ya da kelimeyi mesela Kürtçe olarak bilmiyorumdur bu yüzden çoğu zaman Türkçeye Kürtçeyi karıştırıp konuşuyorum. Bu yüzden genel olarak Türkçeyi tercih ediyorum.”(B16)

“Ez di sehayên gel de piranî tirkî, tercîh dikim. Çunkî ez xwe bi tirkî bêtir rihet îfade dikim û ez wisa hizir dikim ku ez baştir tême fêmkirin. Sebebê tercîhnekirina min a kurdî ew e ku ez nizamim ka kesê li hemberî min asta wî ya ziman çi ye. Wekî din min perwerdeya ziman nedîtiye, ji malbat û devdora xwe çi hîn bûbim ew e. Loma carna telafûzên min ên çewt çêdibin. Yan jî mesela kurdiya peyvê nizamim loma pirî caran tirkî û kurdî tevê hev dikim. Loma bi giştî tirkî tercîh dikim.”

Tablo 3.2: Kodên Têkilî Mecbûriyet û Pêdiviyê

J	Kod	F
1	Tirkî zimanê fermî ye. (hemî beşdar)	16
2	Tirkî berbelav e.(B10, B13, B15)	3
3	Ez mecbûrî tirkî bi kar tînim.(B1, B2, B3, B5, B7, B15)	6
4	Dixwazim kurdî bijî/normalîze be.(B1, B2, B3, B4, B5, B8)	6
5	Mixatab nas be kurdî tercîh dikim.(B4, B6, B7, B10, B11, B14, B16)	7
6	Mixatab tirkînezan be kurdî diaxivim.(B2, B11, B12, B13, B15, B16)	6
7	Eger îhtiyac hebe kurdî tercîh dikim.(B9, B10, B11)	3

Wekî ji tabloyê jî diyar e hemî beşdar, tirkî wekî zimanê fermî dizanin (di hin îfadeyên beşdaran de wekî zimanê perwerdeyê, zimanê nivîsê, zimanê saziyan) û sê beşdar jî tirkî wekî zimanê berbelav bi nav dikin (B10, B13 û B15). Li aliyekî din ji beşdaran 5 kes; (B1, B2, B3, B5, B7) dibêjin ew piranî kurdî tercîh dikin di pêwendiya axaftinê de, lê ji ber mecbûriyetê ew tirkî bi kar tînin. Beşdarê 15an jî çendî tirkî zêdetir tercîh bike jî, ew dibêje ne bi dilê wê ye, lê ji ber mecbûriyetê ew tirkî tercîh dike. Dîsa em ji hevpeyvînên xwe têdigêjin ku kurdîzanên helwest berz piranî sebebê tercîhkirina kurdî wekî meşrûkirin û normalîzekirina kurdî nîşan didin. (B1, B2, B3, B4, B5, B8). Heft beşdarên hevpeyvîna me jî (B4, B6, B7, B10, B11, B14, B16) dibêjin dema kesên ku pêre diaxivin nasê wan bin, ew piranî kurdî tercîh dikin. Herwiha beşdarên (B2, B11, B12, B13, B15, B16) dibêjin mixatabê wan eger bi tirkî nezane ew bi wan re kurdî diaxivin. Lê ji beşdarên hevpeyvîna me, sê kes;

(B9, B10, B11) dibêjin ew piranî tirkî tercîh dikin di sehayên gel de lê eger îhtiyac hebe ew kurdî tercîh dikin.

Bi kurtasî; hemî beşdar ji bo ku tirkî zimanê fermî ye ew bivê nevê bi kar tînin ku beşdarên helwest-berz vê wekî mecbûriyetê bi nav dikin û ew tercîha ziman de kurdî ser tirkî re digirin. Li aliyekî din hemî beşdarên helwest-nizm axaftina sehayên gel de tirkî tercîh dikin û eger îhtiyac hebe, kesê mixatab nas be yan jî eqrebayê wî/ê be û kesê mixatab tirkî nezane hingê ew kurdî tercîh dikin.

3.2.1.2. Aîdiyet

Pirsa duwem a ku me li beşdarên xwe kir; ‘Hokarên ku te bi kurdî yan jî tirkî didine axaftinê çi ne?’ bû. Dema em berê xwe didine bersivên beşdarên me, em dibînin wekî pirsa berê di navbera herdu grûpên helwest-berz û helwest-nizm de ferqeke watedar heye. Hin bersivên beşdarên me wekî li jêr in:

“Çima kurdî? Ji ber ku ez kurd im. Zimanê min ê dayîkê jî kurdî ye, zimanê çanda min jî kurdî ye. Ku meriv bêje ziman tenê ji bo pêwendiyê ye, ji bo dîyalogê ye ew dibe kêmasî, dibe heqaret ji bo ziman lewra ziman binhişê te ye serhişê te ye jîyana te ye, hebûna te ye, çanda te ya hezar salî ye. Ne çanda îro ye. Ziman ne tenê dîyalogekî ye ku ez bi yekî ra bikim. Ji ber wî jî tu li ser kîjan kokê, li ser kîjan xîme mezin bûbî divê tu wî mezintir bikî. Tu îro xwe bişoyî jî yanî tu tirk bî xwe ji tirkîyê bişoyî, kurd bî xwe ji kurdîyê bişoyî li ser wî çandî dîsa mezin dibî. Îro tirkekî ku çûbe Ewrpoyê qet zimanê Tirkî nizanibe jî çawa ku çanda tirkîyê pê ra heye kurdek jî bixwaze nexwaze her tim ew kurd e. Westê ku ez hertim kurd bim divê ez zimanê xwe pêşva bibim. Lewra çanda min pêşva diçe, lewra rabirdûya min pêşva diçe û dahatûya min pêşva diçe. Ji ber wî divê ez kurdîya xwe pêşva bibim û civat jî pê bihese.”(B4).

Bersivdarê sêyem (B3) jî hokarên terciha xwe ligel kurdî wiha derbirriye:

“Yanî sebebê yekem ez kurd im, nasnameya min e yanî zimanê dayîk, hebûna min e loma ez kurdî diaxivim. Ya duwem jî rewşa kurd ya niha xetereyê da ne. Ji her hêlê va ber bi asîmîlasyonê, qirkirinê va diçe. Li hember wî bertekê nîşan didim. Yanî dibe ku ev rewşa kurdî nebûya ev helwesta min belkî ewqas xurt nebûya. Yanî helwesta min a bi kurdî axaftinê zêdetir dike. Tirkî jî mecbûr bimînim. Yanî êdî tu îmkân tunebe ez tirkî bi kar tînim. Wekî din wekî ez bi kêf tirkî biaxivim yan bi kar bînim kêma, kêma caran.”(B3).

Li aliyekî din beşdarê duyem yek ji hokarên tercîha kurdî wekî hezkirina zimanê xwe wiha nîşan dide:

“Min şanoyeke kurdî temaşe kiribû. Eger bêjne min di jiyana te da dema te ya herî xweş kîj bû? Ez ê bêjim ew şanoya kurdî bû.”(B2)

Beşdarê dehem (B10) wekî hokar ji bo tercîha kurdî yan jî tirkî wisa dibêje:

“Birincisi Kürtçe konuştuğumuz alan genelde şeydir, tabiri caizse turnak içinde söylüyorum resmi alanların dışında kalan daha çok yakın akrabalarımızla, türkçeyi daha zayıf konuşabilen, ya da daha zayıf iletişim kurabilen ya da hiç Türkçe bilmeyen yakınlarımızla ya da çok nadir karşılaştığımız herhangi bir insanla Kürtçe konuşma gereği duyuyoruz ve o süreçte Kürtçe konuşuyoruz. Ama bunun dışında genelde çok yaygın bir şekilde artık zaman içerisinde Türkçe konuşmaya başlıyoruz. Yakın çevremizde, aile içerisinde Türkçe artıyor, sebepleri eğitim dilinin Türkçe olması, Türkçenin çok yaygın bir şekilde kullanılması, ekonomik alanda olsun, alışverişte olsun, iletişim, hani kitle iletişim araçlarında... Bi de şu da önemli; anadil üzerinden, kendi anadilim Kürtçe, Kürtçenin herhangi bir şeyde akademik alanda bir eğitimi yapılmadığı için, ben bu eğitimden geçmediğim için aslında daha çok şey oluyor yani böyle, hani tabiri caizse anneden çevreden duyulanlarla iletişim kurabiliyoruz.” (B10).

“Pêşî, sehaya ku em bi kurdî diaxivin ewk e, eger gotina wê cî be, li derî sehayên fermî, zêdetir bi eqrebayên me yên nêzîk re, bi kesên ku tirkî baş nizanin, an jî pêwendiyêke lawaz datînin, an jî yên qet bi tirkî nizanin an jî hin însanên ku em wan nadîren dibînin, em bi wan re kurdî diaxivin, yanî hingê îcab dike. Lê ji bilî vê bi giştî, berbelav, bi demê re em tirkî diaxivin. Li devdora me ya nêzîk, di nav malbatê tirkî zêde dibe. Sedemên wê; zimanê perwerdeyê tirkî ye, tirkî berbelav tê bikaranîn, di warê aboriyê, di danûstanê, pêwendiyê yanî di amûrên pêwendiya girseyî... Yek jî ev heye; li ser zimanê min ê serî, zimanê min ê serî kurdî ye, ji bo ku perwerdeyêke akademîk a kurdî nehatiye kirin, ji bo ku ez ji vê perwerdeyê re derbas nebûme, rastî zêdetir ewk dibe, yanî eger gotin li cî be em bi bihîstina ji dayîkê û ji devdora xwe pêwendiyê datînin.”

Beşdarê yanzdem (B11), di sehayên gelwarî, tercîha xwe ji bo zimanê pêwendiyê wiha îfade dike:

“Ayrıca Kürtçeye çok hakim olmadığım için de Türkçeyi tercih ediyorum. Bir de Kürtçe de ağız şive farklılıkları var, standart dile çok hakim değilim, ayrıca yaygın olmamasından dolayı Türkçeyi daha çok tercih ediyorum. Yine tercih sebepim daha çok Kürtçeyi iyi bilmemeyle alakalı, yoksa bir dayatma yok, ihtiyaç varsa kullanıyorum.” (B11).

“Wekî din ji bo ku ez zêde hakimî kurdî nînim loma tirkî tercîh dikim. Yek jî di kurdî cudahiyên devok û şeweyan hene, ez zêde hakimî zimanê standart nînim, hem jî ji bo ku zêde berbelav nîne loma zêdetir tirkî tercîh dikim. Dîsa sedema min a tercîhê zêdetir têkilî zimanê min ê kurdî ye ku ez pir baş nizanim, yan na li ser min zextek nîne, pêdivî hebe ez bi kar tînim.”

Tablo 3.3: Kodên Têkilî Aîdiyetê

J	Kod	F
1	Kurdî nasnameya min e.(B1, B2, B3, B4, B5, B6, B8)	7
2	Kurdî zimanê min ê serî ye.(B2, B3, B4, B8, B15)	5
3	Kurdiya min ne pir baş e.(B9, B10, B11, B12, B13, B15, 16)	7
4	Wekî bertek kurdî tercîh dikim.(B1, B3, B5)	3
5	Tirkî bêtir berbelav e.(B9, B10, B11, B12, B13, B14, B15)	7

Wekî ji tabloyê em dibînin; heft beşdarên hevpeyvîna me (B1, B2, B3, B4, B5, B6, B8) kurdî wekî nasnameya xwe dizanin û pênc hebên wan jî (B2, B3, B4, B8, B15) kurdî wekî zimanê xwe yê serî bi nav kirine. Wekî din, heft beşdarên helwest nizm (B9, B10, B11, B12, B13, B15, 16) sebepê tercîhkirina tirkî wekî qelsbûna zimanê xwe yê kurdî nîşan kirine. Lê sê beşdarên helwest berz jî (B1, B3, B5) ji bo sebepê tercîhkirina xwe ya kurdî wekî ‘bertekê’ bi nav dikin. Ji beşdarên me yê helwest nizm heft kesan jî (B9, B10, B11, B12, B13, B14, B15) wekî sebep, berbelavbûna tirkî nîşan kirine.

Wekî dawî, em ji tabloyê hîn dibin ku di navbera herdu grûpan de cudahiyeke watedar heye. Bersivdarên me yê helwest-berz hokarên ku wan bi kurdî didine axaftin piranî wekî; ‘kurdûn, zimanê wan ê serî/dayîkê, zimanê wan ê netewî, hezkirina wan a kurdî û ww.’ lê bersivdarên helwest-nizm jî bêtir hokarên wekî;

‘malbat û nas’ lê ji bo tercîha tirkî jî zêdetir qelsbûna kurdiya wan, dorwarê pêwendiyê, berbelavbûna tirkî û wd.’ nîşan dane.

3.2.1.3. Têrayiya Ziman

Pirsa me ya sêyem a ku me li beşdarên xwe kir jî; ‘Tu bi kîjan zimanî rehet î dema tu daxivî, çima?’ bû. Wekî bersiv beşdarên helwest-berz B1, B3 û B6 xwe bêtir bi kurdî rihet hîs dikin, yên mayî bi herdu zimanan jî xwe rehet hîs dikin. Heçî yên helwest-nizm hemiyar bersiv wekî ‘tirkî’ dan. Lê beşdarên helwest nizm ne di dorwarên duziman lê dorwarên wekî malbatê de xwe bi kurdî jî rihet nîşan dan.

Beşdara şeşem (B6) sedemên axaftina tirkî û xwe rihet hîskirin-nekirinê wiha derdibirre.

“...bi min du sedem heye ku em gelek caran bi Tirkî xeber didin; ya yekem ji ber ku zimanê fermî ye ya duwem jî ji ber ku me bi zimanê Kurdî perwerde neditiye ji ber vê jî em nikarin di gelek mijaran de bi Kurdî xeber bidin. Ji ber ku min perwerde bi vî zimanî dîtîye û min lîsans û mastira xwe jî bi vî zimanî kiriye di xala duyem de ez dikarim çareserîyê ji bo vê pirsgirêkê bibînim lê mixabin derdora min ji ber vê sedemê di axaftina Kurdî de dijwarî dikşînin.”(B6).

Wekî wê, hema bêje hemî beşdarên helwest-berz sedema xwe rehet hîskirina bi kurdî wekî perwerdedîtîyê yan jî hakimbûna ser zimanê xwe yê dayikê nîşan didin.

“Ez bi kurdî bêtir xwe rihet hîs dikim. Ji ber ku heta şeşsaliya xwe min xêncî kurdî tu ziman nizanibû. Zimanê min ê dayikê ye û piştî wan xebatê min ên kurdolojiyê ku ev panzde şanzde sal in ez ser dixebitim, kurdiya min ji tirkî xurttir e hem ji hêla nivîskî hem hêla hestiyariyê ve, her hêlê ve ez xwe baştir îfade dikim. Cara wextê ez diaxivim ez hinek tiştê tirkî ji bîr dikim.”(B3).

Beşdarê çarem (B4) xwe bi kurdî rihet hîs dike û ew ciyawaziya devokên kurmancî girîng nabîne ji bo têkghiştîyê:

“Wextê ez Kurdî diaxivim xwe rehet hîs dikim. Yê me kurda problemeke me ya wiha jî heye, ji ber ku em xwe zêf dibînin her herêmek dibêje kurdiya min ya baş nîn e, kurdiya heqîqî ya filan derê ye. Bêtir ev li herêma me ya Bitlîsê gelek zêde ye. Halbukî tişteke wisa tune zimanê te da, yanî tu li gundekî bî heta tu nava wî gundî malbatek jî bî wextê tu xwe bikaribî îfade bikî devoka rast devoka te ye. Îja peyvên ku te bikaranî eger xîmê te bi kurdî be çî dibe bila bibe. Yanî em divê ji vê psîkolojiyê xelas bibin.”(B4)

Wekî din beşdarên helwest-nizm zêdetir ser xweîfadekirin û têkgihaştinê disekinin. Beşdarê nehemîn wekî bûyera nimûne tesîra xweîfadekirinê di pêwendiyê de wiha diguhêze:

“Şöyle bir örnek daha vereyim yine yaşadığım bir olayı anlatayım, mesela ben şeyde görevliydim, Çatak adliyesinde. Savcı soruyor adama, adam şey yapmış, tarla olayı var, aralarında husumet var, koyunu onun tarlasına girmiş, şikayet konusu budur tamam mı. Yani aslında suç nedir TCKya göre, işte meranın başkası tarafından ihlal edilmesi bak suç bu. Adam geliyor, ne diyor şeye savcıya diyor: “Adam bana hakaret etti.” Yani o kastettiği şey adamın benim tarlama girdi yani, tecavüzde bulundu. Yani onu kastediyor. Ama savcı şey diye anladı: sana ne dedi? Dedi. Bi de akraba bunlar. Adam şaşırıyor o ne dedi diyince. ... Ben girdim araya... Dedim savcı bey adam bana hakaret etti derken şeyi kastetmiyor yani bildiğimiz anlamda küfür etti demek istemiyor, tecavüzde bulundu demek istiyor. Öyle mi? Dedi. Sana bu küfür etmedi mi? Dedi. Hayır dedi...”(B9).

“Ez nimûneyeke wiha bidim, dîsa behsa serhatiyeye xwe bikim, mesela ez li ewkê wezîfedar bûm, Edliyeya Şaxê. Dozger ji mêrik dipirse, mêrikî ewk kiriye, meseleya zeviyê, neyartî heye navbera wan de, peza wî ketiye zeviya mêrik, mijara giliyê ev e, tamam. Yanî rastî ew sûcê wî çi ye li gorî TCKyê, îhlalkirina merayê ye, sûc ev e. Mêrik tê çi dibêje dozger: “Mêrik heqaret li min kir.” ... Yanî dixwaze bêje mêrik ketiye zeviya min. Lê dozger wisa fêm kir: “çi gote te?” got. Hem ew eqreba ne jî. Mêrik şaş ma wextê go “wî çi go”... Ez ketime navê... Min go birêz dozger! qesta vî camêr î ew e ku dixwaze bêje “wî tecawizî zeviya min kiriye” ne ku ew e dibêje “wî dijûn limin kirine”. Ha, wisa? got. Wî dijûnî te nekir? got, got na...”

Beşdarê dehem (B10) dibêje ji bo ku wî perwerdeya kurdî nedîtiye, ji bilî axaftinên rojane yên dorteng ew nikare bi hêsanî hin tiştan rave bike û derbarê mijarekê de gengeşiyê bike:

“İşin açıkçası rahattan ziyade hangisi daha kolayınıza geliyor dersiniz Türkçe kolayıma geliyor. Mesela annem Türkçe bilmez konuşurken annemle Kürtçe daha rahat iletişim sağlayabiliyorum. Ama Kürtçe konuşurken şu eksikliklerimiz var. Hem ben hem de karşıdaki kişi kelime dağarcığımız olsun, hazinemiz olsun dil yapımız çok fazla gelişkin olmadığı için maalesef çok sağlıklı bir iletişim kuramayabiliyorsunuz, tükenebiliyorsunuz. Bu sadece benden kaynaklı olmuyor... Bazı kelimelerin karşılığını bilmiyoruz, hayatın içerisinde kullanılmadığı için. Benim bilip bilmemem de önemli değil karşıdakiler de bilmiyor bazen. Dolayısıyla çok sığ, belli sayıdaki kelimelere, belli sayıdaki

gündelik formlara sıkışmış bir dil yapısından oluyor. Yani basit iletişim işleri yani ev içindeki işleyişler. Herhangi bir şeyi alıp verme. Ama mesela diyelim televizyonda bir program izliyorsunuz ya da herhangi bir kitap okuyorsunuz onunla ilgili herhangi bir yorumu karşınızdakiyle Kürtçe yapamıyorsunuz çünkü şey yok, dilbilgisi, edebiyat bir altyapı oluşmamış yani.”(B10).

“Ya eşkere hûn bêjin kîjan ji te re rihet e, tirkî bêtir rihet e. Mesela diya min bi tirkî nizane, dema bi diya xwe re diaxivim kurdî bêtir rihet e. Lê dema kurdî diaxivim ev kêmasiyên me hene. Hem ez hem yê pêşberî min peyvzanîna me ferhenga me, zimanê me ji bo ku ne dewlemend e em nikarin pêwendiyeye durust daynin, em dixitim. Ev ne ji ber min tenê ye... Em wateyên beramberî hin peyvnan nizanin, ji bo em di jiyana rojane bi kar naynin. Ne girîng e ka ez dizanim yan na, kesê pêş min jî nizane carna. Ji ber wê zimanekî tenik, bi jimarek peyvên diyar, zimanekî mehkumî bi formên rojane heye. Yanî karên pêwendiyê yên basît, yanî karên navmal. Danûstana tiştekî. Lê mesela hûn televîzyonê de tiştekî temaşe dikin an jî kitêbekê dixwînin, raveyeye têkilî wê hûn nikarin kesê pêşberî xwe re bi kurdî bikin, çunkî ewk tune, rêziman, edebiyat, yanî binesaziyek çênebûye.”

Beşdara sêzdem (B13) jî, ji bo sebebê tercîhkirina tirkî bi nisbeteke zêdetir, perwerdeyê nîşan dide:

“Kürtçe konuşurken bazen durup Türkçeye devam ediyorum orda dediğim gibi, çünkü acaba onun karşılığı ne ya da o cümlelerin Kürtçedeki karşılığını bilmediğim için Türkçe konuşuyorum... Bi de şivelerden de. Mesela biz başka bir şey deriz, biri başka bir şey der o da yazılı olmadığından kaynaklı, eğitim dilini bilmediğim için Türkçe konuşurken kendimi daha rahat hissediyorum. Ama eğitim dilini almak isterim.”(B13).

“Dema ez kurdî diaxivim, disekinim tirkî dewam dikim, çunkî dibêjim gelo beramberî wê peyvê çî ye, yan jî beramberî wê hevokê nizanim ka kurdiya wê çî ye, loma tirkî diaxivim... Yek jî ji ber şeweyan. Mesela em tiştekî din dibêjin, yekî din tiştekî din, ew jî ji ber nenivîsînê ye, ji bo ku ez zimanê perwerdeyê nizanim dema ez tirkî diaxivim bêtir xwe rihet hîs dikim. Lê dixwazim zimanê wî yê perwerdeyê bistînim.”

Tablo 3.4: Kodên Têkilî Têrayiya Ziman

J	Kod	F
1	Asta kurdiya min qels e. (B9, B10, B11, B12, B13, 15, B16)	7
2	Tirkî hêsan e. (B1, B2, B3, B5, B10)	5
3	Perwerdeya fermî(B6, B12, B13)	3
4	Devokên cuda(B2, B10, B13, B16)	4
5	Xweîfadekirin(B7, B10, B13, B14, B15, B16)	6
6	Têkgihaştin(B2, B9, B10, B13, B14, B15, B16)	7

Wekî ji tabloyê jî diyar e, di pêwendiya zimanî de beşdar piranî xwe rihet hîsdikin dema ew tirkî diaxivin. Ji beşdarên me yê helwest berz B1, B3, B6 û B8 xwe bêtir bi kurdî rihet dîtin, B2 û B4 xwe bi herdu zimanan, B1, B5 û B7 tirkî hêsan dibînin lê ew bi herdu zimanan jî xwe rihet hîs dikin dema ew diaxivin. Herwiha ji bo sebebên xwe rihet hîskirinê sê kes (B6, B12, B13) perwerdeya fermî wekî sebeb nîşan didin. Çar beşdar dibêjin, ew zimanê kurdî yê standart baş nizanin (B2, B10, B13, B16). Şeş kes dibêjin (B7, B10, B13, B14, B15, B16) ew bi tirkî xwe bêtir rihet hîs dikin çûnkî ew xwe bi tirkî baştir îfade dikin. Dîsa heft kesên beşdarên hevpeyvîna me dibêjin (B2, B9, B10, B13, B14, B15, B16) ji bo ku bi tirkî ew baştir têdigêjin loma ew xwe bi wî zimanî rihet hîs dikin.

Eger em daneyên hevpeyvîna xwe bidine ser hev; beşdarên helwest berz dibêjin ew bi herdu zimanan jî xwe rihet hîs dikin dema ew bi însanan re dikevîne pêwendiyê. Beşdarên helwest nizm jî, ji bo pêwendiyê xweîfadekirin û têkgihaştinê girîng dibînin ku ew jî ji ber ku perwerdeya wan bi tirkî çêbûye, bêtir pê rihet in. Herwiha ew sebebê nerihetîya xwe ya bi kurdî, wekî qelsbûna zimanê xwe nîşan dikin lê ew piranî di dorwarên wekî; malbat, gund û li nav eqrebayên tirkînezan de xwe bêtir rihet dibînin dema ew kurdî diaxivin.

3.3. Raberî û Encam

Di vê xebata xwe ya kalîtatîv de; me 8 jê mer, 8 jî jin bi 16 kesan re hevdiîtin pêk anîn û ev beşdarên xwe jî, li gorî pûanê wan ê pîvaneka helwesta ziman a xebata kantîtatîv wekî ‘helwest-berz’ û ‘helwest-nizm’ kirine du grûp. Piştî ku me notên hevdiîtinê deşîfre kirin, me li gorî bersivên wan kodên sereke bijartin û ew di bin sê

temayan de civandin. Me temayên xwe, wekî: ‘mecbûriyet û pêdivî’, ‘aîdiyet’ û ‘têrayiya ziman’ bi nav kirin û li gorî frekansê kodan me ew rave kirin.

Me sê pirs ji beşdarên xwe kirin ku pirs a yekem; “Tercîha te ya axaftin an jî pêwendîdanîne piranî bi kîjan zimanî ye di sehayên gelwarî de (saziyên fermî, park, mekteb, nexweşxane, ND û ww.), çima?” bû. Li gorî bersivên beşdarên me hemî bersivdar didin nîşan di sehayên gel de ji bo ku tirkî zimanê fermî ye ew bivê nevé merûzî tirkî dibin. Lê ji van beşdaran grûpa helwest berz bêtir li zimanê xwe xwedî derdikevin dema ew dikevîne têkiliyê bi însanên din re. Û ew dema mecbûr bimînin, an jî mixatabê wan tirkî nezane, li hin sazîyên ku axaftina kurdî ne mumkîn be, hingê tirkî tercîh dikin. Yê helwest nizm cara pêşî bi kurdî dest bi axaftinê nakin lê eger mixatabê wan nas be yan jî tirkî nezane hingê ew dikarin kurdî bersiva wan bidin an jî bi axivînin. Û ev grûp ji ber fermîbûn û berbelaviya wê bêtir tirkî tercîh dikin. Trask (2007) wateya zimanê fermî û hînbûn û bikaranîna wî wisa derdibirre: “Zimanê ku ji bo karên fermî tê bikaranîn di dewleteke diyar de. Di dewleta modern de, her yek ji me bêgav e ku karên xwe yê fermî bi deshilataran re bike. Em mecbûr in ehliyet û pasaportê bistînin, wesîqeya beyannameya baca dahatê tijî bikin, wesîqeya jidêbûna zarokên xwe bistînin, formên xwe tijî bikin dema me ji xwe re karek dît an em bê kar man, dema me wesiyeta xwe da, zarok dane mektebê, xanî kirin û firotin û yê din. Hinekên me divê tevî hikumeta herêmî yan jî netewî bibe herwiha tevî dadgehên...” û li gorî vê em tercîh û biryara kurdîzanên helwest berz dikarin vê çarçoveyê de binirxînin. Li aliyekî din kurdîzanên helwest nizm jî dema îhtiyaç hebe yan jî mixatab tirkî nizanibe kurdî tercîh dikin ku ev jî dide nîşan ew ji bilî zimanê pêwendiyê wateyêke din li kurdî nakin.

Pirsa me ya duwem jî; “Hokarên ku te bi kurdî yan jî tirkî didine axaftinê çi ne?” bû û li gorî bersivan em dibînin ku grûpa helwest berz zêdetir wekî hokarên tercîha zimanê kurdî hêmanên têkilî aîdiyetê didine pêş ên wekî; ‘nasname, zimanê serî, kurdbûn û ww. û ji bo tirkî jî ev grûp zêdetir karên fermî, xebata li sazîyan û kurdîzanbûna mixatab derdixine pêş. Grûpa helwest nizm jî wekî sebebê bikaranîna tirkî berbelavbûna wê nîşan didin û sebebê bikarneanîna kurdî jî wekî asta lawaz a kurdiya xwe nîşan didin. Lê ew wekî hokarê sereke yê bikaranîna kurdî jî dorwarê xwe; malbat, eqreba û ww. nîşan didin.

Îja lêre em dikarin tercîha beşdarên xwe yên helwest berz têkilî fikra wan a neteweyî ya têkilî ziman binirxînin ku ew dixwazin zimanê xwe biparêzin û pêş bixin. Yıldız (2007) helwesta nasnav/kêbûnê ya têkilî mensûbiyet û aîdiyetê wisa diguhêze (ji Güleç, 1992: 14) : “Ciyê ku pirsiyara nasnavê/nasnameyê/kêbûnê jê dertê, xwe dispêre pirsên wekî: ‘însan xwe wekî çi terîf dike/xwe bi çi ve digire’ an jî ‘xusûsiyên wî yên ku wî ji yên mayî cuda dike çi ne’. Yanî kurtasî, çarçoveyên derbarê mensûbiyet (attachment) û aîdiyetê (belonging) de ên ku takekes berê xwe didê, ew xwespartin in ku helwesta nasnav/kêbûnê (cohesion) dabîn dikin. Lêre kêbûn wekî encama pêdiviya aîdbûna tiştekî din dertê pêşiya me.”

Îja eger em ji vê derê biherin, gotina Celadet Bedirxan a derbarê cihêbûna kurdan ji tirkên rewşê sayî dike. Ew dibêje “dîn û zimanê milletan wan ji milletê din cuda dike, ji bo ku dînê me û tirkên yek e, di destê me de wekî hêz tenê ziman dimîne”. Îja ev rewşa nimûneyên me yên helwest berz rave dike ka ew çima zimanê xwe wekî nasnameya xwe dibînin.

Pirsa sêyem a xebata me jî; “Tu bi kîjan zimanî rehet î dema tu daxivî, çima?” bû û di van bersivan de jî cudahiyeke navbera herdu grûpan de hebû. Lê endamê grûpa helwest berz ji bo ku herdu zimanan jî dizanin xwe bi herdu zimanan jî rihet hîs dikin, lê yên helwest nizm bêtir xwe bi tirkî rihet hîs dikin ji bo ku zimanê wan ê perwerdeyê ye û kurdiya wan ne ewqas baş e. Dîsa li gorî wan sebebê herî muhîm a bikaranîna tirkî xwe baş îfadekirina bi wî zimanî û têkgihaştina ligel mixatab e. Lêre, vê rewşa helwest berzan em dikarin li dor; tercîha ziman de rola ‘têrayiya ziman/linguistic proficiency’ (Cummins, 2000) binirxînin ku li gorî Cummins kesekî zimanê xwe yê pêşîn de jîr be ew di zimanekî din de jî jîr e dema ew wî zimanî hîn dibe, û dîsa têkilî motîvasyonê rola ‘xwe-têriyê/self-efficacy’ (Bandura, 1977) nîşan bidin. Li gorî Bandura (1982) xwe-têriya kesan asta motîvasyonê wan diyar dike (Kasap 2015: 83). Beşdarên me yên perwerdeya kurdî dîtine li gorî yên perwerde nedîtine bêtir xwedî li kurdî derdikevin û xwebawer û rihet in. Lê berevajî yên ku perwerdeyê ke kurdî nedîtine yan jî ne hakimî zimanê standart in wekî ji tabloya 3.4. diyar dibe wekî sebebên tercîhkirina tirkî ‘qelsbûna zimanê wan ê serî, cudahiya devokên kurdî, xwe baş îfade nekirin’ nîşan kirine. Ji xebata Kasap (2015) em dibînin; beşdarên ku xwedî helwesteke nerênî ne, ew axaftina tirkî tercîh dikin ji ber

ku di zimanê wan ên serî de hin hêmanên leksîkal wînda bûne loma ew dibe problemek di zimanê wan de dema ew xwe îfade dikin. Wekî wê beşdarên me yên helwest nizm jî ji bo ku kurdiya wan bi têra xwe baş nîne hin sebebên tercîha tirkî wiha îfade kirine; ‘ew carna axaftina xwe diguhezin tirkî (B13), yan ew tirkî tevê axaftina xwe dikin (B14), an jî ew hin peyvên kurdî nizanin loma ew dixitimin (B10)’.

Li aliyekî din, em dikarin bêjin, di vê xebata me ya kalîtatîv de, navbera mêr û jinan de ferqeke watedar a li pêş zimanê wan an jî zimanê tirkî derneket çî grûpa helwest berz û çî grûpa helwest nizm be.

Wekî dawî em dikarin bêjin hemî beşdarên me çî yên helwest berz û çî jî yên helwest nizm bin ne xwedî helwesteke nerênî ne raber kurdî. Beşdarên helwest berz hemî dixwazin, dikin ku pêşî bi kurdî dest bi axaftinê bikin dema ew dikevîne pêwendiyêke zimanî û xwedî şîûreke zimanî ne. Lê beşdarên me yên helwest nizm çendî derbarê kurdî de fikreke nerênî îfade nekiribin jî ew ji ber asta zanebûna xwe ya kurdî û raseriya tirkî ya dorwarê pêwendiyê de zêdetir ziman wekî amrazeke xwe îfade kirinê û têkghaştinê dibînin.

ENCAM

Helwest, wekî hêmaneke sereke ya derûniya însan girîng e di jiyana wî de û tesîrê li kar û kiryarên wî dike. Di pêbendî ziman, li gorî dorwarê lê dijî, însan xwedî helwest e raber zimanê xwe û zimanê(n) mayî. Bi taybetî jî li dorwarên duziman, li gorî statûya zimanan û kargerîya wan, helwesta kesan dikare bişekile. Îja, ji ber ku li bajarê Wanê îro rewşeke duziman li kar e, helwesta kurdîzanên bajêr bû mijara xebata me ka dema ew dikevîne pêwendiyê, ji herdu zimanên kurdî û tirkî bêtir kîjanî bi kar tînin û li gorî hin xusûsiyetên ku me di lêkolînê de diyar kirine, helwesta wan tesîreke çawa li ser tercîha wan a ziman dike.

Xebata me xwe dispêre herdu cure rêbazên zanistên civakî; rêbaza kantîtatîv û ya kalîtatîv ku bi vê, me armanc kir em helwesta kurdîzanan bi van rêbazan digel lêkolînên sehayî, bi teknîkên wekî anket û hevpeyvînê bipîvin û rave bikin. Ji bo vê me bajarê Wanê wekî nifûs û kurdîzanên bajêr jî wekî nimûne bijartin û herdu xebatên xwe, bi metoda têkel ji bo ku encamê wan hev tamam bikin û destek bikin sepandin.

Li gorî encamên xebata me di navbera helwesta kurdîzanan û zimanê wan ê pêwendiyê de têkiliyeke xurt heye. Di xebata me ya kantîtatîv de li gorî encamên pîvaneka ku me bi kar anî; ji testa KMO (Kaiser-Meyer-Olkin) encama ,923 deranî ku di lîteraturê de wekî nirxekî mikemmel e û diçespîne ku pîvaneka me xwedî pêbaweriyeke berz e. Herwiha qatjimara pêbaweriyê ya Cronbach-alfa jî wekî ,928 hate dîtin ku ev jî rêjeyeke berz a qatjimara pêbaweriyê tê qebûlîkirin di lîteratûra vê biwarê de.

Dema em li encama daneyên xwe dinêrin; em dibînin, ji 310 kesên ku pîvaneka me bersivandine, puanê wan ên helwestê herî berz; 155,00 û herî kêr; 65,00 derketiye û nirxê nîvteva helwesta wan jî wekî; 126,2903 derketiye ku ev jî wekî rêjeyeke berz a helwesta wan a kurdî nîşan dide. Li aliyekî din li gorî zayendê; puanê helwestê yê mêran; 129,5636 û yê jinan jî; 118,2889 derketiyê ku ev jî nîşan dide navbera pûanê helwesta herdu zayendan de ferqeke berçav heye. Dema em li encama daneyên T-Testê dinêrin; Sig. (2-tailed)/Watedarî (2-alî) wekî; ,000 derketiye, ku ev jî asteke watedar a cudahiya helwestan nîşan dide. Li gorî wê, mêr xwedî helwesteke berztir in raber zimanê xwe yê serî li gorî jinan û bi vê, merî dikare

bêje mumkîn e mîrên kurdîzan ji ber têrayiya ser kurdî û mijûliya pêre bûne xwedî helwesteke berz li gorî jinan.

Heçî li gorî meslekê kurdîzanan e; li gorî testa ANOVAYê nirxê watedariyê ya helwesta wan; ‘,716’, li gorî rewşa perwerdeyê ya kurdîzanan, di encama T-Testê, nirxê watedariyê; ‘,986’ û li gorî temenê kurdîzanan jî, di encama testa ANOVAYê de, nirxê watedariyê; ‘,663’ derketiye ku nîşan dide ferqeke watedar di nav helwesta wan de derneketiye, loma em dikarin bêjin helwesta kurdîzanan li gorî karê wan, perwerdeya ku dîtine (ya tirkî) û temenê wan nêzî hev e.

Li aliyekî din ev lêkolîn bersiva pirsê wekî; ‘Tu xwendin û nivîsandina kurdî çawa hîn bûyî?’ digere ku li gorî hersê bersivên wan ên ‘ji mal/malbatê’, ‘ji mekteb/qursê’ û ‘bi keda xwe’ têderket di navbera şeweya hînbûna zimanê wan û helwesta wan de tîkiliyeke watedar heye. Li gorî bersivan, ji 310 kesên; 158 kes xwendina xwe ya kurdî ji malbata xwe hîn bûne, 98 kes bi keda xwe û 54 kes jî bi çûna mekteb an jî qursê hîn bûne. Lê dema em pûanê nivteva helwesta wan a raber kurdî dinêrin; kurdîzanên ku kurdî ‘bi keda xwe hîn bûne’ bi pîleya 131,1633 pûanê herî berz standine. Pûanê nivtev a kesên ku kurdî ‘ji mekteb/qursê’ hîn bûne 127,2963 û yên ‘ji mal/malbatê’ hîn bûne jî 122,9241 e. Dema me hersê grûp, bi testa ‘berawirdiya geleyî’ dan ber hev; di navbera kurdîzanên ku kurdî ‘bi keda xwe hîn bûne’ û yên ‘ji mal/malbatê’ hîn bûne de nirxê watedariyê wekî; ‘,003’ derket ku ev jî nîşan dide, di navbera van herdu grûpan de ferqeke watedar raber zimanê wan ê serî heye.

Dîsa me di anketa xwe de sê pirsên tîkîlî ‘rewşa siyasî’, ‘rewşa aborî’ û ‘prestîjê’ kirin ku ev hersê xusûsiyet girîng in li ser terciha ziman bi taybet di civakên kêmeper de. Pirsên me ev bûn: ‘Rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî, ez ê di jiyana xwe de bêtir kurdî bi kar bînim.’, ‘Eger rewşa min a aborî bi bikaranîna kurdî baştir be, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.’ û ‘Eger bikaranîna kurdî prestîja min zêde bike, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.’ Îja dema em encamên daneyan dinêrin, di bersivên hersê pirsan de, nimûneyan bersivên ‘erê’ bêtir dane ku ev jî nîşan dide kurdîzan dixwazin rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî, aboriya wan bi bikaranîna kurdî baştir be û ew bi bikaranîna kurdî bibine xwedî prestîj ku hingê ew ê bêtir xwedî li kurdî derkevin. Û wextê em li nivteva pûanên wan dinêrin; di

hersê grûpên rewşa siyasî de, yên ku ‘erê’ gotine; ‘128,4733’, di hersê grûpên rewşa aborî de, yên ku ‘tişteke naguhere’ gotine; ‘128,8475’ û di hersê grûpên prestîjê de, yên ku ‘tişteke naguhere’ gotine; ‘130,2561’ wekî pûanên berzîrîn ên helwestê bi dest xistine. Lê dema em li gorî van hersê pirsan, di navbera grûpan de, li gorî testa ANOVAYê dinêrin, bi rêzê, rewşa siyasî wekî; ‘,000’, rewşa aborî wekî; ‘,001’ û prestîjê jî wekî; ‘,022’ derketiye ku navbera hersê bersivan ên van grûpan de ferqeke watedar heye li gorî helwesta bersivdaran.

Lê li aliyekî din, di xebata kalîtatîv de jî; me 8 jê mêr, 8 jî jin bi 16 kesan re hevdiştin pêk anîn û ev beşdarên xwe jî, li gorî pûanê wan ê pîvaneka helwesta ziman a xebata kantîtatîv wekî ‘helwest-berz’ û ‘helwest-nizm’ kirine du grûp. Ji herdu grûpan, 8 kesên ji grûpa helwest berz perwerdeya kurdî dîtine wekî; çûyîna qursê, mastir an jî doktoraya kurdî. Ji 8 kesên grûpa helwest nizm jî, yekî tenê bi çûyîna qursê perwerdeya kurdî dîtîye lê yên din perwerdeyê kurdî nedîtine. Piştî ku me notên hevdiştinê deşîfre kirin, me li gorî bersivên wan kodên sereke bijartin û ew di bin sê temayan de civandin. Me temayên xwe, wekî: ‘mecbûriyet û pêdivî’, ‘aîdiyet’ û ‘têrayîya ziman’ bi nav kirin û li gorî frekansê kodan me ew rave kirin. Dema em li kodên temayên xwe û frekansê wan dinêrin li gorî 16 beşdarên xwe, kodên temaya mecbûriyet û pêdivî’yê; ‘Tirkî zimanê fermî ye’ 16, ‘Tirkî berbelav e’ 3, ‘Ez mecbûrî tirkî bi kar tînim’ 6, ‘Dixwazim kurdî bijî/normalîze be’ 6, ‘Mixatab nas be kurdî tercîh dikim’ 7, ‘Mixatab tirkînezan be kurdî diaxivim’ 6 û ‘Eger îhtiyac hebe kurdî tercîh dikim’ 3 ne. Temaya duyem ‘aîdiyet’ê jî bi rêzê ev kod û frekans derxistine: ‘Kurdî nasnameya min e’ 7, ‘Kurdî zimanê min e’ 5, ‘Kurdiya min ne pir baş e’ 7, ‘Wekî bertek kurdî tercîh dikim’ 3 û ‘Tirkî bêtir berbelav e’ jî 3 ne. Kod û frekansên wan li gorî temaya ‘têrayîya ziman’ jî wiha ne: ‘Asta kurdiya min qels e’ 7, ‘Tirkî hêsan e’ 5, ‘Perwerdeya fermî’ 3, ‘Devokên cuda’ 4, ‘Xweifadekirin’ 6 û ‘Têkgihaştin’ jî 7 e.

Îja eger em bersivên beşdarên xwe rave bikin; beşdarên helwest-berz ji bilî saziyên fermî di sehayên gel de bêtir kurdî bi kar tînin/dixwazin bi kar bînin, ew kurdî wekî nav û nasnameya xwe dibînin û dema dikevîne têkiliyê bi herdu zimanan jî xwe rihet hîs dikin. Lê heçî beşdarên helwest-nizm in, ew; ziman bêtir wekî amrazekî yan jî kanaleke pêwendiyê dibînin û ji ber ku tirkî fermî, berbelav e û

kurdiya wan li gorî tirkî ewqas nebaş e ew bi tirkî bêtir xwe rihet hîs dikin di hingama pêwendiya axaftinê de. Dîsa divê em vê jî bêjin; grûpa helwest-berz ji bo ku bi kurdî perwerde dîtine/dibînin (qurs-mastir-doktora), ji bersivên wan tê dertê, ew bêtir bixwebawer in û xwedî şîûra ziman in li gorî yên perwerdenedîtî ku ev jî girîngiya perwerde û pedagojiya ziman nîşan dide.

Di lêkolîna me de derket ku li ser tercîha zimanê kesan di hingama pêwendiyê de li dorwarên duziman şert û mercên sosyal (statûya ziman, berbelavbûna ziman, asta ziman a mixatab, mekan) û yên psîkolojîk (hesta aîdiyetê, hesta xwe nêzîk/nas hîskirinê, şiyana/hesta xwe îfadekirinê) li ser tercîhkirina ziman girîng in.

Li aliyekî din divê em bêjin ku xebata me bi navenda Bajarê Wanê ve sînorkirî bû lê xebatên wekî vê dikare li gelek bajarên kurdan ên duzarava yan jî duziman heta sêziman bê sepandin. Herwiha ne tenê di nav sînorên bajarekî, lê ew dikare li sehayêke firehtir bê sepandin. Bo nimûne; ji bo berhevkirina daneyan, anketên xebatê bi rêya formên elektronîk di gelek bajaran, li ser nifûseke mezintir dikare bê sepandin. Dîsa ne tenê helwest, xebatên li dor dên û motîvasyonê yên xwendevanan, kurdîzanan, mamosteyan jî dikare bê pîvandînin bi vê rêbazê. Wekî din ji bo ku ev xebat bi rêbaza têkel herdu metodên lêkolînê jî dihewîne, xebatên bi yek metod dikare bê sepandin. Bo nimûne; eger sînorê cografîyê firawan be, xebatên kalîtatîv yên ku daneyên wê xwe dispêre hevpeyvînan li ser nivîskarên kurdî dikare bê sazîkirin.

Wekî gotina dawî em hêvî dikin ev xebat ew ê bibe tîkariyeke mitewazî di nava zanista kurdî ya pêşeroj-geş û bikeve ber îstifadeya lêkolînerên biwarên sosyolînguîstîk û psîkolojiya civakî.

JÊDER

Abubakari, Ayishetu (2016), *Türkçe Öğrenen Yabancı Öğrencilerle İngilizce Öğrenen Türk Öğrencilerin Motivasyon Durumlarının Karşılaştırılması*, Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Ankara.

Akin, Salih (2013), *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Weşanên Avesta, Stenbol.

Aksan, Doğan (2009), *Her Yönüyle Dil: Ana Çizgileriyle Dilbilim*, TDK Yayınları, Ankara.

Alkan, V., Şimşek, S. & Armağan Erbil, B. (2019), 'Karma yöntem: Öyküleyici alanyazın incelemesi', *Eğitimde Nitel Araştırmalar Dergisi – Journal of Qualitative Research in Education*, 7(2), 558-581.

Arslan, Sevda (2015), *Language Policy in Turkey and Its Effect on the Kurdish Language*, Western Michigan University, USA.

Baki, A. & Gökçek T. (2012), 'Karma Yöntem Araştırmalarına Genel Bir Bakış', *Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi*, Sonbahar, cilt. 11, s.42.

Baltacı, Ali (2018), 'Nitel Araştırmalarda Örnekleme Yöntemleri ve Örnek Hacmi Sorunsalı Üzerine Kavramsal Bir İnceleme', *Bitlis Eren Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, cilt.7, sayı.1, Haziran, s. 231-274.

Bazidî, Mela Mehmûdê (2010), *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, amd: Ziya Avcı, Weşanên Lîs, Amed.

Blomfield, Leonard (1933), *Language*, George Allen & Unwin Ltd. Museum Street, London.

Bhattacharjee, Anol (2012), *Social Science Research: Principles, Methods, and Practices*, Universty of South Florida, USA.

Boyner, G. & Dickel N. (2011), 'Attitudes and Attitude Changes', *Annual Review of Psychology*, iss. 62, p. 391-417, Department of Psychology, University of Bielefeld.

Busmann, Hadumod (2006), *Dictionary of Language and Linguistic*, translated and edited: Gregory Trauth and Kerstin Kazzazi, Routledge, Newyork and London.

Büyüköztürk, Şener (2005), 'Anket Geliştirme', *Türk Eğitim Bilimleri Dergisi*, 3. Cilt, Sayı. 2, s. 133-155.

_____ (2016), *Sosyal Bilimler İçin Veri Analizi El Kitabı: İstatistik Araştırma Deseni SPSS Uygulamaları ve Yorum*, 6. Baskı, Pegem A Yayıncılık, Ankara.

Coşkun, V., Derince M. Ş. & Uçarlar N. (2010), *Kula Ziman*, wer: Elîxan Lorin & Ergin Öpengin, weş: DÎSA, Amed.

Chambers, J.K. & Trudgill, P. (2004) *Dialectology*, Cambridge University Press, UK.

Cîhanî, Perwîz (2013), *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Creswell, John W. (2013), *Nitel Araştırma Yöntemleri*, Beş Yaklaşımına Göre Nitel Araştırma ve Araştırma Deseni, çev: Mesut Bütün & Selçuk Beşir Demir, çapa 3yan, Siyasal Yayınları, Ankara.

_____ (2014), *Research Design - Qualitative, Quantitative and Mixed Methods Approaches*, Sage Publications, University of Nebraska, Lincoln.

Crystal, David (2000), *Language Death*, Cambridge University Press, New York.

_____ (2008), *A Dictionary of Linguistics and Phonetics*, Blackwell Publishing, çapa 6an, UK.

Çiçek, Cuma (2013), *Zimanek Çima Tê Qedexekirin: Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê, ji Înkarê ber bi Nasînê*, Weşanên Peywend, Stenbol.

Dilbilim Sözlüğü (2011), Kamile İmer, Ahmet Kocaman, A. Sumru Özsoy, Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, İstanbul.

Della Porta, Donatella & Keating Michael (2015), *Sosyal Bilimlerde Yaklaşımlar ve Metodolojiler: Çoğulcu Bir Perspektif*, Küre Yayınları, İstanbul.

Derince, M. Şerif (2010), *The Role of First Language (Kurdish) Development in Acquisition of a Second (Turkish) and a Third Language (English)*, Yüksek Lisans Tezi, Boğaziçi Üniversitesi, İstanbul.

Deumert, Ana (2011), 'Multilingualism', *The Cambridge Handbook of Sociolinguistics*, (ed. Rajend Mesthère), p. 261-282, Cambridge University Press, New York.

Edwards, John (2003), *Multilingualism*, Routledge, Newyork and London.

Eker, Süer (2008), 'Türk Dili Tarihinde Bir Dilbilim Temas Bölgesi Olarak Diyarbakır', *Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Diyarbakır*, (ed: Bahaeddin Yediyıldız & Kerstin Tomenendal), Yayınevi: Diyarbakır Valiliği, Ankara.

Ergin, Muharrem (2009), *Edebiyat ve Eğitim Fakültelerinin Türk Dili ve Edebiyatı Bölümleri İçin- Türk Dilbilgisi*, Bayrak Yayınları, İstanbul.

Fanon, Frantz (2016), *Siyah Deri Beyaz Maskeler*, çev: Cahit Koytak, Encore Yayınları, İstanbul.

Farqînî, Zana (2004), *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.

Franceschini, Rita (2002), 'Code-Switching And The Notion Of Code In Linguistics' *Code-Switching in Conversation*, (ed. Peter Auer), Routledge, London & Newyork.

Filiz, M. Şirin (2017), 'Sosyolinguistik û Jousha A. Fishman', *Gotarên Zimannasiyê*, (ed. Kenan Subaşı & Resul Geyik), Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Garcia, Ofelia (2012), 'Ethnic identity and language policy', *Language Policy*, (ed. Bernard Spolsky), Cambridge University Press, UK.

Geyik, Resul (2017), 'Bidestxistina Zimanê Duyem', *Gotarên Zimannasiyê*, (ed. Kenan Subaşı & Resul Geyik), Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Haig, G. & Öpengin, E. (2014), 'Regional Variation in Kurmanci: A Preliminary Classification of Dialects', *Kurdish Studies*, v. 2, p. 143-176.

Hassanpour, Amir (2005), *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)*, Weşanên Avesta, Stenbol.

Haugen, Einar (1966), 'Dialect, Language, Nation', *Blackwell Publishing on behalf of the American Anthropological Association*, v. 68, no. 4 (Aug., 1966), p. 922-935.

Hickey, Raymond (2007) *Language and Society*, Cambridge University Press, UK.

Hoffmann, Ch. (1991), *In Introduction to Bilingualism*, ed: Logman, Newyork.

Hogg, Michael A. & Vaughan, Graham M. (2010), *Essential of Soccial Psychology*, Pearson Education Limited, England.

_____ (2014), *Sosyal Psikoloji*, 7. basım, çev: İbrahim Yıldız – Aydın Gelmez, Ütopya Yayınları, Ankara.

Kasap, Süleyman (2015), *The Role of Attitude in the First Language Attrition Among Kurdish Bilingual Adolescents in Turkey*, Doktora Tezi, Aydın Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Aydın.

_____ (2019), ‘Akademisyenlerin Gözünden Türkiye’deki İngilizce Eğitimi’ *YYÜ Eğitim Fakültesi Dergisi (YYU Journal of Education Faculty)*, 2019; 16(1): 1032-1053.

Kayaoğlu, Aysel (2011), *Sosyal Psikoloji-I* (ed. Sezen Ünlü), Anadolu Üniversitesi Yayınları, Eskişehir.

Kazazoğlu, Semir (2011), *Anadili ve Yabancı Dil Derslerine Yönelik Tutumun Akademik Başarıya Etkisi*, Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara.

Keblawî, Faris, ‘A Review of Language Learning Motivation Theories’, <https://pdfs.semanticscholar.org/...>, (pêwendî-20.08. 2019)

Kıran Abdullah (2014), *Ferhenga Zanistên Civakî*, Weşanên Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol.

Köklü, Nilgün (1995), ‘Tutumların Ölçülmesi ve Likert Tipi Ölçeklerde Kullanılan Alternatif Seçenekler’, *Eğitim Bilimleri Fakültesi Dergisi*, 28(2), 81-93.

Kuppuswamy, B. (1961), *An Introduction to Social Psychology*, Asia Publishing House, printed in India.

Kurt, Şehmuz (2017), ‘Bidestxistina Zimanê Yekem’, *Gotarên Zimannasiyê*, (ed. Kenan Subaşı & Resul Geyik), weşanên Nûbihar, Stenbol.

Ladegaard, Hans J. (2000), ‘Language Attitudes and Sociolinguistic Behaviour: Exploring Attitude-Behaviour Relations in Language’, *Journal of Sociolinguistic*, 4/2, 214-233.

Liddicoat, Anthony (1991), ‘Bilingualism: an Introduction’, ResearchGate, National Languages Institute of Australia.

Marshall, Gordon (2005), *Sosyoloji Sözlüğü*, çev: Osman Akınhay & Derya Kömürcü, Bilim ve Sanat Yayınları, Ankara.

Mostyn, Barbara J. (1978), *The Attitude Behaviour Relationship*, Report no. 15, Marketing Communications Research Centre.

Millon, Theodore & Lerner Melvin J. (2003) 'Personality and Social Psychology-volume 5' *Handbook of Social Pshichology*, (ed: Irving B. Weiner), John Wiley & Sons, Inc., Canada.

Mukriyanî, Hejar (1988), *Ferhengî Kurdî-Farîsî*, Cilda yekem, Weşanên Sirûş, Tehran.

Oruç, Şerif (2016), 'Ana Dili, İkinci Dil, İki Dillilik, Yabancı Dil', *The Journal of Academic Social Science Studies*, Spring, no. 45, p. 279-290.

Öpengin, Ergin (2011), *Rewşa Kurdî ya Sosyolînguîstîk li Tirkiyeyê*, Weşanên Avesta, Stenbol.

Pëndroyî, Mihemed Salih (2018), *Ferhengî Peyv*, Bergî Hunerî Tişk, Hewlêr.

Punch, Keith F. (2005), *Sosyal Araştırmalara Giriş: Nicel ve Nitel Yaklaşımlar*, çev: Dursun Bayrak, H. Bader Arslan, Zeynep Akyüz, Siyasal Yayınları, Ankara.

Schilling-Estes, Natalie (2013), *An Introduction to Language and Linguistics*, (ed. Fasold & Connor-Linton), Cambridge University Press, New York.

Shukla, S. & Connor-Linton, J. (2013), 'Language Change', *An Introduction to Language and Linguistics*, (ed: Ralph W. Fasold û Jeff Connor-Linton), Cambridge University Press, UK.

Subaşı, Kenan (2017), 'Peyvnasî (Lexicology)', *Gotarên Zimannasiyê*, (ed. Kenan Subaşı & Resul Geyik), Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Social-psychology, www.resources.saylor.org, -(pêwendî, 15.01.2019)

Spolsky, Bernard (2004), *Language Policy*, Cambridge University Press, UK.

Stangor, Charles (2011), *Principles of Social Pshichology*, The Saylor Foundation (original source), The Open University of Hong Kong.

Şahin, Çavuş (2013), 'Veri Toplama Teknikleri', *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (ed: Remzi Y. Kıncal), Nobel Yayınları, 2. basım, Ankara.

Tavşancıl, Ezel (2018), *Tutumların Ölçülmesi ve SPSS ile Veri Analizi*, Nobel Yayınları, 6. Basım, Ankara.

The Kurdistan and Kurds (1919), Qatar National Library, http://www.qdl.qa/en/archive/81055/vdc_100000000239.0x00013c, (pêwendî – 01.01.2019)

Thomason, Sarah G. (2001), *Language Contact*, Edinburg University Press, Edinburg.

Trask, R.L. (2007), *Key Concepts in Language and Linguistics*, (ed. Stockwell, P.), Routledge, Oxon.

Varol, Orhan (2014), *Türkçe –Kürtçe Dil Etkileşimi: İkidilli Konuşuculara Ait Verilerdeki Dilbilimsel Görünümler*, Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara.

Wardhaugh, R. & Fuller, Janet M. (2015), *An Introduction to Sociolinguistics*, Seventh Edition, Willey Blackwell Publishing, Oxford.

Xanî, Ehmedê (2009), *Mem û Zîn*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.

Yeşil, Rüştü (2013), ‘Nicel ve Nitel Araştırma Yöntemleri’, *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (ed: Remzi Y. Kıncal), Nobel Yayınları, 2. basım, Ankara.

Yıldız, Mehmet Zeydin (2016), ‘XIX. Yüzyılda Van’ın Demografyası’, *Van Kent Araştırmaları*, haz: Suvat Parin, Bağlam Yayınları, İstanbul.

Yıldız, Süleyman (2007), ‘Kimlik ve Ulusal Kimlik Kavramlarının Toplumsal Niteliği’, *Milli Folklor*, yıl 19, s. 74.

Yıldırım, A. & Şimşek, H. (2011), *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*, Seçkin Yayıncılık, 11. Basım, Ankara.

http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5c2d314c561af6.56950146, (pêwendî, 03.01.2019)

http://2012books.lardbucket.org/social_psychology_principles, (pêwendî, 17.01.2019)

<https://dictionary.apa.org/motive>, (pêwendî, 24.01.2019)

<https://www.gazeteduvar.com.tr/kitap/2016/12/01/fuzulinin-kurtce-siirleri/>, (pêwendî, 08.02.2019)

PÊVEK -1

1. Forma Anketê ya Kurdî

Anketa Helwesta Ziman a Kesane (ji bo Duzimanan) (AHZK)

Ev anket (pirsname) ji bo rewşa kurdîzanan û helwesta wan a li ser zimanê wan ê pêwendiyê bipîve hatiye amadekirin. Daneyên ku ji vê pîvanekê bi dest ketin ew ê di xebateke zanistî de bi kar bên û ew ê nebin para kes an saziyeke din.

Ji ber têkilî û bersivandina we ya samimî em spas dikin.

Ji kerema xwe pirsan bibersivîne yan jî yên li te tîn bi nîşana X nîşan bike.

BEŞA I

1. Tu çend salî yî? Ez salî me.

2. Tu Mêr an Jin î?

3. Tu xwe çi dihisî?

Kurd

Tirk

Ê din

4. Tu çi karî dikî?

Mamoste Karmend Esnaf Mela Karsaz

Xwendevan Karker Parêzer Xebatkarê tendurustiyê

Bêkar Ê din

5. Rewşa te ya perwerdeyê çi ye?

Seretayî Navîn Lîse Lîsans Mastir

6. Zimanê dikarî biaxivî li jêr binivîse:

Zimanê te yê serî (zimanê dayikê).....

Zimanê te yê duwem.....

Zimanê te yê sêyem (eger hebe).....

7. Zimanê serî yê dayika te çi

ye?.....

8. Kesên li jêr re piranî bi kîjan zimanî diaxivî.

Kes	Ziman
Bi diya xwe re
Bi bavê xwe re
Bi xûşk û birayê xwe re
Bi hevalên xwe re

9. Li ciyên jêrê, piranî bi kîjan zimanî diaxivî.

Cî	Ziman
Li mektebê
Li malê
Li ser kar
Derva (li qehwe, park û wd.)

10. Tu xwendin û nivîsandina kurdî çawa hîn bûyî?

Li malê, ji malbatê Li qursê/mektebê Bi keda
xwe

11. Asta zimanê te yê serî çawa ye?

Nivîsandin	Axaftin	Xwendin	Guhdarî
<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş
<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş
<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal
<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş

12. Asta zimanê te yê duwem çawa ye?

<u>Nivîsandin</u>	<u>Axaftin</u>	<u>Xwendin</u>	<u>Guhdarî</u>
<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş	<input type="checkbox"/> Pir baş
<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş	<input type="checkbox"/> Baş
<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal
<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş	<input type="checkbox"/> Nebaş

13. Rewşa siyasî destekê bide pêşketina kurdî, ez ê di jiyana xwe de bêtir kurdî bi kar bînim.

Erê Hinekî Tiştek naguhere

14. Eger rewşa min a aborî bi bikaranîna kurdî baştir be, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.

Erê Hinekî Tiştek naguhere

15. Eger bikaranîna kurdî prestîja min zêde bike, ez ê bêtir xwedî li kurdî derkevim.

Erê Hinekî Tiştek naguhere

BESA II

Ji kerema xwe pirsan bibersivîne yan jî ya li te tê, bi X nîşan bike. Ji bo her maddeyekê 30 saniyeyan nebore.

Hevokên li jêr bixwînin û bersivên li we tên bi nîşana X nîşan bikin.	BI TEMAMÎ WISA YE	WISA YE	NE ERÊ NE NA	NE WISA YE	QET NE WISA YE
1. Dema ez bi kurdî diaxivim (xeber didim) endîşe dikim ku ez ê xeta bikim.					
2. Dema ez bi kurdî diaxivim ditirsim ew ê bi min bikenin.					
3. Ew ên zimanê wan wekî yê min e, ez bi wan re bi zehmetî diştexilim.					
4. Dilê min naxwaze ez bi kurdî biaxivim.					
5. Ez bi kurdî naxivim çunkî eger ez biaxivim însanên din ew ê bi nebaşî berê xwe bidine min.					
6. Ez bawer im ku axaftina bi kurdî ji bo min ew ê ne baş be.					
7. Li gorî min divê meriv pêşî zimanê fermî yê welatê lê dijî hîn be.					
8. Ku kurdî hatibe pirsîn jî ez carna bersivên tirkî didim.					
9. Li mektebê ez bi hevalên xwe yê kurd re axaftina tirkî tercîh dikim.					
10. Li malê ez bi dê û bavê xwe re yan jî ehlê malê re tirkî tercîh dikim, zimanê wan ê dayikê kurdî be jî.					
11. Ez bi tirkî difikirim paşê bi kurdî dibêjim.					
12. Dema ez bi tirkî diaxivim ez xwe rehet hîs dikim.					
13. Ez tenê eger mecbûr bimînim bi kurdî diaxivim.					
14. Ez ditirsim dema ez kurdî biaxivim hevalên min ên kurdiya wan baş in, ew ê bi min bikenin.					

15. Ez bi tirkî diaxivim, malbat û hevalên min kêfxweş dibin.					
16. Eger ez tirkî baş bizanibim, ev bes e ji bo jiyana min a li Tirkîyeyê.					
17. Dema ez cem dê û bavê xwe me li ciyên fermî(wekî; mekteb, kargeh, civîn, banka, pirtûkxane, mixaze, avahiyên îdarî) ez dixwazim bi wan re tirkî biaxivim.					
18. Ez hêstên xwe bi tirkî baştir îfade dikim.					
19. Kurdiya min nebaş be jî ez rehet im dema li pêş însanan kurdî diaxivim.					
20. Li mektebê bi hevalên xwe yên kurd re ez axaftina kurdî tercîh dikim.					
21. Li malê ez bi dê û bavê xwe re axaftina bi kurdî tercîh dikim ew bi tirkî bikarin biaxivin jî.					
22. Ez bi kurdî diaxivim, malbat û hevalên min kêfxweş dibin.					
23. Ez wisa hîs dikim ku ew ê bibe zirareke mezin eger ez nikaribim bi kurdî biaxivim, bixwînim û binivîsim.					
24. Mihafazakirina zimanê min ê dayikê ji bo min muhîm e.					
25. Ez dikim ku kurdî biaxivim çendî xeta û kêmasiyên min hebin jî.					
26. Ez hêstên xwe bi kurdî baştir îfade dikim.					
27. Di her firsendê de, kengê dibe bila bibe ez zimanê xwe yê serî diaxivim.					
28. Dema ez cem dê û bavê xwe me li ciyên fermî(wekî; mekteb, kargeh, civîn, banka, pirtûkxane, mixaze, avahiyên îdarî) ez dixwazim bi wan re kurdî biaxivim.					
29. Ez ji gelê kurd û çanda kurdan hez dikim.					
30. Ez bêtir rehet im dema ez bi kurdî diaxivim.					
31. Ez ji xwendina kurdî hez dikim.					

2. Türkiye Forma Anketi

Kişisel Dil Tutum Anketi (iki dilliler için)

Bu anket Kürtçeyi bilenlerin iletişim kurdukları dile ilgili tutumlarını ölçmek amacıyla hazırlanmıştır. Bu ölçekten elde edilecek veriler bilimsel bir çalışmada kullanılacak ve hiçbir kişi veya kurumla paylaşılmayacaktır.

İlginiz ve cevaplandırmadaki samimiyetinizden dolayı teşekkür ederiz.

Lütfen soruları cevaplayınız ya da size uyan kutucukları X işareti ile işaretleyiniz.

I. BÖLÜM

1. Kaç yaşındasınız? Ben yaşıdayım.

2. Cinsiyetiniz? Erkek Kadın

3. Kendinizi nasıl tanımlarsınız?

Kürt

Türk

Diğer

4. Hangi işle meşgulsünüz?

Öğretmen Memur Esnaf İmam İş insanı

Öğrenci İşçi Avukat Sağlık çalışanı

İşsiz Diğer

5. Öğrenim durumunuz?

İlkokul Ortaokul Lise Lisans Mastır

6. Lütfen konuştuğunuz dilleri yazınız:

Anadiliniz/Birinci diliniz:.....

İkinci diliniz:.....

Üçüncü diliniz (varsa):.....

7. Annenizin anadili?.....

8. Lütfen yazınız, aşağıdaki kişilerle daha çok hangi dille konuşursunuz.

Kişi	Dil
Annenizle
Babanızla
Kardeşlerinizle
Arkadaşlarınızla

9. Lütfen yazınız, aşağıdaki yerlerde daha çok hangi dille konuşursunuz.

Kişi	Dil
Okulda
Evde
İşte
Dışarda (Kahve, alışveriş merkezi vb.)

10. Kürtçe okuma yazmayı nasıl öğrendiniz?

Evde, aileden Okulda/kursta Kendi çabamla

11. Anadil seviyeniz nasıldır?

Okuma	Konuşma	Okuma	Dinleme
<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi
<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi
<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal
<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü

12. İkinci dilinizin seviyesi nasıldır?

Okuma	Konuşma	Okuma	Dinleme
<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi	<input type="checkbox"/> Çok iyi
<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi	<input type="checkbox"/> İyi
<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal	<input type="checkbox"/> Normal
<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü	<input type="checkbox"/> Kötü

13. Eğer siyasi durum Kürtçenin gelişmesini desteklerse ben Kürtçeyi daha çok kullanırım.

Evet Biraz Değişen bir şey olmaz

14. Eğer ekonomik durumum Kürtçeyi kullandığımdan dolayı daha iyi olursa Kürtçeye daha çok sahip çıkarım.

Evet Biraz Değişen bir şey olmaz

15. Eğer Kürtçeyi kullandıktan dolayı daha prestijli olursam Kürtçeye daha çok sahip çıkarım.

Evet

Biraz

Değişen bir şey olmaz

II. BÖLÜM

Lütfen soruları cevaplayınız ya da sizin için uygun olan ifadeleri X ile işaretleyiniz. Her bir madde için 30 saniyeyi geçmeyiniz.

Aşağıdaki cümleleri okuyunuz ve size uyanları X işareti ile işaretleyiniz.	TAMAMEN KATILYORUM	KATILYORUM	KARARSIZIM	KATILMIYORUM	KESİNLİKLE KATILMIYORUM
1. Kürtçe konuştuğum zaman hata yapabilirim diye endişeleniyorum					
2. Kürtçe konuştuğum zaman bana gülecekler diye korkuyorum.					
3. Anadili benimle aynı olan kişilerle zorlukla iletişim kuruyorum.					
4. Kürtçe konuşmak içimden gelmiyor.					
5. Ben Kürtçe konuşmuyorum çünkü diğer insanlar bana olumsuz tepki verecekler.					
6. Kürtçe konuşmanın benim için iyi olmadığına inanıyorum.					
7. Bana göre insan önce yaşadığı ülkenin resmi dilini öğrenmelidir..					
8. Kürtçe sorulsa da bazen Türkçe cevaplar veririm.					
9. Okulda Kürt olan arkadaşlarımla Türkçe konuşmayı tercih ederim.					
10. Evde anne ve babamla ya da evdeki diğer aile fertleriyle Türkçe konuşmayı tercih ederim anadilleri Kürtçe olsa bile.					
11. Önce Türkçe düşünürüm sonra Kürtçe ifade ederim.					
12. Türkçe konuştuğumda kendimi rahat hissederim.					

13. Sadece mecbur kalırsam Kürtçe konuşurum.					
14. Kürtçe konuştuğum zaman Kürtçesi iyi olan arkadaşlarımın bana gülmesinden korkuyorum.					
15. Türkçe konuştuğumda ailem ve arkadaşlarım mutlu olurlar.					
16. Türkçeyi iyi bilirse Türkiye'deki hayatım için bu yeterlidir.					
17. Annem ve babamın yanıdayken resmi alanlarda (okul, işyeri, toplantı, banka, kütüphane, mağaza, kamu binaları) onlarla Türkçe konuşmayı istiyorum.					
18. Duygularımı Türkçe daha iyi ifade ediyorum.					
19. Kürtçem iyi olmasa bile insanlarla konuştuğum zaman kendimi rahat hissediyorum.					
20. Okulda Kürt arkadaşlarımla Kürtçe konuşmayı tercih ediyorum.					
21. Evde anne ve babamla Kürtçe konuşmayı tercih ediyorum onlar Türkçe konuşabilseler de.					
22. Ben Kürtçe konuştuğumda ailem ve arkadaşlarım mutlu oluyorlar.					
23. Eğer Kürtçe konuşmazsam, okuyup yazamazsam benim için büyük bir kayıp olacağını düşünüyorum.					
24. Anadilimi korumak benim için önemlidir.					
25. Kürtçe konuşmaya çalışıyorum hata ve kusurlarım olsa bile.					
26. Duygularımı Kürtçe daha iyi ifade edebiliyorum.					
27. Her fırsatta, ne zaman olursa olsun anadilimle konuşmaya çalışıyorum.					
28. Annem ve babamın yanıdayken resmi alanlarda (okul, işyeri, toplantı, banka, kütüphane, mağaza, kamu binaları) onlarla Kürtçe konuşmayı istiyorum.					
29. Kürt Halkını ve kültürünü seviyorum.					
30. Kürtçe konuştuğumda daha rahat hissediyorum.					
31. Kürtçe okumayı seviyorum.					

PÊVEK -2

Forma Hevpeyvînê ya Tercîha Ziman

Ev form dixwaze bîr û raya kesên kurdîzan bigire derbarê tercîha zimanê wan ê axaftinê de li Bajarê Wanê. Bersivandina pirsan ew ê ji bo tezeke doktorayê ya Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî bi kar bê; bersivên hevpeyvînê û nav û nasnavê kesê bersivdar ew ê nebe para kes an saziyekê.

Bersivdarê/a Birêz!

Ji kerema xwe pirsên li jêr bibersivîne.

1. Di sehayên gel de (saziyên îdarî, kargeh, nexweşxane, mixaze, park û wd.) ji kurdî û tirkî hûn bêtir kîjan zimanê tercîh dikin, çima?
2. Hokerên (sebebên) we bi kurdî yan jî tirkî didine axaftin çi ne?
3. Hun bi kîjan zimanê xwe bêtir rehet hîs dikin, dema hûn bi însanên din re pêwendiyê datînin, çima?

PÊVEK -3

Notên Hevpeyvînan/Qeydên Dengan

Beşdarê -1

Pirsa 1.

Xusûsî ez kurdî tercîh dikim. Sedemên wê ji ber ku kurdî zimanê min e, zimanê vê axê ye, vê derê zimanê ewê dî kurdî ye, divê em ezmanê xwe biaxivîtin. Hinde sedemên dî jî hene, seba ku zimanek bimîne, dewam bike, nemire, ji holê ranebe divê mirov xeber bide, bike zimanê bazarê, bike zimanê fermî. Ber hindê çi danûstandinê da çi karê fermî da, nexweşxaneyan da saziyên dewletê da hindî ku ji min hat ez kurdî diaxivim. Însanan jî teşwîq dikim ku kurdî biaxivin.

Kengê tu tirkî diaxivî, mesela?

Tirkî, cihekî em bêjin ez pê bizanim ku kes bi kurdî nizane mecbûr ez ê tirkî xeber bidim, yek û hinde ciyên em bêjin zêde zêde fermî ciyên wek hêzên ewlehiyê lê hebin meriv nikaribe kurdî xeber bide mecbûr dimînim, ne bi dilxwaziya xwe tirkî xeber didim. Ji bilî wê ciyê ku ez bixwe lê dixebitim, ez diçim şolekî xwe biqedînim, fermî yan ne fermî, danûstandinê bi giranahî, bi zanyarî bi hişyarî kurdî diaxivim, hez dikim millet jî kurdî bersiva min bide.

Jixwe na be tu kurdî diaxivî?

Belê. Nebe jî ez diceribînim yanî hez dikem yê hemberî xwe jî teşwîq bikem û bizanim ka kurde yan ne bi taybetî jî tercîha xwe aliyê esnaf kesê kurdeyar ve didim wê çaxê. Gava bertek nîşan da, hinde cara dibe tu ji kurdiya wî fêhm dikî ku aciz dibe ez êdî wê tercîh nakim.

...

Bûvera Nimûne

Ew firina ez diçim nan distînim daîmî, serê ewil ez çend cara çûm, min kurdî xeber dida rojekê mêrkê misade kir go heval, tu kîderê dergevan î/kapici yî? Mi go ez çu dera dergevan nînim, min zanî ku seva kurdî xeberdana min hizir dike ku ez dergevan im. Ji piştî wê rojê ez çend cara bi kravata çûme dikana wî da bila bizane ne ku xwendevan bûyîn mamoste bûyîn, memûrbûyîn ne tiştêkî xwe mezinkirinê ye belê mi go bila bizanît ku kesê xwenda jî xusûsiyetê didin ezmanê xwe...

...

Bi kurtasî, sebebê tercîha min a kurdî, ya yekemîn ji ber ku zimanê min qedexe bûye ku ez wekî bertekeke dijberî zilmê ez wî bi kar tînin. Ya duduya; gotineke Celadet Bedirxan heye dibêje navbera kesê zilmker û kesê zilmê dibînin da, wan civakan, du tişt dikarin pêşiya wan vekin ew jêk xilas bin. Yek dîn e, eger dîn cuda be hingê hûn dikarin ji hev xilas bin. Lê dînê me û yê tirkan yek e. Wê derê ziman

tenê dimîne. Eger hûn ser ziman nasnameyekê ava bikin, siyasetekê ava bikin hûn ê zimanê xwe biparêzin...

Pirsa 2.

Tirkî cihê ku ez lê mecbûrî bimînim wê derê tenê heye, tirkî zimanekî biyanî ye ne ku zimanê min e. belkî ji zimanekî biyanî wêdatirê ya, bo çî ez îngilizî jî hîn dibim, farisî jî hîn dibim gele hej zimana dikim. Lê belê wextê hate tirkîyê ez car cara disekinim ji ber ku zilma li me hatî kirî hişê min da bertekek ava kiriye, wekî refleksekê jê dûr dimînim.

Çima ez kurdî tercîh dikim; yek, eva ye li hember zilmê sekinî ne. Ya duduya zimanê meriv ê netewî ye herkes zimanê xwe xeber dide. ya sisiya zimanekî xweş e şirîn edema mirov di romanekî da, helbestekî da yan jî flmekê da, gotarên zarokan da di çand û falklarkurdî da rastî wan berhemana têtin ez gelekî jê hez dikim ez xwe nava deryayekî da wek avjeniyê da hîs dikim.

Bûvera Nimûne

Mîna şanoyeke kurdî temaşe kiribû. Eger bêjne min di jiyana te da dema te ya herî xweş kîj bû? Ez ê bêjim ew şanoya kurdî bû.

Pirsa 3.

Rastî ji ber ku me perwerde tirkî dîtiye, doralîyê me tirkî zehf e, tirkî bo min hêsan têtin. Ez dikarim konferansekê deh saetan tirkî bidim lê kurdî belkî duseetan ancax mirov bihere. Eva bo hêsanîyê tirkî hêsan e belê bo rihetîyê na kurdî rihettir e bo min, wextê ez tirkî diaxivim çepê wê ez ne rihet dibim.

...

Bî pêşketina teknolojiyê, hebûna mekteban rêjeya tirkî zêdetir bû nava kurdan de, statuyekê kurdî çênebû loma tirkî pêş ket û kurdî yan wekî xwe ma yan jî paş ket.

...

Kurdiyekê xirab ji tirkîyê baş çêtir e. divê zimanê meriv xirab be jî divê dîsa meriv zimanê xwe xeber de.

...

Meriv bêtir di nav civaka xwe de rihet e. Cihê metropolan da tu dibînî asîmilasyon pêştir e. birangên min ên metropolan da dijîn, Mersînê kurdiya me têdigihên belê nikarin bersiva me bidin, birayê min ên em li kurdistanê mayîn têdigihin jî dikarin xeber jî biden. Çima? Dêrora kurdî da maye.

Beşdar-2

Pirsa-1.

Ez bixwe wek prensîb dixwazim kurdî nav sehayê gel da hebîtin, îllahî bi kurdî diaxivim. Loqente bîtin, xestexane bîtin, emniyet bîtin, polis bîtin. Ez dixwazim li wê derê kurdî meşru bibîtin ji ber ku meşruiyeta kurdî di nava her erdekî da çêbîtin, însanê miqabilî te jî bizane ku tu kurd î, ez kurdî diaxivim. Ez dibêjimê mesela. Çime xestexanê: doxtor mesela, dahîliye doktorî kêderê ye? heke go ne? Ez wê gavê bo tirkî dizivirînim. Yan çûme loqentê, bêjimê kebab hene? Heke go e nizanim ez wê gavê dixwazim bizivirînim ev ê sadece vêrê jî ne, Turkiyê jî ne Îranê jî, Îraqê jî, Kurdistanê, dewleteke dî dixwazim meşruiyeta kurdî pê çêbîtin.

Pirsa-2.

Kurdî zimanê min ê zikmakî ye. Zimanê min ê resen ê yekemîn e. Ji ber hindê ez dixwazim ku her kesek wekî her kesekê, çawa ku dixwazî zimanê wî di nava dewletê da di nava perwerdeyê da di nava siyasetê da di nava rojnamevaniyê da bête axaftin mesela îngilizek wîsa, emêrikîyek, erebek, milletekî wîsa e z jî dixwazim zimanê min bîtin. Ji ber hindê ez naxwazim zimanê min bîte zimanê duyemîn û yê sêyemîn û paşvedayî, wêredayî.

Ev ji ber fikra te ya milliyetê ye yan tu jê hez dikî?

Yanî herdu jî hene. Ema hestiyarî ye çunkî zaten ez kurd im. Yanî tiştêkî tabîî ye kurdî axaftina min. Wekî din jî şîûra millî heye çunkî zimanê me paş ve hatiye hêlandin, perwerdeya me nîne, ev tişte hanê nîne. Ez dixwazim ziman nav gel da nemirîtin. Yanî ew ê dî bîtin, însan va tiştê hanê biaxivin. Mesela em bêjin di nava civînê mezin da dema ez kurdî axiftim çu kes tênegêhîtin jî dîsa ez bi kurdî dest bi axaftina xwe dikim. Ez dibêjim lazime hûn jî kurdî bizanin, hewe jî haj vê tiştî hebîtin. Eger hewe divêtin aşî û selamêfî, başî û qencî bo millet hebîtin. Ji bo vê dewletê hebîtin lazim e kurdî hebîtin. Eger kurd nebe, çunkî milletekî hinde mazin, di nava dewletekê da çu îmkân nîne tu îlla bê ez ê vê asîmîle kem û vê ezmanê ji mirovan bime jîbîrkirin. Lazim e neyête jîbîrkirin, eve şîûra millî ye. Bes ya dî ya min xwezayî ye, herdu jî hene.

Sebebê axaftina te bi tirkî çî ye, çî dibe sebeb tu tirkî diaxivî?

Sebebê wê tek ew e ew ê miqabilî min kurdî nezanîtin. Eger însanekî miqabilî min dema ez kurdî gel axiftim, kurdî nezanîtin, tirk bîtin ez tirkî diaxivim. Ereb bîtin erebî gel daxivim, faris bîtin farisî gel daxivim yanî ezmanê wî çî bîtin ez wî gel wan diaxivim. Mesela gele caran mirovê îranî li kolanên wanê ez dibînim, ez dibêjimê, tiştêkî suwal dikim tedî farisî cewab da ez wê gavê farisî gel daxivim. Ji berk u eger zimanê ewil nezanîtin zimanê duyê gel daxivim.

Eger carna kurdê miqabilî te kurdekî Mardînê bîtin yan kurdekî Erzurumê bîtin baş tenegehîtin, wê gavê ferqa şeweyê hebîtin tirkî bo wî îzah dikim.

Pirsa 3.

Rastî ez xwe bi kurdî di axaftina rojane de, di nivîskariyê de, di jiyana rojane, em bêjin gel eyalêxwe, gel zarokê xwe, gel hevalê xwe, digel karmendê xwe wa tiştê hanê kurdî pitir rehet hîs dikim. Çunkî însanek kurdî bizanîtin bo min pitir xweş têtin çunkî ezmanê min ê êkemîn ew e. Lê eger ez bizanim miqabilê min kurdî nizane, pêwendiya wî bi kurdî ra nîne wê gavê tirkî jî bo min sextiyekî zêde çênaketin. Nexweşiyekî zêde çênaketin lewra ez xwe wekî însanekî yekziman nabînim, asîmîlebûyî nabînim. Ez tirkî jî wekî zimanê xwe yê fermî qebûl dikim, farisî jî min bo xwe girtiye elhemdulillah, erebiya min piçekî kême ez dixwazim ew ê jî çêkem û bibime çarziman, evê çarzimaniyê jî di jiyana xwe da wekî mirovekî misilman dixwazim bi kar bînim feqet bo min kurdî ji hemû gava rihettir e ji ber ku ez kurd im.

Beşdar-3

Pirsa 1.

Ez bi awayekî zanebûnî zêdetir kurdî tercîh dikim ji ber ku hem yên saziyan da dixebitin hem kurd bin hem tirk bin, bira hewcetiyeke wisa di wan da çêbe bira kurdî bi kar bînin ji ber ku milletê me yên diçine nexweşxaneyan û saziyan zêdetir zêdetir kal û pîrên tirkînezan in. Ez jî bi zanebûn kurdî tercîh dikim he ji bo ew kesê derdora min bibe nimûneyek.

Yanî normalîze be?

Erê, normalîze be, di saziyan da normalîze be. Hem hişmendiyek nav gel da çêbe bila qîmeta kurdî bizanibin. Yek jî wextê ez diçime saziyekî ji ber ku ez jî karmend im. Ew kesên ji gel bi çavekî dinêrin ku yekî mamoste ku di çavê wan da xwedî paye ye ku bi zimanê wan diaxive ew bêbaweriya wan a ji ber piçûkdîtina kurdî ji holê radibe. Yek jî ez bi kurdî xwe baştir îfade dikim û dixwazim li her deî bi zimanê min be. Çawa mesela kurdek yan jî tirkek here dewleteke cuda mecbûr e ziman wan hîn be, divê di Kurdistanê jî her karmend her sazî bi zimanê gel bizanibe li gorî wê biaxivin. Yanî ez dixwazim wê nîşan bidim. Nexweşxane filan be jixwe ez dema bi dê û bavê xwe ra yan jî bi zarokê xwe ra diçim ez kurdî tercîh dikim. Yanî ez ba wan jî dixwazim xwe kurdî îfade bikim. Saziyên fermî da jî êdî tiştêk destê min da nemîne, mecbûr bimînim wê çaxê ez xwe bi tirkî îfade dikim wekî eskeriyê. Yanî hin cih hene xweîfadekirin zehmet e, nêrîna wan jî nebaş e jixwe biyanî ne, jixwe ziman jî nizanin. Lê nexweşxane be yan jî ciyekî wisa jixwe pîranî kurd lê hene meriv dikare kurdî mixatab bibîne.

Pirsa 2.

Yanî sebebê yekem ez kurd im, nasnameya min e yanî zimanê dayîk, hebûna min e loma ez kurdî diaxivim. Ya duwem jî rewşa kurd ya niha xetereyê da ne. Ji her hêlê va ber bi asîmilasyonê, qirkirinê va diçe. Li hember wî bertekekê nîşan didim. Yanî dibe ku ev rewşa kurdî nebûya ev helwesta min belkî ewqas xurt nebûya. Yanî helwesta min a bi kurdî axaftinê zêdetir dike. Tirkî jî mecbûr bimînim. Yanî êdî tu îmkân tunebe ez tirkî bi kar tînim. Wekî din wekî ez bi kêf tirkî biaxivim yan bi kar bînim kê m e, kê caran.

Pirsa 3.

Ez bi kurdî bêtir xwe rihet hîs dikim. Ji ber ku heta şeşsaliya xwe min xêncî kurdî tu ziman nizanibû. Zimanê min ê dayikê ye û piştî wan xebatê min ên kurdolojiyê ku ev panzde şanzde sal in ez ser dixebitim, kurdiya min ji tirkî xurttir e hem ji hêla nivîskî hem hêla hestiyariyê ve, her hêlê ve ez xwe baştir îfade dikim. Cara wextê ez diaxivim ez hinek tiştê tirkî ji bîr dikim.

Yanî meriv dikare bêje di jiyana te da pileya kurdî zêdetir bûye?

Zehftir. Yanî jixwe ziman, zimanê dayîkê meriv nikare wekî em bêjin araç, araceke yenî tesîra wê ser rihê mêriv, giyana mêriv psîkolojiya mêriv, derûniya mêriv, helwesta mêriv hertiştî heye. Bela wê jiyana min zêdetir kurdî ye, malbata min, hevalê min yê baş hemî kurd in. têkiliyên jiyana min em bêjin sedî no dû pênc kurdî ye.

Ciyekî ku tu xwe bi kurdî rehet hîs nakî heye?

Yanî ciyên wisa mesela wextê ku tirk hebin, yên kurdînezan hebin ez dîsa hevalê min ê kurdî hebin dîsa ez kurdî tecîh dikim lê kurd tunebe mecbûr tu tirkî ew dikî lê ez xwe xweş hîs nakim. Yanî mesela em zimanê wan dizanin ew çima hewl nadin zimanê me hîn bin.min heyata xwe da nebihîstiye ku tirkekî navekî kurdî li zarê xwe kiriye yan kurdî hîn bûye.

Baş e meriv dikare bêje xwe rihethîskirina te ya bi herdu zimanan, tabî kurdî bêtir, bi perwerdeyê ve girêbide, mesela te kurdî perwerde nedîta kurdî?

Perwerde nizam dibe ku xwe baş îfadekirinê ra bandora wê hebe lê, lê xwe başhîskirinê kurdî ewktir e. Berî ez perwerda kurdî bixwe xwe ez hîn bûm. Berî ez wextê çûme zanîngehê jî hevalekî min ê tirk hebû, yanî digo ez tirk im, belkî ereb bû jî hebû. Min cara bê hemdê xwe min pêra kurdî xeber dida, bi deqqeyan min xeber dida. Paşê digo yaw ez bi kurdî nizanîm. Dîsa ez vedigeriyame tirkî. Min dixwast ez xwe bi kurdî baştir îfade bikim. Ez bi vê va girê Didim heke zimanê zarokekî yan kesekî kurdî be heta piştî wextekî tirkî hîn bûbe wekî zimanê duyemîn ew dê jiyana xwe da herdem xwe bi kurdî baştir îfade bike.

Beşdar - 4

Pirsa 1.

Di sazîyên fermî da ez bêtir bi Tirkî diaxivim. Heya ku ez bi ser bikevim yan pê bizanim yê li hemberê min kurd e, Kurdî dizane yan jî ji Kurdî aciz nîn e ez wê demê dest bi Kurdî dikim. Lê destpêk exleb bi tirkî ye lewra zimanê fermî ye. Nav gel da jî ku hevnasîya min bi yekî ra bi Kurdî be axaftinên min bi wî ra hertim bi Kurdî ye lê ku bi tirkî me hev nas kiribe ez bi rihefî nikarim pê ra Kurdî biaxivim. Heya ji destê min tê ez di nav civatê da bi Kurdî diaxivim.

Dema em diçin şaredarîyê em bi rehetî Kurdî diaxivin lewra em dizanin yên derûdora me tev kurd in. Nexweşxaneyê da jî meriv xwe rehet hîs dike lê cîyên wek nifûs, tapî û emnîyetê da mirov bi rehetî nikare biaxive. Wextê ku ez bizanibim li cîhekî kurd zêde ne, hejmara kurda zêde ye axaftina min jî rehet dibe.

Pirsa 2.

Çima Kurdî? Ji ber ku ez kurd im. Zimanê min ê dayîkê jî Kurdî ye, zimanê çanda min jî Kurdî ye. Ku meriv bêje ziman tenê ji bo îletîşimê ye ji bo dîyalogê ye ew dibe kêmasî, dibe heqaret ji bo ziman lewra ziman binhişê te ye serhişê te ye jîyana te ye hebûna te ye, çanda te ya hezar salî ye. Ne çanda îro ye. Ziman ne tenê dîyalogekî ye ku ez bi yekî ra bikim. Ji ber wî jî tu li ser kîjan kokê, li ser kîjan xîme mezin bûbî divê tu wî mezintir bikî. Tu îro xwe bişoyî jî yanî tu tirk bî xwe ji tirkîyê bişoyî, kurd bî xwe ji kurdîyê bişoyî li ser wî çandî dîsa mezin dibî. Îro tirkekî ku çûbe Ewrpoyê qet zimanê Tirkî nizanibe jî çawa ku çanda tirkîyê pê ra heye kurdek jî bixwaze nexwaze her tim ew kurd e. Wextê ku ez hertim kurd bim divê ez zimanê xwe pêşva bibim. Lewra çanda min pêşva diçe, lewra rabirdûya min pêşva diçe û dahatûya min pêşva diçe. Ji ber wî divê ez kurdîya xwe pêşva bibim û civat jî pê bihese. Wekî dî jî ez Kurdî xwe rehet hîs dikim.

Herçiqas jîyana me bi Kurdî dest pê kiribe jî berdewamîya jîyana me êdî bê tirkî lewra me li sazîyên tirkî nêzîkî bîst sala xwend. Pirtûkê ku me xwend jî tev tirkî bûn. Hê îro jî wisa ne. Jiber ku statûyeke me tûne ye li her derên fermî ziman bi tirkî ye. Bona wî jî tirkî di jîyana me de gelek zêde ye. Wextê ku tirkî zêde be mecbûr em tirkî diaxivin. Civat jî di vî warî de zêde hişyar nîn e, civat xwe ji kurdîyê dişo. Ji bona wî di nav civatê da jî Kurdî zêde nayê bikaranîn.

Sedemê tiştên civakî, bûyerên civakî meriv nikare bêje sedemek tenê heye. Qanûnê civakî mîna qanûnên fîzîkî nîn in. Gele sedemên wî hene. Li hinek cîhan ji tirsê ye, li hinek deveran ji şermê ye belkî. Tiştêkî wiha jî heye, meriv çawa dikare ji van tiştan xelas bibe û bi zimanê xwe biaxive? Divê du tişt hebe. Serê ewil divê statûyek hebe. Wextê statû tinebe millet xwe jê dişo lewra ew ziman ji bo jîyana te wê çi bide te? Îro kurd evî nabînin, yanî sibê bi vî zimanî wê çi bikin. Bi vî zimanî nikare bibe doktor, bi vî zimanî nikare bibe mihendis, bi vî zimanî nikare pêşva biçe. Hertim wê bikeve nava zimanê tirkî. Jiber wî xwe pê va nagre. Êdî lewra civat jî civateke feodal nîn e, civateke postmodern e, civata postmodern da jî şexis mûhîm e. Ji ber vî jî her şexis li xwe temaşe dike yan jî belkî li malbata xwe, li jin û zarên xwe temaşe dike. Bi firehî temaşe nake. Wextê ku statû hebe deverên fermî tu Kurdî biaxivî wê ziman pêşva biçe. Yek jî bazar e. Îro temaşe bike li Wanê li her derî zimanê Îranî yê farsî nivîsîne.

Bo çi? Ji bo ku bazar e. Îro bazara ziman Kurdî jî tine. Wextê ku ev herdû tunebin ji bo zimanekî ew ziman pêşva naçe, ew ziman paşva diçe. Elbet di roja îro da ku zimanê dinyayê tev bûye îngîlîzî li zimanê weke Kurdî xwedîderketin êdî zehmettir e. Ji bona vî divê statû û bazar hebe. Wextê tunebe wê paşve biçê.

Pirsa 3.

Ez herduyan da jî xwe rehet hîs dikim. Gava Kurdî diaxivim li derdora min yekî ku zêde Kurdîyeke kûr mirov pê ra biaxive kêma e. Ji bona wî Kurdî em tiştên felsefî-polîtîk nikarin zêde nikarin niqaş bikin. Bona wî jî kurdîya me hinekî ewk dibe. Lê ji şexsê min ra zêde ferq nake. Heta dikarim wiha bêjim carna ez herduya tevê hev dikim. Tirkî-Kurdî. Hinek tiştên Tirkî nayên bîra min ez Kurdî tevlê dikim.

Hinek peyvên gava meriv diaxive yê li hember meriv ku fêma nîke meriv di valahiyê da dimîne. Ew gelek caran min aciz dike. Lê tiştek wiha heye, însanê ku zimanê dayîkê ji piçûktayî hîn bûbe rehet e. Yanî çiqas peyv têra wî neke, peyvê Tirkî, Erebi, Farsî li nav bide jî rehet e. Însanê ku paşê hîn bibin ew rehet nîn in lewra bi zimanekî din difikirin, peyvê wan zimanan tînin ser zimanê xwe û bi wî dixwazin biaxivin. Ew jî diyalog çênake, rehet nabe. Ê min ji ber ku ji dayîkê da ez Kurdî axivîme, li gund mezin bûme ê piştra jî her tim Kurdî di malbatê da diaxivim ji bo wî zêde ji min ra zehmetî çênabe.

Wextê ez Kurdî diaxivim xwe rehet hîs dikim. Yê me kurda problemeke me ya wiha jî heye, ji ber ku em xwe zêf dibînin her herêmek dibêje kurdîya min ya baş nîn e, kurdîya heqîqî ya filan derê ye. Bêtir ev li herêma me ya Bitlîsê gelek zêde ye. Halbûkî tiştek wisa tune zimanê te da, yanî tu li gundekî bî heta tu nava wî gundî malbatek jî bî wextê tu xwe bikaribî îfade bikî devoka rast devoka te ye. Îja peyvên ku te bikaranî eger xîmê te bi kurdî be çi dibe bila bibe. Yanî em divê ji vê psîkolojîyê xelas bibin. Yanî devoka Colemêrgîyan yan devoka Mêrdînîyan yan devoka Dîyarbekirîyan tune, tev jî Kurdî ne. Wextê ku meriv rehet be cudatîya devokan ji holê radibe.

FORMA HEVPEYVÎNÊ YA TERCÎHA ZIMAN- Beşdar -5

Ev form dixwaze bîr û raya kesên kurdîzan bigire derbarê tercîha zimanê wan ê axaftinê de li Bajarê Wanê. Bersivandina pirsan ew ê ji bo tezeke doktorayê ya Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî bi kar bê; bersivên hevpeyvînê û nav û nasnavê kesê bersivdar ew ê nebe para kes an saziyekê.

Bersivdarê/a Birêz!

Ji kerema xwe pirsên li jêr bibersivîne.

1. Di sehayên gel de (saziyên îdarî, kargeh, nexweşxane, mixaze, park û wd.) ji kurdî û tirkî hûn bêtir kîjan zimanî tercîh dikin, çima?

